# Zebûr

# Mesele

# Zebûr

# Mesele

Înstîtûta Welger'andina K'itêba Pîroz
Moskva, 2016

**Zebûr**
**Mesele**

Bi vê navnîşê binivîsin bişînin: ibt_inform@ibt.org.ru

ISBN 978-5-93943-207-8
© Институт перевода Библии, 2016

## Pêşgotin

Xwendevanêd delal!

Ev cara pêşin e, ku ev her du k'itêb, «Zebûr» û «Mesele», bi zimanê k'urdîya kurmancîya welatêd kafkazê hatîye welger'andinê. Cihû, musulman û mesîhî van her du k'itêba qebûl dikin çawa k'itêbêd pîroz, ev her du k'itêb jî dik'evine nava p'arêd «K'itêba Pîroz». K'itêba Pîroz jî, awa gotî Bîblîya, k'itêba k'itêba ye, k'itêba here hêja ye û hineke ji p'arêd wê bi h'ezara zimanêd dinyayê hatine welger'andinê.

Her merivê ser t'opa dinyayê, k'îjan qulbêda ku dimîne, çi miletî yan xweyê çi h'ebandinê be, li wî dik'eve ku K'itêba Pîroz bi zimanê xwe bixûne. K'itêba Pîroz t'evayîya xweva şêst şeş k'itêb in, k'îjan ku bi destê gelek nivîsk'ara navbera gelek salada hatine nivîsarê. Ev k'itêbana derheqa serhatîyêd ji destpêbûna dinyayêda girtî h'eta sedsalîya yekêye pey bûyîna Îsa Mesîhr'a dibêjin. K'itêba Pîroz li ser du p'ara p'arevedibe: Peymana Kevin û Peymana Nû.

Ev k'itêbêd «Zebûra» û «Mesela» dik'evine nava p'arêd Peymana Kevin, awa gotî ew zemanekî berî bûyîna Îsa Mesîhda hatine nivîsarê. Ew her du k'itêb çawa k'itêbêd serwaxtî û hilbestî (şiêrî) têne h'esabê. Ew t'ijî zanebûn, aqil û bîlantî ne, şîretê didine yêd ku dixwazin r'îya r'astîyêda her'in, ne ku ser wê r'îya şaşe ku dibe berbi undabûnê. Usa jî ew dil didine ber yêd ku ji Xudan dûr k'etine û dixwazin veger'in, r'îya Wî bibînin.

Zebûr û Meselêd Silêman ji têk'sta îbranîye kevin, awa gotî ji têk'sta Masorêtî hatine welger'andinê. Belê têk'sta îbranî kanîya vê welger'andinê ye, lê bona vê welger'andinê çend welger'andinêd zimanêd mayîn, usa jî welger'andina Yûnanîye kevin hatine lênihêr'andinê.

Bona alîk'arîya xwendevana çend tişt hatine hazirkirinê:

1. Sernivîsarêd nûye p'ara.
   Nava welger'andinêda, her zebûr û her p'areke Meselêd Silêman pê sernivîsarê destpêdibe. Mesele, Zebûra 1-ê bi sernivîsara «Du r'ê» destpêdibe, Zebûra 2-a bi «P'adşayê bijartîyê Xudan» destpêdibe û yêd mayîn. Ev sernivîsar kanîya têk'sta îbranîda t'unene, lê van axirîyada bona alîk'arîya xwendevana hatine hazirkirinê, wekî xwendevan zanibe, merem yan fikira her p'arê ser çi ye.
2. Sernivîsarêd kevine p'ara.
   Gelek zebûr bi sernivîsareke kevine îbranî jî destpêdibin. Ev sernivîsar kanîya têk'sta îbranîda hene. Ew bi h'erfêd tewyayî hatine nivîsarê. Mesele, Zebûra 3-a bi sernivîsareke aha destpêdibe: «*Zebûra Dawid, gava ew ji ber kur'ê xwe Abşalom r'evî*», Zebûra 6-a jî aha destpêdibe: «*Serwêrê sazbendar'a. Ser sazêd h'eyştt'êlî. Zebûra Dawid*». Ji wan sernivîsara gelek be'sa têrmînêd kevine sazbendîyê û miqama dikin, mesele, Zebûra 6-a be'sa «*sazêd h'eyştt'êlî*» dike. Lê ji wan hinek têrmîn, me'na wan ne t'am e'yan e. Mesele, Zebûra 8-a be'sa «*Ser Gît'ît'ê*» dike, lê zaneyêd îroyîn nizanin heger «Gît'ît'» be'sa miqamekî dike (mesele, miqamekî ji bajarê Gat'ê) yan be'sa hacetekî mûzîkîyê dike (mesele, mîna saz yan bilûrê). Usa jî xebera «Sela» gelek cara nava r'êzêd zebûrada derbaz dibe, lê me'na wê bi îbranî ne e'yan e. Gelek zane bawer dikin ku ev jî têrmîneke miqamê ye. Binihêr'e Zebûr 3:2 û şirovekirina wê.
3. Şirovekirinêd jêrê.
   Nava k'itêbêda li jêra r'ûp'ela şirovekirin hene. Heger nivîsarêda hûn ser xeberê steyrkê «*» bibînin, hingê şirovekirina jêrê bixûnin.

4. H'erfêd *tewyayî*.
   Çend cara nava nivîsarêda h'erfêd *tewyayî* (*kûrsîv*) hatine nivîsarê. Ev xeberana li gora zimanê îbranî derbê distînin. Lema xwendevan gerekê xwendina xweda giranîyê bide ser wan xebera. (Mesele, binihêr'e: Zebûr 59:16.)
5. H'erfêd mezin.
   Gava navek yan cînavek be'sa Xwedê yan Mesîhê Wî dike, ew pê h'erfa mezin alîyê welger'ada hatîye nivîsarê. (Mesele, bona Mesîh binihêr'e: Zebûr 2 û 110.)

Înstîtûta Welger'andina K'itêba Pîroz r'azîbûna xwe dide: welger'a, serr'astkira, usa jî h'emûyêd ku t'evî k'arê hazirkirin û xebata çapkirina her du k'itêba bûne.

*Înstîtûta Welger'andina K'itêba Pîroz, Moskva*

# Zebûr

## Pêşgotina K'itêba Zebûra

«Zebûr», bi zimanê yûnanî «Psalmos» e, bi zimanê îbranî jî «Mezmûr» e. Zebûr stiranêd r'uh'anî ne, k'îjan ku bin miqamêd cûr'e-cûr'e hacetêd sazbendîyêda hatine stiranê.

Zebûr dinyayêda bîranîneke hilbestaye kevin e. Evana ji Îsraêlîya derk'etin bûne dengî, navbera h'ezarsalîya berî bûyîna Îsa Mesîhda. Evana hilbestêd r'uh'anîye xweyîşuret in: hineke ji van stiranêd pesindayîn û Xwedêh'ebandinê ne, duayêd bona alîk'arîyê, xweyîkirinê û xilazkirinê ne. Serda jî zebûrêd lavakirinêye bona baxşandinê, stiranêd şikirdarîyêye bona dayîn û alîk'arîya Xwedê, usa jî zebûrêd hewarîya cezakirina dijmina ne. Zebûr carna hindava şexsekîda têne gotinê, carna jî hindava cime'têda. Carna zebûrbêj kulêd dilê xwer'a dibêje, carna jî bona h'ewcedarîya t'evayîya cime'ta Xwedê. Zebûr k'itêbeke h'ewask'ar e, bona serwaxtîyê, zanebûn û bextewarbûnê.

Zebûr ji alîyê gelek nivîsk'arada, awa gotî ji alîyê Dawid P'êxember (ku p'adşekî cime'ta Xwedê bû), Asaf, malbeta Qorax û yêd mayînva hatine nivîsarê û wextekî dirêjda ew gîhandine hev.

K'itêb belayî ser pênc p'ara dibe: 1-41, 42-72, 73-89, 90-106, 107-150.

# K'itêba Yekê (Zebûra 1-ê h'eta 41-ê)

## Du r'ê

1 1 Xwezî li wî bendeyî,
ku ber bayê nep'aka nak'eve,
xwe li r'îya gunek'ara nagire
û civata berzeqada r'ûnanî.
2 Lê şabûna wî hînkirina Xudanda ye,
şev û r'oj ser wê hînkirinê k'ûr difikire*.
3 Ewî mîna wê dara devê ava ye,
ku we'dê xweda berê xwe dide,
belgê li ser naç'ilmise,
çi jî dixwaze mîyaser dibe.

4 Lê nep'ake ne usa ne,
ewe mîna paç'a kayê ne,
ku ba lê dixe dajo dibe.
5 Lema nep'akê ber dîwanê teyax neke,
neheqê jî civata r'astada nesekine.
6 Çimkî ç'e'vê Xudan ser r'îya r'asta ye,
lê r'îya nep'aka wê ber wan unda be.

## P'adşayê bijartîyê Xudan

2 1 Çima p'ûtp'arist diqilqilin
û milet badîhewa t'ivdîrê dikin?*
2 P'adşêd dinyayê hevr'a r'adibin,
serwêr t'evîhev dişêwirin,
davêjine Xudan û K'ifşkirîyê Wî, dibêjin:
3 «Qeyd-zincîrêd wan em bişkênin
û xwe ji destêd wan xilaz kin».

---

* 1:2 «K'ûr difikire» aha jî tê fe'mkirinê: «Dixûne» yan «ezberî dike».
* 2:1 K'arêd Şandîya 4:25-26.

4 Yê ser k’ursîya e’zmên wan dik’ene
û Xudan wan dike k’en û qerfane.
5 Hingê bi hêrs li wan dike xeberdane
k’în-boxîyê wan dike nava sawane:
6 «Min P’adşê Xwe t’estîq kirîye,
li wî ç’îyayê Xweyî pîroz, ku Sîyon e».

7 P’adşê got: «Ezê bikim qirare,
Xudan vekir Minr’a biryare:
‹Tu Kur’ê Min î,
îro Minr’a Tu bûyî*.
8 De bike Tu ji Min bixwaze,
mileta Ez Ter’a bikim ware,
her çar qulbe Ter’a mal û mik’an* e.
9 Pê şiva h’esinî Tê wan bih’incir’înî
û mîna cêr’ wan hûrdexweşî kî›»*.

10 De niha fe’m bikin, gelî p’adşa,
serwêrêd e’rdê werine ser h’işa!
11 Bi xof xulamtîyê Xudanr’a bikin,
ji dest sawa Wî bilerizin,
12 Kur’ r’amûsin* ku hêrs nek’eve,
ku r’êda ji we kes unda nebe,
gava hêrsa Wî nişkêva r’abe.

Xwezî li h’emûyêd xwe dispêrine Wî**.

---

* 2:7 K’arêd Şandîya 13:33; Îbranî 1:5; 5:5.
* 2:8 Awa gotî «cî-war, cîyê mayînê».
* 2:9 E’yantî 2:26-27; 12:5; 19:15.
* 2:12 Fe’mîna îbranî ne t’am e’yan e, lê «Kur’ r’amûsin» eva fe’mînek e, fe’mîna duda jî ev e: «Bi sitqê dilê r’ast bih’ebînin».
** 2:1-12 Bi fikira gelek zana, eva zebûra bona qewîn-qedîmkirina t’extê p’adşêd Îsraêlê dihate gotinê. Lê peyr’a, gelek ser k’etin, ku eva zebûra p’êxembertîyê bona Mesîh hatîye gotinê (Mesîh tê fe’mkirinê: «Yê bi r’ûn k’ifşkirî» yan «P’adşê bijartî»). Bona vê yekê,

### Duayê berbangêyî hewarê

**3** *Zebûra Dawid, gava ew ji ber kur'ê xwe Abşalom r'evî.*
1 Ya Xudan! Dijminêd min çiqas zêde bûn!
Gelek r'adibin miqabilî min.
2 Gelek bona min aha dibêjin:
«Xilazbûna vî Xwedêda t'une». (Sela)*

3 Lê Tu Xudano, mert'ala min î,
r'ûmet û bilindkirê serê min î.
4 Min deng hilda, li Xudan kir gazî,
Ewî cab da ji ç'îyayê Xweyî pîrozî. (Sela)

5 Ez p'al didim, r'adizêm û r'adibim,
çimkî Xudan e xweykirê min.
6 Ez natirsim ji p'ir'anîya wan meriva,
wekî dora min girtine her çar alîyava.

7 R'abe Xudano! Min xilaz ke, Xwedêyê min!
Belê Tê sûretê h'emû neyarêd minda bidêyî
û diranêd nep'aka hûrdexweşî kî.
8 Xilazbûn destê Xudanda ye.
Bira duayê Te ser miletê Te be. (Sela)

### Duayê yekî ku êvarê hewara xwe Xwedê tîne

**4** *Serwêrê sazbendar'a. Ser sazêd t'êlî. Zebûra Dawid.*
1 Gava ez dikim gazî, dengê min bibihê,
Tu, Xwedêyê r'astîya min!

---

vê welger'andinêda h'erfa mezin bona vî p'adşayî hatîye nivîsarê (mesele «P'adşa» û «Wî»).

* 3:2 Me'na xebera «Sela» bi zimanê îbranî ne e'yan e. Gelek zane bawer dikin ku ev têrmîneke miqamê ye. Lê welger'andina Yûnanîye kevinda ev tê fe'mkirinê çawa deng sekinandin û dûmayîkirina miqamê.

Tengasîyêda Te ez derxistime fireyê,
li min bike vê r'e'mê, duayê min Tu bibihê.

2 Hey însanno! H'eta k'engê hûnê bêhurmet kin
r'ûmeta min?
H'eta k'engê hûnê boş-betalîyê h'iz bikin
û derewîyê biger'in? (Sela)
3 Lê zanibin, Xudan aminê Xwe* pê ç'e'vekî din dinihêr'e.
Xudan dibihê, gava ez gazî Wî dikim.

4 Bilerizin, guna nekin*,
cî-nivînada bifikirin û deng nekin. (Sela)
5 Qurbanêd r'astîyê hûn bidin
û gumana xwe bidine ser Xudan.

6 Gelek hene aha dibêjin:
«K'î wê qencîyê nîşanî me ke?»
Xudano! R'onaya dîndara Xwe bide ser me.
7 Te ji wê şabûna wan zêdetir kir dilê min,
yêd ku gava nan, şerava nûva ew xinê dibin.

8 Ez r'ih'et p'al didim û r'adizêm,
çimkî Tu yî t'enê Xudano, ku min bêxof didebirînî.

## Duayê k'omekxwestinê

**5** *Serwêrê sazbendar'a. Pê bilûra. Zebûra Dawid.*
1 Ya Xudan! Tu guh bide gotinêd min,
bira Teva e'yan be zarînîya min.
2 Dîna Xwe bide hêwarza min,
ya P'adşê min û Xwedêyê min!
Çimkî hewara xwe Te datînim.
3 Xudano! Berbangê Tu dibihêyî dengê min,
berbangê ezê bême ber Te, hîvîya Te bim.

---

* 4:3 «Aminê Xwe» aha jî tê fe'mkirinê: «Pîrozê Xwe».
* 4:4 Aha jî tê fe'mkirinê: «Heger hêrs dik'evin, guna nekin».

4 Tu yî Xwedêyê ku neheqîya naxwaze,
xirabê li cem Te nehêwire.
5 Babaxê ber ç'e'vê Te nesekine
ku dijenî yêd xwe bêolîtîyê girtine.
6 Tu derewîna unda dikî,
ji yêd qet'il û qelp aciz î Xudan.

7 Lê ezê saya h'uba Teye p'ir',
bik'evime nava Xana Te
û ber P'aristgeha Teye pîroz,
bi xofa Te ezê ta bim.
8 Xudano! Bi r'astîya Xwe,
Tu r'êberîyê min bike
û e'ynatî dijminêd minr'a,
Tu ber min r'ast ke r'îya Xwe.

9 Çimkî zarê wanda r'astî t'une,
dilê wanda xirabkirin e,
gewrîya wane t'irba vekirî ye,
zimanê wanda h'ilek'arî ye*.
10 Xwedêyo! Dîwana wan Tu bike,
bira ew bik'evin pê şêwirêd xwe.
Bona gelek neqencîyêd wan,
Tu wan bavêj ji ber Xwe,
çimkî r'abûne himberî Te.

11 Lê h'emûyêd xwe spartine Te bira şa bin,
h'eta-h'etayê eşqa bistirên, bin sîya destê Teda bin,
yêd navê Te h'iz dikin, bira pê Te beşerxweş bin.
12 Çimkî dua Tu yê r'ast dikî, Xudano,
bi xêrxwazîyê dora wî digirî, çawa mîna dîwara*.

* 5:9 R'omayî 3:13.

* 5:12 Têk'sta îbranî xeberekê bi k'ar tîne, ku aha tê fe'mkirinê: «Mert'aleke mezin e, ku t'emamîya bedenê digire».

## Duayê oxirmêd giranda

6 *Serwêrê sazbendar'a. Ser sazêd h'eyştt'êlî. Zebûra Dawid.*
1 Xudano! Bi k'ela Xwe min hilneyê
bi hêrsa Xwe, li min neke Tu şîretê.
2 Xudano! Minr'a bike Tu r'e'mê
çimkî k'etime bêt'aqetîyê.
Xudano, Tu min bike h'ekîmtîyê,
çimkî hestûyada k'etime r'icafê.
3 Ez bi xwe jî dir'icifim
û Tê Xudano... h'eta k'engê?

4 Veger'e Xudan! Tu nefsa min xilaz ke,
li gora xatirê wê h'uba Xwe, min azad ke.
5 Çimkî t'irbêda k'î wê Te bîr bîne?
Dîyarê mirîyada k'ê şikirîyê bide Te?

6 Ji ne'lînîyê ez wastîya me,
her şev dişom doşeka xwe,
bi hêsira şil dikim nivîna xwe.
7 Ç'e'vê min ji k'ederê hatin derên,
r'ûyê h'emû dijminada ew r'ijîyan.

8 Ji min dûr k'evin, h'emûyêd neheqîyê dikin*,
çimkî Xudan bihîst dengê girîyê min.
9 Xudan bihîst lavayê min,
Xudanê qebûl ke duayê min.
10 H'emû dijminêd min wê şermî bin, bir'icifin,
wê veger'in û nişkêva şermezar bin.

## Duayê li gor heqî û neheqîyê

7 *Dawid Xudanr'a stira û avîte K'ûşê ji r'ik'inyata Bênyamîn.*
1 Xudan, Xwedê min! Min xwe daye bin sîya Te.
Ji peyk'etîyêd min, min xilaz ke û azad ke.

---

* 6:8 Metta 7:23; Lûqa 13:27.

2 Yan na ewê mîna şêra min bidir'înin
û vejenin azadkirê minê t'une bin.

3 Xudano, Xwedê min!
Heger min tiştek kirîye,
yan destê minda neheqî heye,
4 yan min neheqî xêrxwazr'a kirîye,
cîyê heqî-neheq dijminê xwe şêlandîye,
5 bira dijmin pey min k'eve min bigire
û e'mirê min li ser dinê p'êpes ke,
r'ûmeta min jî ax-xalîyêda betal ke. (Sela)

6 De r'abe Xudano, bi hêrsa Xwe,
ber gef-gur'îya dijminêd min bisene.
De h'işyar be hêna minda, Xudano!
Ne Te heqî e'mir kirîye?
7 Bira civîna mileta dora Te bigire,
ser wanr'a Xwe bide hêlana jorin.
8 Xudan ser miletada dinihêr'e.
Xudano, Tu heqîyê li min bike,
li gora wê r'astî û bêsûcîya min.
9 Bira xirabîya nep'aka bit'er'ibe,
lê yêd sitqê dilê r'ast bişidîne,
Tu nêt û dilê min e'nene dikî,
Xwedêyê ku li ser r'astîyê yî!

10 Mert'ala min Xudan e,
yê dilê r'ast xilaz dike.
11 Xwedê h'akimê r'ast e,
her r'oj ser nep'aka hêrsk'etî ye.
12 Heger ew nep'ak veneger'e,
Ewê şûrê Xwe bona wî tûj ke,
kevanê Xwe saz ke, nîşan bigire.
13 Ç'ekêd kuştinê wîr'a hazir ke,
tîrêd Xwe jî wê bike yêd agirî.

14 Va, yê neheq ji neheqîyê pê maye,
xirabîyêva h'emle ye, derewîyê tîne.
15 Ç'e'lê dik'ole, ew k'ûr dike,
lê xwexa dik'eve wê t'elê.
16 Xirabîya wî vediger'e serê wî,
zulmdarîya wî tê ser qafê wî.

17 Bona r'astîya Wî, ezê şikirîyê bidime Xudan
û bistirêm eşqî navê Xudanê Herî Jorin.

## Mezinayîya r'ûmeta Xwedê

**8** *Serwêrê sazbendar'a. Ser Gît'ît'ê. Zebûra Dawid.*
1 Ya Xudan, Xweyê me!
Ça h'eyran e navê Te,
li ser t'emamîya evî e'rdî!
R'ewşa Te fêza e'zmanar'a ye,
2 ku pê devê xişîm*
û şîrxura tê bilindkirinê.
E'ynatî dijminr'a Te qewat h'îm kir,
ku neyar û peyk'etîya dengbir'î kî.

3 Gava ez dîna xwe didime li e'zmana,
kirêd t'ilî-pêç'îyêd Te, hîvê û steyrka,
k'îjan ku Te cî-war kirine,
4 îdî çî ye însan ku Tu bîr tînî,
yan jî bendê vê dinê Tu lê dinihêr'î?

5 Te hinekî ji milyak'eta ew nimiztir kir,
r'ûmet û r'ewşêva ew xemiland.
6 Te ser şixulê destê Xwe ew serwêr danî,
her tişt kire binê p'îyêd wî*,
7 h'emû pez û dewar, h'eywanêd beyanî,

---

* 8:2 Metta 21:16.
* 8:4-6 Bona «her tişt kire binê p'îyêd wî» binihêr'e: Korint'î I 15:27; Efesî 1:22. Bona r'ezêd 4-6 binihêr'e: Îbranî 2:8.

8 teyredêd e'zmên, me'sîyêd be'rê
û her çi ku r'îyêd be'rêda diçin.

9 Ya Xudan, Xweyê me!
Ça h'eyran e navê Te,
li ser t'emamîya evî e'rdî!

## Şikirdarîya bona R'astîya Xwedê

9 *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid. E'lmût'-labên*.*
1 Ezê bi t'emamîya dilê xwe
şikirîyê bidime Te, Xudan,
h'emû k'eremetêd Te bikim dengî.
2 Ezê pê Te şa bim û gul dim
eşqî navê Te ezê bistirêm, Yê Herî Jorin.

3 Gava neyarêd min paşda vediger'in,
ew dik'evin û ber ç'e'vê Te unda dibin.
4 Çimkî Te ser dîwan û heqîya minda nihêr'î,
Tu ser k'ursîyê, çawa h'akimê ser r'astîyê r'ûniştî.

5 Te p'ûtp'arist dengbir'î kirin,
k'ok li nep'aka Te anî,
navêd wana h'eta-h'etayê da hildan.
6 Neyar îdî t'une ne,
ewe her t'im xirabe ne,
Te bajarêd wan wêran kirin,
bîranîna xweva ew unda bûn.

7 Lê Xudanê h'eta-h'etayê p'adşatîyê bike,
Ewî k'ursîya Xwe bona dîwanê hazir kirîye.
8 Ewê dîwana dinê bi heqîyê bike,
ser miletada bi r'astîyê binihêr'e.

---

* 9:0 Me'na «E'lmût'-labên» bi îbranî ne e'yan e.

9 Xudanê qesira dero-dera be,
usa jî qesira yêd tengasîyada.
10 Ewêd nas dikin navê Te,
gumana xwe didin ser Te,
ewêd ku li Te diger'in,
Tu jî pişt nadî wan Xudan.

11 Bistirên eşqî Xudanê li Sîyonê,
bela kin kirêd Wî nava mileta.
12 H'eyfhildayî xûna r'êtî bîr tîne,
zarînîya dero-dera bîr nake.

13 Min were r'e'mê, Xudano,
dîna Xwe bide wan tengasîyêd min,
k'îjan destê peyk'etîyada min k'işandin,
Tu ku ji ber dergê mirinê min hildidî,
14 wekî t'emamîya r'ûmeta Te bikim dengî,
li ber dergehêd bajarê* Sîyonê,
bi dengê bilind şa bim bi xilazkirina Te.

15 P'ûtp'arist k'etine ç'e'la xweye k'olayî,
nigêd wan xwexa k'ete t'ela wane veşartî.
16 Xudan bi dîwankirinê Xwe da naskirinê,
nep'ak bi kirêd destê xwe dik'eve t'or'ê.
(Higgayon Sela)*

17 De bira nep'ak veger'ine dîyarê mirîya,
h'emû ew miletêd ku Xwedê bîr kirine.
18 Çimkî feqîrê h'eta xilazîyê neyê bîrkirinê,
gumana dero-dera h'eta-h'etayê unda nebe.

* 9:14 «Bajar» bi îbranî xeber bi xeber «qîz» e. Bi îbranî xebera «qîz» gelek cara bi me'na «bajar» yan jî «binelîyêd bajêr» tê xebatê.
* 9:16 Hinek zane fe'm dikin, ku «Higgayon Sela» be'sa miqamekî nerm dike, ku navbera stiranêda tê lêdanê.

19 R’abe Xudano, bira însan qewat negire,
bira dîwana p’ûtp’arista li ber Te bibe.
20 Xudano, Tu tirsê bike li ser wan,
bira p’ûtp’arist zanibin, ku ew merî ne. (Sela)

### Duayê gazinkirinê

10 1 Xudano, çima Tu Xwe dûr digirî?
Tengasîyada Xwe vedişêrî?
2 Nep’ak bi k’ubarîya xwe pey feqîr k’etîye,
bira ew xwexa bik’eve t’ela xweye fikirî.

3 Belê nep’ak bi nêtê dilê xwe difir’e
û yê tima Xwedê dik’ifire, bêhurmet dike*.
4 Yê nep’ak ji dest babaxîyê Xwedê nager’e,
t’emamîya fikira wîda Xwedê t’une.

5 Her t’im r’îyêd wî jêr’a r’ast dibin,
qirarêd Te wîr’a bilind in, dûrî wî ne,
p’ifî ser h’emû dijminêd xwe dike.
6 Dilê xweda dibêje: «Ezê nelik’umim,
qur’ne-qur’ne jî xirabîyê neyêne serê min».
7 Devê wîda t’ijî nifir’, derew, gef-gur’î ye,
bin zimênda jî mixenetî û neheqî ye*.

8 Te’ldêd gundada xwe vedişêre,
yê amî-t’am bi dizîva ew dikuje
û ç’e’vê wî bi dizîva ser feqîr e.
9 Ew qulç’ada xwe ditelîne,
mîna wî şêrê ne’la xweda.
Ew ditele çawa bike feqîr bigire,
feqîr digire û davêje t’or’a xwe.

* 10:3 Aha jî tê fe’mkirinê: «Û yê tima xwezîya xwe li xwe tîne».
* 10:7 R’omayî 3:14.

10 Xwe dike qoncik û p’al dide*,
yê belengaz dik’evine nav lepê wî.
11 Dilê xweda dibêje: «Xwedê bîr kirîye,
Ewî r’ûyê Xwe nixamtîye, ku Ew t’u car nebîne».

12 R’abe, Xudan, Xwedêyo!
Bilind bike Destê Xwe û belengaza bîr neke.
13 Çima yê nep’ak Xwedê bêhurmet ke,
dilê xweda bêje: «Xwedê serda nanihêr’e».

14 Ne Tu wan belengaza dibînî?
Tu li ser te’lî-tengîyada dinihêr’î
ku bi destê Xwe heqê nep’ak bidî.
Belengazêd xwe li Te spartî,
piştovanê sêwîya ew Tu yî.

15 P’er’ê nep’ak û xiraba Tu bişkênî,
gava xirabîya wan biger’î Tu nebînî.

16 Xudan p’adşê h’eta-h’etayê ye,
p’ûtp’aristê betavebin ji e’rdê Wî.

17 Tu xwestina belengaza dibihêyî, ya Xudan!
Dilê wan bişidîn û guh bide ser wan,
18 ser dîwana sêwî û belengazda binihêr’e,
wekî merivê dinê îdî wî netirsîne.

## Stirana gumana li ser Xudan

**11** *Serwêrê sazbendar’a. Zebûra Dawid.*
1 Min xwe daye bin sîya Xudan,
hûn ça minr’a dibêjin:
«Mîna ç’ivîka bifir’e,
her’e ç’îyayêd xwe?»

---

* 10:10 Aha jî tê fe’mkirinê: «Yê bêxeda qoncikî dibe tê p’elaxtin».

2 Va ye neheqa kevan saz kirine
û tîrêd xwe jî k'işandine,
ku te'rîyêda bavêjine yê dilê r'ast.
3 Gava bingeh wêran be,
îdî yê r'ast wê çi bike?

4 Xudan P'aristgeha Xweye pîrozda ye,
k'ursîya Xudan li e'zmên e,
ç'e'vê Wî her kesî dibîne,
bijangê Wî benî-adem dicêr'ibîne.
5 Xudan r'asta dicêr'ibîne,
lê dijene nep'ak û yê zulmê h'iz dike.
6 Wê ser nep'aka şelê agir û k'irk'ûtê bibarîne,
bayê germî-şewatê jî p'ara k'asa wan bik'eve.
7 Çimkî Xudan r'ast e, r'astîyê h'iz dike
û yê r'ast wê nûr-nedera Wî bibîne.

### Duayê hewargazîyê

## 12

*Serwêrê sazbendar'a. Ser sazê h'eyştt'êlî.*
*Zebûra Dawid.*

1 Hewar Xudan, çimkî yêd r'ast neman,
amin ji nava meriva hatine hilatin.
2 H'emû meriv hevr'a derewa dibêjin,
zarê h'ilek'ar û dilê qelp xeber didin.

3 De bira Xudan zarê h'emû h'ilek'ara bibir'e,
usa jî zimanê yê mezin-mezin xeber dide.
4 Ew dibêjin: «Emê bi zimanê xwe serk'evin,
zar-zimanêd me t'evî me ne
û h'ukumê k'ê wê ser me hebe?»

5 «Bona xatirê feqîrêd şêlandî
û zarînîya belengaza,
Ezê niha r'abim» Xudan dibêje,
«wan bikime cîkî bêxof,
k'îjan demana wê yekê ne».

6 Gotinêd Xudan, gotinêd xalis in,
mîna zîvê k'ûra axînda h'elandî ne
û h'eft cara ew paqijkirî ne.

7 Xudano, Tê nobedarîya me bikî,
h'eta-h'etayê me ji vî nisilî xwey kî,
8 ku dibin p'er'anî, ew diger'in,
bêarîya însênr'a ew maşoq in.

### Duayê hewargazîyê

13 *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid.*
1 Xudano, h'eta k'engê Tê min lap bîr bikî?
H'eta k'engê Tê r'ûyê Xwe ji min veşêrî?
2 H'eta k'engê ezê bine'lim,
her r'oj dilda derd û kul bim?
H'eta k'engê ber neyar ezê nimiz bim?

3 Binihêr', caba min bide,
Xudan, Xwedêyê min!
R'onayîyê bide ber ç'e'vê min,
ku nek'evime xewa mirinê
4 û dijmin nebêje: «Ez ser wî k'etim»,
xêrnexwaz şa nebe, gava ez bik'evim.

5 Min xwe spartîye aminîya Te,
dilê minê şa be, bi xilazkirina Te.
6 Ezê bistirêm eşqî Xudane,
bona qencîya ku li min kirîye.

### Bêarî û bêbextîya neheqa

14 *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid.*
1 Bêarê-bêfe'm dilê xweda dibêje: «Xwedê t'une».
Şûna r'eşva diçe, h'eramîyê dike,
kesek t'une ku qencîyê bike.

2 Xudan jorda ser mêrivda dinihêr'e ku bibîne,
gelo wê hebe yekî serwaxt, ku li Xwedê diger'e.
3 H'emû ji r'îya xwe derk'etî ne
û t'evayî pêva lewit'î ne,
yekî qencîyê bike t'une, t'u kes t'une!*

4 Gelo yêd neheqîyê dikin fe'm nakin,
ku cime'ta Min mîna nan dixwin
û ew gazî Xudan jî nakin?

5 Li wir xof û tirsê li wan bigire,
çimkî Xwedê nava k'oma r'astada ye.
6 Hûn dikin t'ivdîrada feqîra bidine şermê,
lê belê Xudan sit'argeha wan e.

7 Xwezî azadîya Îsraêlê ji Sîyonê bihata!
Gava Xudan çerxa cime'ta Xwe dîsa r'ast kira,
hingê Aqûbê eşq be, Îsraêlê jî şa be.

**K'î dikare Xana Xwedêda be**

**15** *Zebûra Dawid.*
1 Xudano! K'î dikare Konê* Teda bimîne?
K'î wê serê ç'îyayê** Teyî pîroz bihêwire?

2 Ewê ku bê lek'e dimeşe
û xwe r'îya heqîyê digire,
dilê xweda r'ast difikire,
3 bi zimanê xwe buxdana nake
û xirabîyê t'u kesî nake,
cînarê xwe bêhurmet nake*.

---

* [14:1-3] R'omayî 3:10-12.
* [15:1] Awa gotî «Konê Şe'detîyê». Ew kon h'eta çêkirina p'aristgeha Silêman hebû. Binihêr'e: Derk'etin 26:1.
** [15:1] Awa gotî «Ç'îyayê Sîyonê», ku Orşelîmêda ye.
* [15:3] Aha jî tê fe'mkirinê: «Û ji cînêr şermî nabe».

4 Merivê xirab ber ç’e’vê wî bêr’ûmet e
lê qedirê xwedêxofa bilind digire,
ew sond dixwe û sozê xwe diqedîne,
5 p’erêd xwe bi selef nade,
ji ber bêsûcva r’uşetê hilnade.

K’î van dike, t’u car ewê nelik’ume.

### Duayê gumana ser Xwedê

16 *Zebûra* Dawid.*
1 Tu min xwey ke, Xwedêyo,
çimkî min xwe daye bin sîya Te.
2 Ez dibêjime Xudan: «Tu yî Xweyê min,
pêştirî Te t’une xêrxwazekî minî din».

3 Ez demana pîrozêd Teye welatda me
û wan e’silzada me.

4 Lê ewêd pey xwedêyêd mayîn dir’evin,
ew derd û kulêd xwe zêde dikin.
Ez t’evî xûna qurbanêd wan nabim
û navêd wan ser zarê xwe hilnadim.

5 Xudan e p’ara mine jibare û r’isqê min,
destê Wîda ye axirî-aqûbeta min.
6 Cî-warêd r’ind p’ara min k’etin
û li min xweş hat Ew milk’ê min.

7 Pesinê Te ezê bidim, Xudanê şîretk’ar,
h’eta şev jî dil nav minda dibe dersdar.
8 Xudan her t’im ber ç’e’vê min e,

---

* 16:0 Vê zebûrêda, usa jî ji zebûra 56-a h’eta 60-î xebera îbranî «mîxtam» çawa «zebûr» hatîye welger’andinê. Lê me’na wê xebera îbranî ne e’yan e.

Ew li milê minî r’astê ye,
nefsa minê nelik’ume.

9 Lema dilê min şa dibe
û nefsa min eşq dibe,
bedena min jî bêxof dibe.
10 Çimkî Tê dîyarê mirîyada min nehêlî,
ne jî bihêlî aminê Te gor’istên bibîne*,

11 Tê r’îyêd e’mir minva e’yan kî.
Şabûneke mezin e li ber dîndara Te,
h’eta-h’etayê xêr û xweşî destê Teyî r’astêda ye*.

**Duayê hewargazîya yê amî-t’am**

**17** *Duayê Dawid.*
1 Ser heqîyêda binihêr’, ya Xudan,
dîna Xwe bide zarînîya min
û guh bide duayê min,
xêlif dernayê ji devê min.
2 Bira r’ûspîtîya min ji dîndara Te be,
bira ç’e’vê Te ser r’astîyê be.

3 Te dilê min cêr’iband, şev jî serîk li min da,
Te ez e’nene kirim, nedîtim tiştekî xirabda,
min ad kirîye, xirabî t’unebe devê minda.
4 Weke gotinêd devê Te,
bona kirinêd merivayê,
h’evza xwe dikim ji zulmk’arîyê.
5 Gavêd min şidîyayî ne şiver’îyêd Teda
û nigêd min neşimitîn ji nav wanda.

6 Min Te kir gazî, Xwedêyo, Tê cabê bidî
û guh bidî min, gotinêd min bibihêyî.

* 16:10 K’arêd Şandîya 13:35.
* 16:8-11 K’arêd Şandîya 2:25-28.

7 R’e’ma Xweye h’ujmek’ar e’yan bikî
û Tê bi destê Xweyî r’astê bikî,
ku spartîyêd Xwe ji neyar xilaz bikî.

8 Mîna r’onayîya ç’e’va Tu min xwey ke,
bin sîya p’er’ê Xweda min binixême,
9 ji ber ç’e’vêd wan nep’akêd min dişêlînin,
ji wan xûnxurêd ku dora min digirin.
10 Van bez girtîye, bê îsaf bûne*,
bi devê xwe xeberada berzeq bûne.
11 P’ê-p’ê pey min in, va ye dora min in,
ç’e’vê wan li ser min e, ku min e’rdê xin.
12 Ewe mîna şêrê dike ku bidir’îne,
mîna cewrikê şêrayî ku xwe ditelîne.

13 R’abe Xudan, pêşîya wan Tu bigire
û dever’ûya Tu wan bîne,
pê şûrê Xwe ji yêd nep’ak min xilaz ke,
14 pê destê Xwe, Xudano, min ji meriva xilaz ke,
ji wan merivêd vê dinê, p’ara k’îjana ev e’mir e,
ku zikê wan xezebêd Xweva Tu dadigirî,
ku ç’e’v li wan dibijiqin û zar’êd wan pê t’êr in,
bermayî jî zar’ê zar’êd xwer’a dihêlin.

15 Lê belê ezê r’ûkî r’ûspî dîndara Te binihêr’im,
gava h’işyar bim, nûr-nedera Te ezê t’êr bim.

## Stirana Dawide serk’etinê

**18** *Serwêrê sazbendar’a. Zebûra Dawidê e’vdê Xudan, k’îjanî xeberêd vê stiranê eşqî Xudan stira, li wê r’oja ku Xudan ew ji destê h’emû neyarêd wî û ji destê Şawûl xilaz kir. Ewî got:*

1 Ya Xudan, ez Te h’iz dikim, qewata min!

* 17:10 Bi îbranî xeber bi xeber aha ye: «Evana bezê xweda mewicîne», ku tê fe’mkirinê «ew bê îsaf bûne» yan «ew miqabil in».

2 Xudan e zinarê min, kela û xilazkirê min,
Xwedêyê min, qeyayê min,
ez xwe didime bin sîya Wî.
Ew e mert'al, stirûyê xilazbûnê û sit'argeha min.
3 Hewara xwe Xudanê xweyîpesin tînim
û ji destê neyara ez xilaz dibim.

4 Xumama mirinê ez girtim,
lêyîyêd wêranê ez r'oda birim.
5 Zincîrêd gor'istên li min welîyan
û t'elekêd mirinê pêşîya min girtin.
6 Tengasîya xweda min gazî Xudan kir,
hewar-gazîya xwe Xwedê xwe kir.
Ewî ji P'aristgeha Xwe bihîst dengê min,
gihîşte guhê Wî ew zarînîya min.

7 Hingê e'rd lerizî û h'ejîya,
h'îmê ç'îya derizîn û leqîyan,
çimkî Xudan r'akiribû hêrsa Xwe.
8 Ji bêvilêd Wî dû jê k'işîya,
ji devê Wî agir-alav,
k'ûrêd êgir ji Wî pekîyan.
9 E'zman tewand Ew hat jorda,
e'wrê r'eş bû bin p'îyada.
10 Xêrûb* sîyar bû û fir'î,
ser baskêd bê Ew sililî**.
11 Te'rîstan Xwer'a kire orxan,
avêd te'rî, t'ev e'wrêd e'zman
her çar alîyava Jêr'a bûn xan.
12 Ji şewqa Wî, teyrok, birûsk
e'wrêd Wîva derbaz bûn çûn.

* 18:10 «Xêrûb» cûr'ekî milyak'etayî sereke ye.
** 18:10 Me'na «sililî» ev e: «Mîna tîra ber'dayîye hewava diçe».

13 Xudan e’zmênda birq veda,
bi teyrok û birûskê
Yê Herî Jorin deng veda.
14 Tîrêd Xwe avîtin, neyar bela kirin,
birûsk şandin, ew t’evîhev kirin.
15 Binê be’ra hatine dîtinê
û h’îmê dinyayê hate k’ifşê,
Xudano, ji wê hilatina Te,
gava derk’et bayê bêvila Te.

16 Ewî jorda dest avîte min û ez girtim,
ji k’ûrayêd ava ez derxistim.
17 Ez ji destê neyarê minî zor xilaz kirim,
ji yêd dijenîyane min, ku ji min zortir bûn.
18 R’oja oxirmê giranda wan girt pêşîya min,
lê belê Xudan bû piştovanê min.
19 Ez derxistime fireyê xilaz kirim,
çimkî Ewî ez begem kirim.

20 Weke r’astîya min Xudan da min,
ez xelat kirim, weke paqijîya destê min.
21 Çimkî r’îyêd Xudan min xwey kirin,
neheqî nekir, ji Xwedê xwe dûr nek’etim.
22 Çimkî ber min bûn h’emû qirarêd Wî
û min xwe dûr nexist ji qanûnêd Wî.
23 Ez li ber Wî bêlek’e bûm
neheqîyêda h’evzek’ar bûm.
24 Lema Xudan da min, weke r’astîya min,
ku dîna xwe dide paqijîya destê min.

25 Tu aminar’a amin î,
bêqusûrar’a bêqusûr î.
26 Paqijar’a paqij î,
h’ilek’arar’a didî weke kirê wî.
27 Çimkî tayê merivêd k’etî Tu yî,
lê ç’e’vê k’ubar-babax nimiz dikî.

28 Belê, yê ç'ira min vêdixe Tu yî,
Xudan Xwedê şeva min dike r'onayî.
29 Pê Te ez h'icûmî ser ordîyê dikim
û pê Xwedêyê xwe ser sûrar'a banzdidim.

30 R'îya Xwedê k'amil e,
gotina Xudan xalis e,
Ew mert'al e bona her kesê Wîda sit'ar e.
31 Belê k'î ye Xwedê, pêştirî Xudan?
Yan k'î ye Qeya, xêncî Xwedê me?
32 Xwedê ye, Yê ku min qewat dike
û r'îya min bêxem dike*.
33 P'îyêd min dike, mîna p'îyêd kara xezalê
û min cîyêd bilind dide sekinandinê.
34 Destê min hînî şer'kirinê dike
û zendêd min kevanê sifir ditewîne.
35 Te mert'ala Xweye azadîyê da min,
milê Teyî r'astê girt pişta min,
berbihêrîya Te bû bilindbûna min.
36 Fire didî avîtin Tu gavêd min,
ku nelik'umin nigêd bin min.
37 Pey neyar k'etim, xwe wanr'a gîhand,
veneger'îyam h'eta k'oka wan qeland.
38 Min e'rdê xistin û nikaribûn r'abin
û ew k'etine bin p'îyêd min.
39 Te bona şêr' piştek min da girêdan,
ewêd ber min r'abûyî, ew kirine binê min.
40 Te r'ev kire nav neyarêd min,
k'oka peyk'etîyêd xwe min anî.
41 Wan kir hewar, hewarî nehat,
Xudan kirin hewar, lê Wî cab neda.
42 Min ew hêran mîna t'oza ber bê,
mîna h'er'îya k'ûçê wêda avîtin.

* 18:32 Aha jî tê fe'mkirinê: «Û r'îya min k'amil dike».

43 Ji şer'-de'wêd cime'tê Te ez xilaz kirim,
ser miletêd xerîb serwêr k'ifş kirim,
miletêd minva nenas, bûne xulamêd min.
44 Ça bona min bihîstin,
wan guhdarî li min kir,
xerîb ber min xwe ta kir.
45 Qudûmê çokê xerîb şkestin,
ji qesirêd xwe r'icaf derdik'etin.

46 Xudan sax e, pesinê Qeyayê min bidin!
Bira bilind be Xwedêyê azadîya min.
47 Ew e Xwedêyê ku hildide h'eyfa min,
milet jî kirine bin destê min,
48 ez ji neyar xilaz kirim,
ji xêrnexwazêd min bilindtir kirim
û ji destê zulmdara azad kirim.

49 Bona vê yekê, Xudano!
Nav miletada ezê Te bilind kim,
eşqî navê Te ezê bistirêm*.
50 Tu serk'etinêd mezin didî p'adşê Xwe,
Tu amin î hindava k'ifşkirîyê Xwe,
Dawid û zur'eta wîr'a h'eta h'etayê.

**R'ûmeta Xwedêye nava e'firîn û Qanûna Wîda**

**19** *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid.*
1 E'zman bona r'ûmeta Xwedê dibêjin,
e'rşê e'zmên şixulêd destê Wî k'ifş dikin.
2 R'oj r'ojêr'a xeberê dibêje,
şev şevêr'a zanebûnê vedike.
3 Ziman t'une, gotin t'une,
dengê wana nayê bihîstinê,

* 18:49 R'omayî 15:9.

4 lê şe’detîya* wan bela dibe t’emamîya e’rdê
û gotinêd wan digihîjine serê dinê**.

Xwedê e’zmênda bona te’vê konek vegirt,
5 mîna ze’vayê ji bin p’er’dê ku dertê,
mîna mêrxasê ku pê r’eva xwe şa ye.
6 Ew ji alîkî e’zmên dertê, diçe h’eta alîyê dinê
û ji germa wê t’u tişt nayê veşartinê.

7 Hînkirina Xudan k’amil e,
mêriv ew nûyejîyîn dike.
T’emîyêd Xudan bêxêlif in,
sadeya ew serwaxt dikin.
8 Qanûnêd Xudan r’ast in,
dilê mêriv şa dikin.
Fermanêd Xudan zelal in,
ç’e’vêd mêriv r’onayî dikin.
9 Xofa Xudan xalis e,
h’eta-h’etayê dimîne.
Qirarêd Xudan heq in,
t’emamîya xweva ew r’ast in.
10 Ewe hê havijî ne, ne ku zêr’,
ne ku ew zêr’ê herî safî,
ji hingiv û hingivê şimê şîrintir in.
11 Xulamê Te pê wan tê xweykirinê,
yê pêk tîne, xelata wî p’ir’ mezin e.

12 K’î dikare şaşîyêd xwe nas ke?
Ji guneyêd veşartî Tu min paqij ke,
13 ji k’ubarîyê xulamê Xwe xwey ke,
bira ew h’ukumî li ser min nekin.

* 19:4 Bi îbranî xeber bi xeber aha ye: «T’êla t’erezûyê», lê welger’andina yûnanîye kevinda «deng» e.
** 19:4 R’omayî 10:18.

Hingê ezê bêlek'e bim,
ji neheqîyêd mezin ezê paqij bim.

14 Bira gotinêd devê min
û ew fikirêd dilê min
li ber Te bêne qebûlkirin,
Xudanê Qeyayê min
û Azadkirê min.

### Duayê bona serk'etinê

**20** *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid.*
1 Bira oxirmê giranda Xudan guh bide te,
navê Xwedêyê Aqûb te xwey ke.
2 Bira ji Cîyê Pîroz k'omekê ter'a bişîne
û ji Sîyonê piştovanîyê li te bike.
3 Bira h'emû dîyarîyêd te Ew bîr bîne
û dîyarîyêd teye t'evayîşewatê qebûl ke. (Sela)
4 Bira weke dilê te bide te
û nêt-meremêd te bîne sêrî.
5 Pê serk'etina Te emê şa bin
û pê navê Xwedêyê xwe alê bilind kin.
Bira h'emû xwestinêd te Xudan bîne sêrî.

6 Niha ez zanim, ku Xudan k'ifşkirîyê Xwe ser dixe,
ji e'zmanê Xweyî pîroz caba wî dide,
pê destê Xweyî r'astê serk'etinêd zor dide.
7 Hinek pê e'reba, hinek pê hespa,
lê em pê navê Xwedêyê xwe difir'in.
8 Ewana lik'umîn û k'etin,
lê em r'abûn û r'ast sekinîn.

9 Xudano! Tu p'adşê ser xe!
Dengê me bibihê, gava em gazî Te dikin.

## Şikirdayîna bona serk'etinê

**21** *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid.*
1 Xudan! Pê qewata Te p'adşa şa dibe
û azadkirina Ter'a çiqasî gul dide.
2 Te ya dilê wî da wî,
xwestina devê wî na-na nekir. (Sela)

3 Tu berek'eta qencva r'astî wî hatî
û t'acê zêr'ê safî danî serê wî.
4 Ewî jîyîn ji Te xwest,
Te r'ojêd dirêje her-heyê danê.

5 R'ûmeta wî mezin e, pê xilazkirina Te,
qedir û hurmet Te danî serê wî.
6 Te duayê h'eta-h'etayê ser wîda barand,
dîndara Xweva Te ew eşq û şa kir.

7 Çimkî p'adşayî Xudanda guman e,
saya h'uba Yê Herî Jorin wê nelik'ume.
8 Destê Teyê bigihîje h'emû dijminêd Te,
destê Teyî r'astê bigihîje yêd dijenine Te.
9 Gava Tu k'ifş bî, Tê wan bikî mîna k'ûra tendûrê,
Xudanê hêrsa Xweda wan unda ke
û agir-alavê wan h'ûfî xwe ke.
10 Tê k'oka wan ji dinê bînî
û zur'eta wan ji nav merivayîyê.

11 Wan xwest xirabîyê li Te bikin,
şêwir derxistin,
lê ev yek wanr'a li hev nehat.
12 Tê r'evê wan xî,
tîrkevanê Xwe bik'işînî nav ç'e'vê wan.

13 Xudano, qewata Xweva Tu bilind be,
emê bistirên, şikirîyê bidine zoraya Te.

### Hewargazîya tengasîyêda û stirana pesindayînê

**22** *Serwêrê sazbendar'a. «Stirana kara xezalêye serê sibehê». Zebûra Dawid.*

1 Xwedêyê min! Xwedêyê min!
Te çima ez hiştime?*
Xwe ji xilazkirin û dengê hêwarza min
dûr girtîye.
2 Xwedêyo! Ez r'oj gazî Te dikim
lê Tu caba min nadî,
şevê jî dengê min nayê bir'în.

3 Lê belê Tu Yê Pîroz î,
ser t'extê Xwe r'ûniştî yî,
pesindayîna Îsraêlê yî,
4 Kal-bavêd me Teda guman bûn,
Teda guman bûn, Te ew azad kirin.
5 Li Te kirin hewar, ew xilaz bûn
guman dan ser Te, şermî nebûn.

6 Lê ez kurm im ne ku merî,
nav merivada bêhurmetkirî
nav cime'tada sosretbûyî.
7 H'emûyêd ku min dibînin,
ew qerfê xwe li min dikin,
devê xwe li min xar dikin,
serê xwe dih'ejînin* û dibêjin:
8 «De bira xwe bispêre Xudan
û Ew wî xilaz ke,
de bira wî azad ke,
heger Ew ji wî r'azî ye»*

---

* 22:1 Metta 27:46; Marqos 15:34.
* 22:7 Metta 27:39; Marqos 15:29; Lûqa 23:35.
* 22:8 Metta 27:43.

9 Lê belê Tu yî, yê ez ji bet'inê derxistim,
ber bistanê dîya min, Te ez bêxof kirim.
10 Ez ji bet'inêda spartî Te bûyî,
ji zikmakîyêda Tu Xwedêyê min î.
11 Ji min dûr nek'eve,
çimkî tengasî nêzîk e
lê k'omekdarek t'une.

12 Gelek canega dora min digirin,
boxêd Başanêye* zor ser minda digirin.
13 Mîna şêrê devxûn mir'e-mir' dikin
û ew qîlêd xwe li ser min vedikin.

14 Ez mîna avê tême r'êtinê,
hestûyêd min ji hev têne ber'danê,
dil nav minda dih'ele mîna şimê.
15 Qewat li min ziha dibe,
mîna cêr'ê axîn hûr-hûrî dibe,
ziman demaxê minva diqemite,
Tu min dikî axa mirinê.

16 Se-kûç'ika ez kirime nava xwe,
k'oma neheqa dora min girt,
dest û p'îyêd min qul kirin*.
17 H'emû hestûyêd min têne jimarê,
min t'emaşe dikin dîna xwe didinê.
18 K'incêd min nava xweda bela dikin
û ser k'inca min p'eşk davêjin*.

---

* 22:12 Başan dik'ete r'ohilata ç'emê Ûrdunê û dewarêd wan ber ç'e've nav û deng bûn. Binihêr'e: Hezekîyêl 39:18; Amos 4:1.
* 22:16 Eva têk'sta ji welger'andina yûnanîye kevin tê. Fe'mîna îbranî ne zelal e, lê hinek zane aha fe'm dikin: «Mîna şêr dest û p'îyêd min (didir'înin)».
* 22:18 Metta 27:35; Marqos 15:24; Lûqa 23:34; Yûh'enna 19:24.

19 Lê Tu Xudano, ji min dûr nek’eve!
Qewata min! Zû bike Xwe minr’a bigihîne.
20 Nefsa min Tu ji şûr xilaz ke,
min tayî jî ji nav lepê se-kûç’ika.
21 Min xilaz ke ji qîlê şêr
û azad ke ji stirûyêd gayêd beyanî.

22 Ezê navê Te biratîya xwer’a salix kim,
nava civînêda pesinê Te bidim*.
23 Gelî xudanxofa! Pesinê Wî bidin!
Gelî zur’eta Aqûb! R’ûmetê bidin!
H’emû zar’êd Îsraêl! Ji Wî xof bikin!
24 Çimkî Ewî pişt neda yê t’engezar,
belengazîya wî bêhurmet nekir,
r’ûyê Xwe Ewî ji wî veneşart,
gava wî hewar kir, Xwedê bihîst.

25 Civîna mezinda ezê bidim pesinê Te,
li ber wan xofk’êşêd Te,
bînime sêrî ad-qirarêd xwe, bona wî xatirê Te.
26 Belengazê bixwin û t’êr bin*,
pesinê Xudan bidin yêd Wî diger’in.
Dilê we bira bijî h’eta-h’etayê!

27 Her qulbê dinyayê wê bîr bînin
û berbi Xudan wê veger’in.
H’emû berekêd mileta,
wê serê xwe ber Te daynin.

---

* 22:22 Îbranî 2:12.

* 22:26 Firaza «bînime sêrî ad-qirarêd xwe» û firaza «belengazê bixwin û t’êr bin» hevr’a girêdayî ne. Anegorî r’aw-r’izimê cime’ta Îsraêlê, gava yek tiştek ji Xudan dixwest û li ber Wî ad-qirar dikir û Xudan caba wî dida, hingê ewî merivî qurban didane Xudan û ji wî goştî p’arek digihîşte belengaza. Lema li vê r’êzêda dibêje wekî belengazê bixwin û t’êr bin.

28 Çimkî p'adşatî ya Xudan e,
Ew serwêrtîyê mileta dike.

29 H'emû k'up-k'upêd evê dinê,
ewê bixwin û ber ta bin
û her kesê p'ara xwelîyê,
ku firarî ye li ser e'rdê,
wê bik'eve ber li ser çokê.
30 Nisilê xulamtîyê Wîr'a bikin,
navê Xwedê qur'na peyr'a wê qise kin.
31 Wê bên û xilazkirina Wî
wan merivar'a bikin dengî,
k'îjanêd ku wê bêne dinê,
wê bêjin: «Xudan ev yek kirine».

**Xudan Şivanê min e**

**23** *Zebûra Dawid.*
1 Xudan şivanê min e,
ez ne h'ewcê tiştekî me.
2 Ew mêrg û çîmanada min dide mexel,
min dibe ser avêd nerme e'dil,
3 nefsa min Ew nûyejîyîn dike.
Şiver'îyêd r'astîyêda Ew min dibe,
bona xatirê wî navê Xwe.

4 Heger ez gelîyê sîya mirinêda bim,
ji xirabîyê ezê t'u car netirsim,
çimkî Tu yî wir t'evî min,
şiv û berşivka Te dil didin ber min.

5 Tu ber ç'e'vê dijminêd min,
sifirê datînî li ber min.
Tu r'ûn dikî ser serê min,
lêvar'a dadigirî k'asa min.
6 T'emamîya r'ojêd e'mirê minda,
t'enê qencî û dilovanîyê bibin minr'a.

H'emû r'ojêd e'mirê xweda
ezê bimînim Xana Xudanda.

**R'ûmeta P'adşayê E'firandar**

**24** *Zebûra Dawid.*
1 E'rd xêr û xiznêva yê Xudan e,
usa jî dinya binelîyêd wêva*.
2 Çimkî Ewî h'îm avîte li ser be'ra,
ew da sekinandin li ser ç'ema.

3 K'î dikare r'abe ç'îyayê Xudan,
k'î dikare bisene Cîyê Wîyî Pîroz?*
4 Yê destê h'elal û sitqê dilê r'ast,
ku nak'eve pey derewîyê*
û derew jî sond naxwe.
5 Ewê ji Xudan bistîne xêr-berek'etê,
ji xilazkir Xwedêyê xwe r'ûspîtîyê.
6 Yêd aha ne, ku li Wî diger'in,
h'izreta dîtina Xwedêyê Aqûb in! (Sela)

7 Gelî dergeha, serê xwe bilind kin!
Bilind kin, gelî dergehêd her-heyê,
wekî P'adşayê r'ûmetê bik'eve navê!
8 K'î ye ew p'adşayê r'ûmetê?
Xudanê zor û qewatê,
Xudanê şêr'dayî qudretê.

9 Gelî dergeha, serê xwe bilind kin!
Bilind kin, gelî dergehêd her-heyê,
wekî P'adşayê r'ûmetê bik'eve navê!
10 K'î ye ew p'adşayê r'ûmetê?
Xudanê Ordîya, Ew e p'adşayê r'ûmetê! (Sela)

---

* 24:1 Korint'î I 10:26.
* 24:3 Awa gotî «Ç'îyayê Sîyon» û «P'aristgeh», ku Orşelîmêda bû.
* 24:4 Aha jî tê fe'mkirinê: «Ku pey p'ûtsenemîyê naçe».

### Duayê hewargazîyê

**25** *Zebûra Dawid.*
1 Xudano, ez canîya xwe berbir'î Te dikim.
2 Xwedêyê min! Ez Teda guman im,
bira ez şermî nebim,
dijmin dilê xwe li min şa nekin.
3 Bira yêd Teda guman şermî nebin,
bira ew şermî bin û r'ûr'eş bin,
ewêd bêamine nemamîyê dikin.

4 Xudan, r'îyêd Xwe nîşanî min ke
û min hînî şiver'îyêd Xwe ke.
5 Berê min bide r'astîya Xwe, hîn ke,
çimkî Tu yî ew Xwedêyê xilazkirê min
û her r'oj ez gumana xwe didime ser Te.

6 Bîr bîn, Xudan, r'e'm û h'uba Xwe,
çimkî ewe h'eta-h'etayî ne.
7 Guneyêd zar'otî û neheqîyêd min bîr neyne,
lê li gora h'uba Xwe min bîr bîne,
bona xatirê qencîya Xwe, Xudano!

8 Qenc û r'ast e Xudan,
lema gunek'ara hînî r'ê dike.
9 Ew berbi heqîyê milûka dibe
û r'îya Xwe milûka hîn dike.
10 H'emû r'îyêd Xudan dilovan û amin in,
bona yêd peyman û t'emîyêd Wî xwey dikin.

11 Xudano, bidî xatirê navê Xwe,
sûcê neheqîya min ku mezin e,
dîsa bidî xatirê baxşa Xwe.
12 Ew merivê ku ji Xudan xof dike,
Ewê hîn ke ku k'îjan r'îyê bibijêre.

13 Nefsa wîyê xêr-xweşîyêda bimîne
û zur'eta wîyê li e'rdê war be.
14 Sir'a Xudan bona xofk'êşêd Wî ye
Ew peymana Xwe wanva e'yan dike.

15 Ç'e'vê min t'imê li Xudan e,
çimkî Ewê nigê min ji t'elê derxe.

16 Berê Xwe bide min û min were r'e'mê,
çimkî ezî bêkesî dero-der im.
17 Kulê dilê min zêde dibin,
ji van derd-kula derxe Tu min.
18 Dîna Xwe bide min me'rimî û r'ebenî,
bibaxşîne h'emû guneyêd mine kirî.

19 Dîna Xwe bide p'ir'anîya neyarêd min,
çawa k'în û boxîyêva dijenine min.
20 Nefsa min xwey ke û min xilaz ke,
şermî nebim, ku xwe daye bin sîya Te.
21 H'elalî û r'astî bira min xwey kin,
çimkî ez bi guman hîvîya Te me.

22 Xwedêyo, azad ke Îsraêlê,
ji ber her te'lî-tengîyê*.

**Duayê yê amî-t'am**

**26** *Zebûra Dawid.*
1 Ya Xudan, li ser heqîya minda binihêr'e,
çimkî ez h'elalîya xweda mame.
Min gumana xwe danîye ser Xudan, ez naşih'itim.
2 Min e'nene ke Xudan û min bicêr'ibîne,
nêt û dilê min Tu parzûn ke.

---

* 25:1-22 Eva zebûreke «akrostîk» e, awa gotî anegorî elîfbeya h'erfêd îbranî çêkirî ye.

3 Çimkî h’uba Te li ber ç’e’vê min e
û aminîya Te r’êberîya min dike.

4 Ez t’evî derewîna r’ûnanîm
û t’evî dur’ûya r’ê naçim.
5 Ez dijenime civata xiraba
û t’evî nep’aka r’ûnanîm.

6 Ez bi bêsûcîyê destêd xwe dişom,
dora gorîgeha Te, Xudan, dizivir’im,
7 dengê şikirdarîyê didime bihîstinê,
h’emû h’ujmek’arîyêd Te salix dikim.

8 Xudano! Ez h’iz dikim Xana Te,
ew cîyê mayîna r’ûmeta Te.
9 Nefsa min t’evî gunek’ara unda neke,
e’mirê min jî t’evî xûnxura,
10 destê k’îjanada neheqî heye,
destê wanî r’astê r’uşetêva t’ijî ye.

11 Lê belê ezê h’elalîya xweda bimînim.
Min azad ke û min were r’e’mê!
12 Nigê min r’îya r’astda ye,
civatada ezê pesinê Xudan bidim.

### Stirana pesindarîyê bona gumana ser Xwedê

**27** *Zebûra Dawid.*
1 Xudan e r’onaîya min û xilazbûna min!
Ezê ji k’ê bitirsim?
Xudan e qesira jîyana min!
Ezê ji k’ê bir’icifim?

2 Gava xirab h’icûmî ser min dikin,
ku canîya min h’ûfî xwe kin,
hingê peyk’etî û neyarêd min,
xwexa dilik’umin û dik’evin.

3 Heger ordîk r’abe ber min,
wê netirse qet dilê min.
Heger şêr’r’a bêne ser min,
wê dîsa unda nebe gumana min.

4 Tiştekî ji Xudan ez dixwazim
û ez h’eyra vê yekêda me,
t’emamîya r’ojêd e’mirê xweda,
Xana Xudanda ez bimînim,
ji dîndara Wî ez t’êr nebim
û h’eyra P’aristgeha Wîda bim.

5 Wê r’ojêd oxirmê giranda,
Ewê min veşêre çardaxa Xweda,
k’ûrayîya konda min binixême
û min bilind ke, bide ser qeyê.
6 Lê niha serê minê bilind be,
ber wan neyarêd dora min girtine,
Konê Wîda ezê bi dengê eşqê qurbana bidim,
ezê bistirêm û miqama Xudanr’a lê xim.

7 Xudano, bibihê dengê evê gazîya min,
r’e’mê bike û bide Tu vê caba min.
8 Dilê min boy Te dibêje:
«De tu r’ûyê Wî biger’e».
Va ye Xudan, ez jî r’ûyê Te diger’im.
9 R’ûyê Xwe Tu ji min veneşêre.

Bi hêrsê berî xulamê Xwe nede.
Piştovanê min Tu bûyî,
pişt nede min, min nehêle,
Xudan, Xilazkirê min!
10 Heger dîya min û bavê min,
ew dest ji min bik’işînin,
lê Xudan wê qebûl ke min.

11 R'îya Xwe Xudan, min hîn ke,
dijminêd minr'a e'ynat ke,
şiver'îya r'astda min xwey ke.
12 Destê neyarva ber'nede min,
ku şe'dêd derew r'adibin ber min
û gef û gur'îyê hûyî min dikin.

13 Lê ez bawer im, e'rdê zêndîyada
qencîya Xudan ezê bibînim.
14 Xudanda guman be!
Serxwe û dilteyax be!
Xudanda guman be!

**Duayê hewargazîyê û r'azîdarîyê**

**28** *Zebûra Dawid.*
1 Ez hewara xwe Te datînim, Xudano!
Qeyayê min, hêna minda bêdeng nemîne!
Hindava minda Xwe ker' neke,
ku nebime mîna yê dik'evine gor'ê.
2 Bibihê dengê zarînîya min,
gava ez hewara xwe Te datînim,
dest berbir'î P'aristgeha Te dikim.

3 Min nede r'êza nep'aka,
neke t'evî wan neheqa,
ku zarxweş in hevalar'a,
lê xirab in dilê xweda.
4 Weke kirêd wan bide wan,
anegorî wan xirabîyêd wan,
weke kirinêd bi destê wan,
ser bela xwe bira ew vebin.
5 Çimkî ewan kirinêd Xudan,
ser kirê destê Wî nafikirin.
Ewê wan wêran ke, ava neke.

6 Şikir ji Xudanr’a,
ku Ewî bihîst zarînîya min.
7 Xudan qewat û mert’ala min e,
dilê min Wîda guman bûye,
hingê min stand jê k’omeke,
dilê min k’etê şabûne,
pesinê Wî bidim bi stirane.

8 Xudan e qewata cime’ta Xwe,
sit’ara azadîya bijartîyê Xwe.
9 De cime’ta Xwe xilaz ke
û warê Xwe bimbarek ke,
Tu şivantîyê li wan bike
û t’imê wan hilgire.

**Pesindayîna dengê Xwedê**

**29** *Zebûra Dawid.*
1 Bidine Xudan, heyînêd Xwedêye e’zmên,
bidine Xudan qedir û qudretê,
2 bidin şikirîyê navê Xudan,
xemila pîrozva bih’ebînin Xudan*.

3 Dengê Xudan li ser ava ye,
Xwedêyê xweyîr’ûmet birq vedaye,
Xudan li ser gelek ava ye.
4 Dengê Xudan qewat e,
dengê Xudan xweyîşuret e.

5 Dengê Xudan darêd erzê dişkêne,
Xudan erzêd Lubnanê hûr-hûrî dike
6 û wan mîna golika dide banzdanê,
Lubnan û Sîryonê* jî mîna gayê beyanî.

---

* 29:2 Aha jî tê fe’mkirinê: «Cîyê Pîrozî xemilandî».
* 29:6 «Sîryon» bi zimanê fînîkî navê ç’îyayî Hermonê ye, ku ji be’rê nêzîkî 2800 mêtir bilindtir e.

7 Dengê Xudan tîrêd agirî alav dide.
8 Dengê Xudan çol û besta dilerizîne,
Xudan çol û besta Qadêşê dilerizîne.
9 Dengê Xudan karêd xezala dide zayînê,
daristana dide r'ûtkirinê
û P'aristgeha Wîda h'emû dikin dengî:
«R'ûmet wîr'a!»

10 Xudan k'ursîya Xwe ser avêd e'zman danîye,
Xudanê ser k'ursîya Xwe h'eta-h'etayê p'adşa be.
11 De bira Xudan qewatê bide cime'ta Xwe,
bira Xudan dua û xêr-xweşîyê bide cime'ta Xwe.

## Stirana Pesindayînê

**30** *Zebûra Dawid. Stirana bimbarek-pîrozkirina P'aristgehê.*
1 Ezê te bilind kim, Xudano,
çimkî Te ez xilaz kirim,
dijmin li min nedan k'enandin.
2 Ya Xudan, Xwedêyê min!
Min hewara xwe Te anî
û Te ez qenc kirim.
3 Xudan! Ji dîyarê mirîya Te ez derxistim,
ku nek'evime gor'ê, Te ez sax hiştim.

4 Eşqî Xudan hûn bistirên aminêd Wî,
şikirîyê bidinê û bîr bînin pîrozîya Wî.
5 Hêrsa Wî, çawa ç'e'v bigirî-vekî,
lê şîrinaya Wî t'emamîya e'mir e,
êvarê şîn e û girî ye,
lê sibehê zû eşq û şayî ye.

6 Ez fireyîya xweda fir'naq bûm,
fikirîm: «Ezê t'u car nek'evim».
7 Ya Xudan, Te bi xweşîya Xwe,
mîna ç'îyakî ez qewîn kirim.

Lê gava Te r'ûyê Xwe veşart,
hingê r'icafê ser minda girt.

8 Xudan gazîya xwe Te datînim
û hewara xwe Xweyî tînim.
9 Xûna minê çi k'arê bide,
heger ez bik'evim ax-berê sar?
Gelo xalîyê pesinê Te bide?
Yan r'astîya Te wê salix ke?
10 Bibihê Xudan, min were r'e'mê,
Xudan, bide min k'omekê.

11 Te şîna min kire şayî,
k'urxê min jî jorda anî,
şabûnêva min dixemilînî.
12 Canîya minê ker' nemîne,
ewê bistirê eşqî Te.
Xudan, Xwedêyê min,
ezê t'imê bidim pesinê Te.

### Gumana ser Xwedê û duayê bona azadbûnê

**31** *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid.*
1 Xudano, min xwe daye bin sîya Te,
bira ez t'u car şermî nebim,
anegorî heqîya Xwe min xilaz ke.
2 Guhê Xwe bide Tu ser min,
bike ku min zû xilaz kî.
Bona min bibe kela kevirî,
mala sit'arbûnê ku min azad kî.

3 Çimkî Tu yî qeya û kela min,
Tu bona xatirê wî navê Xwe,
bibe r'êber û serwêrê min.
4 Ji wê t'elê Tu derxe min,
ku dizîva danîbûn bona min,
çimkî Tu yî ew sit'ara min.

5 R'uh'ê xwe didime destê Te*,
belê Te ez xilaz kirim,
Xudan, Xwedêyê aminîyê.

6 Ez dijenime yêd pey p'ûtêd p'ûç' k'etî,
lê gumana min ser Xudan e.
7 Pê h'uba Te ezê eşq û şa bim,
çimkî ser me'rimîya minda Te nihêr'î
û te'lî-tengîya min pê h'esîyayî.
8 Te ez nedam destê dijmin,
lê danîne fireyê nigêd min.

9 Min were r'e'mê, Xudano,
çimkî ez nava tengasîyêda me,
ç'e'vê min, nefs û canîya min
ji dilêşîyê h'elîyan-maşîyan.
10 E'mirê min derbaz bû zelûlîyê,
salêd min jî ne'le-ne'lê,
ji derd-kula qudûm k'etim
û hestûyada h'elîyam-maşîyam.

11 Ber h'emû neyara bûm îtoyîn,
li ber cînarêd xwe ez îlahî,
sawa min dik'eve ser nasêd min,
yêd derva dibînin ji min dir'evin.
12 Mîna mirîya ji dila hatime bîrkirinê,
bûme çawa derdaneke hûrdexweşî.
13 Xeyba geleka ez dibihêm,
her alîyava saw min digire,
gava ew hevr'a himberî min dicivin,
dişêwirin ku bîna ber min bistînin.

14 Lê ez Teda guman im, Xudano,
min got: «Tu yî Xwedêyê min».

---

* 31:5 Lûqa 23:46.

15 R'ojêd min destê Teda ne,
min ji destê dijmin
û peyk'etîya xilaz ke.
16 Sifetê Xwe gul de ser e'vdê Xwe
bi h'uba Xweye amin min azad ke.
17 Xudano! Bira ez şermî nebim,
çimkî ez gazî Te dikim,
bira nep'ak şermî bin
dîyarê mirîyada ker' bimînin.
18 Devêd derewîn bira bên girtin,
ku hindava r'astada h'ir' dibêjin,
bi k'ubarîyê û mixenetîyê.

19 Çiqas mezin e qencîya Te,
li ber h'emû merivayê,
xofk'êşêd Xwer'a xwey kirîye Te,
k'îjan xwe didine bin sîya Te.
20 Dîndara Xweva wan xweyî dikî,
ji dest nemamîyêd merivayê,
Konê Xweda wan vedişêrî,
ji zordarîya zimanîyê.

21 Şikir ji Xudanr'a,
ku h'uba Xweye h'eyre-h'ujmek'ar,
nava neyarêd dora minda nîşanî min kir!
22 T'evhevbûna xweda min got:
«Ber ç'e'vê Te ez k'etime».
Lê Te dengê duayê min bihîst,
gava min Te kire gazî.

23 Xudan h'iz kin, h'emû aminêd Wî,
Xudan şîrh'elala xwey dike,
lê yêd xwe babaxîyê girtine,
xezebê ser wanda dibarîne.

24 Serxwe bin!
Bira dilê we bişidin,
h'emûyêd ku Xudanda guman in.

**Şabûna bona guneafûbûnê**

32 *Maskîla* Dawid.*
1 Xwezî li wî bendeyî,
ku neheqîyêd wî hatine afûkirinê
û guneyêd wî hatine baxşandinê!
2 Xwezî li wî merivî,
ku Xudan jêr'a neheqîyê h'esab nake
û dilê wîda qelpî t'une*.

3 Gava min guneyê xwe neda r'ûyê xwe,
hestûyêd min h'elîyan-maşîyan,
ji dest zarînîya mine t'emamîya r'ojê.
4 Çimkî şev û r'oj destê Te ser min giran bû,
ter'ayîya min bû mîna zihaya havînê. (Sela)

5 Hingê min guneyê xwe Teva e'yan kir
û neheqîya xwe veneşart,
min got: «Ezê şaşîya xwe
li ber Xudan bidime r'ûyê xwe».
Û Te neheqîya guneyê min baxşand. (Sela)

6 Bona vê yekê her kesê amin,
gava xwe nas ke, bi duakirinê wê berbi Te bê.
Hingê heger lêyîyêd ava jî li ser hevr'a derbaz bin,
ewê t'u car negihîjine wî.
7 Sit'argeha min Tu yî,

* 32:0 Me'na xebera «Maskîl» bi îbranî ne e'yan e. Gelek zane bawer dikin, ku ev têrmîneke hilbestê ye. K'oka vê xeberê diçe ser k'ûr fikirandinê û serwaxtîyê.
* 32:1-2 R'omayî 4:7-8.

ji tengasîyê Tu min xwey dikî,
bi stiranêd azadîyê Tu dora min digirî. (Sela)

8 «Ezê te aqil û serwaxt kim
û r'îya ku têda her'î ber te vekim,
ç'e'vê Minê li ser te be, te şîret kim.
9 Mîna hesp û qant'ir'a nebine bêfe'm,
wan gem û t'emb dikin ku zeftî we bin».

10 Cefayêd nep'aka wê gelek bin,
lê h'uba amin wê bigire dora wan,
k'îjana gumana xwe dane ser Xudan.
11 Bi Xudan eşq û şa bin,
gelî sitqê dilê r'ast,
dengê xwe hildin h'emûyêd dilada r'ast.

### Stirana pesindayînê

**33** 1 Bi Xudan eşq bin gelî amina,
li r'asta dik'eve pesindarî.
2 Bi çengê zîs şikirîyê bidine Xudan,
bi sazê dehet'êlî Wîr'a bistirên.
3 Stiraneke nû Wîr'a bistirên,
zor û xweş saz xin, dengê bilindî ziringîyê.

4 Çimkî xebera Xudan r'ast e
û h'emû kirinêd Wî bi heq-h'elalîyê ne.
5 Ew r'astîyê û heqîyê h'iz dike,
h'uba Xudanva dinya t'ijî ye.

6 Bi xebera Xudan e'zman e'firîn,
bi bîna ber Wî h'emû e'rşêd wan.
7 Be'ra mîna lodê t'op dike,
avêd bêbinîya dike e'mbara.

8 T'emamîya e'rdê bira ji Xudan bitirse
û bira ji Wî bir'icife t'emamîya t'opa dinê.

9 Çimkî Ewî got û qewimî,
Ewî e’mir kir û qedîm bû.

10 Xudan şêwirêd p’ûtp’arista xirab dike
û fikirêd mileta betal dike.
11 Şêwira Xudan qewîn û qedîm e,
fikira dilê Wî qur’ne-qur’ne ye.
12 Xwezî li wî miletî, Xwedêyê k’îjanî Xudan e
û li wê cime’tê, k’îjan bijart kire warê Xwe.

13 Xudan ji e’zmên jorda dinihêr’e,
t’emamîya merivayê dibîne.
14 Ew ji k’ursîya Xwe dîna Xwe dide
t’emamîya binelîyêd dinyayê.
15 Dilê wan h’emûya Ewî e’firandîye
û haş ji h’emû kirêd wan heye.

16 P’adşa pê eskerêd ze’f xilaz nabe,
ne jî yê mêrxas pê qewata zor.
17 Hesp derew e bona azadîyê,
pê qewata xweye zor nake xilazîyê.

18 Belê ç’e’vê Xudan li ser xofk’êşêd Wî ne
û li ser wane ku hîvîya h’uba Wî ne,
19 Ew nefsa wan ji mirinê xilaz dike
û wextê xelayê jî wan t’êr dike.

20 Nefsa me hîvîya Xudan e,
Ew alîk’ar û mert’ala me ye.
21 Dilê me pê Wî şa dibe,
çimkî gumana me navê Wîyî pîroz e.
22 Xudan, de bira Tu li ser me dilovan bî,
çawa ku em Teda guman in.

### Pesindayîn bona qencîya Xudan

**34** *Zebûra Dawid, gava xwe li ber Abîmelex danî dewsa bêh'işa û berî wî dan, ewî hişt çû.*

1 Her gav pesinê Xudan ezê bidim,
şikirdayîn wê ji zarê min kêm nebe.
2 Nefsa min pê Xudan difir'e,
bira yêd milûk bibihên û şa bin.
3 T'evî min Xudan mezin kin,
em t'evayî navê Xudan bilind kin.

4 Ez Xudan ger'îyam û Ewî caba min da,
ez ji h'emû xof-tirsa xilaz kirim.
5 Yêd ku Wî dinihêr'in dibiriqin,
û r'ûyêd wanê şerma sor nebin.
6 Evî feqîrî kire gazî, Xudan bihîst
û ew ji h'emû tengasîyêd wî xilaz kir.
7 Milyak'etê Xudan t'evî xofk'êşêd Wî ye,
pişta wan digire û wan xilaz dike.

8 Te'm kin û bizanibin ku Xudan ça qenc e!*
Xwezî wî merivî, yê ku xwe daye bin sîya Wî.
9 Ji Xudan bitirsin gelî pîrozêd Wî,
çimkî xofk'êşêd Wîyê h'ewcê tiştekî nîbin.
10 Cewrikêd şêra bir'çî û muh'tac dibin,
lê ewêd li Xudan diger'in,
kêmasîya t'u qencîyê nabînin.

11 Werin lawo, guh bidine min,
xofa Xudan ez we hîn kim.
12 K'î dixwaze ku xweş bijî,
gelek r'oja ew bibîne?
13 Bira zimanê xwe ji xirabîyê xwey ke
zarê xwe jî ji derewîyê.

---

* 34:8 Petrûs I 2:3.

14 Ji xirabîyê veger’e, qencîyê bike,
e’dilayê biger’e û li pey wê her’e.

15 Ç’e’vê Xudan li ser r’asta ye
û guhê Wî li ser hewar-gazîya wan e.
16 Berê Xudan miqabilî xiraba ye,
ku bîranîna wan ji dinê bide hildanê*.
17 Yêd r’ast gazî dikin, Xudan dibihê
û wan ji h’emû tengasîya xilaz dike.
18 Xudan nêzîkî dilşkestîya ye
û me’rim-belengaza didebirîne.

19 Tengasîyêd yê r’ast gelek in,
lê Xudan ji h’emûya xilaz dike.
20 Xudan her hestûyêd wî xwey dike,
ku ji wan yek jî neşkê*.
21 Xirabîyê xiraba bikuje
û dîwana peyk’etîyêd r’asta wê bibe.
22 Xudan nefsa xulamêd Xwe xilaz dike
û dîwana ewêd ku xwe dane bin sîya Wî nabe*.

### Duayê hewargazîyêyî ji neyara

**35** *Zebûra Dawid.*
1 Ya Xudan, miqabilî miqabilêd min be,
şer’kirêd minr’a şer’ bike.
2 Hilde zirih’ û mert’alê,
r’abe were hewarê!
3 R’im û şûr bavêj, pêşîya peyk’etîyêd min bigire,
bêje nefsa min: «Ez xilazkirê te me».

---

* 34:12-16 Petrûs I 3:10-12.
* 34:20 Yûh’enna 19:36.
* 34:1-22 Eva zebûreke «akrostîk» e, awa gotî anegorî elîfbeya h’erfêd îbranî çêkirî ye.

4 Bira peyk'etîyêd min şermî bin, bibin r'obet,
bira veger'in bibin sosret,
ewêd ku dixwazin xirabîyê min bikin.
5 Bira bibine mîna paç'a li ber bê,
milyak'etê Xudan berî wan de.
6 Bira r'îya wana te'rî û şimşat be,
milyak'etê Xudan peyk'etîyê wan be.

7 Bê sebeb t'or' bona min avîtine li ser ç'e'lê
ku bê sebeb k'olan bona nefsa min.
8 Bira nişkêva xezeb li ser wanda bê,
t'or'a wane veşartî wan bigire,
bira ew qede-bela bê serê wan.

9 Hingê ezê pê Xudan eşq bim,
bi azadkirina Wî ezê şa bim.
10 H'emû hestûyêd minê bêjin:
«Xudan! K'î mîna Te xilaz dike,
yê sist ji destê zordarê wî,
feqîr û belengaz ji t'alankirê wî».

11 Şe'dêd derew r'adibin,
tiştêd ez haş pê t'une me dikine stûyê min.
12 Ji ber qencîyêva xirabî min kirin,
ez nefsêda sêwî hiştim.
13 Lê min nexweşîya wanda k'urx xwe dikir,
nefsa xwe jî bi r'ojîya dida cefê.
De bira ew duayê min li min veger'e*.
14 Ez t'evî wan usa bûm,
çawa t'evî pismam û birê xwe,
mîna yekî bona dîya xwe şînê bike,
ez bi k'ederê nimiz dibûm.

* 35:13 Aha jî tê fe'mkirinê: «Lê duayê min p'aşila minda veger'îya».

15 Lê gava ez k'etim,
ewana civîyan li min k'enîyan,
qaçax civîyan miqabilî min,
lê min nizanibû çima ez dizêrandim,
nedisekinîn.
16 Bêar li min k'enîyan, dane hêlana
diranêd xwe li min ç'ir'ikandin.

17 Xweyê min! H'eta k'engê Tê dîna xwe bidêyî?
Nefsa min xilaz ke ji derbêd wan,
e'mirê min jî ji cewrikêd şêra.
18 Hingê civata mezinda, ezê pesinê Te bidim,
nava mixulqeta mezinda Te bimbarek kim.

19 Bira dilê xwe min şa nekin,
yêd bê sebeb bûne dijmin,
bira bi ç'e'va hevr'a nekin,
yêd cîyê amî-t'am dijenine min*.
20 Ew ser e'dilayê xeber nadin,
lê miqabilî merivêd dinêye milahîm,
şêwirêd h'ilek'ar difikirin.
21 Devê xwe ser min mezin vedikin
û dibêjin: «Va ye! Va ye!
Ç'e'vê me dîtin».

22 Ya Xudan, Te dît! Xwe ker' neke!
Xweyê min! Tu ji min dûr nek'eve.
23 Hêna minda Tu h'işyar be,
li ser minda binihêr'e,
Xweyê min û Xwedêyê min.
24 Anegorî r'astîya Xwe,
heqîyê li min bike,
Xudan Xwedêyê min,
ku ew li ser min nek'enin.

* 35:19 Yûh'enna 15:25.

25 Bira dilê xweda nebêjin:
«Meremê dilê me bû!»
û bira nebêjin «Me ew daqurtand!»

26 Bira şermî bin û h’emû bibine r’obet,
yêd ku dilê xwe min şa dikin.
Bira şermîyê û sosretîyê li xwe wergirin,
yêd ku ser minr’a xwe bilind digirin.

27 Bira eşq û şa bin,
yêd ku r’ûspîtîya min dixwazin
û t’imê bira bêjin: «Xwedê mezin e,
ku xêr-xweşîya e’vdê Xwe dixwaze!»
28 Zimanê minê heqîya Te salix ke
û t’emamîya r’ojê pesinê Te bide.

### Xirabîya mêriv û heqîya Xwedê

**36** *Serwêrê sazbendar’a. Zebûra Dawidê xulamê Xwedê.*
1 Neheqî çi ku e’mirî nep’aka dike,
ev yek e’yan e dilê minva:
Xofa Xwedê t’une li ber ç’e’vê wan*,
2 çimkî h’ilek’arîyê li ber ç’e’vê xwe dikin,
ku neheqîya wan e’yan nebe û ji ber ç’e’va nek’evin.
3 Xeberêd devê wan neheq û derew in,
fe’mê wan t’une ku qencîyê bikin.
4 Nivînêd xweda şêwira neheqîyê dikin
û ser r’îyêd neqenc ew disekinin,
ji xirabîyê jî ew zivêr nabin.

5 Ya Xudan! H’uba Te h’eta e’zmên e
û aminîya Te h’eta e’wra ye!
6 Heqîya Te mîna çîyayê herî bilind e,
qirara Te mîna ava here k’ûr e!
Mêriv û h’eywên Tu xwey dikî, Xudano!

---

* 36:1 R’omayî 3:18.

7 H'uba Te çiqas bêhimber e, Xwedêyo!
Bendê dinê bin sîya p'er'ê Teda hêwirîne.
8 Ewana ji xêr-berek'eta mala Te t'êr dibin
û ji ç'emê Xweyî begemkirî didî vexwarinê.
9 Çimkî kanîya jîyanê li cem Te ye,
bi r'onaya Te em r'onayê dibînin.

10 H'uba Xwe ji nasêd Xwe nebir'e
û heqîya Xwe ji yêd sitqê dilê r'ast.
11 Bira p'e'yna k'ubara negihîje min
destê nep'ak jî min cî neh'ejîne.
12 Hema ev e k'etina yêd neheqî dikirin,
ew e'rdê xistin îdî nikaribûn r'abûna.

## Qedera heq û neheqa

**37** *Zebûra Dawid.*
1 Bîna xwe xiraba teng neke,
h'evsûdîyê bêola* neke.
2 Çimkî ewê zûtirê mîna gîhê biç'ilmisin
û mîna gîhayê şîn wê h'işk bin.

3 Gumana xwe bide ser Xudan û qencîyê bike,
welêtda bijî û aminîya xwe xwey ke.
4 Bira Xudan şabûna te be,
Ewê xwestinêd dilê te bide te.

5 R'îya xwe bide destê Xudan,
gumana xwe bide ser Wî û Ewê bîne sêrî.
6 Wê mîna r'oyê r'ûspîtîya te derxe
û pirsa heqîya te jî mîna nîvro.

7 Li ber Xudan berbihêr be û hîvîya Wî be,
bîna xwe wî merivî teng neke ku jêr'a li hev tê
û wî merivê ku digihîje meremê xirab.

---

* 37:1 Awa gotî «bêqanûn, nep'ak».

8 Hêrs nek'eve, neqilqile,
bînteng nebe ku xirabîyê bikî.
9 Çimkî k'ok li xiraba wê bê,
lê yêd li Xudan sebir dikin,
ewê li e'rdê war bin.

10 Belê hinekî şûnda nep'akê betavebe,
tê li cîyê wî biger'î û wî nebînî.
11 Lê belê milûkê e'rdê war bin,
xêr-xweşîyêva wê xinê bin û şa bin*.

12 Nep'ak bona yê r'ast xirab dişêwire
û dirana ser wî diç'ir'ikîne.
13 Xweyî ser wî dik'ene
çimkî axirîya wî dibîne.

14 Gunek'ar şûr dik'işînin,
kevanêd xwe saz dikin,
ku yê feqîr û belengaz jorda bînin,
yêd r'îya r'astda diçin, wan bikujin.
15 Şûrêd wanê bik'evine dilê wan,
kevanêd wanê hûrdexweşî bin.

16 Hebûka r'astaye hindik,
ji hebûka nep'akaye p'ir' çêtir e.
17 Çimkî qolanêd nep'aka wê bişkên,
lê stûna r'asta Xudan e.

18 Xudan xemê h'alê bêlek'a dik'işîne
wartîya wanê h'eta-h'etayê bimîne.
19 Oxirmêd giranda wê şermî nebin
û r'ojêd xelayêda wê t'êr bin.

* 37:11 Metta 5:5.

20 Lê nep'akê unda bin
û dijminêd Xudan
mîna gul-sosinêd çolê,
nava dûda wê betavebin.

21 Nep'ak deyn hildide û nade,
lê yê r'ast destvekirî ye û dide.
22 Xwedê dua k'îjana bike, ewê e'rdê war bin
û nifir'a k'îjana bike, ewê unda bin.

23 Xudan gavêd wî merivî dişidîne
r'îya k'îjanî ew begem dike.
24 Heger ew bilik'ume, wê nek'eve,
çimkî Xudanê destê wî bigire.

25 Ez zar' bûme û niha jî mezin bûme,
min nedîtîye yê r'ast wêda avîtî,
yan jî zar'êd wî ku nên p'ars kin.
26 Ew her t'im mer'd e û deyn dide,
dua jî ser zur'eta wî ye.

27 Ji xirabîyê xwe dûr bigire,
qencîyê bike, tê bimînî h'eta-h'etê.
28 Çimkî Xudan heqîyê h'iz dike
û pişt nade aminêd Xwe.

Ewê h'eta-h'etayê bêne xweykirinê,
lê zur'eta nep'aka wê unda be.
29 R'astê li e'rdê war bin
û her-heyê wê ser bijîn.

30 Ji devê r'asta gul-nûr dibarin
û zimanê wî heqîyê dibêje.
31 Hînkirina Xwedê wî dilê wîda ye,
gavêd xweda ew nalik'ume.

32 Nep’ak pey yê r’ast k’etîye,
dike ku çawa wî bikuje.
33 Lê Xudan wî nade destê nep’ak
û gava wî bîne ber dîwanê,
nahêle ku wî gunek’ar ke.

34 Xudan sebir ke û xwe r’îya wî bigire,
Ewê te bilind ke ku e’rdê war bî.
Tê bibînî undabûna nep’aka.

35 Min dît nep’akek stirû derxistî,
mîna dara şîne ç’iqilava p’er’vedayî*.
36 Lê ew derbaz bû, k’a ew nema,
ez lê ger’îyam û min ew nedît.

37 Yê bêlek’e binihêr’e
û dîna xwe bide ewêd r’ast,
çimkî axirîya merivê ha wê xêr be.
38 Lê k’oka neheqa wê hevr’a bê,
axirîya nep’aka undabûn be.

39 Xilazbûna r’asta ji Xudan e,
oxirmê giranda Ew piştovanê wan e.
40 Xudanê alîk’arîyê wan bike, wan xilaz ke,
ji nep’aka wan azad ke û xilaz ke,
çimkî wan xwe daye bin sîya Wî*.

## Duayê merivê oxirmê giranda

# 38

*Zebûra Dawide bona dîyarîya bîranînê.*
1 Xudano! Bi hêrsa Xwe min hilneyê
û bi k’ela Xwe min şîret neke.

---

* 37:35 Bi îbranî r’êza duda ne t’am zelal e, lê welger’andina yûnanîye kevinda aha ye: «Mîna darê erzêyî Lubnanêda bilind dibe».
* 37:1-40 Eva zebûreke «akrostîk» e, awa gotî anegorî elîfbeya h’erfêd îbranî çêkirî ye.

2 Çimkî tîrêd Te li min k’etine
û destê Te li ser min giran bûye.

3 Ji alava hêrsa Te, cîkî minî sax nemaye,
dest guneyê min, hestûkî minî r’ih’et nemaye.
4 Çimkî neheqîyêd min ji serê min bilindtir bûne,
mîna barê giran ew li ser min giran bûne.

5 R’ûyê bêfe’mîya minda,
birînêd min bîn k’etinê dir’izin.
6 Dever’ûya çûyî, qudûmk’etî,
her r’oj bi dilê kul diger’im,
7 çimkî navdilê min kul-birînava t’ijî ne
û nav minda cîkî sax nemaye.
8 Ez h’alk’etî û gelekî h’incir’î,
dikim zarîn ji axînîya dilê xwe.

9 Xweyo, xwestina min Teva e’yan e,
k’esera dilê min ji Te veşartî nîne.
10 Dilê min lê dixe, qudûm k’etime,
r’onaya ç’e’vê min jî li min birîya ye.
11 H’izkirîyêd min û hevalêd min,
xwe dûr digirin ji birînêd min,
pismamêd min jî dûr sekinîn.
12 Ewêd e’mirê min diger’in, t’ela datînin
û yêd xirabîya min dixwazin,
bona k’etina min xirab xeber didin
û her r’oj mixenetîyê difikirin.

13 Lê ez mîna ker’a nabihêm
û mîna yê lal ku devê xwe venake.
14 Ez bûme merivê çawa ku nabihê
û devê wîda cabek t’une.

15 Ez xwe dispêrime Te, Xudano,
Tê cabê bidî, ya Xweyî, Xwedêyê min.

16 Çimkî min got: «Bira ew dilê xwe min şa nekin
û fir’naq nebin gava bişimite nigê min».

17 Va ye ez k’etina xwe dibînim,
her gav kula min ber bîna min e.
18 Ez neheqîyêd xwe aşkere dibêjim,
bona guneyêd xwe xweda dişewitim.
19 Lê neyarêd min sih’et û qewat in,
cîyê heqî-neheq xêrnexwazêd min zêde dibin.
20 Yêd ber qencîyêva xirabîyê min dikin,
bona wê yekê miqabilî min r’adibin,
çimkî ez xwe qencîyê digirim.

21 Min nehêle Xudano!
Xwedêyê min ji min Tu dûr nek’eve.
22 Zû bike were hewara min,
ya Xudan, Xilazkirê min!

### Boş-betalîya e’mir

39 *Yidût’ûnê serwêrê sazbendar’a. Zebûra Dawid.*
1 Min got: «Ezê miqatî r’îya xwe bim,
ku bi zimanê xwe guna nekim,
gemekê bavêjime ez devê xwe,
h’eta ku nep’ak li ber min e».
2 Min xwe ker’ kir û deng nekir,
bona qencîyê jî qet tişt negot,
hingê êş li min t’evîhev bû.
3 Dil nav minda qilqilî,
alavê da qafê min,
hingê derevebûm û min got:

4 «Bêje Xudan Tu axirîya min,
çiqas in ew r’ojêd min
û r’êwîtîya min çend r’oj in».
5 Va pê bihusta Te r’oj dane min
û e’mirê min li ber Te ne t’u tişt e.

R’ast her merivê dinê k’etîye,
ew t’am weke hulmekê ye. (Sela)
6 R’ast mîna sîyê meriv tê-diçe.
R’ast badîhewa h’ece-h’ec dike,
ew t’op dike lê nizane ewê bibe r’isqê k’ê.

7 Îdî niha ez hîvîya çi bim, Xweyo?
Gumana min li ser Te ye.
8 Min ji h’emû neheqîyêd min xilaz ke,
min neke nava dev-diranê bêfe’ma.
9 Ez xwe ker’ dikim, devê xwe venakim,
çimkî Te kir, eva yeka.
10 Derba Xwe Tu ji min dûr xe,
ez ji ber k’ulma Te betavedibim.

11 Bona şîretê, neheqîya mêriv li ber bêvila derdixî,
mîna bizûzê Tu hebûka wî dihizhizînî
û jîyîn t’am weke hulmekê ye. (Sela)

12 Ya Xudan, Tu bibihê duayê min
û guh bide hêwarza min,
Tu pişt nede hêsirêd min,
ez li ber Te çawa r’êwî,
mîna pêşîyêd xwe mêvanî.
13 Mir’ûzê Xwe ji min dager’îne,
ku ez dîsa beşerxweş bim
h’eta ku neçûme, p’ûç’ nebûme.

### Stirana pesindayînê û k’omekxwestinê

**40** *Serwêrê sazbendar’a. Zebûra Dawid.*
1 Ez bi sebirê hîvîya Xudan mam,
Wî ser minda nihêr’î
û zarînîya min bihîst,
2 ji wêrana ç’e’lê ez derxistim,
ji wê ç’im-ç’ima şile-h’er’î,
nigêd min danîne li ser qeyê

û gavêd min qedîm kirin.
3 Stiraneke nû kire devê min,
zebûreke eşqî Xwedêyê me.
Gelekê bibînin û wê xof kin
û xwe bidine bin sîya Xudan.

4 Xwezî li wî merivî,
ku xwe spartîye Xudan,
dîna xwe nade yê k’ubar
û yêd xwe dane p’ûtêd derew.
5 Gelek in kirinêd Te, ya Xudan, Xwedêyê min,
ew k’eremet û fikirêd Teye li ser me,
t’u heyîn t’une mîna Te.
Minê ew salix kirana û bikira dengî,
lê bêh’esab in, nayêne gotin.

6 Qurban û dîyarî Te begem nekir,
Te guhê min vekir,
t’evayîşewat û dîyarîya paqijbûnê Te nexwestin.
7 Hingê min got: «Va me ez hatim,
k’itêba gulomatkda bona min nivîsar e.
8 Ez dixwazim xwestina Te biqedînim, ya Xwedê
û va ye hînkirina Te dilê minda ye»*.

9 Min nava civîna giranda mizgînî da
heqîya azadkirina Te e’lam kir.
Va ye min lêvêd xwe nedan ser hev,
ya Xudan, Tu zanî!
10 Min heqîya Te dilê xweda veneşart,
aminîya Te û xilazkirina Te min salix kir,
dilovanî û r’astîya Te min ji civîna giran veneşart.

11 R’e’ma Xwe, ya Xudan, ji min dûr nexe,
bira dilovanî û aminîya Te her gav min xwey kin.

---

* 40:6-8 Îbranî 10:5-7.

12 Xirabîya bêh’esab dora min girt,
neheqîyêd min xwe minr’a gîhandin,
ew ji p’or’ê serê min ze’ftir in,
r’îya xwe jî nikarim bibînim,
dil jî minva îdî nemaye.
13 Bike r’isqat*, Xudano, min xilaz ke,
ya Xudan, zû bike hewara min were.
14 Bira şermî bin û hevr’a t’evayî bibine r’obet,
yêd ku pey min k’etine
û mirina min dixwazin.
De bira şermî bin, paşda bir’evin,
yêd ku xirabîya min dixwazin.
15 Bira şermîya xweda ew sûcdar bin,
yêd ku hûyî min dikin.

16 H’emûyêd ku li Te diger’in,
bira pê Te eşq û şa bin
û yêd xilazkirina Te h’iz dikin,
«Xudan mezin e!» t’imê bêjin

17 ezî şkestîyî belengaz im,
lê belê bona min Xudan xem dike.
Alîk’ar û xilazkirê min Tu yî!
Xwedêyê min derengî nek’eve.

### Duayê merivê nexweş bona qencbûnê

41 *Serwêrê sazbendar’a. Zebûra Dawid.*
1 Xwezî li wî ku xem dike bona yê k’esîb,
r’ojêd tengasîyêda Xudanê wî xilaz ke.
2 Xudanê wî xwey ke û e’mir bidê,
ewê li ser dinê xwezilî be
û wê nede destê xwestina neyar.
3 Xudanê nexweşîyêda cî-nivîna wî bê r’e’mê,
ji h’emû nexweşîya qenc ke û ji nivînê r’ake.

* 40:13 Awa gotî «bira xwestina Te be».

4 Min got: «Ya Xudan, min were r'e'mê,
nefsa min qenc ke, çimkî min ber Te gune kir».
5 Neyar xeyba min dikin û dibêjin:
«K'engê ewê bimire û navê wî unda be».
6 Yek jî ku tê min bibîne,
tiştê h'al-qal dibêje,
dilê wî deng-be'sêd xirab t'op dike,
ku derê derva gilî ke.
7 H'emû peyk'etîyêd min,
bona min hevr'a dikine p'iste-p'ist,
bona min tiştê xirab difikirin,
8 dibêjin: «Xezebê eva girtîye,
ew k'etîye îdî r'anabe».
9 H'eta pêşewitîyê min jî,
k'îjanîda ez serfinyaz bûm,
nanê min dixwar, p'e'yn avîte min*.

10 Lê belê, ya Xudan, Tu min were r'e'mê
û min bide sekinandinê ku ezê wan veger'înim.
11 Ezê bi vê yekê zanibim ku Tu min begem dikî,
gava dengê serk'etina dijmin neyê bihîstin.
12 Lê Tê min nava bêsûcîya minda xweyî kî
û h'eta-h'etayê min ber Xwe bidî sekinandinê.

13 Şikir Xudan Xwedêyê Îsraêlr'a,
ji her-heyê h'eta h'eta-h'etayê.

Amîn û amîn.

* 41:9 Metta 26:23; Marqos 14:18; Lûqa 22:21; Yûh'enna 13:18.

# K'itêba Duda (Zebûra 42-a h'eta 72-a)

## Duayê sirgûnîyê û belengazîyêda

42 *Serwêrê sazbendar'a. Maskîla malbeta Qorax.*
1 Çawa kara xezala h'eyra r'êç'ê ava ye,
usa jî r'uh'ê min h'eyra Teda ye, Xwedêyo!
2 R'uh'ê min t'îyê Xwedê ye, Xwedêyê zêndî ye.
K'engê ezê bêm ber dîndara Xwedê hazir bim?
3 Hêsirêd min şev û r'oj bûne xurê min,
ku her gav dibêjine min:
«K'anê ye Xwedêyê te?»

4 Ev yek ku tên bîra min,
agir-şewat min dik'eve,
çawa mixulqetêr'a min xwe digîhand,
bi wanr'a t'evayî bi dengê eşqê û şikirdarîyê,
k'oma cejinêva ez dik'etime Xana Xwedê.
5 Çima nav minda dik'izk'izî r'uh'ê min,
çima nava minda ne r'ih'et î?
Gumana xwe li Xwedê bîne,
çimkî ezê dîsa pesinê Wî bidim,
xilazkirê xwe û Xwedêyê xwe.

6 R'uh'ê min nav minda dik'izk'ize,
lema Te bîr tînim
ji e'rdê Ûrdunê û Hermonê,
ji ç'îyayê Mîtsarê.
7 Li wir bêbinî deng dide bêbinîyê
bi dengê avşir'ikêd Te,
h'emû lêyî û pêlêd Te
li ser minr'a derbaz bûn.
8 R'ojê Xudan h'uba Xwe dide e'yankirinê,
şevê jî stirana Wî t'evî min e,
duayê min jî ber bi Xwedêyê e'mirê min e.

9 Ezê bêjime Xwedêyê Qeyayê xwe:
«Çima Te ez bîr kirime?
Çima bi dilê kul ez biger'im,
ji zêrandina destê dijmin?»
10 Dijmin usa te'na li min dixin,
tê bêjî hestûyêd min hûrxweşî dikin,
gava her r'oj dibêjine min:
«K'anê ye Xwedêyê te?»

11 Çima nav minda dik'izk'izî r'uh'ê min,
çima nava minda ne r'ih'et î?
Gumana xwe li Xwedê bîne,
çimkî dîsa ezê pesinê Wî bidim,
xilazkirê xwe û Xwedêyê xwe.

### Duayê k'omekxwestinê

**43** 1 Tu ser îşê minda binihêr'e, ya Xwedê,
heqîya min xwey ke ji nava vî miletê bêxwedê,
ji merivêd derewîn û neheq azad ke.
2 Çimkî Tu yî Xwedêyê kela min.
Çima Te ez wêda avîtim?
Çima ez bi dilê kul biger'im,
ji ber zêrandina neyara?

3 R'onayî û r'astîya Xwe bişîne,
bira ewana r'êberîya min bikin,
min bibine ç'îyayê Teyî pîroz û Xana Te.
4 Ezê her'ime ber gorîgeha Xwedê,
li ber Xwedêyê şabûn û eşqa xwe,
ezê bi çeng pesinê Te bidim,
ya Xudan, Xwedêyê min!

5 Çima nav minda dik'izk'izî r'uh'ê min,
çima nav minda ne r'ih'et î?

Gumana xwe li Xwedê bîne,
çimkî dîsa ezê pesinê Wî bidim,
xilazkirê xwe û Xwedêyê xwe.

**Duayê k'omekdarîyê**

**44** *Serwêrê sazbendar'a. Maskîla malbeta Qorax.*
1 Xwedêyo, me bi guhêd xwe bihîstin,
kal-bavêd me mer'a gotin,
bona wan kirêd Teye r'ojêd wanda,
nava wan r'ojêd berêda kirî.
2 Te bi destê Xwe p'ûtp'arist r'aqetandin
û kal-bavêd me cî-war kirin,
qede-bela anî serê wan mileta
û pêşêd me derxistine firêqetîyê.
3 Ne ku pê şûrê xwe ew e'rdê war bûn,
yan zendêd wan ew xilaz kirin,
lê destê Teyî r'astê,
zenda Te û nûr-nedera Te,
çimkî Te ew begem kirin.

4 Tu yî P'adşê min, ya Xwedê!
Tu serk'etinê Aqûbr'a li hev bîne.
5 Pê Te em neyarêd xwe e'rdê dixin,
yêd ku ber me r'adibin,
em pê navê Te wan p'êpes dikin.
6 Çimkî kevanê xweda ez ne guman im
û ne jî şûrê minê min xilaz ke.
7 Lê Te em ji neyara xilaz kirin
û peyk'etîyêd me dane şermê.
8 Her r'oj em pê Xwedê difir'in
h'eta-h'etayê pesinê navê Te didin. (Sela)

9 Te em kirine sosret wêda avîtî,
t'evî ordîyêd me dernak'evî.
10 Te em ji ber dijmin dane r'evê,
peyk'etîya jî em t'alan kirin.

11 Te em çawa pez dane xwarin,
nav miletada em bela kirin.
12 Te cime’ta xwe bêqîmet firot
û bahê wê Te bilind nekir.

13 Te em ber cînara kirine r’obet
û li ber yêd dor-berêd me nav û nûç’ik.
14 Nav xelqêda Te em kirine dev-dirana,
nava miletada jî bûne mîna pêk’enîya.
15 T’emamîya r’ojê sosretîyêda me,
şerma r’ûyê min min dinixême,
16 r’ûyê dengê buxdanbêj û k’ifira,
usa jî r’ûyê h’eyfhildayê dijminda.

17 Ev h’emû hatine serê me,
lê me Tu bîr nekirî
û peymana Te net’er’iband.
18 Dilê me paşda veneger’îyan
û gavêd me ji r’îya Te dernek’etin.
19 Lê Te em cîyê mişk û me’ra h’incir’andin
û bi sîya mirinê em nixamtin.

20 Heger me navê Xwedêyê xwe bîr bikira,
yan destê xwe dirêjî xwedêkî xerîb kira,
21 Xwedê wê ser vê yekêda nenihêr’îya?
Çimkî Ew sir’êd dilada zane.
22 Lê bona Te em her r’oj ber mirinê ne,
mîna pezêd serjêkirinê h’esab dibin*.

23 R’abe Xweyo, çima r’aza yî?
H’işyar be me t’exsîr neke h’eta-h’etê.
24 Çima r’ûyê Xwe ji me vedişêrî,
zelûlî û derd-kulêd me bîr dikî.

* 44:22 R’omayî 8:36.

25 Em usa dever’ûya çûne e’rdê,
h’eta zikê me e’rdêva qemitî.
26 R’abe alî me bike û me xilaz ke,
bona xatirê h’uba Xweye amin.

### Şayîya mala P’adşê û dergîstîya Wî

**45** *Serwêrê sazbendar’a. Pê miqamê: «Sosinî». Maskîla evîntîya malbeta Qorax.*

1 Ji dilê min xebera qenc bilq vedide,
hilbestêd min eşqî P’adşê ne,
zimanê min mîna qelema nivîsk’arê çê ye.

### Bona P’adşê

2 Tu ji h’emû însanetî bedewtir î,
ji lêvêd Te gul û nûr dibare,
lema Xwedê h’eta-h’etayê dua li Te kirîye.
3 Şûrê Xwe li pişta Xwe girêde, E’gîto,
bi r’ewş û r’ûmeta Xwe.

4 Bi qedirê Xwe pêşda her’e,
bona r’astî, milûktîyê û heqîyê, sîyaro,
bira destê Teyî r’astê
r’êberîya Te ber bi kirêd h’ujmek’ar bike.
5 Tîrêd Te tûj in,
ew dik’evine dilêd dijminêd P’adşê,
miletê bik’evine binê p’îyêd Te.

6 T’extê Te Xwedêyo*, t’extê h’eta-h’etayê ye,
şiva p’adşatîya Te şiva heqîyê ye.
7 Tu heqîyê h’iz dikî û dijenî neheqîyê,

* 45:6 «T’extê Te Xwedêyo» bi îbranî aha jî tê fe’mkirinê: «T’extê Teyî ku Xwedê da Te». Zemanê berê, p’adşa çawa xwedêk dihatine h’esabê û wana weke h’ukumê xwedêtîya xwe p’adşatî dikir. Lê cihûya gotinêd vê zebûrê fe’m dikirin, çawa gotinêd li ser Mesîh hatîye sêrî.

lema jî Xwedê, Xwedêyê Te Tu bi r’ûnê şabûnê
ji hevalêd Te zêdetir k’ifşkirî*.
8 Ji h’emû k’incê Te bîna zimir, ûd û darçînê* dertê,
ji tam-taşêd hestûyêd fîlînda, pê dengêd saza Te şa dikin.
9 Qîzêd p’adşaya nava xanim-xatûnêd Teda ne,
xanimp’adşa nav zêr’ê Ofîrda li milê Teyî r’astê sekinî ye.

**Bona dergîstîya P’adşê**

10 Bibihê qîzik, dîna xwe bidê û guhê xwe veke,
tu bîr bike miletê xwe û mala bavê xwe
11 û bira P’adşa maşoqê bedewîya teda be,
çimkî Ew e xweyê te, tu ber Wî ta be.
12 Binelîyêd Sûrê* bi dîyarîya
û dewlemendêd cime’tê jî bi xizna
wê h’eyra dîndara teda bin.

13 Dergîstîya P’adşê ew hindur’va xas û xewan e,
k’incê wê bi t’êlê zêr’ hûnandî ye.
14 Xemila neqişandîva wê dibine li ber P’adşê,
berbûk pey wê t’ev diçine li ber Wî.
15 Ew têne birinê bi eşq û şayî
û dik’evine qesira P’adşê.

**Bona P’adşê**

16 Dewsa kal-bavêd Teyê ewledêd Te bin,
Tê wan bikî serwêr ser t’emamîya e’rdê.
17 Ezê navê Te qur’ne-qur’ne bidime bîranîn,
lema miletê pesinê Te bidin h’eta-h’etayê*.

---

* 45:6-7 Îbranî 1:8-9.
* 45:8 Cûr’ekî biharetêye ku bi îbranî ne e’yan e. Gelek welger’andinada jêr’a dibêjin «kasîya».
* 45:12 Bi îbranî xeber bi xeber aha ye: «Qîza Sûrê». Bi îbranî xebera «qîz» gelek cara bi me’na «bajar» yan «binelîyêd bajêr» tê xebatê.
* 45:1-17 Ev zebûra evîntîyê bona de’wata p’adşakî Îsraêl û dergîstîya wîye ji welatder e. Peyr’a, gelek ser k’etin ku ev zebûr bi Mesîh ser hevda

### Xwedê sit'argeha û xilazkirê bajêr e

**46** *Serwêrê sazbendar'a. Stirana malbeta Qoraxe li ser Alamotê*.*

1 Xwedê sit'argeh û qewata me ye,
k'omekdarê meyî tengasîyada herî nêzîk e.
2 Lema jî em natirsin,
heger e'rd jî serobinîhev be,
ç'îya bik'evine k'ûraya be'rê,
3 avêd wê fûr din, ew bikin xuşîn,
ç'îya bilerizin ji dest pêlêd wan. (Sela)

4 Ç'emek heye ku avêd wê bajarê Xwedê şa dikin,
wê Mala pîroze Yê Herî Jorin.
5 Xwedê wî bajarîda ye, ew nah'eje,
Xwedêyê berbanga k'ûrda alî wî bike.
6 Milet dikine qalme-qalm, h'ej dik'eve p'adşatîya,
Yê Jorin dike dengî û e'rd dih'ele.

7 Xudanê Ordîya t'evî me ye,
Xwedêyê Aqûb kela me ye. (Sela)

8 Werin bibînin kirêd Xudan,
çi k'eremet kir r'ûyê e'rdê.
9 Şer'a dide sekinandinê, her çar qulbêd dinyayê,
tîr-kevana dişkêne, r'ima hûr-hûrî dike
û mert'ala bi êgir dişewitîne.
10 Ker' bin û bizanibin, Ez im Xwedê,
Ezê nav miletada bilind bim
û li r'ûyê e'rdê bilind bim.

---

tê (mesele, welger'andineke aramîye kevinda r'êza 2a navê «Mesîh» bona p'adşa bi k'ar anîye). Bona vê yekê, vê welger'andinêda h'erfa mezin bona vî p'adşayî hatîye nivîsarê (mesele, «P'adşa» û «Wî»).

* 46:0 «Alamot» têrmîneke miqamêye ne e'yan e. Zane dibêjin, ku eva dide k'ifşê çawa dengê ziravî k'ulfeta cahil, yan jî dengê zur'nê.

11 Xudanê Ordîya t’evî me ye,
Xwedêyê Aqûb kela me ye. (Sela)

### Mezinayîya Xwedê û tabûna mileta

47 *Serwêrê sazbendar’a. Zebûra malbeta Qorax.*
1 Destêd xwe li hev xin h’emû miletno,
bi dengê şabûnê berbi Xwedê bikin qar’în.
2 Çimkî Xudan, Yê Herî Jorin, saw e,
P’adşê Mezin e li ser t’emamîya e’rdê.
3 Ew mileta ber me ta dike,
cime’ta dike bin p’îyêd me.
4 Ewî milk’ê me mer’a bijart,
mezinayîya Aqûb, h’izkirîyê Xwe. (Sela)

5 Xwedê Xwe da hêlana jorin qar’înîya şabûnêr’a,
Xudan r’abû ser t’extê Xwe bi dengê bor’îyêr’a.
6 Bistirên Xwedêr’a, bistirên,
bistirên P’adşê mer’a, bistirên.
7 Xwedê P’adşê t’emamîya e’rdê ye,
bi zebûra* bistirên hûn jêr’a.

8 Xwedê p’adşatîyê h’emû mileta dike,
Xwedê r’ûdinî ser k’ursîya Xweye pîroz.
9 E’silzadêd mileta civîyan
t’evî miletê Xwedêyê Îbrahîm.
Çimkî mert’alêd dinyayê yêd Xwedê ne,
Ew ser wanr’a ye.

### Sîyon, bajarê Xwedêyê me ye

48 *Stiran. Zebûra malbeta Qorax.*
1 Xudan mezin e, hêjayî gelek pesina ye,
bajarê Xwedêyê meda,
li ser ç’îyayê Xweyî pîroz,

* 47:7 Bi îbranî xeber bi xeber «maskîl» e. Bona «maskîl» şirovekirina Zebûr 32 binihêr’e.

2 bilindayîya bedew,
şabûna t’emamîya e’rdê,
ç’îyayê Sîyonê, t’apê Safonê*,
bajarê P’adşê mezin**.
3 Qesirêd wêda Xwedê k’ifş e,
Ew çawa kela xuya dike.
4 Va ye p’adşa, ewan civîyan,
h’emû hevr’a hatin ser şêr’.
5 Gava dîtin, e’cêbmayî bûn,
t’evîhev bûn, paşda r’evîn.
6 R’icafê li wir ew girtin,
mîna sancûyê jina ku dik’eve ber zar’ê
7 û çawa bayê r’ohilatê
gemîyêd T’arşîşê hûrxweşî dike.

8 Me çawa bihîstibû, usa jî me dît,
bajarê Xudanê Ordîyada,
bajarê Xwedêyê meda,
k’îjanî Xwedê qedîm dike h’eta-h’etayê. (Sela)

9 Ya Xwedê, P’aristgeha Teda
em ser h’uba Teye bêhimber difikirin.
10 Çawa navê Te, ya Xwedê,
usa jî pesinê Te h’eta serê dinê,
destê Teyî r’astê heqîyêva xinê.
11 Bira şa be ç’îyayê Sîyonê
û eşq bin bajarêd Cihûda pê qirarêd Te.

12 Dora Sîyonê bizivir’in
û dora wê hûn bigirin,
bilindcîyêd wê bijmirin,

---

***** **48:2** Bi îbranî çend fe’mînêd «Safonê» hene: (1) Ew navekî K’enanîyayî bona wî ç’îyayî bû, ku «misk’enê pîroz» dihate h’esabê; (2) usa jî «bakur» tê gotinê.
****** **48:2** Metta 5:35.

13 mêla we ser sûrêd wê be,
dîna xwe bidine qesirêd wê,
ku nisilê mayînr’a hûn salix kin,
14 çimkî ev Xwedêya
Xwedêyê me ye h’eta-h’etayê,
Ewê r’êberê me be her-heyê.

### Kêmaqilîya merivêd hebûka xweda guman

## 49

*Serwêrê sazbendar’a. Zebûra malbeta Qorax.*
1 Bibihên vê yekê h’emû miletno,
guhdar bin h’emû binelîyêd dinê,
2 belengaz û yê e’silzade,
dewletî û k’esîb hevr’a t’evayî.
3 Devê minê serwaxtîyê bêje,
fikirêd dilê min zanistîyê.
4 Ezê guhê xwe bidime ser mesela gotî,
pê çengê zîs vekim sir’a gotina xwe.

5 Çima bitirsim ez r’ojêd xirabda,
gava neheqîya neyar dora min bigire,
6 yê gumana wî li ser qewata wî ye
û pê hebûka xweye p’ir’ difir’e?
7 Belê ew hebûk nikare wî xilaz ke
û ne jî berdêlê berva bide Xwedê.
8 Çimkî biha ye qîmetê xilazbûna wan,
t’u car ev yek nabe ku bê dayîn,
9 wekî bijî h’eta-h’etayê
û mirinê ew nebîne.

10 Her kes dibîne ku serwaxt dimirin,
mîna axmax û bêfe’ma unda dibin,
hebûka xwe hineke dinr’a ew dihêlin.
11 Qebirêd wan dibine tamêd h’eta-h’etayê,
ew cî-warêd wane qur’ne-qur’ne ne,
ev in ku navê xwe didane li ser cî-misk’ena.

12 Meriv xêr-xweşîyêda dirêj namîne,
wê mîna h'eywên, ewê unda be her'e.

13 Ev e r'îya axmaxa,
axirîya yêd e'mirê xwe r'azî ne. (Sela)
14 Mîna pêz berbir'î dîyarê mirîya dibin,
mirin şivanê wan e,
ew r'ast berjêrî gor'ê dibin.
Qalibê wanê bir'ize her'e,
gor'istanê mala wan be.
15 Lê Xudanê nefsa min ji destê dîyarê mirîya xilaz ke,
belê Ewê min hilde* cem xwe. (Sela)

16 Netirse, ku meriv dewletî dibe
û hebûka wê malê zêde dibe,
17 çimkî gava ew dimire diçe,
nikare tiştekî t'evî xwe hilde,
ew hebûka wî t'evî wî naçe.
18 Heger ew saxîya xweda xwe bextewar dibîne
û h'emû jî pesinê wî didin,
bona ku her tişt wîr'a li hev tê,
19 yeke wê her'e bigihîje wan pêşîyêd xwe
û îdî t'u car ewê r'onayê nebîne.
20 Meriv, ew xêr-xweşîyêda ye,
lê nizane wê mîna h'eywên unda be.

## H'ebandina r'ast

**50** *Zebûra Asaf.*
1 Yê Zor, Xudan, Xwedê xeber dide,
ji r'ohilatê h'eta r'oavayê gazî dinyayê dike.
2 Ji Sîyonê, bedewetîya Xwedêye k'amil dibiriqe.

---

* 49:15 Binihêr'e: Destpêbûn 5:24.

3 Xwedêyê me tê û Ew Xwe ker’ nake,
agirê p’er’itandinê li pêşîya Wî ye
û dora Wî bobelîska mezin e.
4 Ew jorda e’rd û e’zmên şe’de digire,
ku dîwana cime’ta Xwe bike.
5 «Aminêd min cem Min t’op kin,
yêd ku bi qurbanê peyman t’ev Min girêdan».
6 Hingê e’zman r’astîya Wî dikine dengî,
ku Xwedê Xwexa h’akim e. (Sela)

7 «Bibihê cime’ta Min û Ezê xeber dim,
hey Îsraêl, Ezê şe’dê miqabilî te bim,
Ez Xwedê me, Xwedêyê te.
8 Ne ku bona qurbanêd te Ez te hiltêm,
t’evayîşewatêd te t’imê ber Min in.
9 Ez ji mala te canega naxwazim,
ne jî nêrîya ji axilê te.
10 Çimkî h’emû bînberê daristên ew yêd Min in,
usa jî h’eywanêd li ser h’ezara ç’îya.
11 H’emû teyredêd ç’îya Ez nas dikim
û h’eywanêd çolê li ber ç’e’vê Min in.

12 Heger Ez bir’çî bim, Ez ter’a nabêjim,
çimkî dinya xêr-xizna xweva ya Min e.
13 Gelo Ez goştê canega dixwim,
yan jî xûna nêrîya vedixwim?
14 Xwedêr’a qurbana r’azîdarîyê bide,
ad-qirarêd xwe t’ev Yê Herî Jorin bîne sêrî.
15 Oxirmêd giranda tu Min bike gazî,
Ezê te xilaz kim, tê jî şikirîyê bidî Min».

16 Lê belê Xwedê gunek’arar’a dibêje:
«Çî ter’a ne, ku tu qeyde-qanûnêd Min salix dikî
û peymana Min didî li ser zarê xwe?
17 Çimkî tu li şîretêd Min ne xweş î
û xebera Min davêjî pişt guhê xwe.

18 Gava diz dibînî, didî pey diçî
û dibî hevalê zinêk'ara.

19 Bona xirabîyê devê xwe vedikî
û zimanê te mixenetîyê dertîne.
20 Tu r'ûdinî davêjî birê xwe
û xeyba kur'ê dîya xwe dikî.
21 Te ev yek kirin û Min deng nekir,
te t'irê Ezî mîna te me.
Ezê te hilêm û kirêd te bidime ber ç'e'vê te.

22 Vê yekê fe'm bikin, gelî Xwedêbîrkirîya,
ku nebe Ez we qet-qetî kim û azadkir t'une be.
23 Yê qurbana r'azîdarîyê dide,
ew e yê ku qedirê Min digire
û ewê miqatî r'îya xwe dibe,
xilazkirina xwe Ezê nîşanî wî dim».

## Zebûra t'obekirinê

**51** *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid, gava p'êxember Nat'an hate cem wî, bona ku wî serê xwe Bat'-Şevayêr'a danîbû.*
1 Min were r'e'mê, Xwedê,
weke aminîya Xwe,
weke h'uba Xweye p'ir',
bêolîtîyêd min r'esît ke.
2 Min lap bişo ji neheqîyêd min
û min paqij ke ji guneyêd min.

3 Çimkî bêolîtîyêd xwe ez nas dikim
û guneyê min t'imê li ber min e.
4 Li ber Te, t'enê himberî Te min gune kir
û xirabî li ber ç'e'vê Te kir,
usa ku Tu r'ast î qirara Xweda
û paqij î h'akimtîya Xweda*.

* 51:4 R'omayî 3:4.

5 Belê ezî neheqîyêva dinê k’etime
ez ji zikmakîyêda gunek’ar bûme.

6 Belê Tu r’astîyê dilê minda dixwazî.
Dilê min k’ûr hînî serwaxtîyê ke.
7 Paqij ke min pê zoxê hûsopê, ezê paqij bim
û bişo min, ji berfê ezê qerqaştir bim.
8 Dengê eşqê û şabûnê Tu bigihîne min,
bira şa bin hestûyêd ku Te şkênandin.
9 Tu pişta Xwe bide guneyêd min
û r’esît ke h’emû neheqîyêd min.

10 Xwedê, dilekî paqij nav minda bie’firîne
û r’uh’ekî r’ast nav minda ser hevda bîne.
11 Tu min ji ber Xwe nevêje
û R’uh’ê Xweyî Pîroz ji min nestîne.
12 Şabûna xilazkirina Xwe li min veger’îne
û bi r’uh’ekî r’azî min bingeh ke.

13 R’îyêd Te ezê bêola hîn kim
û gunek’arê ser Teda veger’in.
14 Min xilaz ke Xwedê ji xûnr’êtinê,
Tu Xwedêyê minî xilazbûnê,
zimanê minê bide pesinê heqîya Te.

15 Xweyo, lêvêd min Tu ji hev veke
û devê minê r’ûmeta Te bilind ke.
16 Çimkî Tu qurbana naxwazî,
yan na minê ew bidana,
t’evayîşewata jî begem nakî.
17 Qurbana Xwedê xweş, r’uh’ê şkestî ye,
dilê milûk e, ku Xwedê t’exsîr nake.

18 Bi r’ezedilîyê qencîyê Sîyonêr’a bike,
sûra Orşelîmê bide sekinandinê.

19 Hingê qurbanêd r’astîyê wê Te xweş bên,
dîyarîyêd şewat û t’evayîşewatê
û ser gorîgeha Teyê canega bên dayînê.

**Dîwana Xwedê û dilovanîya Wîye amin**

**52** *Serwêrê sazbendar’a. Maskîla Dawid, gava Doêgê edomî hat gote Şawûl, ku Dawid k’ete mala Ah’îmelek’.*

1 Çima pê xirabîyê tu difir’î, hey mêrxaso?
Aminîya Xwedê ew her t’im heye.
2 Zimanê te xirabîyê dertîne,
mîna dûzanê tûj h’ilek’arîyê dike.
3 Tu xirabîyê hê gelekî h’iz dikî, ne ku qencîyê,
hê gelekî derewîyê, ne ku r’ast xeberdanê. (Sela)
4 Tu h’iz dikî her xeberêd zîyank’ar,
hey zimanê har û me’r.

5 Xwedê wê bela te bidê h’eta-h’etayê,
wê te bigire, te ji wargeh derxe,
k’oka te jî ji wî e’rdê jîyînê. (Sela)
6 R’astê bibînin û xof kin,
ser bik’enin û bêjin:
7 «Va ye ew merivê ku xwe nesparte Xwedê,
lê gumana xwe da ser hebûka p’ir’e bêkêr
û bi neheqîyêd xwe qewat hê girt».

8 Lê ez Xana Xwedêda mîna dara zeyt’ûnêye şîn im,
her t’im h’ub û aminîya Xwedêda ez guman im.
9 Ezê t’imê bidim pesinê Te,
bona xatirê wê kirina Te,
ber aminêd Te bikim dengî navê Te,
çimkî ew nav qenc e û xweş e.

## Hêwarza azadîyê ji h'alê xirabîya merivayîyê

53 *Serwêrê sazbendar'a. Ser Mah'alatê. Maskîla Dawid.*
1 Bêarê-bêfe'm dilê xweda dibêje: «Xwedê t'une».
Ew şûna r'eşva diçin û neheqîyê dikin,
kesek t'une ku qencîyê bike.

2 Xwedê jorda li merivayê dinihêr'e,
ku bibîne gelo serwaxtek heye,
ku ew li Xwedê diger'e.
3 Ew h'emû jî xalifîne,
t'evayîya xweva lewit'îne.
Yekî qencîyê bike t'une,
t'u kes t'une!*
4 Gelo ewêd neheqîyê dikin fe'm nakin,
dixwin ça nan cime'ta Min,
Xwedê jî nah'ebînin?

5 Hingê xof û tirsê wan bigire,
wê dera ku tirs t'une,
hestûyêd h'icûmkirêd te
Xwedê wê bela-belayî ke.
Ew hatine sosretkirin,
çimkî Xwedê ew wêda avîtin.

6 Xwezî azadkirina Îsraêlê ji Sîyonê bihata!
Gava Xwedê çerxa cime'ta Xwe dîsa r'ast ke,
hingê Aqûbê eşq be, Îsraêlê jî şa be.

## Duayê bona ji destê dijmin azadbûnê

54 *Serwêrê sazbendar'a. Ser sazêd t'êlî. Maskîla Dawid, gava zîfî hatin gotine Şawûl, ku Dawid xwe li cem me veşartîye.*
1 Xwedêyo, bi navê Xwe min xilaz ke
bi qewata Xwe weke heqîya min bide min.

---

* 53:1-3 R'omayî 3:10-12.

2 Xwedêyo, bibihê duayê min
û guh bide ser gotinêd min.
3 Çimkî xerîba ser minda girtine
û zulmk'ar pey e'mirê min k'etine,
Xwedê nadine ber ç'e'vê xwe. (Sela)

4 Lê belê Xwedê piştovanê min e,
Xweyî t'agêrê* e'mirê min e!
5 Xirabîyê ser dijminda veger'îne,
ji dest aminîya xwe wan mina ke.

6 Ezê Ter'a qurbanê bidim, bi dil û can
û şikirîyê bidime navê Teyî qenc, Xudan.
7 Çimkî Te ji her tengasîya ez xilaz kirim,
k'etina neyara, min ber ç'e'vê xwe dît.

**Hewara ji destê nemamîya heval xilazbûnê**

**55** *Serwêrê sazbendar'a. Ser sazêd t'êlî. Maskîla Dawid.*
1 Xwedêyo, guh bide duayê min
û pişta Xwe nede r'ecayê min.
2 Dîna Xwe bide min û caba min bide,
diltengîyêda ez şaşo-p'aş bûme û şînê dikim,
3 ji dest dengê neyar û tengasîya nep'ak.
Çimkî neheqîyê li ser minda dibarînin
û bi hêrsê min dizêrînin.

4 Dil nav minda dilerize
û xofa mirinê ser minda girt.
5 Tirs û lerizekê ez girtime
û r'isasê ez mina kirime*.
6 Min got: «Xwezî mîna kewa baskêd min hebûna
ku ez bifir'îyama û r'ih'et bûma.

* 54:4 Awa gotî «alîk'ar».
* 55:5 Awa gotî «unda kirime, t'une kirime».

7 Ezê bir’evîyama dûr biçûma,
çol-bestada ezê bimama. (Sela)
8 Minê bikira ji ber fizirdûmanê
û bobelîskê sit’arek xwer’a bidîta».

9 Ya Xudan, zarê wan şaş ke,
zimanêd wan t’evîhev ke,
çimkî bajêrda zordarî ye,
hevk’etinê ez dibînim.
10 Evana şev û r’oj her çar alîyava
li ser sûra wî diger’in,
bêolîtî û xirabî jî navda ye.
11 Wêranbûn nava wîda ye,
derewî û zordarî ji meydanêd wî kêm nabin.

12 Neyar nîne serê min dike,
min sebir kira,
yan peyk’etîyêd min
yê ku xwe ser minr’a digire,
min xwe jê veşarta.
13 Lê belê tu hogirê min,
heval û pismamê min,
14 ku me hevr’a şîrin-şîrin hevaltî dikir
û t’evî mixulqetê Xana Xwedêda diger’îyan.
15 Bira mirin nişkêva ser wanda bigire
û saxe-sax ew bik’evine dîyarê mirîya,
çimkî nava wan û hêwargehêd wanda xirabî heye.

16 Lê ezê hewara xwe Xwedê daynim
û Xudan wê min xilaz ke.
17 Ezê sibeh, nîvro û êvar,
bikim zarîn hêwarze
û Ewê bibihê dengê min,
18 bi e’dilayê min xilaz ke
ji wî şer’ê miqabilî min,
çimkî gelek in neyarêd min.

19 Xwedê wê bibihê
û Yê Her-Heyêyî li ser k’ursîyê
wê dever’ûya wan bîne, (Sela)
çimkî ew nayêne guhastinê
û ji Xwedê natirsin.

20 Destê xwe hilda ser hogirêd xwe
û peymana xwe t’er’iband.
21 Ji devê wî gul û nûr dibarin,
lê şer’ heye dilê wîda,
zarê wî ji melh’emê nermtir e,
lê xwexa şûrê k’aşkirî ye.

22 Tu barê xwe bide Xudan
Ewê hilgire dewsa te.
Ewê t’u car nehêle,
wekî yê r’ast bilik’ume.

23 Lê Tu Xwedêyo,
Tê wan bavêjî ç’e’la mirinê,
merivêd qet’il û mixenet
wê negihîjine nîvê r’ojêd xwe.
Lê ez Teda guman im.

### Duayê gumana li ser Xudan

**56** *Serwêrê sazbendar’a. Pê miqamê: «Ser keweke lale dûrk’etî». Zebûra* Dawid, gava filistînîya ew Gat’êda girtibûn.*

1 Min were r’e’mê, Xwedêyo!
Merî zorê li min dikin,
t’evayîya r’ojê tengasîyê didine min.
2 Neyar t’evayîya r’ojê zorê min dikin,
çimkî gelek in şer’k’arêd min!
Yê Herî Jorin!

* 56:0 Ji zebûra 56-a h’eta 60-î xebera îbranî «mîxtam» çawa «zebûr» hatîye welger’andinê. Lê me’na wê xebera îbranî ne e’yan e.

3 Gava ez tirsêda me,
ez Teda guman im.
4 Pê Xwedê ezê pesinê xebera Wî bidim,
ez Xwedêda guman im, ez natirsim,
bendeyê çi li min bike?

5 T’evayîya r’ojê kula dikin dilê min,
h’emû şêwirêd wane ser min xirabî ne.
6 Ew tele-tel bi dizîva,
dîna xwe didine gavêd min,
ku r’uh’ê min bistînin.
7 Neheqîyêd wan Tu bîne serê wan,
Xwedêyo, pê hêrsê Tu mileta e’rdê xe.

8 Tu dero-derbûnêd min dijmirî,
hêsirêd min Tu bike meşkê Xwe.
Gelo ew ne k’itêba Teda ne?
9 Neyarêd minê paşda her’in,
gava ez hewara xwe Te daynim.
Ez bi vê yekê pê dih’esim,
ku Xwedê t’evî min e.
10 Pê Xwedê ezê pesinê xebera Wî bidim,
pê Xudan ezê pesinê xebera Wî bidim.
11 Ez Xwedêda guman im, ez natirsim,
merivê çi li min bike?

12 Ya Xudan, gere ez ad-qirarêd xwe bînime sêrî.
Qurbanêd r’azîdarîyê bidime Te.
13 Çimkî nefsa min Te ji mirinê xilaz kir,
belê, nigêd min jî ji lik’umandinê,
wekî ez li ber Xwedê r’onaîya jîyînêda biger’im.

## Duayê hewarê

**57** *Serwêrê sazbendar'a. Pê miqamê: «Wêran neke». Zebûra Dawid, gava ew ji ber Şawûl r'evî şkeftê.*

1 Min were r'e'mê, Xwedêyo, min were r'e'mê,
nefsa min xwe daye bin sîya Te.
H'eta ku qezî ji ser minr'a derbaz bin,
ezê xwe bidime bin sîya p'er'ê Te.
2 Ez gazî Xwedêyê Herî Jorin dikim,
Xwedêyê ku minr'a qencîyê dike.
3 Wê ji e'zmên bişîne û min xilaz ke
û bêhurmetkirêd min bike r'obet. (Sela)
Xwedê wê h'ub û aminîya Xwe bişîne.

4 Ez k'etime nava şêrêd devxûne merivxur,
diranêd k'îjana tîr û r'im in,
zimanêd wan jî şûrê tûj in.

5 Xwedêyo li ser e'zmên bilind be,
bira r'ûmeta Te t'emamîya dinê bigire.

6 T'or' avîtine ber nigêd min,
nefsa min xweda şkestî bû,
pêşîya min wana ç'e'l vedan,
lê ew xwexa k'etine wê. (Sela)

7 Ez dilda guman im,
Xwedêyo, ez dilda guman im.
Ezê bistirêm û miqamê lêdim.
8 H'işyar be, hey nefsa min,
h'işyar bin, hey çeng û çengê zîs,
ezê r'ojê h'işyar kim.
9 Ezê şikirîyê bidime Te, Xudan, nav miletada,
eşqî Te bistirêm nav cime'tada.
10 Çimkî h'uba Te mezin e h'eta e'zmên,
aminîya Te jî h'eta e'wra.

11 Xwedêyo, r’abe li ser e’zmên,
de bira r’ûmeta Te t’emamîya dinê bigire.

**Duayê bela serê nep’aka**

**58** *Serwêrê sazbendar’a. Pê miqamê: «Wêran neke». Zebûra Dawid.*

1 Gelo hûn r’ast qirar dikin, serwêrno?
Û bi heqîyê h’akimtîyê dikin, merivno?
2 Ne dilda hûn bêolîtîyê dikin,
bi destêd xwe zulmê e’rdê dir’eşînin.

3 Nep’ak hema bet’inê dêda ji r’ê k’etî ne,
zikmakîyêda xalifîne derewîyêda.
4 Je’ra wan mîna je’ra me’ra ye,
mîna tîreme’rê ku guhêd xwe dixitimîne,
5 ku dengê k’oç’eka nebihê,
sêrbazê me’rayî pispor jî.

6 Xwedêyo! Dirana devê wanda hûrdexweşî ke,
qîlêd wan şêra bik’işîne, Xudano!
7 Bira mîna avêd diç’ikin, her’in derbaz bin,
mîna gîhê bêne p’êpeskirin, h’işk bin her’in*.
8 Bira ew mîna zûrîya bin,
gava ew dik’işin dih’elin,
mîna zar’a ber k’ulfetê çûyî,
ku r’ûyê te’vê nabîne.
9 Ew hê ser h’işada ne hatî
bira mîna stirîya bêne r’akirinê,
mîna k’ol-k’osa bêne k’işandinê*.

10 R’astê şa be gava h’eyfhildanê bibîne,
ewê xûna nep’akada nigêd xwe bişo.

---

* 58:7 Fe’mîna p’ara r’êzêye duda îbranîda ne zelal e.
* 58:9 Fe’mîna vê r’êzê bi îbranî ne zelal e.

11 Merivê bêjin:
«R’astî jî xelata r’asta heye!
R’astî jî Xwedê heye,
Ew H’akimê ser dinê ye!»

**Duayê xilazbûna ji neyara**

**59** *Serwêrê sazbendar’a. Pê miqamê: «Wêran neke». Zebûra Dawid, gava Şawûl şand gosqulaxîyê lê bikin ku wî bikujin.*
1 Min xilaz ke ji dijminêd min, Xwedêyê min!
Min xwey ke ji yêd miqabilî min.
2 Min xilaz ke ji bêolkira,
min azad ke ji xûnxura.

3 Çimkî va ye, xwe li min telandine,
zordar miqabilî min civîyane,
lê Xudan ne bona gune û xirabîyêd min,
4 cîyê heqî-neheq ser minda digirin, k’arê xwe dikin.

R’abe hewara min û dîna Xwe bidê.
5 Tu Xudan, Xwedêyê Ordîya, Xwedêyê Îsraêl,
r’abe dîwana h’emû mileta bike,
yêd nep’ake xayîn neyê r’e’mê. (Sela)

6 Êvarê ew vediger’in,
mîna kûç’ika dikine gir’e-mir’
û dor bajêr ew diger’in.
7 Binihêr’e ew devê xwe çawa vedikin,
lêvêd wanda şûr hene,
«K’î wê bibihê?» ew dibêjin.

8 Lê Tu Xudan, ser wan dik’enî,
h’emû p’ûtp’arista dikî pêk’enî.
9 Ez dîna xwe didime Te, qewata min,
çimkî Xwedê ye kela min.
10 Xwedêyê bi h’uba Xwe minr’a bigihîne,
Xwedê wê dilê min ser dijmin şa ke.

11 Wan nekuje, ku cime'ta min bîr neke,
bi qewata Xwe wan bela-belayî ke, dever'ûya bavêje,
ya Xudan, mert'ala me.
12 De bira ew bona guneyê devê xwe
û xebera lêvê xwe, k'ubarîya xweda bêne girtinê,
bona wan nifir'a û derewêd ku ew dikin.
13 Wan gever ke Tu pê hêrsê,
wan gever ke, ku k'ok lê bên.
Bira t'emamîya dinê bizanibe,
ku Xwedê xweyîtîyê Aqûb dike. (Sela)

14 Êvarê ew vediger'in,
mîna kûç'ika dikin mir'în
û dor bajêr ew diger'in.
15 Bona xurek ew diger'in
ku nabînin, dikin kastîn.

16 Lê belê *ezê*, pesinê qewata Te bidim
û sibehê eşqî h'uba Te bistirêm,
çimkî Te xweyîtî li min kir,
r'ojêd tengasîyêda minr'a bûyî sit'ar.
17 Qewata min! Eşqî Te ezê bistirêm,
çimkî Xwedê ye kela min,
Xwedê ye xweyê h'uba amin.

## Duayê milet ku şêr'da da der

**60** *Serwêrê sazbendar'a. Pê miqamê: «Sosina Peymanê». Zebûreke Dawide hînkirinê, gava t'evî aramîyêd ji Naharayîmê* û Sovayê** şer' kir, Yoab jî veger'îya ji edomîya donzdeh h'ezar kes Newala Xwêda kuştin.*

1 Xwedê, Te em ji ber Xwe avîtin,
Tu li me hêrs k'etî, em qudûm xistin,
de berê Xwe li meda ke!

---

* 60:0 Awa gotî «Aramîyêd Bakur R'oavaya Mesopotamyayêda».

** 60:0 Awa gotî «Aramîyêd goveka Sûryayêda».

2 Te e'rd h'ejand û tîş lê xist,
qeliştokêd wê bicebirîne,
çimkî ew dilerize.
3 Te tengasî da cime'ta Xwe,
şerava deminandinê em dane vexwarinê.

4 Te xofk'êşêd Xwer'a al* da bilindkirin,
nîşanek da ku ji tîra bir'evin, (Sela)
5 bi destê Xweyî r'astê me ser xe û bibihê,
wekî h'izkirîyêd Te azad bin.

6 Xwedê ji Cîyê Xweyî Pîroz xeber da:
«Ezê şa bim, Şexemê p'arevekim
newala Sûkotê bipîvim.
7 Gîle'd ya Min e, Minaşe ya Min e,
Efrayîm zirih'ê serê Min e,
Cihûda jî qanûndarê Min e.
8 Mowab derdana Mine şûştinê ye,
sola Xwe Ezê bavêjime ser Edomê,
dilê Xwe Ezê şa kim li Filistînê».

9 K'î wê min bibe bajarê sûrkirî?
K'î wê r'êberîya min bike h'eta Edomê?
10 Tu nînî Xwedê, ku Te em ji ber Xwe avîtin?
Tu t'evî ordîyêd me dernak'evî, Xwedêyo!
11 Ji destê neyar me xilaz ke,
çimkî p'ûç' e alîk'arîya meriva.
12 Emê pê Xwedê mêrxasîyê bikin,
t'enê Ewê dijminêd me p'êpes ke.

### Duayê hewargazîyê

**61** *Serwêrê sazbendar'a. Ser sazêd t'êlî. Zebûra Dawid.*
1 Xwedêyo, zarînîya min bibihê,
guh bide duayê min!

---

* 60:4 Awa gotî «beyraq».

2 Ez ji serê dinê gazî Te dikim
gava dilê min sist dibe.

Berê min bide wî qeyayî,
k'îjanî ku nikarim bigihîjimê.
3 Çimkî Tu sit'argeha min î,
kelake zor ji ber dijmin.

4 De bira ez bijîm Konê Teda h'eta-h'etayê,
binê sîya p'er'ê Teda bihêwirim. (Sela)
5 Tu, Xwedêyo, ad-qirarêd min Te bihîstin
û war da wan, yêd ku ji navê Te ditirsin.

6 R'oja zêde ke ser r'ojêd p'adşê,
salêd wî dirêj ke ser gelek nisila.
7 Bira ew h'eta-h'etayê ber Xwedê ser t'ext be,
t'emîyê bide r'e'm û r'astîyê ku wî xwey kin.

8 Awa ezê h'eta-h'etayê bistirêm eşqî navê Te
û her r'oj ad-qirarêd xwe bînime sêrî.

## Gumana t'ame ser Xwedê

62 *Yidût'ûnê serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid.*
1 Ez t'enê ker' û lal, hîvîya Xwedê me,
xilazbûna min ji Wî ye.
2 T'enê Ew e qeyayê min,
xilazbûn û kela min,
ezê t'u car neh'ejim.

3 H'eta k'engê hûnê h'icûmî ser mêriv kin,
mîna dîwarê xwar û sûra ji cî çûyî,
ku hûn h'emû dikin wî hilşînin?
4 Ew t'enê dişêwirin ku wî ji cîyê jorin bavêjin.
Ew derewîyê h'iz dikin,
bi devê xwe dua lê dikin,
lê dilê xweda nifir'a. (Sela)

5 Ez t'enê ker' û lal hîvîya Xwedê me,
çimkî gumana min ji Wî ye.
6 T'enê Ew e qeyayê min, xilazbûna min
û kela min, ezê neh'ejim.
7 Azadbûn û r'ûmeta min Xwedêda ye,
qeyayê minî zor û sit'ara min Xwedê ye.

8 Gelî cime'ta, t'imê Wîda guman bin,
hûn li Wîr'a dilê xwe vekin.
Sit'argeha me Xwedê ye. (Sela)

9 Merivêd sade mîna hulmê ne,
merivêd gire-gir derew in,
heger wan bidine ser mêzînê,
h'emû ji hulmê siviktir in.
10 Şêlandinêda guman nîbin,
xwe nespêrine t'alanîyê,
heger hebûk zêde be,
dilê xwe pêva girê nede.

11 Carekê Xwedê got,
min du cara bihîst,
wekî qewat ya Xwedê ye.
12 H'ub jî ya Te ye, Xudano!
Weke e'mela Tu didî*.

## H'eyr û demana Xwedêda

# 63

*Zebûra Dawid, gava ew li ber'îya Cihûstanêda bû.*
1 Xwedêyo! Tu yî Xwedêyê min,
ez demana Teda me,
r'uh'ê min t'îyê Te ye,
canîya min h'eyra Teda ye,
çawa e'rdê t'î û ziha, dera ku av lê t'une.

---

* 62:12 Metta 16:27; R'omayî 2:6; E'yantî 2:23.

2 Belê, min Cîyê Pîrozda Tu dîtî,
dîna xwe da qewat û r'ûmeta Te.
3 H'uba Te ji e'mir çêtir e,
lêvêd minê pesinê Te bidin.
4 Belê h'eta xweş bim ezê pesinê Te bidim,
bi navê Te destêd xwe bilind kim.
5 Ezê pê sifira t'ijî t'êr bim,
pê beşera xweş jî pesinê Te bidim.

6 Gava nivîna xweda Te bîr tînim,
bedîlêd şevêda* ser Te difikirim,
7 çimkî Tu minr'a alîk'ar î.
Ezê bin sîya p'er'ê Teda şa bim.
8 Nefsa min bûye maşoqê Te,
destê Teyî r'astê min xwey dike.

9 Lê ewê dixwazin min unda kin,
wê xwexa bik'evine k'ûrayîya e'rdê.
10 Wê bik'evine ber devê şûr
û wê bibine xurê çeqel*.
11 Lê belê p'adşayê pê Xwedê şa be.
H'emûyêd ku pê Wî sond dixwin,
wê fir'naq bin,
lê devê derewîna wê bê girtinê.

### Duayê ji dijmin xweykirinê

**64** *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid.*
1 Xwedêyo, gava ez gazinê xwe dikim
Tu bibihê dengê min,
e'mirê min xwey ke ji sawa dijmin.
2 Min veşêre ji şêwirêd neheqa,
ji e'laleta xirabîkira,

---

* 63:6 Awa gotî «demêd şevê, p'arêd şevê».
* 63:10 Awa gotî «wawîk, torî», ku cisinekî seyê beyanî ye.

3 zimanê xwe ew tûj dikin mîna şûra
û gotinêd te'l hazir dikin mîna tîra,
4 ku dizîva bavêjine yê amî-t'am,
nişkêva davêjinê û natirsin.
5 Fikirêd xweye xirabda qewîn dimînin,
difikirin ku bi dizîva t'eleka daynin,
«K'î wê van bibîne?» ew dibêjin.
6 Ew t'ivdîra xirabîyê dikin û dibêjin:
«Me r'îya xweye neheqîyê dîtîye».
Fikirêd însên gelekî k'ûr in*.

7 Lê Xwedê wê tîrê bavêje wan,
nişkêva ewê birîndar bin.
8 Zimanê wanê k'oka wan bîne,
her kesê ku wan bibîne,
wê serê xwe bih'ejîne.
9 Her merivê bitirse,
kirinêd Xwedê wê bela ke
û guh bidine kirinêd Wî.
10 R'astê pê Xudan şa bin,
bin sîya Wîda sit'ar bin,
h'emû dilr'astê pê bifir'in.

### Pesindayîna Xwedê bona xêr-berek'etîyê

**65** *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid. Stiran.*
1 Xwedêyo, Sîyonêda Tu hêjayî pesina yî,
emê ad-qirarêd Ter'a dayî bînin sêrî.
2 Tu ku dua dibihêyî,
her merivê berbi Te bê.
3 Kirêd bêolîtîyê li ser me giran bûne,
k'ewa neheqîyêd me Tu didêyî.
4 Xwezî li wî ku Tu dibijêrî û nêzîkî Xwe dikî,
ku ew h'ewşêd Teda bimîne.

---

* 64:6 Eva r'êza têk'sta îbranîda ne zelal e.

Emê ji xêr-berek'eta Mala Te,
ji P'aristgeha Teye pîroz t'êr bin.

5 Tu bi kirêd saw me azad dikî,
Xwedêyê azadîya me, caba me didî,
gumana yêd h'emû qulba
û welatêd wî berî be'ra.
6 Bi qewata Xwe ç'îya-banî ava kirine
û qudretêva wergirtî ye.
7 Tu dengê be'ra, xuşînîya pêla
û qalme-qalma mileta diseqir'înî!
8 Yêd serêd dinyayê ku dimînin
ji nîşanêd Te xof dikin,
r'ohilat û r'oavayê Tu şa dikî.

9 Ç'e'vê Te ser e'rdê ye,
Tu wê av didî, dewlemend dikî.
Ç'emê Xwedê lêvar'a ye.
Tu genim mêrivr'a hazir dikî,
çimkî Te aha qirar kirîye.
10 Tu cêrgêd wê av didî,
ç'e'l-ç'ûlêd wê r'ast dikî,
Tu pê barana wê nerm dikî
û dua şînaya wê dikî.
11 Tu xêr-berek'eta xweva salê dixemilînî,
p'êgehêd Xweva xêr û xiznê dibarînî.
12 Deştêd ber'îê k'im-k'imî ne
û çîya-banî şabûnêva xim-ximî ne.
13 Mêrg û çîman ew kerîyava wergirtî ne,
deşt û newal ew gênimva nixamtî ne,
bi eşq û şa bi stiranî deng hilîne.

## Stirana eşqî pesindayîna Xwedê bona qencîya hindava Îsraêlda

**66** *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid.*
1 Hey t'emamîya dinyayê,
bi dilê şa Xwedêr'a dengê xwe hildin.
2 De bistirên eşqî r'ûmeta navê Wî,
şikirîyê bidine r'ûmeta Wî.
3 Bêjine Xwedê: «Çiqas xof in kirinêd Te!
Ji qewata Teye zor, neyar li ber Te diqurifin.
4 Dinya pêva li ber Te ta dibe,
eşqî Te distirên,
eşqî navê Te distirên». (Sela)

5 Werin û bibînin kirêd Xwedê,
Ew bi kirêd Xwe xof e ser merivayê.
6 Wî be'r kire zihabûn,
ç'emê avêr'a p'îya derbaz bûn,
li wir em pê Wî şa bûn.
7 Bi qudreta Xwe h'eta-h'etayê serwêrîyê dike,
ç'e'vê Wî p'ûtp'arista dibîne,
de bira serhildayî fir'naq nebin. (Sela)

8 Gelî mileta, pesinê Xwedê bidin
û dengê pesindayîna Wî bidine bihîstinê.
9 Yê ku nefsa me sax dihêle
û nahêle ku nigê me bişimite.

10 Xudan Te em e'nene kirin û h'elandin,
çawa ku zîv tê h'elandinê.
11 Te em kirine t'or'ê,
barê giran da ser milê me.
12 Te serê me kirine bin p'îyêd sîyara.
Em agir û avêr'a derbaz bûn,
lê belê Te em derxistine fireqetîyê.

13 Ezê bi dîyarîşewata bême Mala Te,
wan ad-qirarêd xwe bînime sêrî,
14 k'îjan lêvêd min soz dane
û tengasîyêda ji devê min derk'etine.
15 Ezê dîyarîyêd k'ok p'êşk'êşî Te kim,
t'evî şewitandina bîna berana,
canega û nêrîya ezê qurban bînim. (Sela)

16 Werin bibihên, h'emûyêd Xwedêxof,
ezê wer'a bêjim Ewî çi kir bona min.
17 Min bi devê xwe gazî Wî kir,
pesindayîn ser zarê xwe kêm nekir.
18 Heger neheqî min xweda xwey kira,
Xudan wê dengê min nebihîsta.
19 Lê belê Xwedê bihîst
û guh da dengê duayê min.

20 Şikir ji Xwedêr'a,
ku pişt nade duayê min
û h'uba Xwe ji min dûr nexist.

### Stirana r'azîdarîyê

## 67

*Serwêrê sazbendar'a. Ser sazêd t'êlî. Zebûr. Stiran.*
1 Xwedê li me were r'e'mê
û Tu dua li me bike,
bi dîndara Xwe me r'onayî ke, (Sela)
2 wekî r'îya Te dinyayêda bê naskirinê
û xilazkirina Te nava h'emû miletada.

3 Bira milet pesinê Te bidin, Ya Xwedê!
Bira h'emû milet pesinê Te bidin.
4 Bira cime't eşq û şa bin,
çimkî bi r'astîyê Tu ser mileta h'akimtîyê dikî
û li ser e'rdê Tu r'êberîya cime'ta dikî. (Sela)
5 Bira milet pesinê Te bidin, Xwedêyo,
bira h'emû milet pesinê Te bidin!

6 Bira e’rd berê xwe bide.
Xwedê dua li me bike, Xwedêyê me.
7 Bira Xwedê dua li me bike
û her çar qulbêd dinê ji Wî xof kin.

### Stirana eşqî serk’etina Îsraêlê

**68** *Serwêrê sazbendar’a. Zebûra Dawid. Stiran.*
1 Bira Xwedê r’abe, neyarêd Wî bela bin,
peyk’etîyêd Wî ber ç’e’vê Wî bir’evin!
2 Çawa dû bela dibe, usa Tu wan bela ke,
çawa şima li ber agir dih’ele,
bira nep’ak jî li ber Xudan unda bin.
3 Lê yêd r’ast bira şa bin,
li ber Xwedê bira geş bin,
bi şabûnê bira eşq bin.

4 K’ulamê hûn Xudanr’a bêjin,
eşqî navê Wî hûn bistirên,
bilind kin* Yê li e’wra sîyarbûyî tê,
navê Wî Xudan e, ber Wî şa bin.

5 Bavê sêwîya, tayê jinebîya,
Xwedêyê Xana Xweye pîrozda.
6 Xwedê bêkesa malda didebirîne,
r’ê dide li ber hêsîra,
lê şer’ûd wê cîyê dêmda* bimînin.

7 Xwedêyo! Tu ku pêşîya cime’ta Xweva çûyî
û ber’îyêva derbaz bûyî, (Sela)
8 e’rd h’ejîya, e’zman ji dîndara Xwedê niqitî,
ji dîndara Xwedêyê Sînayê, Xwedêyê Îsraêlê.
9 Barana xêr-berek’etîyê barand, Xwedêyo.
Warê Teyî westîyayî, Te qewat dayê,

* 68:4 Welger’andina Yûnanîye kevinda aha ye: «R’êkê Wîr’a hazir ke».
* 68:6 Awa gotî «cîyê bê av».

10 kerîyê pezê Te li wir hêwirî.
Te ji qencîya Xwe, Xwedêyo,
belengazar’a t’ivdarek dît.

11 Xudan dike fermanî,
k’ulfet dibine mizgîndarêd p’ir’anî.
12 Dir’evin p’adşêd ordîya dir’evin,
lê kevanîyêd malda t’alên bela dikin,
13 wan xişirêd dilqê kewê p’er’ê wane zîvkirî
û baskê wane zêr’ê xalisî.
Çima hineke ji we xwe paşda digirin
û tewlada xwe vedişêrin?*
14 Gava Yê Herî Zor p’adşa li wir bela-belayî kirin,
ew cî bû mîna bagera ser ç’îyayê Salmonê.

15 Hey ç’îyayê Başanê*, ç’îyayê zor!
Hey ç’îyayê gelek serî, ç’îyayê Başanê!
16 Hey ç’îyayê gelek serî,
tu çima usa bi h’evsûdîyê dîna xwe didêyî
li wî ç’îyayê k’îjan Xwedê begem kirîye lê bimîne?
Belê Xudanê h’eta-h’etayê lê bimîne.

17 E’rebêd Xudan bi h’ezar-h’ezara ne,
Xudan ji Sînayê hate Cîyê Pîroz*.
18 Ew hilk’işîya çû jor,
hêsîr t’evî Xwe birin
û p’êşk’êş standin ji meriva,

* 68:13 Fe’mîna îbranî ne zelal e.
* 68:15 T’opraxa Başanê dik’ete alîyê r’ohilata ç’emê Ûrdunê. Bi fikira gelek zana, Başan be’sa ç’îyayê Hermonê dike, ku ji be’rê nêzîkî 2800 mêtir bilindtir e. Xwedê ev ç’îyayê bilind nebijart bona P’aristgeha Xwe, lê ç’îyayê Sîyonêyî li Orşelîmê, ku ji be’rê 750 mêtir bilindtir e.
* 68:17 Awa jî tê fe’mkirinê: «Xudan nava wanda ye, Xwedêyê Sînayê, li Cîyê Pîroz».

h’eta ji wan jî ku nedixwestin,
Xudan Xwedê li wir bimîne*.

19 Şikir Xudanr’a, Xwedêyê xilazkirê mer’a
ku her r’oj barê me hildigire. (Sela)
20 Xwedê bona me Xwedêyê azadkir e,
Xudan Xweyî me ji mirinê xilaz dike.

21 Belê Xwedêyê serêd dijminêd Xwe bih’incir’îne,
qafêd wane pir’ç’e ku nava bêolîtîyêda dimînin.
22 Xweyî got: «Ezê neyara ji Başanê,
ji k’ûrayîya be’rê veger’înim,
23 wekî hûn nigêd xwe xûnêda bişon,
zimanê seyêd we jî xûna neyara biçelpînin».

24 Derbazbûna Te dibînin, Xwedêyo,
derbazbûna Xwedêyê min,
P’adşayê minî çûyîna Cîyê Pîroz.
25 Pêşîyêva dengbêj in, paşîyêva sazbend in,
navêda jî qîz defika dixin.
26 «Civînada pesinê Xudan Xwedê bidin,
hûn h’emûyêd ku ji kanîya Îsraêl in!»
27 Li wir pêşîya wan Bênyamîna biç’ûk diçe,
paşê serwêrêd Cihûdayê k’oma xweva,
serwêrêd Zebûlonê, serwêrêd Neftelîyêva.

28 Xwedêyo, wê qewata Xwe nîşan ke,
bi k’îjanê Xwedêyo, Te alî me kir,
29 ji P’aristgeha Xweye Orşelîmê,
dera ku p’adşa Ter’a dîyarîya tînin.
30 Li r’e’wirê nava qamîşa* hilê,
t’evî boxêd nava gar’anêd mileta,

* 68:18 Efesî 4:8.
* 68:30 Bi fikira zana «r’e’wirê qamîşa» be’sa Hespê Nîl dike, ku sîmvola Misirê bû.

h’eta ku dever’û bên û zîv dîyarî bînin.
De bela-belayî ke wan mileta,
k’îjanêd ku şêr’ dixwazin.
31 E’silzadeyê ji Misirê bên,
etyûpî wê destê xwe dirêjî Xwedê kin.

32 Gelî p’adşatîyêd dinyayê, Xwedêr’a bistirên,
eşqî Xudan bistirên. (Sela)
33 Wîr’a ku li ser e’zmanêd qedîmî sîyarbûyî ye.
Va ye Ew dike dengî, bi dengê Xweyî zor.
34 Qewata Xwedê e’lam kin!
R’ûmeta Wîye mezine li ser Îsraêlê
û qudreta Wîye nava e’wrada.
35 Xwedêyo Tu xof î, wî Cîyê Xweyî Pîrozda.
Xwedêyê Îsraêlê, Ew qewatê û karînê dide
cime’ta Xwe.

Pesinê Xwedê bidin!

### Dua û hêwarza alîk’arîyê

69 *Serwêrê sazbendar’a. Pê miqamê: «Sosinî». Zebûra Dawid.*
1 Min xilaz ke Xwedê,
av gihîştîye qir’ika min.
2 Ez ç’im-ç’imêda* xurpişîme,
cîyê nigê xwe bavêjim t’une,
k’etime k’ûraya avê,
pêlêd ava ez r’oda birim.
3 Ji hewar-gazîyê ez westîya me,
gewrî li min ziha bûye,
ç’e’vê min li r’îya Xwedê qer’imîye.

4 Cîyê amî-t’am peyk’etîyêd min
ji p’or’ê serê min ze’ftir in*.

* 69:2 «Ç’im-ç’ime» e’rdê binav e, ku merî dikare bixurpişê, nuq be.
* 69:4 Yûh’enna 15:25.

Dijminêd mine derewîn,
xwe girtine ku min unda kin.
Tiştê ku min t'alan nekirîye,
dikin ku ez veger'înim.
5 Xwedêyo! Bêh'işîya min Tu zanî
û guneyêd min ji Te veşartî nînin.

6 Bira r'ûyê minda yêd Teda guman şermî nebin,
ya Xweyî, Xudanê Ordîya.
Bira r'ûyê minda yêd Te diger'in, r'ezîl nebin,
ya Xwedêyê Îsraêlê.
7 Ez bona Te bêhurmetîyê sebir dikim
û şerm r'ûyê min dinixême.
8 Biratîya xwer'a ez bûme xerîb,
kur'êd dîya xwer'a jî bûme nenas.

9 Xîreta hindava Mala Teda agir min xist*,
qarêd yêd qara li Te dikin têne serê min**.
10 Ez ku digirîm r'ojî digirim,
ev yek dibe qara serê min.
11 Dewsa k'inca min k'urx xwe kir,
wanr'a bûme mesela gotî.
12 Bûme gote-gota devê cime'tê
û stirana devê k'êfxweşa.

13 Lê ez hewara xwe Te datînim, ya Xudan.
Dema xwestina Te, Xwedêyo,
bi h'uba Xweye mezin, caba min bide,
min xilaz ke, bide xatirê aminîya Xwe.
14 Min ji h'er'îyê derxe
ku ez têda neçim,
ji peyk'etîyêd xwe
û avêd k'ûr xilaz bim.

---

* 69:9 Yûh'enna 2:17.

** 69:9 R'omayî 15:3.

15 Bira pêlêd ava min r'oda nebin
û bêbinî bira min danequrtînin,
qunî* jî devê xwe ser min negirin.

16 Min bibihê, Xudano, çimkî h'uba Te şîrin e,
anegorî dilşewatîya Xwe ser minda binihêr'e.
17 Berê Xwe ji xulamê Xwe neguhêze,
ez tengasîyêda me, min zû guhdar be.
18 Nêzîkî nefsa min be û wê xilaz ke,
e'ynatî neyarêd minr'a min azad ke.

19 Tu zanî bêhurmetbûna min,
şerm û r'obetbûna min,
h'emû peyk'etîyêd min Teva e'yan in.
20 Bêhurmetîyê dilê min şkênand,
kirime xweyê derd-kula,
hîvîya baristanîyê bûm, lê min nedît,
yek t'unebû dil bida ber min.
21 Dewsa xwarinê je'r didan min,
dewsa avê jî sirke didan*.

22 De bira sifira wan li ber wan bibe t'elek
xêrxwazêd wanr'a jî bibe t'or'.
23 Bira ava r'eş bê ser ç'e'vêd wan, nebînin
û pişta wan her t'im bike li ber wan*.
24 Xezeba Xwe li ser wanda bibarîne,
agirê hêrsa Te wan bigire.
25 Hêwargehêd wan wêran bin
û konêd wanda kesek nemîne*.

---

* 69:15 Xebera «qunî», ew ç'e'leke avêye bêbinî ye. Bi îbranî ev xeber navek bona «dîyarê mirîya» ye.
* 69:21 Metta 27:34, 48; Marqos 15:36; Lûqa 23:36; Yûh'enna 19:28-29.
* 69:22-23 R'omayî 11:9-10.
* 69:25 K'arêd Şandîya 1:20.

26 Çimkî Te k’îjanî xistîye, ew pey wî k’etine,
ser êşa birîndarê Te gilî-gotina dikin.
27 Neheqîyê ser neheqîya wanda zêde ke,
ku ew negihîjine heqîya Te.
28 Bira navêd wan ji k’itêba jîyînê r’esît bin
û t’evî r’asta neyêne nivîsarê*.

29 Lê belê ezî şkestîyî dilê kul im,
Xwedêyo, bira azadîya Te minr’a bibe piştovan.

30 Ezê pesinî navê Xwedê bistirêm,
Wî bilind kim, şikirîyê bidimê.
31 Ev yekê hê Xudan xweş bê,
ne ku ga û canegayê xweyîstrûyî xweyîsim.
32 T’engezarê* bibînin û şa bin.
Hey Xwedêh’eyra, dilê weyê jî serxweda bê.
33 Çimkî Xudan belengaza guhdar dibe
û pişt nade cime’ta Xweye hêsîrtîyêda.
34 Bira e’rd û e’zman pesinê Wî bidin,
be’r û h’emûyêd ku navda dimînin.
35 Çimkî Xwedê wê Sîyonê xilaz ke,
bajarêd Cihûda dîsa ava ke,
wê li wir bihêwirin
û wêda jî cî-war bin.
36 Zar’êd xulamêd Wî, wê li wir war bin
û h’izkirîyêd navê Wî wêda bimînin.

## Hewara ji dijmin xilazbûnê

**70** *Serwêrê sazbendar’a. Zebûra Dawide bona dîyarîya bîranînê.*

1 Ya Xwedê, bike ku min xilaz kî,
Xudan, zû alîk’arîya min bikî.

---

* [69:28] E’yantî 3:5; 13:8; 17:8.
* [69:32] «T’engezar» yê ku tengasîyêda dike zarîn.

2 Bira şermî bin, bibin r’obet,
ewêd ku e’mirê min diger’in,
bira bibin sosret, paşda bir’evin,
ewêd xirabîya min dixwazin.
3 Bira şermî bin û veger’in,
yêd ku hûyî min dikin.

4 H’emûyêd ku li Te diger’in,
bira pê Te eşq û şa bin
û yêd azadkirina Te h’iz dikin,
«Xwedê mezin e!» t’imê bêjin.
5 Lê ezî şkestîyî belengaz im,
Xwedêyo, Xwe zû minr’a bigihîne!
Tu yî piştovanê min û azadkirê min,
Ya Xudan, derengî nebe!

**Duayê hewargazîya kalemêr**

**71** 1 Xudano, min xwe daye bin sîya Te,
bira ez t’u car şermî nebim.
2 Weke heqîya Xwe min xwey ke û azad ke,
guh bide min û min xilaz ke.
3 Bibe qeyayê sit’argeha min,
kela zore azadîya min*,
çimkî Tu yî zinarê min û kela min.

4 Xwedê min! Min xilaz ke ji destê nep’ak,
ji destê neheq û zulmk’ar.
5 Tu yî gumana min, Xudan Xweyo,
ji zar’otîyêda gumana min Tu yî.
6 Ji bet’inêda min xwe spartîye Te,
ji zikmakîyêda Tu yî xweykirîyê min,
pesindayîna min t’imê bona Te ye.

---

* 71:3 Eva têk’sta ji welger’andina yûnanîye kevin tê, lê bi îbranî aha ye: «Bibe qeyayê sit’argeha min ku t’imê ez bir’evimê. Te e’mir kir ku min xilaz kî».

7 Bona geleka ez bûme e'cêbek,
lê Tu yî sit'argeha zor.
8 Devê min pesindayîna Teva t'ijî ye,
t'evayîya r'ojê jî şikirdarîya Teva.
9 Kaltîya minda Tu pişt nede min,
qudûmnekirinêda min ber'nede.
10 Çimkî neyar miqabilî min xeber didin,
ewêd ç'e'vê wan e'mirê min e, hevr'a dişêwirin
11 û dibêjin: «Xwedê dest ji wî k'işandîye,
pey k'evin û wî bigirin,
çimkî kes t'une ku wî xilaz ke».

12 Xwedêyo, ji min dûr nek'eve,
Xwedêyê min, zû Xwe minr'a bigihîne!
13 Bira şermî bin û biqelin şikîyatkirêd min,
bira r'obetîyê û bêhurmetîyêva binixumin,
ewêd ku xirabîya min dixwazin.
14 Lê belê gumana minê t'imê Tu bî,
ezê pesindarî û şikirdarîyê Te zêde kim.
15 Devê minê heqîya Te salix ke,
her r'oj xilazkirina Te,
h'esabê wan minva ne e'yan e.
16 Ezê bêm kirêd Xweyî Xudane mezin gilî kim,
wan kirinêd Teye heq, t'enê bîr bînim.

17 Xwedêyo! Ji zar'otîya minda Te ez hîn kirim
û h'eta niha k'eremetêd Te salix dikim.
18 Kaltî û r'û-r'emantîya minda jî
min nehêlî, Xwedêyo,
h'eta qewata Te nisilê mayînr'a bêjim
û qudreta Te h'emû hatîyar'a.

19 Xwedêyo, kirêd Teye heq h'eta e'zmên in,
Te gelek tiştêd mezin kirine.
Xwedêyo, k'î mîna Te ye?

20 Te ku ez gelek tengasî
û cefar'a derbaz kirim,
lê Tê dîsa bînê bidî ber min
û ji k'ûrayîya e'rdê dîsa min derxî.
21 Tê min bilind kî û baristan kî.

22 Ezê jî pesinê Te bidim Xwedêyo,
li ser çeng bona aminîya Te,
li ser çengê zîs bistirêm eşqî Te,
Pîrozê Îsraêlê!
23 Lêvê minê şa bin,
gava Ter'a bistirêm,
nefsa min jî, k'îjan ku Te xilaz kir.
24 Zimanê minê t'emamîya r'ojê
bona kirêd Teye heq bêje,
çimkî şermî bûn û bûne r'obet,
ewêd xirabîya min dixwestin.

**Duayê bona k'omeka p'adşê**

**72** *Zebûra Silêman.*
1 Xwedê, p'adşê hîn ke ku ç'e'v bide dîwana Te,
r'astîya Xwe jî kur'ê p'adşê.
2 Bira bi r'astîyê dîwana cime'ta Te bike,
belengazêd Te jî bi heqîyê.
3 Bira ç'îya xêr-berek'etîyê cime'têr'a bînin,
bira gir jî wanr'a r'astîyê.
4 Bira pişta heqîya belengazêd milet bigire,
bira zar'êd k'esîba xilaz ke
lê zulmk'ara hûrdexweşî ke.

5 Bira p'adşa bijî h'eta ku te'v p'enc dide,
usa jî h'eta ku hîv şewq dide*.

* 72:5 Eva têk'sta ji welger'andina yûnanîye kevin tê, lê têk'sta îbranî aha tê fe'mkirinê: «Wê ji Te bitirsin nisil bi nisil, h'eta te'v û hîv hebin».

6 Bira jorda bê mîna barana ser mêrga dirûyî,
mîna te'vîya ku e'rdê av dide.
7 Bira r'ojêd wîda r'astî gul de
û e'dilayî gelek be,
h'eta ku hîv betavebe.

8 Bira h'ukum ke ji be'rê h'eta be'rê
û ji ç'emê Firatê h'eta serê dinê.
9 Bira binelîyêd çolê ber wî dever'ûya bên
h'emû dijminêd wî t'ozê balêsin.
10 Bira p'adşayêd T'arşîşê û girava xerc bidinê,
p'adşêd Şibayê û Sivayê xelata bînin.
11 Bira h'emû p'adşa li ber wî ta bin,
h'emû milet jî xulamtîya wî bikin.

12 Çimkî ew yê k'esîb xilaz dike, ku gazî dikê
û yê belengaz ku k'omekdarê wî t'une ye.
13 Dilê wî li bêt'aqet û k'esîba dişewite
û nefsa belengaza xilaz dike.
14 Ji zêrandinê û zordarîyê wan xilaz dike
û xûna wan ber ç'e'vê wî xweyîqîmet e.

15 Bira ew xweş be
û zêr'ê Şibayê jêr'a bê dayîn,
bona wî her t'im dua bên kirin,
her r'oj bona wî xweşî bê xwestin.
16 Bira genimê welêt bibe bir'-be'r,
deremetêd wî serê ç'îya bih'ejin,
berê wê jî mîna darêd Lubnanê be
û bajarvan jî hev zêde bin,
mîna şînaîya e'rdê.
17 Bira navê wî h'eta-h'etayê bimîne,
h'eta ku te'v hebe, navê wî hebe.
Bira bi wî dua bê ser meriva,
h'emû milet xwezîya xwe wî bînin.

18 Şikir ji Xudan Xwedêr'a,
Xwedêyê Îsraêlê, ku t'enê Ew e k'eremetkir!
19 Her t'im pesinê navê Wîyî xweyîr'ûmet bidin.
Bira t'emamîya dinê r'ûmeta Wîva t'ijî be.
Amîn û amîn.

20 Duayêd Dawidê kur'ê Yêşa ser hevda hatin.

## K'itêba Sisîya (Zebûra 73-a h'eta 89-a)

### Serk'etina heqîya Xwedê

**73** *Zebûra Asaf.*
1 R'astî çiqasî qenc e Xwedê hindava Îsraêlda,
hindava yêd xweyê sitqê dilê r'astda.
2 Lê hindik mabû ez ji r'ê bik'etama
û mûk mabû gavêd min bişimitîyana,
3 çimkî min dilê xwe kir maşoqê xwer'azîya,
gava min dîna xwe da açixîya* nep'aka.

4 Çimkî ew nizanin êş çi ye h'eta mirinê,
ew li ser qewata xwe jî dimînin.
5 Ew mîna yêd mayîn tengasîyê nabînin
û t'evî merivêd mayîn naçerçirin.
6 Lema jî babaxî mîna t'oq stukura wanda ye
û zordarî mîna xişir xweva dikin.
7 Ji k'okbûnê ç'e'vêd wan dibijiqin,
fikirêd dilê wan bê sînor in.
8 Ew ser xelqê dik'enin,
mixenetî xeber didin
û jorda ew gefê dixwin,
9 ber bi e'zmên devê xwe vedikin,
bi zimanêd xwe t'emamîya e'rdê li hev dixin.

---

* 73:3 Awa gotî «xêr-xweşîyêda pêşdaçûyîn».

10 Lema jî cime'ta Wî xwe li wan digire,
bi devvekirî guhdarîya gotinêd wan dike*.
11 Dibêjin: «Xwedêyê çi bizanibe?
Gelo Yê Herî Jorin haş pê heye?»
12 Awa ev in ewêd nep'ak,
ewe t'imê bê derd-kul in
û hebûkê zêde dikin.
13 Ku usa ye badîhewa min xwe paqij xweyî kirîye
û destêd xwe pê bêsûcîyê şûştine.
14 Ez her r'oj lêdayî me
û her sibeh k'ewandî* me.

15 Heger min bigota:
«Ezê jî vî cûr'eyî xeber dim»,
hingê ezê bibûma xayînê cime'ta Te.
16 Hingê ez fikirîm ku vê yekê fe'm bikim,
lê ev yek ser min giran r'ûnişt,
17 h'eta ku k'etime pîrozgeha Xwedê,
hingê axirîya wana ez pê h'esîyam.

18 R'astî Te nep'ak kirine r'îya şimşat,
berjêrê kendêlda wan dişînî.
19 Çawa nişkêva ew t'ûr'-t'ûr'î bûn,
betavebûn û bi tirsê k'ok lê hatin.
20 Gava Tu r'abî, Tê ji wan zivêr* bî,
çawa yek ji xewna xirab h'işyar dibe.

21 Gava dilê min qilqilî
û navdilê min k'ir-k'irî,

---

* 73:10 Me'na têk'sta îbranî ne zelal e.

* 73:14 Du me'nêd «k'ewandin» hene, (me'na duda vê r'êzêda cîda ye): 1. Afûbûn, awa gotî k'ewandina guna. 2. Lêdan, awa gotî filankesê k'ewa bêvankesê da.

* 73:20 «Zivêr» bîzokî ku me'dê yekî naçe tiştekî.

22 hingê ez bûm yekî bêfe’m û nezan,
li ber Te bûme mîna h’eywan.
23 Lê ez t’imê t’evî Te me,
Tu destê minî r’astê digirî.
24 Tu pê şîretêd Xwe r’ê nîşanî min dikî
û paşê jî bi r’ûmetê min qebûl dikî.
25 K’î min heye li e’zmên?
Li ser e’rdê jî pêştirî Te
tiştekî din ez naxwazim.
26 Heger beden û dilê min bih’elin,
lê belê Xwedê ye sik’ana dilê min
û h’eta-h’etayê p’ara min.

27 R’astî ewêd Te dihêlin, unda dibin,
Tê k’oka wan h’emûya bînî,
yêd ku hindava Teda bêe’sil in.
28 Lê bona min qenc e, nêzîkî Xwedê bim,
min gumana xwe daye li ser Xudan Xwedê,
wekî h’emû kirinêd Te bikime dengî.

## Hewara xilazbûna ji dijminêd welat

# 74

*Maskîla Asaf.*
1 Xwedêyo, Te çima em lap ji ber Xwe avîtin?
Çima hêrsa Te r’abû li ser pezê ber Te?
2 Bîr bîne wê k’oma Xwe ku Te zûva qazinc kir,
ew xilaz kir, ku bibe qebîla p’ara Te.
Bîr bîne ç’îyayê Sîyonê ku lê dimînî.
3 Gavêd Xwe bavêje ber bi xirabeyêd her t’im,
wî Cîyê Pîrozî ku neyara wêran kir.

4 Pîrozxana Teda peyk’etîyêd Te dikin qar’în,
alêd xwe çawa nîşan wir danîn.
5 Al k’ifş dibe mîna yekî bivir hildayî
li ser darêd daristênr’a sekinî.
6 Û aha her nexşêd têda şkênandin,
hevr’a bi bivir û çakûç’a xişirandin.

7 Agir-alav avîtine Pîrozgeha Te,
h’er’imandin, kirin ax-xwelî Xana navê Te.
8 Dilê xweda gotin: «Em van h’emûya hevr’a wêran kin».
H’emû civatxanêd Xwedê welêtda şewitandin.

9 Em nîşanêd xwe nabînin,
îdî p’êxember t’unene,
kesek t’une t’evî me,
ku bizanibe h’eta k’engê evê aha be.
10 Xwedê, h’eta k’engê neyarê qerfa bikin?
Peyk’etîyê her t’im navê Te bêhurmet kin?
11 Çima Tu destê Xweyî r’astê paşda dik’işînî?
Çima ji p’aşila Xwe dernaxî wan unda nakî?

12 Lê belê qur’nada p’adşê min Xwedê ye,
ku azadîyê dike li r’ûyê e’rdêye!
13 Te bi qewata Xwe be’r qelaşt,
Te serê zîya avada h’incir’andin.
14 Te serêd Lêwyat’an p’elaxtin,
ew kire xurê r’e’wirêd çolê.
15 Te kanî û cew bijiqandin,
Te ç’emêd mezin miç’iqandin.
16 R’oj ya Te ye, şev ya Te ye,
Te hîv û r’o xuliqandîye.
17 Te h’emû sînorêd e’rdê danîn,
Te çêkirin zivistan û havîn.

18 Lê bîr bîne, Xudan, ku neyar qerfa dikin
û navê Te, miletê bêar bêhurmet dikin.
19 Tu canîya kewa Xwe nede r’e’wira,
civîna k’esîbêd Xwe qet bîr neke.

20 Hela dîna Xwe bide peymana Xwe,
cîyêd e’rdêye te’rî,
malêd zordarîyêva bûne t’ijî.

21 Bira yêd şkestî şermî nebin,
k'esîb û belengaz pesinê navê Te bidin.

22 R'abe Xwedêyo, ser heqîya Xwe be,
ewan k'ifirîya Tu bîr bîne,
ku yê bêaqil her r'oj li Te tîne.
23 Dengê neyarêd Xwe bîr neke,
qerebalixa yêd miqabilî Te
çiqas diçe zêde dibe.

**Dîwana Xwedêye hindava nep'akada**

**75** *Serwêrê sazbendar'a. Pê miqamê: «Wêran neke». Zebûra Asaf. Stiran.*

1 Em şikirîyê didine Te, Xwedêyo,
şikirîyê didine navê Teyî mezin,
k'eremetêd Te dikine dengî*.

2 Te got: «Gava bê we'de
Ezê bi r'astîyê dîwanê bikim.
3 Heger e'rd binelîyava bih'eje,
Ezê stûnêd wî qewîn-qedîm kim. (Sela)
4 Ez dibêjime k'ubara: ‹K'ubar nebin›
û nep'aka: ‹Strûya dernexin,
5 strûyê xwe ber bi jor bilind nekin,
qur'be-qur'be xeber nedin›».

6 Çimkî bilindbûn ne ji r'ohilatê ye,
ne ji r'oavayê ye, ne jî ji başûrê ye.
7 Lê belê h'akim Xwedê ye,
hineka nimiz dike, hineka bilind dike.

* 75:1 Eva têk'sta ji welger'andina yûnanîye kevin tê, lê hinek zane têk'sta îbranî aha fe'm dikin: «H'izûrîya Te nêzîk e, ew k'eremetêd Te salix dikin».

8 K'as destê Xudanda ye,
şerava hêrsê wêda t'evdayî dik'ele û jê dir'ije.
H'emû nep'akêd ser e'rdê wê nixalêva vexwin.

9 Lê ezê her t'im bikim dengî,
bistirêm eşqî Xwedêyê Aqûb.
10 H'emû strûyêd nep'aka ezê hûrdexweşî kim,
strûyêd r'asta wê bilind bin.

### Serk'etina Xwedê

**76** *Serwêrê sazbendar'a. Ser sazêd t'êlî. Zebûra Asaf. Stiran.*
1 Cihûstanêda Xwedê e'yan e,
Îsraêlêda navê Wî mezin e.
2 Xana Wî li Şelîmê* ye,
hêwargeha Wî li Sîyonê ye.
3 Li wir tîrêd agirî Ewî şkênandin,
mert'al, şûr û ç'ekêd şêr'. (Sela)

4 Tu şemal î, mezin î,
ji ç'îyayêd h'eta-h'etayê zêdetir î*.
5 Yêd dilada şidîyayî t'alan çûn,
xewa mirinêda hênijîn,
t'u mêrxasî qewat nekir bi destê xwe.
6 Ji hilatina Te, Xwedêyê Aqûb,
hesp sîyarîva xewr'a çûn.

7 Xof Tu yî, Tu!
K'ê turiş ke ber Te bisene
gava Tu hêrs k'evî?
8 Te ji e'zmên dîwan e'lam kir,
e'rd tirsîya û xwe ker' kir,

* 76:2 Awa gotî «Orşelîm».

* 76:4 Eva têk'sta ji welger'andina yûnanîye kevin tê, lê bi îbranî aha tê fe'mkirinê: «Tu şemal î û mezin î, ji ç'îyayê nêç'îrê têyî xarê».

9 gava Xwedê r'abû dîwanê bike,
ku her bindestî xilaz bike. (Sela)
10 Xezeba dîwana Teye ser meriva pesinê Te dide,
Tu t'emamîya hêrsa Xwe didî k'ifşê.

11 Ad-qirar kin, Xudan Xwedê xwer'a biqedînin
û h'emûyêd dora Wî bira p'êşk'êş Yê xofr'a bînin.
12 Ew r'uh'ê serwêra distîne,
xofa Wî ser h'emû p'adşêd e'rdê ye.

### K'omekdarîya Xwedêyê h'eyr û h'ujmek'ar

**77** *Yidût'ûnê serwêrê sazbendar'a. Zebûra Asaf.*
1 Dengê min berbi Xwedê ye,
ez dikim gazî,
dengê min berbi Xwedê ye,
wekî Ew dengê min bibihê.
2 Oxirmêd giranda ez li Xudan diger'im.
Destê min berbir'îkirî ye û sist nabe,
nefsa min naxwaze baristan be.
3 Xudan bîr tînim axîn dikim,
difikirim r'uh'ê xweda dikim ne'lîn. (Sela)

4 Te nehişt ç'e'vê min bêne ser hev,
dilê min kul e nikarim xeber dim.
5 R'ojêd bihurî ez bîr tînim
û wan salêd wî zemanî.
6 Şevê bîr tînim stirana xwe,
dilê xwer'a xeber didim
û k'ûr û dûr difikirim.
7 Gelo Xudan îdî pişt daye?
Ewê îdî xweşîyê neke?
8 Gelo h'uba Wî lap hatîye hildan?
Sozê Wî kêm bûye qur'ne-qur'ne?
9 Gelo Xwedê bîr kir dilovanî?
Gelo bi hêrsê r'e'ma Xwe da bir'înê? (Sela)

10 Lê belê dibêjim: «Eva kula min e,
Yê Herî Jorin piştminda kirîye».

11 Kirêd Xudan ezê bîr bînim,
belê k'eremetêd Teye berê bîr nakim.
12 Ezê h'emû kirêd Teda k'ûr bibim
û li ser k'arêd Te bifikirim.
13 Xwedêyo, r'îya Te pîroz e!
Mîna Xwedê, xwedêyê mezin k'î ye?
14 Tu yî Xwedêyê ku k'eremeta dikî,
qewata Xwe nava miletada Te da k'ifşê.
15 Te cime'ta Xwe xilaz kir,
pê zenda Xwe zar'êd Aqûb û Ûsiv. (Sela)

16 Ava Tu dîtin, Xwedêyo,
ava Tu dîtin, lerizîn
û r'icafê bêbinîya girt.
17 E'wra av r'ijandin,
e'zmana jî deng derxistin
û tîrêd Te derbaz bûn çûn.
18 Dengê qir'ç'înîyê nav bobelîskê,
birqvedana Te kir dinya r'onî,
e'rdê kire xirmîn û lerizî.
19 R'îya Te be'rêda bû,
şiver'îyêd Te avêd mezinda,
lê p'êgeha Te nehate k'ifşê.
20 Mîna kerê pêz r'êberîya cime'ta Xwe kir,
bi destê Mûsa û Harûn.

## Çend dersêd ji t'arîxa Îsraêlê

**78** *Maskîla Asaf.*
1 Gelî cime'ta min, guh bidine hînkirina min,
li ber xeberêd devê min guhê xwe ta kin.
2 Bi mesela ezê devê xwe vekim
û sir'êd berê ezê e'yan kim*,
3 k'îjan ku me bihîstin û pê h'esîyan
û kal-bavêd me mer'a gotin.
4 Em gerekê ji zar'êd wan veneşêrin
û nisilê mayînr'a gerekê bêjin,
kirêd Xudane xweyîr'ûmet, qudreta Wî
û k'eremetêd ku Wî kirine.

5 Ewî qanûn nava Aqûbda qedîm kirin
û hînkirin danî nava Îsraêl,
e'mirî kal-bavêd me kir,
ku zar'êd xwe ew hîn kin,
6 wekî nisilê mayîn
û zar'êd ku bibin, bizanibin,
zar'êd xwer'a ew bêjin,
7 ku gumana xwe bidine ser Xwedê,
kirêd Xwedê bîr nekin
û t'emîyêd Wî ew xwey kin.
8 Lê bira r'îya kal-bavada ew neçin
miletê serh'işk û miqabil ew nebin,
ku dilê wan r'êda ne şidîyayî be
û r'uh'ê wan Xwedêr'a amin nîbe.

9 Ewledêd Efrayîm sîlih'kirî* bûn,
mîna kevanêd tîre li ser hazir,
lê r'oja şêr' ew paşda veger'îyan.

---

* 78:2 Metta 13:35.
* 78:9 Awa gotî «ç'ekkirî».

10 Vana peymana Xwedê t’er’iband
û anegorî hînkirina Wî derbaz nekirin,
11 k’eremet û kirinêd Wî bîr kirin
k’îjan ku Wî nîşanî wan kiribûn,
12 Ber ç’e’vê kal-bavêd wan e’cêb kirin,
li deşta Zoyanê welatê Misirêda.
13 Be’r qelaşt dan derbazkirinê,
av mîna lodê dan sekinandinê.
14 R’ojê pê e’wr r’êberîya wan kir
û t’emamîya şevê pê r’onayîya êgir.
15 Qeya qelaştin nava ber’îyêda,
av dane vexwarinê, çawa bêbinîyêda.
16 Cew ji qeyê derxistin,
av jî mîna ç’ema k’işîyan.

17 Lê wana hê li ber Wî gune kirin,
ber’îyêda miqabilî Yê Herî Jorin bûn,
18 dilê xweda Xwedê cêr’ibandin,
xwarina dilê xwe wan xwestin.
19 Devê xwe ber Xwedê vekirin û gotin:
«Gelo Xwedê dikare ber’îyêda jî sifirê dayne?
20 R’ast Wî qeyê xist, avê bilq da, cew her’ikî.
Lê gelo nên jî dikare bide?
Gelo goşt jî hazir dike boy cime’ta Xwe?»

21 Awa gava Xudan bihîst, Ew hêrs k’et,
agir barî ser Aqûbda,
qilqilî ser Îsraêlda.
22 Çimkî Xwedê bawer nekirin
û gumana xwe nedan ser azadîya Wî.
23 Ewî jorda e’mir li e’wra kir,
derîyêd e’zmên vekirin,
24 bona xurek mana ser wanda barand
nanê e’zmên wanr’a şand*.

* 78:24 Yûh’enna 6:31.

25 Mêriv nanê milyak'eta xwar,
xurekê weke t'êrbûna wan şand.
26 E'zmênda bayê r'ohilatê r'akir,
bi qudreta Xwe bayê başûrê anî,
27 mîna t'ozê goşt ser wanda barand,
mîna qûma be'rê jî h'eywanêd xweyîp'er',
28 nava zoma wan barand
û dora kona dane danîn.
29 Wana xwar û t'êr bûn,
Ewî xwestina wan da wan.
30 Hê kêmasîya xwestinêd xwe nedîtibûn,
hê xwarina wan devê wanda bû,
31 hêrsa Xwedê li ser wan r'abû,
Ewî mêrxasêd wan kuştin
û cahilêd Îsraêlê e'rdê xistin.

32 Pey haqas tiştr'a dîsa gune kirin
û bawerîya xwe k'eremetêd Wî neanîn.
33 Awa pê boş-betalîyê r'ojêd wan xilaz kirin
û salêd wan jî pê saw û tirsê.
34 Gava ew dikuştin, li Wî diger'îyan,
xwe mukur' dihatin
û destxweda xwe dîsa davîtine Xwedê.
35 Dik'ete bîra wan ku Xwedê Qeyayê wan e
û Xwedêyê Herî Jorin xilazkirê wan e.
36 Lê bi devê xwe h'ilek'arî dikirin
û bi zimanê xwe Wîr'a derew dikirin.
37 Dilê wan li ber Wî r'ast nîbû
û peymana Wîda amin nîbûn.
38 Lê Ew ku r'e'm e, guneyêd wana dibaxşîne
û qir'a wan Ew nayîne.
Hêrsêda gelek cara Xwe zeft dikir
û lap bîna Xwe teng nedikir.
39 Çimkî bîr danî ku ew xûn-goşt in,
mîna bayê tê derbaz dibe paşda nayê.

40 Çiqasî ber'îyêda ber Wî r'abûn
û çolêda hêrsa Wî r'akirin!
41 Dîsa Xwedê dicêr'ibandin
û Pîrozê Îsraêlê bînteng dikirin.
42 Destê Wî bîr neanîn,
ew r'oja ku ji dijmin xilaz kirin,
43 gava nîşanêd Xwe Misirêda kirin,
deşta Zoyanda ew k'eremetêd Xwe.
44 Ç'emêd wan Wî kire xûn,
usa jî cewêd wan ku nikaribin ew vexwin.
45 Mêş-mor şandin Ewî ser wan, ku wan bixwin,
usa jî beq ku wan p'ûç' kin.
46 Deremeta wan da zerikê*
û k'eda wan da kulîyê**,
47 tirîyêd wan da ber teyrokê
hêjîr jî dane ber bûzê,
48 h'eywanêd wan dane teyrokê
kerîyêd wan dane birûskê.
49 Xezeba Xwe anî serê wan,
bîntengî, hêrs, da tengasî
û qasidêd qet'ilê şandine ser wan.
50 Ewî r'îya hêrsa Xwe vekir,
nefsa wan ji mirinê xwey nekir,
lê e'mirê wan da nexweşîya h'al*.
51 Her nixurî Misirêda kuşt,
berê bedenêyî pêş, konêd Hamda*.

52 Hingê cime'ta Xwe mîna pêz derxist
û mîna kerê pêz ber'îyêda ajot.
53 Ew bê qezî birin, ew netirsîyan,
lê dijminêd wan be'rê nixamtin.

* 78:46 «Zerik» kurmê ku şînayê dêris dike.
** 78:46 Awa gotî «hespê gîhê, sîyarê bûkê».
* 78:50 «Nexweşîya h'al» nexweşîke ji hev hildanê ye û ç'are pê nabe.
* 78:51 «Ham» kur'ekî Nuh bû. Binihêr'e: Destpêbûn 10:6.

54 Ew birin welatê Xweyî pîroz,
wî ç’îyayê ku destê Wîyî r’astê pêk anîbû.
55 Berî miletê pêşîya wan da,
e’rdê wan çawa milk’ wanr’a p’arevekir
û qebîlêd Îsraêlê konêd wanda cî-war kir.

56 Lê wana Xwedê cêr’ibandin
miqabilî Yê Herî Jorin r’abûn,
qanûnêd Wî xweyî nekirin.
57 Mîna kal-bavêd xwe veger’îyan û xalifîn,
mîna kevanêd qelp bêamin derk’etin.
58 Dilê Wî pê ocaxêd xwe qilqilandin,
pê p’ûtêd xwe hê alav dane xezeba Wî.
59 Gava Xwedê bihîst hêrs k’et
û lap pişt da Îsraêlê.
60 Dest ji p’aristgeha Şîloyê k’işand,
ji wî Konê nava merivada dima.
61 Qudreta Xwe hêsîr da
û r’ûmeta Xwe da destê dijmin.
62 Cime’ta Xwe da devê şûr
û ser warê Xwe hêrs k’et.
63 Xortêd wan êgir xwarin
û qîzêd wan jî bê bext man.
64 K’ahînêd wan pê şûr k’etin
û jinebîyêd wan negirîyan.

65 Lê Xudan h’işyar bû çawa ji xewê,
mîna mêrxasê k’êfxweş ser h’işê xweda hatî,
66 r’ev dijmin xist
qara h’eta-h’etayê anî serê wan.

67 Konê Ûsiv t’exsîr kir
û qebîla Efrayîm begem nekir.
68 Lê qebîla Cihûda begem kir
û ç’îyayê Sîyonê ku Wî h’iz kir.

69 Pîrozgeha Xwe mîna e’zmên bilind çêkir,
çawa e’rdê ku h’eta-h’etayê h’îm kir.
70 Xulamê Xwe Dawid bijart,
ew ji axilêd pêz derxist anî,
71 ew ji ber mîya girt anî,
wekî şivantîyê cime’ta Wî Aqûb,
warê Wî Îsraêl bike.
72 Ewî jî bi saxîya dilê xwe şivantîya wan kir,
bi deste’melîya xwe r’êberîya wan kir.

## Lûrîna bona h’alê Orşelîmê

# 79

*Zebûra Asaf.*
1 Xwedê! P’ûtp’arist k’etine cî-warê Te,
h’er’imandin P’aristgeha Teye pîroz,
Orşelîm kirine xirabe.
2 Cinyazêd xulamêd Te kirine xurekê teyredêd e’zmên,
qalibêd aminêd Te dane r’e’wirêd e’rdê.
3 Dora Orşelîmê xûna wan r’êtin mîna avê
û kes t’une bû ku defin kirana wê gavê.
4 Em r’ûr’eş bûn ber cînarêd xwe,
r’obet û pêk’enî li ber dor-berêd xwe.

5 H’eta k’engê Xudano, Tê t’imê hêrs k’evî?
Xezeba Teyê mîna agir alav bide?
6 Hêrsê li ser wan miletada bir’êje,
yêd ku Te nas nakin
û li ser wan p’adşatîya,
k’îjan ku gazî navê Te nakin.
7 Çimkî wana Aqûb xwarin,
hêwargeha Wî kirine ax-xwelî.

8 Neheqîyêd pêşîyêd me neke bîra Xwe,
bira r’e’ma Te zûtirekê bigihîje me,
çimkî em gelekî me’rim bûne.

9 Bona xatirê navê Xwe alî me bike, Xwedêyê azadîya me.
Bona r’ûmeta navê Xwe me xilaz ke û guneyêd me
afû ke.
10 Çima p’ûtp’arist bêjin: «K’anê Xwedêyê wan?»
Bira h’eyfa xûna xulamêd Teye r’ijîyayî,
em bibînin ber ç’e’vê xwe, nav p’ûtp’aristada.

11 Bira zarînîya wan hêsîra bigihîje Te,
bi qewata Xweye zor,
yêd mirinêr’a dayî xilaz ke.
12 H’eft car li p’aşila cînarêd me veger’îne
wê bêhurmetîya wan,
bi k’îjanê Tu bêqedir kirin, Ya Xudan.
13 Lê belê em cime’ta Te û pezê mêrga Te,
emê h’eta-h’etayê şikirîyê bidine Te
û qur’ne-qur’ne r’ûmeta Te salix kin bêjin.

## Duayê bona xilazkirina Îsraêlê

# 80

*Serwêrê sazbendar’a. Pê miqamê: «Sosina Peymanê». Zebûra Asaf.*

1 Şivanê Îsraêlê, guh bide,
Tu mîna kerê pêz r’êberîya Ûsiv dikî!
Yê ser xêrûba r’ûniştî, Tu gul didî,
2 bona Efrayîm, Benyamîn û Minaşe.
Qewata Xwe Tu k’ifş ke,
Xwe mer’a bigihîne me xilaz ke.

3 Xwedêyo, çerxa me dîsa r’ast ke,
sifetê Xwe gul de, emê bijîn.

4 Xudan Xwedêyê Ordîya,
h’eta k’engê Tê hêrs k’evî
li ser duayê cime’ta Xwe?
5 Nanê hêsira li wan didî xwarinê,
bê çap hêsira wan didî vexwarinê.

6 Te em kirine benûştê devê cînara
û pêk'enîyêd nava neyara.

7 Xwedêyê Ordîya! Çerxa me r'ast ke,
sifetê Xwe gul de, emê bijîn.

8 K'oleke tirîyê Te ji Misirê cîguhastî kir,
milet r'akirin, ew k'ol daç'ikand.
9 Te bona wê cî hazir kir,
r'awê wê şidand, ewê e'rd t'ijî kir.
10 Ç'îya pê sîya wê hatine nixamtinê,
ç'iqilêd wê darêd erzêye bilind jî.
11 Ç'iqilêd wê dirêj kir h'eta be'rê
û şîvêd wê h'eta ç'emê Firatê.
12 Te çima xirab kir sûra wê,
ku her r'êwî diçine tirîyê wê,
13 berazêd daristên xirab dikin,
h'eywanêd çolê wan dixwin.

14 Xwedêyê Ordîya, li me veger'e!
Dîna Xwe bidê û bibîne,
vê k'ola tirîyê Tu xwey ke,
15 Te bi destê Xweyî r'astê daç'ikand
şîvê ku Te bona Xwe qewîn-qedîm kir.
16 Agir pêk'etîye hatîye bir'înê,
ji dest wê hilatina Te unda dibe.
17 Bira destê Te ser mêrê milê Teyî r'astê be,
ser wî merivê ku Te bona Xwe qewat kir.
18 Emê îdî ji Te dûr nek'evin,
me sax ke û emê gazî navê Te kin.

19 Xudan, Xwedêyê Ordîya!
Çerxa me dîsa r'ast ke,
sifetê Xwe gul de, emê bijîn!

## Stirana eşqî cejina navê Xwedê

**81** *Serwêrê sazbendar'a. Ser Gît'ît'ê. Zebûra Asaf.*
1 Bistirên eşqî Xwedê, ku qewata me ye,
bi şabûnê Xwedêyê Aqûb bikin gazî.
2 Miqam xin û defê xin,
çengê dengxweş t'evî çengê zîs.
3 Yekr'ojîya Hîvêda bor'îyê xin,
usa jî dema hîv t'emambûnê,
li r'oja wê cejina meda*.
4 Çimkî ev yek qanûn e bona Îsraêl,
e'mirê Xwedêyê Aqûb e.
5 Ewî ev yek bona Ûsiv kire qirar,
gava ew ji e'rdê Misirê derk'et.

Dengek min bihîst ku nas nedikir:
6 «Min milê te ji bin bar derxist
û destê te ji sepetê dane berdan.
7 Tengasîyêda te gazî Min kir
û Min tu xilaz kirî,
ji bin qir'ç'înîya e'wra Min caba te da,
devê avêd Mêrîbahê tu cêr'ibandî. (Sela)
8 Bibihê cime'ta Min, Ez ter'a dibêjim,
Îsraêl, xwezî tu guhdarîya Min bikî!
9 Gerekê xwedêyê xerîb nava teda t'une be
û xwedêyê xerîb neh'ebînî.
10 Ez im Xudan Xwedêyê te,
ku tu ji welatê Misirê derxistî.
Devê xwe r'ind veke Ezê wî dagirim!

11 Lê cime'ta Min dengê Min nebihîst
û Îsraêlê gur'a Min nekir.

---

* 81:3 Cejina Yekr'ojîya Hîvê, destpêbûna mehada dihate kirinê. Lê Cejina H'olikçêkirinê 15-ê meh 7-a dihata derbazkirinê, awa gotî gava hîv t'emam dibû. Binihêr'e: Jimar 10:10; 29:1.

12 Min jî ew dane qelpê dilê wan,
ku ew bi fikirêd nav xweda bijîn.
13 Heger cime'ta Min guhdarîya Min bike
û Îsraêl r'îya Minda her'e,
14 hingê Ezê dijminêd wan zû ta kim
û destê Xwe hildime ser zordarêd wan.
15 Peyk'etîyêd Min wê li ber Min tabin
û ser belayê h'eta-h'etayê vebin.
16 Lê Ezê genimê k'ir'ik te bidime xwarinê
û hingivê ji qeyê te bidime t'êrkirinê».

## Xwedêyê ser h'akima, tayê k'etîya

# 82

*Zebûra Asaf.*
1 Xwedê dîwangeha xwedêyada* sekinî,
ser îşê xwedêyada nihêr'î:
2 «H'eta k'engê hûnê bi ner'astîyê dîwanê bikin
û pişta nep'aka bigirin? (Sela)
3 Heqîyê li belengaz û sêwîya bikin,
hindava feqîr û k'esîbda ser r'astîyê bin.
4 K'esîb û belengaza azad kin,
ji destê nep'aka xilaz kin».

5 Lê ew nizanin û fe'm nakin,
şûna r'eşva diçin
û h'emû h'îmêd dinê dih'ejin.

6 Min got: «Hûn xwedê ne
û h'emû jî ewledêd Yê Herî Jorin in*,
7 lê belê mîna merîya hûnê bimirin,
mîna serwêrekî hûnê bik'evin».

* 82:1 Gelek zane difikirin, ku eva r'êza diçe ser h'akim û r'êberêd Îsraêlê, k'îjan ku r'ast dîwanê nakin. Usa jî binihêr'e: Eyûb 1:6; 22.
* 82:6 Yûh'enna 10:34.

8 R'abe Xwedêyo, dîwana dinê bike,
çimkî h'emû milet jî warê Te ne.

## Duayê ku neyar bide der

**83** *Stiran. Zebûra Asaf.*
1 Xwedêyo, Xwe ker' neke,
bêxem nebe, bêdeng nemîne. Xwedêyo!
2 Va ye neyarêd Te dikin qar'în,
peyk'etîyêd Te serî hiltînin.
3 Himberî cime'ta Te h'ilek'arîyê dikin,
li ser xweykirîyêd Te şêwira derdixin.
4 Dibêjin: «Werin em van dinê hilînin,
ku milet îdî nemîne,
navê Îsraêl neyê bîranîn».

5 Bi dilekî şêwira xwe kirin,
miqabilî Te ya xwe kirin yek.
6 Konêd Edom û îsmayîlîya,
Mowab û hacerîya,
7 Gebal, Amon, Amalêk
û filistînîya t'evî binelîyêd Sûrê,
8 Aşûr jî gihîşte wan,
çûn pişta kur'êd Lût*. (Sela)

9 Te hinda newala Qîşonê çi anî serê midyanîya*,
Sîsira û Yavîn**, usa jî bîne serê van,
10 k'îjan ku E'yn-Dorêda gever bûn çûn,
bûne p'eynê bona e'rdê.

---

* 83:8 Ev h'emû nav be'sa wan mileta dikin, k'îjan ku nêzîkî cime'ta Îsraêlê diman. Zar'êd Lût be'sa cime'ta mowabî û amonî dike.
* 83:9 R'êber 7:25.
** 83:9 R'êber 4:6-24.

11 Serwêrêd van bike r’oja Orêv û Zêv*,
axa-begêd van r’oja Zebah’ û Salmûna**,
12 k’îjana got: «Cî-warêd Xwedê
em zeftî xwe kin».

13 Xwedêyê min, vana bike mîna t’oza bobelîskê
û mîna kaya li ber bê.
14 Çawa agir daristên dik’eve
û çawa alav ç’îya dik’izirîne,
15 aha jî Tu pey wan k’eve pê firtona Xwe,
wan bibizdîne pê bagera Xwe.
16 R’ûyê wana Tu r’ûr’eş ke,
ku ew Te biger’in, Xudano!
17 Bira t’imê şermîyê û sawêda bin,
bira bi r’ezîlî k’ok lê bên.
18 Bira bizanibin t’enê Tu yî,
ku navê Te Xudan e,
Yê Herî Jorin î,
li ser t’emamîya e’rdê yî.

## H’eyra Xana Xwedêda

**84** *Serwêrê sazbendar’a. Ser Gît’ît’ê. Zebûra malbeta Qorax.*

1 Çiqasî xweş in cî-warê Te, Xudanê Ordîya!
2 Nefsa min h’eyr û demana h’ewşêd Xudanda ye,
dil û bedena min pê Xwedêyê zêndî eşq û şa ye.

3 Ç’ivîkê jî mal dît,
dûvmeqeskê jî hêlûn danî,
ku cûcûkêd xwe wir dayne,
cem gorîgehêd Te, Xudanê Ordîya,
P’adşayê min û Xwedêyê min.
4 Xwezî li wan ku Mala Teda dimînin,
ew her t’im pesinê Te didin. (Sela)

---

* 83:11 R’êber 7:24-25.

** 83:11 R’êber 8:21.

5 Xwezî li wan meriva, qewata k'îjana ji Te ye
û h'eyra r'îya h'eca ç'îyayê Sîyonê ye.
6 Gava newala Bak'ayêye* zihar'a derbaz dibin,
ew der dibe cîyê kanîya,
ç'e'l-ç'ûl avava t'ijî dibin.
7 Evana çiqas diçin hê qewat dibin,
Sîyonêda li ber Xwedê k'ifş dibin.

8 Xudan Xwedêyê Ordîya, duayê min bibihê,
guh bide, ya Xwedêyê Aqûb! (Sela)
9 Xwedê, berê Xwe bide mert'alê me
û r'ûyê k'ifşkirîyê Xwe binihêr'e.

10 R'ast r'ojeke h'ewşa Teda,
ji h'ezar r'ojêd dereke çêtir e.
Qenc e ber şêmîka Xana Xwedêyê xwe bim,
ne ku malêd nep'akada ez bijîm.
11 Çimkî Xudan Xwedê te'v û mert'al e.
Xudan k'erem û r'ûmetê dide,
Ew t'u qencîyê ji ser wan nabir'e,
k'îjan ku dijîn bêlek'e.
12 Ya Xudanê Ordîya, xwezî li wî merivî,
ku gumana wî li ser Te ye.

## Duayê ku Xwedê berê Xwe dîsa bide Îsraêlê

**85** *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra malbeta Qorax.*
1 Ya Xudan, Te welatê Xwe zûva begem kiribû,
Aqûb ji sirgûnîyê veger'andibû.
2 Neheqîya miletê Xwe baxşandibû
û h'emû guneyêd wan afû kiribû. (Sela)
3 Te h'emû xezeba Xwe dabû hildanê,
ji hêrsa Xweye zor paşda sekinîbûyî.

---

* 84:6 «Bak'a» bi îbranî cûr'e-cûr'e tê fe'mkirinê: «girî», «cîyê dêm», usa jî navê cûr'ekî dara ye.

4 De niha dîsa çerxa me r’ast ke, Xwedêyê azadîya me,
ji wê hêrsa Xweye ser me, paşda bisekine.
5 Gelo Tê h’eta-h’etayê hêrsa Xwe li me r’akî
û Tê k’înê qur’ne-qur’ne mer’a bajoyî?
6 Gelo Tê dîsa jîyana nû nedî me,
ku cime’ta Te pê Te şa be?
7 Tu h’uba amin nîşanî me ke,
Xudano, azadîya Xwe bide me.

8 Hela ez bibihêm Xudan Xwedê çi dibêje.
Ewê xêr-xweşîyê bêje cime’t û aminêd Xwe,
lê bira îdî nek’evine nava bêaqilîyê.
9 R’ast azadîya Wî nêzîkî wan e
k’îjan ku ji Wî ditirsin,
ku e’rd r’ûmeta Wîva t’ijî be.

10 H’ub û aminîyê r’astî hev bên,
r’astî û e’dilayîyê li hev r’amûsin.
11 Aminîyê ji e’rdê jêr derk’eve
û r’astîyê ji e’zmên jorda binihêr’e.
12 Xudanê qencîyê bike
û e’rdê meyê deremeta xwe bide.
13 R’astî wê her’e pêşîya Wî
û r’ê r’ast ke bona Wî.

## Duayê hewargazîyê

# 86

*Duayê Dawid.*
1 Xudano, guh bide û caba min bide,
çimkî ez me’rim û belengaz im.
2 E’mirê min xwey ke, çimkî ezî amin im,
xulamê Xwe xilaz ke Xudano, ku Teda guman im.
3 Min were r’e’mê Xweyo,
ku t’emamîya r’ojê gazî Te dikim.
4 Dilê xulamê Xwe şa ke, Xudano,
ku gumana min li ser Te ye.

5 Çimkî Tu Xudano, qenc û afû kir î,
hindava h’emûyada xweyê h’uba mezin î,
k’îjan ku gazî Te dikin.
6 Bibihê Xudano, duayê min
û dîna Xwe bide lavayêd min.
7 Oxirmê giranda, Te dikim gazî,
Tu bona min dibî hewarî.

8 Xudano, nava xwedêyada yekî mîna Te t’une,
ne jî mîna kirêd Te, kir hene.
9 H’emû milet Te xuliqandin,
ewê bên ber Te ta bin, Xudano
û r’ûmetê bidine navê Te*.
10 Çimkî Tu mezin î k’eremetkir î,
Tu yî t’enê Xwedê.

11 Xudan r’îya Xwe min hîn ke,
ku ez r’astîya Teda her’im,
bike ku dilê min ji navê Te xof bike.
12 Bi t’emamîya dilê xwe ezê şikirîyê bidime Te,
Xudan Xwedêyê min
û h’eta-h’etayê r’ûmetê bidime navê Te.
13 Çimkî h’uba Te mezin e hindava minda,
Te ez xilaz kirim ji k’ûraya dîyarê mirîya.

14 Xudano, k’ubar-babax r’abûne ber min,
k’omeke zordara pey min k’etîye
û Te nadine li ber ç’e’vêd xwe.
15 Lê Tu Xudan, Xwedêyê r’e’mê û dilşewatîyê,
xweyê sebir-sik’anê, h’ub û aminîyêda xinêyo.
16 Dîna Xwe bide min û min were r’e’mê,
qewata Xwe bide qûlê Xwe,
xilaz ke kur’ê carîya Xwe.

* 86:9 E’yantî 15:4.

17 Nîşaneke qencîyê bona min bike,
ku peyk'etî bibînin û şermî bin,
çimkî Tu hatî Xudan hewara min
û ez baristan kirim.

### R'ûmeta Orşelîmê

**87** *Stiran û zebûra malbeta Qorax.*
1 H'îmê bajêr li ser ç'îyayê pîroz hatîye avîtinê,
2 Xudan dergehêd Sîyonê
ji tamêd Aqûbe mayîn zêdetir h'iz dike.
3 Tiştêd r'ûmetî bona te têne gotinê,
hey bajarê Xwedê. (Sela)

4 Ezê yêd ku Min nas dikin, nav kim bêjim:
Heye Misir* û Babêlon,
usa jî Filistîn, Sûr, Etyûpa:
«Evanayê binelîyêd wir bên h'esab»**.

5 Bona Sîyonê jî wê bêjin:
«Filankes-bêvankes nava wêda bûyîne
û Yê Herî Jorin wê Xwexa wî qewîn ke».
6 Xudanê dema navnivîsara mileta wê binivîse:
«Eva li wir bûyîye». (Sela)

7 Dengbêj û r'eqaskerê bêjin:
«H'emû ç'e'vkanîyêd me nava teda ne».

### Duayê hewarê

**88** *Stiran. Zebûra malbeta Qorax. Serwêrê sazbendar'a. Ser Mah'alat Lêhanotê. Maskîla Hêymanê ezrah'î.*
1 Xudan, Xwedêyê azadîya min,
ez şev û r'oj li ber Te dizarim.

---

* 87:4 Bi îbranî xeber bi xeber «R'ahab» e, ku navekî Misirê ye.
** 87:4 Bi îbranî xeber bi xeber aha ye: «Eva li wir dinê k'etîye».

2 Bira duayê min bigihîje Te,
guhê Xwe bide ser gazîya min.

3 Çimkî nefsa min kul-derdava t'ijî ye,
e'mirê min gihîşte li ber devê qebirê.
4 Ez t'evî yêd dik'evine gor'ê hatime h'esabê,
bûme mîna merîyê bêt'aqet.
5 Nava mirîyada avîtî me,
çawa kuştîyêd t'irbêda danî,
ku îdî Tu wan bîr naynî
û dest ji wan dik'işînî.
6 Te ez avîtime ç'e'la here k'ûr,
te'rîstanîyê û bêbinîyê.
7 Hêrsa Te li ser min giran e,
pê h'emû pêlêd Xwe min didî cefê. (Sela)

8 Tu min ji ber ç'e'vê nasa davêjî,
Te ez li ber wan kirime k'irêt,
ezî girtî me nikarim derêm.
9 Ç'e'vê min şêlû bûne ji me'rim-belengazîyê,
t'emamîya r'ojê ez gazî Te dikim, ya Xudan,
ez destêd xwe berbir'î Te dikim.

10 Gelo Tu k'eremetê ser mirîya dikî?
Gelo ji gor'ê r'adibin didine Te şikirî? (Sela)
11 Gelo t'irbêda h'uba Te tê gotin,
yan r'astîya Te warê dêrisda?
12 Gelo wê te'rîstanîyêda k'eremetêd Teyê bêne naskirin,
yan xilazkirina Te welatê bîrkirinêda?

13 Lê belê Xudano, ez hewara xwe Te datînim,
duayê min berbanga k'ûrda digihîje Te.
14 Xudan Tu çima dest ji min dik'işînî?
Û berê Xwe ji min diguhêzî?
15 Ez belengaz im û zar'otîyêda li ber hêşîya mirinê me,
sawa Te dik'işînim û xwe unda dikim.

16 Hêrsa Te min dajo dibe,
xezeba Te min wêran dike,
17 mîna avê t’emamîya r’ojê dora min digirin,
hevr’a t’evayî min dip’êç’in.
18 Te ez ji ber ç’e’vê h’izkirî û xêrxwaza avîtim,
te’rîstanî jî hogirê min ne.

**Stiraneke zemanê milet t’evhevbûnê**

**89** *Maskîla Êt’anê ezrah’î.*
1 H’uba Te Xudan, ezê bistirêm h’eta-h’etayê,
aminîya Te bi devê xwe salix kim qur’ne-qur’ne.
2 Ez e’lam dikim, ku h’uba Te t’imê qedîmî ye,
e’zmênda aminîya Te h’îmgirtî ye.

3 Te got: «Min t’evî bijartîyê Xwe peyman girêda
û xulamê Xwe Dawidr’a sond xwar:
4 ‹Zur’eta te Ezê h’eta-h’etayê h’îmgirtî kim
û qur’ne-qur’ne t’extê te qedîm kim›*». (Sela)

5 Ya Xudan, e’zman pesinê k’eremetêd Te dide,
civîna milyak’eta jî pesinê aminîya Te.
6 Çimkî e’zmênda k’î heye ku weke Xudan be?
Û nava mêr-milyak’etada* bibe mîna Xudan?
7 Xwedê gelekî xof e nav civîna milyak’etada
û sawa Wî ser yêd dor-berê Wî ne.

8 Ya Xudan, Xwedêyê Ordîya,
k’î mîna Te xweyîqudret e?
Aminîya Te dora Te girtîye.
9 Tu h’ukumî ser hêrsa be’rê dikî,
gava pêlêd wê r’adibin, Tu wan diseqir’înî.

---

* 89:4 K’arêd Şandîya 2:30.
* 89:6 «Mêr-milyak’et» bi îbranî xeber bi xeber «ewledêd xwedêya», ku li vir tê fe’mkirin milyak’et û heyînêd e’zmanaye r’uh’anî.

10 Te R’ahab* hêra mîna beret’a,
pê zenda Xweye qewat dijmin bela kir.
11 E’zman yê Te ye, e’rd yê Te ye.
Te h’îmê dinîya xêr-berek’etêva danîye.
12 Bakur û başûr Te xuliqandin,
Ç’îyayêd T’abor û Hermonê bi navê Te şa dibin.
13 Zenda Te zor e, destê Te qewat e,
destê Teyî r’astê bilind e!
14 R’astî û heqî ew bingehêd t’extê Te ne,
h’ub û aminî pêşîya Te diçin.

15 Xwezî li wê cime’tê,
ku zane deng hilde cejinêr’a.
Xudano, ew bi r’onaya r’ûyê Te dimeşin.
16 T’emamîya r’ojê bi navê Te şa dibin
û bi azadîya Te bilind dibin.
17 Çimkî Tu r’ûmeta qewata me yî
û bi xweşîya Xwe strûyê me bilind dikî.
18 Mert’ala me ji Xudan e,
Pîrozê Îsraêlê, P’adşayê me.

**Xwedê soz dide Dawid**

19 Hingê dîtinokêda, Te aminêd Xwer’a got:
«Min alî mêrxasekî kir,
ji nav cime’tê yek bijart
û ew danî hêlana jorin.
20 Min Xulamê Xwe Dawid dît,
r’ûnê Xweyî pîrozva ew r’ûn kir*.
21 Destê Minê t’evî wî be,
Zenda Minê wî qewat ke.
22 Dijminê zorê nede wî,
nep’ak wê wî nimiz neke.

---

* 89:10 «R’ahab» navekî h’ûtekî be’rê ye, ku nîşana k’ubar-babaxîyê ye. Usa jî navekî sîmvolî bona Misirê tê gotinê. Binihêr’e: Zebûr 87:4.
* 89:20 K’arêd Şandîya 13:22.

23 Neyar ber wî Ezê hûr-hûrî kim
û usa jî peyk’etîyêd wî xim.
24 Aminî û h’uba Minê t’evî wî bin,
pê navê Min strûyêd wîyê bilind bin.
25 Ezê destê wî daynime ser be’ra,
destê wîyî r’astê ser ç’ema.
26 Ewê gazî Min ke: ‹Tu Bavê min î,
Xwedêyê min û Qeyayê azadîya min›.
27 Ezê wî bikime nixurîyê
ji her p’adşayêd dinê mestir*.
28 Ezê t’imê h’uba Xwe bona wî xwey kim
û peymana Minê hindava wîda qewîn be.
29 Ezê dûmika zur’eta wî qedîm kim
û dûmika t’extê wî weke r’ojêd e’zmên.
30 Heger zur’eta wî gur’a gotina Min nekin,
li gora qirarêd Min nemeşin,
31 qeyde-qanûnêd Min bêqedir kin
û e’mirêd Min neqedînin,
32 hingê Ezê pê şivê serîkî bidime neheqîyêd wan
û bi derba jî ceza bidime bêolîtîyêd wan.
33 Lê h’uba Xwe Ezê ji wî nebir’im
û sozê Xwe net’er’ibînim.
34 Peymana Xwe Ezê net’er’ibînim
û sozê ji devê Xwe derxistî, neguhêzim.
35 Carekê Min pê pîrozîya Xwe sond xwarîye,
t’u car Dawidr’a xêlif nebêjim.
36 Zur’eta wîyê h’eta-h’etayê bimîne,
t’extê wî jî weke r’oyê li ber Min.
37 Mîna hîvê h’eta-h’etayê wê qedîm be,
e’zmanda jî mîna şe’dekî amin be». (Sela)

* 89:27 E’yantî 1:5.

### Şîna bona k’etina p’adşatîyê

38 Lê Te ew ji ber Xwe avît
û bêhurmet kir,
ser k’ifşkirîyê Xwe hêrs k’etî,
39 peymana t’ev xulamê Xwe t’exsîr kir,
t’acê wî kire ax û xwelî.
40 H’emû sûrêd wî xirab kir,
kelayêd wî kirin xirabe.
41 Her kesê wirr’a derbaz dibe,
ewî wira t’alan dike,
ew bû pêk’enîyê cînarêd xwe.
42 Te peyk’etî ser wî xistin,
h’emû dijminêd wî şa kirin.
43 Te devê şûrê wî veger’and,
nava şêr’da pişt lê şkênand.
44 R’ewşa wî Te jê stand,
t’ext e’rdê xist şkênand.
45 R’ojêd cahiltîya wî kin kirin,
ew şermîyêva Te nixamt. (Sela)

### Duayê alîk’arîyê

46 H’eta k’engê, ya Xudan?
Gelo Tê t’imê Xwe veşêrî?
H’eta k’engê hêrsa Teyê alav de?
47 Bîr bîne dûmika e’mirê min,
gelo Te h’emû ewledêd însên
boş û betalîyêr’a xuliqandin?
48 K’î dikare bijî û nemire,
xwe ji destê gor’istên xilaz ke? (Sela)

49 Ya Xudan, k’anê ye ew h’uba Teye berê,
ku Te pê aminîya Xwe Dawidr’a sond xwar?
50 Ya Xudan, bîr bîne bêr’ûmetbûna xulamêd Xwe,
ku ji h’emû miletêd zor ser minda tên.

51 Dijminêd Te wî bêhurmet dikin, ya Xudan,
gavêd k'ifşkirîyêd Te r'obet dikin.

52 Şikir ji Xudanr'a,
h'eta-h'etayê amîn û amîn!

## K'itêba Çara (Zebûra 90-î h'eta 106-a)

### Xwedêyê nemirî û merivê mirî

**90** *Duayê Mûsayê merivê Xwedê.*
1 Ya Xudan, Tu sit'argeha me yî qur'ne-qur'ne.
2 Berî bûyîna ç'îya, berî e'firandina e'rdê û t'opa dinê,
ji her-heyê h'eta-h'etayê, Tu Xwedê yî.

3 Tu mêriv li xwelîyê vediger'înî û dibêjî:
«Veger'in, ewledêd merivayê».
4 H'ezar sal ber ç'e'vê Te mîna r'oja duhu ye,
ku dibihure, ew mîna bedîleke şevê ye*.
5 Tu wan r'oda ber'didî, ew dibin mîna xewna şeva,
mîna gîhayê ku sibehê zû şîn dibe.
6 Ew sibehê zû gul dide û şîn dibe,
êvarê diç'ilmise û h'işk dibe.

7 Belê ji dest hêrsa Te em dih'elin-dimaşin
û ji alava k'ela Te em t'evîhev dibin.
8 Te neheqîyêd me danîne li ber Xwe,
gunêd meye veşartî ber nûra dîndara Xwe.

9 H'emû r'ojêd me bi hêrsa Te dibihurin,
salêd me jî mîna k'eserekê derbaz dibin.
10 R'ojêd e'mirê me h'eftê sal in,
heger bi sih'et-qewat h'eyştê sal bin,

* 90:4 Petrûs II 3:8.

dîsa r’ûmeta wan ze’met û k’eder e,
ew zû dibihurin, em jî difir’in diçin.

11 K’î haş ji qewata hêrsa Te heye?
Xezeba Te weke ji Te xofkirinê ye.
12 Me usa hîn ke em r’ojêd xwe bijmirin,
wekî em dilekî serwaxt dest bînin.

13 Li me veger’e, Xudan! H’eta k’engê?
Li qûlêd Xwe were r’e’mê.
14 Sibehê zû bi h’uba Xwe me t’êr ke,
ku em eşq bin nava h’emû r’ojêd xweda.
15 Me weke wan r’oja şa ke,
çiqasîda Te dilê me êşandin,
weke wan sala, çiqasîda tengasî dît.
16 Bira kirêd Te e’vdêd teva e’yan bin
û r’ûmeta Te ewledêd wanva.
17 De bira Xudan Xwedêyê me, li me xweş be,
şixulê destê me nava meda qewîn ke,
belê, şixulê destê me qedîm ke.

## Xwedê piştovan e

91 1 Yê bin hêşîya Yê Herî Jorinda dimîne,
ew bin sîya Yê Herî Zorda r’ih’et dibe.
2 Ezê bêjime Xudan: «Sit’argeha min û kela min,
Xwedêyê min, k’îjanîda ez guman im!»
3 Ewê te ji t’eleka nêç’îrvan xilaz ke,
ji nexweşîya mirinê.
4 Ewê pê p’er’ê Xwe te binixême,
binê baskê Wîda tê bisit’irî,
r’astîya Wîyê ter’a bibe mert’al û sûr.
5 Tê ji sawa şevê netirsî,
ne ji tîra ku r’ojê difir’e,
6 ne ji nexweşîya mirinêye,
ku te’rîstanîyêda diger’e,

ne jî ji wê derbê,
ku r'o nava r'ojêda gever dike.

7 Heger h'ezar alîyê teyî ç'epêva bik'evin,
dehe h'ezar kes jî, alîyê teyî r'astêva,
lê belê derbekê negihîje te.
8 T'enê tê bi ç'e'vê xwe t'emaşe kî
û belayê nep'aka bibînî.

9 Te Xudan xwer'a kire sit'argeh,
Yê Herî Jorin hêwargeh,
10 lema t'u xirabîyê neyê serê te
û t'u qezîyê nêzîkî konê te nebe.
11 Çimkî wê t'emîya te bide milyak'etêd Xwe,
ku h'emû r'ê-dirbêd teda te xwey kin.
12 Ewê te ser desta hilgirin,
ku nigêd te kevir nek'evin*.
13 Tê şêr û me'rê teyar p'êpes kî
û cewrikêd wan bih'incir'înî*.

14 Xwedê dibêje: «Ew Min h'iz dike,
Ezê jî wî xilaz kim,
Ezê piştovanê wî bim,
çimkî navê Min nas dike.
15 Ewê gazî Min ke, Ezê caba wî bidim,
tengasîyêda Ezê t'evî wî bim,
Ezê wî xilaz kim û bilind kim.
16 Ezê wî r'ojêd dirêjva t'êr kim
û azadîya Xwe nîşanî wî kim».

* 91:11-12 Metta 4:6; Lûqa 4:10-11.
* 91:13 Lûqa 10:19.

## Stiraneke şikirdarîyê

**92** *Zebûr. Stirana bona r'oja şemîyê.*
1 Qenc e şikirîyê bidine Xudan
û eşqî navê Te bistirên, Yê Herî Jorin,
2 ku serê sibehê h'uba Te gilî kin
û êvarê jî aminîya Te,
3 bi sazê dehe t'êlî
û bi miqamê çengê zîs.
4 Çimkî Te, Xudan,
ez şa kirim bi kirinêd Xwe,
kirinêd destê Ter'a ez gul didim.

5 Çawa mezin in, Xudano, kirêd Te!
Gelekî k'ûr in şêwirêd Te!
6 Merivê bêfe'm vê nizane
û yê axmax fe'm nake,
7 heger nep'ak mîna şînayê bigihîjin,
h'emûyêd neheqîyê dikin, gul din,
yek e ewê h'eta-h'etayê gever bin.
8 Lê belê Tu Xudano, t'imê bilind î!
9 Çimkî va neyarêd Te, Xudano,
va neyarêd Teyê gever bin,
h'emûyêd neheqîyê dikin bela bin.
10 Lê Te strûyê min,
mîna strûyê gayê beyanî bilind kir
û ez pê r'ûnê nû r'ûn kirim.
11 Ç'e'vê min k'etina neyarêd min dîtin,
guhê min derheqa wan xirabada bihîstin,
k'îjana ku h'icûmî li ser min kirin.

12 R'astê mîna dara xurmê gul de,
mîna erza Lubnanê bilind be,
13 ew Xana Xudanda daç'ikandî ne,
h'ewşêd Xwedêyê meda gul dane.

14 H'eta mezinayîya xweda jî wê ber bidin,
ter' û şîn wê bimînin,
15 wekî salix kin, ku Xudan r'ast e,
Ew qeyayê min e, neheqî Wîda t'une.

### Pesindayîna mezinayîya Xwedê

**93** 1 Xudan p'adşa ye, mezinayî lê ye,
Xudan xweyîqudret e û piştgirêdayî ye,
belê dinya qedîm e û ji cî nah'eje.
2 K'ursîya Te berê pêşda qewîn-qedîm e,
Tu h'eta-h'etayê yî.

3 Av r'adibin, Xudano,
av dengê xwe bilind dikin,
av bilind dikin xuşînîya xwe.
4 Xudan bilindayêda
ji dengê gelek ava zortir e
û pêlêd be'ra qewattir e.

5 Qanûnêd Te e'seyî ne.
Pîrozî layîqî Xana Te ye,
Ya Xudan, h'eta-h'etayê.

### Xudan h'akimê dinê ye h'eyfa r'asta hiltîne

**94** 1 Ya Xudan, Xwedêyê h'eyfhildanê,
Şewq de birq vede, Xwedêyê h'eyfhildanê!
2 R'abe h'akimê dinyayê,
bela babaxa bidê.
3 Nep'akê h'eta k'engê, Xudano,
h'eta k'engê wê nep'akê fir'naq bin?

4 Ew gotinêd ji xwe mestir dibêjin,
h'emûyêd ku bêolîtîyê dikin k'ubar dibin.
5 Xudan, evana cime'ta Te dih'incir'înin
û warê Te diçerçirînin.

6 Ew jinebî û xerîba dikujin,
sêwîya jî qir’ dikin
7 û dibêjin: «Xudan nabîne,
Xwedêyê Aqûb nezan e».

8 Bizanibin gelî bêfe’mêd meriva,
gelî bêh’işa, k’engê hûnê fe’m bikin?
9 Gelo Yê guh çêkirîye nabihê
û Yê awaz* daye ç’e’v nabîne?
10 Yan Yê mileta şîret dike,
Yê zanistîyê dide meriva, wan hilnayê?
11 Xudan fikirêd mêriv zane, ku ewe p’ûç’ in*.

12 Xwezî li wî bendeyî, Xudan, ku şîret dikî
û qanûna Xwe li wî hîn dikî,
13 wekî ji r’ojêd oxirmê giran wan xilaz kî,
h’eta ku bona nep’aka ç’e’l bê vedanê.
14 Çimkî Xudan cime’ta Xwe ji ber Xwe navêje
û destê Xwe ji warê Xwe nak’işîne*.
15 Lê belê heqîyê pişta r’asta bigire,
h’emûyêd dilê r’ast wê li pey her’in.

16 K’ê bona min li ber xiraba r’abe?
K’ê bona min miqabilî wan bisene,
yêd ku bêolîtîyê dikin?
17 Heger Xudan piştovanê min nîbûya,
hindik mabû nefsa min dîyarê ker’ û lalda bima.
18 Hema min got: «Nigêd min dişimitin»,
h’uba Teye amin Xudan, ez qedîm kirim.
19 Dema derd-kul dilê minda zêde dibin,
baristanîyêd Te nefsa min şa dikin.

* 94:9 Awa gotî «cûr’e».
* 94:11 Korint’î I 3:20.
* 94:14 R’omayî 11:1-2.

20 T'u heleqetîya h'akimêd ner'ast t'evî Te heye,
k'îjan ku neheqîyê dikine heqî?
21 Miqabilî nefsa yê r'ast k'om dibin
û xûna bêsûc sûcdar dikin.
22 Lê belê Xudan bûye kela min,
Xwedêyê min, e'sasê sit'argeha min.
23 Ewê neheqîya wan bîne serê wan
û bona neheqîya wan qir'a wan bîne.
Xudan Xwedêyê meyê qir'a wan bîne.

## Pesinê Xudan bidin û gur'a Wî bikin

95 1 Werin em eşq û şa Xudanr'a bistirên,
gazîya xwe bikine Qeyayê azadîya xwe!
2 Bi şikirdarîyê em bêne li ber dîndara Wî,
bi dengê bilind bistirên eşqî Wî.
3 Çimkî Xudan, Xwedêyê mezin e
û P'adşê mezin, li ser h'emû xwedêya.
4 K'ûrayêd e'rdê destêd Wîda ne,
bilindayêd ç'îya, yêd Wî ne.
5 Be'r, ya Wî ye, Wî ew çêkir
û destê Wî bej awaz kirîye.

6 Werin em ta bin, dever'ûya her'in,
ber Xudan E'firandarê xwe çok din.
7 Çimkî Ew e Xwedêyê me,
em jî cime'ta mêrga Wî ne
û pezêd ber Wî ne.

Xwezî we îro dengê Wî bibihîsta!
8 û serh'işkî nekira,
çawa Mêrîbahêda,
r'oja Massaha ber'îyêda*,
9 dera ku kal-bavêd we kirêd Min dîtin,
lê dîsa Ez cêr'ibandim û e'nene kirim.

---

* 95:8 Binihêr'e: Derk'etin 17:7; Jimar 20:2-13.

10 Çil salî h’îlê Min ji wî nisilî çû,
min got: «Eva cime’ta dilda xalifî ne
û r’îya Min nas nekirine.
11 Lema jî Min ji hêrsa sond xwar û got*:
‹T’u car ewê nek’evine r’ih’etîya Min!›**»

### Bistirên eşqî Xudan p’adşê me

**96** 1 Stiraneke nû bistirên eşqî Xudan,
bistirên eşqî Xudan t’emamîya e’rdê!
2 Eşqî Xudan bistirên, pesinê navê Wî bidin,
r’oj bi r’oj xilazkirina Wî danasîn kin.
3 Nava p’ûtp’aristada r’ûmeta Wî bikin dengî,
nava h’emû miletada k’eremetêd Wî.
4 Xudan mezin e, hêjayî gelek pesina ye,
sawa Wî li ser h’emû xwedêya ye.
5 Xwedêyêd h’emû mileta p’ût in,
lê Xudan e’zman çêkirin.
6 R’ûmet û hurmet li pêşîya Wî ne,
qewat û h’ujmek’arî pîrozgeha Wîda ne.

7 Bidine Xudan, gelî berekêd mileta,
bidine Xudan r’ûmet û qudret.
8 Şikirîyê bidine r’ûmeta navê Xudan,
p’êşk’êşa bînin û bik’evine hêwangehêd Wî.
9 Ber Xudan ta bin bi xemila pîroz,
ji dîndara Wî bitirsin, t’emamîya e’rdê!

10 Bêjine Mileta: «Xudan e P’adşa!
Lema dinya qewîn-qedîm e û nah’eje.
Dîwana mileta Ewê bi r’astîyê bike».
11 Bira e’rd şa be û e’zman eşq be,
be’r bike xuşîn, bi t’êr û t’ijîya xweva.

---

** 95:11 Jimar 14:20-23; Şirovekirina Qanûnê 1:34-36, 12:9-10; Îbranî 4:3-5.

* 95:7-11 Îbranî 3:7-11, 15, 18; 4:1, 3, 5, 7.

12 Bira eşq bin deşt û her tiştêd navda ne,
bira şa bin li ber Xudan, h'emû darêd daristên.
13 Çimkî Ew tê, Ew tê ku dîwana e'rdê bike.
Ewê bi heqîyê dîwana dinê bike
û mileta bi r'astîya Xwe.

**P'adşatîya Xudan ser p'adşatîyar'a ye**

97 1 Xudan e p'adşa, bira e'rd şa be,
bira eşq bin h'emû girav!
2 E'wr û dûman li dora Wî ne,
r'astî û heqî jî bingehê k'ursîya Wî ne.
3 Agir pêşîya Wîva diçe,
her çar alîya neyarêd Wî dişewitîne.
4 Birûskêd Wî li dinyayê dikin r'onî,
e'rd dibîne, dilerizîne.
5 Ç'îya mîna şimê ji dîndara Xudan dih'elin,
ji ber dîndara Xweyê t'emamîya e'rdê.
6 E'zman r'astîya Wî dikin dengî
h'emû milet jî r'ûmeta Wî dibînin.

7 Bira şermî bin h'emûyêd ku p'ûta dih'ebînin,
ku pê p'ûtêd p'ûç' difir'in.
H'emû xwedê li ber Xudan ta dibin.
8 Sîyon dibihê û şa dibe,
bajarêd Cihûda beşerxweş dibin
qirarêd ter'a, Xudano.
9 Çimkî Tu, Xudan, ser t'emamîya e'rdê Yê Herî Bilind î,
ji ser h'emû xwedêya gelekî bilindtir bûyî.

10 Gelî Xudan h'izkirîya, bijenine xirabîyê!
Ew e'mirê aminêd Xwe xwey dike,
ji destê nep'aka xilaz dike.
11 R'onayî dertê bona r'asta,
şabûn jî bona sitqê dilê r'ast.
12 Pê Xudan şa bin, gelî r'asta,
ji navê Wîyî pîroz hûn r'azî bin.

**Xudan e p’adşê dinê**

**98** *Zebûr.*
1 Stiraneke nû bistirên eşqî Xudan,
bona ku Wî k’eremet kirin.
Destê Wîyî r’astê û zenda pîroz
azadî Wîr’a dest anîn.
2 Xudan serk’etina Xwe da k’ifşkirinê,
li ber ç’e’vê mileta r’astîya Xwe da e’yankirinê.
3 H’ub û aminîya Xweye bona mala Îsraêl xwey kir.
Her qulbêd dinyayê dîtin serk’etina Xwedêyê me.

4 T’emamîya dinyayê, eşqî Xudan bikin qar’în,
eşq bin, şabin û bistirên.
5 Pê çengê zîs eşqî Xudan hûn bistirên,
pê çengê zîs û bi dengê miqamê.
6 Li ber Xudan P’adşa, bor’î û strû lêdin eşq û şa bin.

7 Bira be’r bike xuşîn t’êr û t’ijîya xweva,
dinya û h’emûyêd nav wêda.
8 Bira ber Xudan ç’em destêd xwe hev xin,
ç’îya-banî hevr’a Xudanr’a gul û geş bin,
9 Çimkî Ew tê dîwana dinyayê bike,
Ewê dîwana dinê bi heqîyê bike,
ya cime’ta jî bi r’astîyê.

**Xudan p’adşayê zorî ser heqîyê ye**

**99** 1 Xudan e p’adşa! Bira milet bilerizin!
Ew li ser xêrûba r’ûdinî, bira e’rd bih’eje.
2 Xudan mezin e Sîyonêda,
Ew li ser h’emû miletar’a ye.
3 Bira pesinê navê Teyî mezin û xof bidin.
Ew pîroz e!

4 Qewata p'adşê heqî h'izkirin e.
Te r'astî t'estîq kir,
heqî û r'astî nava Aqûbda kir.
5 Xudan Xwedêyê me bilind kin
û li ber nigêd Wî ta bin. Ew pîroz e!

6 Mûsa û Harûn nava k'ahînêd Wîda bûn,
Samûêl jî nava gazîya navê Wîda,
gazî Xudan kirin û Ewî dengê wan bihîst.
7 Ewî ji nava stûna e'wrîda wanr'a xeber dida,
wana t'emîyêd Wî xwey dikirin,
ew qanûnêd ku dabû wan.

8 Xudano, Xwedê me! Te dengê wan bihîst,
Tu bona wan Xwedêyê baxşandinê bûyî,
lê belê weke e'melêd wan jî danî serê wan.
9 Xudan Xwedêyê me bilind kin
li ser ç'îyayê Wîyî pîroz bih'ebînin,
çimkî Xudan, Xwedêyê me pîroz e.

### Bira h'emû meriv pesinê Xwedê bidin

**100** *Zebûra şikirdarîyê.*
1 Ber bi Xudan dengê xwe hildin,
t'emamîya dinyayê!
2 Bi şabûnê Xudan bih'ebînin,
dengê xwe hildin werine h'izûrê.

3 Bizanibin ku Xudan e Xwedê,
Ewî em xuliqandin, em milk'ê Wî ne,
em cime'ta Wî û pezê mêrga Wî ne.

4 Bi şikirdarîyê bik'evine dergehêd Wî
û bi pesindayînê h'ewşêd Wî.
Şikirdar bin û pesinê navê Wî bidin.

5 Çimkî Xudan qenc e,
h’uba Wî h’eta-h’etayê ye
û aminîya Wî jî qur’ne-qur’ne ye.

### P’adşa Xudanr’a soz dide

**101** *Zebûra Dawid.*
1 Eşqî aminî û heqîyê ezê bistirêm,
ya Xudan, zebûra Ter’a bêjim.
2 Bi serwaxtîyê ezê r’îya bêlek’eda her’im.
K’engê Tê bêyî cem min?

Ezê mala xweda bi dilê r’ast r’abim-r’ûnîm,
3 tiştêd xirab ezê neynime ber ç’e’vê xwe,
kirêd neheqa li ber ç’e’vê min r’eş in,
ewê nêzîkî min nebin.
4 Bira dilê qelp ji min dûr be,
naxwazim yê xirab ez nas kim.

5 Ezê yê dizîva buxdan heval dike
r’ûbarî dinê nehêlim,
yê ç’e’vada k’ubar û dilda babax
ez nikarim sebir kim.

6 Ç’e’vê min li ser aminêd e’rdê ne,
ku ew t’evî min bimînin,
ewê ku r’îya bêlek’eda diçin,
wê berdestîyê minr’a bikin.

7 H’ilek’arê mala minda nemîne,
derewînê ber ç’e’vê min nesene.
8 Berbanga k’ûrda ezê r’abim
qir’a nep’akêd welêt bînim,
wekî ji bajarê Xudan
k’oka h’emû bêqanûna bînim.

### Duayê yekî te'lî-tengîyêda

# 102

*Duayê belengaz, gava dil navda nasene, ew gazinê xwe li ber Xudan dir'êje.*

1 Ya Xudan! Dengê min bibihê,
bira zarînîya min bigihîje Te.
2 R'oja oxirmêd giranda
berê Xwe ji min neguhêze,
guhê Xwe bide li ser min.
Wê r'oja ku gazî Te dikim
Tu zûtirê cabê bide min.

3 R'ojêd min mîna dû betavedibin,
hestûyêd min çawa agirda bişewitin.
4 Dil nava minda mîna gîhayê h'işkî k'etîye,
h'eta xwarina xwe jî bîr kirîye.
5 Ji dest dengê zarînîya min,
ez bûm çawa ç'erm û hestû.
6 Ez bûm mîna kundê ber'îyê,
wî bûmê korî xirabada.
7 Mîna ç'ivîka li ser xanî,
ez bêxew mam t'enê mayî.
8 T'emamîya r'ojê neyar te'na li min dixin,
yêd k'îna min girtine ez kirime gote-got.
9 Xurê min k'ozî ye dewsa nan,
hêsir t'evî vexwarina xwe kirin,
10 ji dest hêrs û alava k'ela Te,
ku Te ez girtim wêda avîtim.
11 E'mirê min mîna sîya êvarê ye
û ez mîna gîhê h'işkbûyî me.

12 Lê belê Xudan, t'extê Te, t'extê her-heyê ye
û bîranîna Te qur'ne-qur'ne ye.
13 Tê r'abî Sîyonê bêyî r'e'mê,
çimkî wexte ku dilovan bî,
we'de îdî pêr'a gihîştîye.

14 Çimkî xulamêd Te kevirêd wê begem dikin
û h'eyfa wan t'oza wê jî tê.
15 Miletê ji navê Xudan bitirsin,
h'emû p'adşayêd e'rdê ji r'ûmeta Wî.
16 Xudanê Sîyonê ava ke,
bi r'ûmeta Xwe xuya be.
17 Ewê bibihê duayê bêkesa
û duayêd wan wê bêqedir neke.

18 Bira ev yek bê nivîsarê bona qur'na ku tê,
ku cime'ta nebûyî hê pesinê Xudan bidin,
19 ku Ew jorda ji Cîyê Xweyî Pîroz dinihêr'e,
Xudan ji e'zmên dîna Xwe dide li e'rdê,
20 bona ku zare-zara girtîya bibihê
û yêd mirinêr'a dayî xilaz ke,
21 wekî Sîyonêda navê Xudan bikin dengî
û pesinê Wî jî Orşelîmêda,
22 gava cime't t'evî p'adşê bicivin,
bona ku Xudan bih'ebînin.

23 Ewî r'êda qudûmê min sist kirin,
r'ojêd min jî kin kirin.
24 Min got: «Xwedêyê min!
Nîvê r'ojada hilnede min.
Salêd Te ji qur'ne h'eta qur'na ne».

25 Pêşîyê Te h'îmê e'rdê danîye,
e'zman jî kirê destê Te ye.
26 Ewê unda bin, lê Tê bimînî,
h'emûyê mîna k'inca bimaşin,
Tê mîna berşo wan biguhêzî
û ewê derbaz bin unda bin.
27 Lê Tê neyêyî guhastin
û salêd Teyê xilaz nebin*.

* 102:25-27 Îbranî 1:10-12.

28 Ewledêd xulamêd Te wê bijîn,
nisilê ç'e'vê Te ser wê qedîm bin.

### Pesindayîna qencîya Xwedê

**103** *Zebûra Dawid.*
1 Pesinê Xudan bide, nefsa min
û her tiştê nava minda, navê Wîyî pîroz.
2 Pesinê Xudan bide, nefsa min
û bîr neke h'emû qencîyêd Wî.
3 Ew dibaxşîne h'emû guneyêd te
û qenc dike h'emû nexweşîyêd te,
4 e'mirê te ji t'irbê Ew azad dike
û h'ub û dilovanîyêva dixemilîne,
5 xwestina te berek'etîyêva t'ijî dike,
cahiltîya te mîna teyra nû dibe.

6 Xudan bona h'emû belengaza
r'astîyê û heqîyê dike.
7 Ewî r'îyêd Xwe nîşanî Mûsa kirin
û kirinêd Xwe jî ewledêd Îsraêl.
8 Dilşewat û r'e'm e Xudan,
xweyê sebir-sik'anê û h'ubêda xinêyo.
9 Ew h'eta xilazîyê hêrs nak'eve,
h'eta-h'etayê k'înê najo.
10 Ew weke guneyêd me, serê me nake
û weke neheqîyêd me nade ber me.
11 Lê çiqas e'zman ji e'rdê bilindtir e,
haqas jî h'uba Wî hindava xofk'êşêd Wîda mezin e.
12 Çiqas r'ohilat ji r'oavayê dûrtir e,
haqasî jî guneyêd me ji me dûr xistî ne.
13 Çawa dilê bavê li ser ewledê wî dişewite,
usa jî dilê Xudan li ser xofk'êşêd Wî dişewite.
14 Çimkî Ew zane meya me
û bîr tîne ku em xalî ne.

15 R’ojêd mêriv mîna gîhê ne,
mîna gula çolê ku gul dide,
16 Gava ba serr’a derbaz dibe, unda dibe
û cîyê wê îdî wê nas nake.
17 H’uba Xudan ji her-heyê h’eta-h’etayê ye,
li ser xofk’êşêd Wî ye
û heqîya Wî t’evî kur’êd kur’a ye,
18 li ser wan e, ku xwey dikin peymana Wî
û bîr tînin wan t’emîyêd Wî û pêk tînin.

19 Xudan t’extê xwe danîye li e’zmana,
p’adşatîya Wî h’ukumî li ser h’emûya dike.
20 Pesinê Xudan bidin,
milyak’etêd Wîye xweyîqewat,
ku hûn diqedînin gotina Wî,
dikin guhdarîya dengê Wî.
21 Pesinê Xudan bidin, gelî ordîyêd Wî,
h’emû qulixk’arêd Wî, ku e’mirê Wî diqedînin.
22 Pesinê Xudan bidin, h’emû e’firînêd Wî,
wan h’emû cîyêd bin h’ukumetîya Wî.
Pesinê Xudan bide, nefsa min!

### R’ûmeta Xwedêye nava e’firînada

**104** 1 Pesinê Xudan bide, nefsa min!
Xudano, Xwedêyê min, Tu çiqasî mezin î!
Bedewetî û r’ûmetêva wergirtî yî,
2 r’onayî mîna k’inca li Xwe kirîye,
e’zman mîna kon vegirtîye.
3 Te Xana Xwe jor ser ava çêkir,
e’wra dikî xwer’a e’rebe
û li ser baskê bê diçî.
4 Bayê Xwer’a dikî qasid,
alava êgir jî qulixk’ar*.

* 104:4 Îbranî 1:7.

5 Te e'rd danî li ser bingeh,
ku t'u car ji cî neh'eje.
6 Ava bêbinî mîna k'incekê Te lê kirîye,
av li serê ç'îya k'etine.
7 Ew ji hilatina Te dir'evin,
ji gur'înîya e'wrê Te vedik'işin.
8 R'adibine li serê ç'îya,
dik'işin diçine newala,
ber bi wan cîyêd Te bona wan k'ifş kirine.
9 Te sînor danî ku jê derbaz nebin
û veneger'in r'ûyê e'rdê nenixêmin.

10 Tu kanîya newalada der tînî,
wan nava ç'îyada diher'ikînî,
11 h'emû h'eywanêd çolê didine vexwarinê
û k'erêd beyanî pê wan têne avdanê.
12 Teyredêd e'zmana li ber wan dimînin,
nava ç'iqilada ew deng didin.

13 Tu ji mala Xweye jorin ç'îya av didî,
r'ûyê e'rdê pê mêwa kirêd Te t'êr dibe.
14 Ew bona h'eywên gîhê şîn dike
û p'incar'ê bona k'ara însên,
ku xurek derxe ji e'rdê
15 û şeravê, ku şa dike dilê însên,
bizir ku beşera wan xweş dike,
nan ku dilê wan dişidîne.

16 Darêd Xudan t'êr tên avdanê,
erzêd Lubnanê jî Wî daç'ikandine.
17 Li wir teyreda hêlûna datînin,
malêd leglega jî li ser sipindara ne.
18 Çîyayêd bilind warêd k'ûvîya ne,
qulç'êd zinara jî sit'argeha qotika ne.

19 Te hîv e'firand bona demsalê,
r'o wextê xwe zane çawa diçe ava.
20 Te'rîstan dikî û dibe şev,
h'emû r'e'wirêd daristên wêda diger'in.
21 Cewrikêd şêra bona nêç'îrê dikin mir'în
û ji Xwedê xurekêd xwe dipirsîn.
22 Gava r'o derdik'eve, paşda vedik'işin
û ne'lêd xweda r'adik'evin.
23 Meriv dertê diçe k'arê xwe,
şixulê xweyî h'eta êvarê.

24 Xudano, çiqasî gelek in kirêd Te!
Her tişt bi serwaxtîya Te çêbûye,
e'firînêd Teva e'rd t'ijî ye.
25 Va ye ev be'ra mezin û ber,
bêh'esab şûlikî têda ne,
h'eywanêd biç'ûk t'evî mezina.
26 Wêda gemî diger'in,
Lêwyat'anê Te e'firand,
ku ew têda bilîze.

27 Evana h'emû hîvîya Te ne,
ku xurekêd wan we'deda bidî.
28 Tu didî wan, ew t'op dibin,
Destê Xwe vedikî r'isqê xweva t'êr dibin.
29 Berê Xwe li wan diguhêzî, ew ditirsin,
bîna wan didî girtin, ew dimirin
û li xwelîyê vediger'in.
30 R'uh'ê Xwe dişînî ew die'firin
û jîyana nû didî r'ûyê e'rdê.

31 De bira r'ûmeta Xudan h'eta-h'etayê be,
Xudan şa be bi kirinêd Xwe!
32 Ser e'rdêda dinihêr'e ew dilerize,
ç'îya dik'eve ew dû dikin.

33 Eşqî Xudan ezê bistirêm, bi t’emamîya e’mirê xwe,
ezê Xwedêyê xwer’a miqamê lê xim h’eta ku heme.
34 Bira stirana min li Wî xweş bê,
ezê pê Xudan eşq û şa bim.
35 De bira gunek’ar betavebin
û nep’ak ser dinê t’unebin.

Pesinê Xudan bide, nefsa min.

Halêlûya!*

### Aminîya Xwedêye hindava cime’ta Wîda

**105** 1 Ji Xudan r’azî bin, navê Wî bidin,
kirêd Wî nava cime’tada bela kin.
2 Eşqî Wî bistirên, miqamê Wîr’a lê xin,
h’emû k’eremetêd Wî salix kin.
3 Pê navê Wîyî pîroz bifir’in,
bira dilê wan şa be, yêd Xudan diger’in.
4 Xudan û qudreta Wî bixwazin,
her gav r’ûyê Wî biger’in.
5 Bîr bînin k’eremetêd ku Wî kirin,
nîşanêd Wî û qirarêd devê Wî.
6 Hey zur’eta Îbrahîmê xulamê Wî,
gelî ewledêd Aqûb, bijartîyêd Wî.

7 Xudan e Xwedê me,
ser t’emamîya e’rdê qirarêd Wî ne.
8 Ew peymana Xwe h’eta-h’etayê bîr tîne
û sozê Xweyî dayî jî h’eta h’ezar nisilî,
9 k’îjan ku da Îbrahîm
û sondê ku Îshaqr’a xwar.
10 Aqûbr’a jî ew mak kir çawa qanûn
û Îsraêlr’a jî peymana h’eta-h’etayê.

---

* 104:35 «Halêlûya» forma kin e, ku ji zimanê îbranî tê, ku tê fe’mkirinê: «Pesinê Xudan bidin» yan «Şikir ji Xwedêr’a».

11 Got: «E’rdê Kenanê Ezê bidime te,
çawa p’ara wartîya we».

12 Gava ewe kêm bûn,
hindik û xerîb bûn nava wêda,
13 ji miletekî derbazî nav miletekî din dibûn,
ji p’adşatîkê derbazî nav cime’teke din,
14 Ewî nehişt ku yek qedirê wan k’eve
û bona wan li p’adşa hilat,
15 got: «Qedirê k’ifşkirîyê Min nek’evin
û xirabîyê li p’êxemberêd Min nekin».

16 Gava xelayî anî ser e’rdê
û qinyatêd nanîn dane bir’înê,
17 hingê merîk pêşîya wan şand,
Ûsiv xulamtîyêr’a hate firotan.
18 Nigêd wî qeydada şidandin
û xelaq avîtine stukura wî,
19 h’eta wî wextê gotina wî hate sêrî,
xebera Xudan ew cêr’iband.
20 P’adşa şand û ew da vekirin,
mîrê cime’ta ew azad kir.
21 Li ser mala xwe ew kire malxê
û wek’îlê t’emamîya hebûka xwe,
22 wekî mîrêd wî gora dilê xwe şîret ke
û r’ûspî-giregirêd wî bîlan ke.

23 Hingê Îsraêl hate Misirê,
Aqûb li welatê Hamê xerîbîyêda ma.
24 Xudan cime’ta Xwe p’ir’ zêde kir
û ew ji neyarêd wan qewattir kir.
25 Dilê wan guhar’t ku bijenine cime’ta Wî
û tengasîyê bidine xulamêd Wî.

26 Xulamê Xwe Mûsa şand,
usa jî bijartîyê Xwe Harûn.

27 Wana nava wanda nîşanêd Wî dane k'ifşê
û k'eremetêd Wî welatê Hamêda.
28 Te'rîstan şand kire şever'eş
û Misirî miqabilî gotina Wî r'abûn.
29 Avêd wan kire xûn
û me'sîyêd wan qir' kir.
30 E'rdê wan beqava t'ijî kir,
h'eta gozêd p'adşaye r'azanê jî.
31 Ewî got, mêş-mor û moz hatin
û derdorêd wan girtin.
32 Dewsa baranê teyrok ser wanda barand
û birq-birûsk welatêd wanda.
33 Tirî û hêjîrêd wan xist,
h'emû darêd dorberêd wan hûrdexweşî kir.
34 Got û kulî hatin,
xisîla wane bêh'esab,
35 h'emû şînaîya welêt xwarin,
usa jî berêd e'rdê wan.
36 Nixurîyêd t'emamîya welêt xist,
t'emamîya berêd wane pêş.

37 Îsraêl bi zêr' û zîv ji wir derxist,
qebîlêd wanda bêt'aqetek t'unebû.
38 Misir şa bû bi derk'etina wan,
çimkî sawa wan k'etibû ser wê.
39 E'wr derxist bona nixamtinê,
agir jî bona r'onayîya şevê.
40 Wana xwest Ewî sûsik anîn,
bi nanêd e'zmên ew t'êr kirin.
41 Qeya qelaşt av her'ikî,
mîna ç'êm k'işîya ber'îyêda.
42 Çimkî sozê Xweyî pîroz Wî bîr anî,
ku dabû Îbrahîmê xulamê Xwe.

43 Cime't derxist bi dilê eşq
û bijartîyêd Xwe bi dengê şa.

44 Welatêd mileta Ewî da wan
û k'eda xerîba kirin milk'ê xwe,
45 wekî t'emîyêd Wî xwey kin
û qanûnêd Wî biqedînin.

Halêlûya!

**Qencîya Xudane hindava cime'ta Wîda**

# 106

1 Halêlûya!

R'azî bin ji Xudan, çimkî Ew qenc e,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
2 K'î wê salix ke kirêd Xudane mezin,
k'î wê e'lam ke h'emû pesinê Wî?
3 Xwezî li wan ku heqîyê xwey dikin
û her gav xwe r'astîyê digirin!

4 Min bîr bîne, ya Xudan,
gava qencîyê li cime'ta Xwe bikî.
Berê xwe bide min
gava Tu wan xilaz kî,
5 wekî xweşîya bijartîyêd Te bibînim,
pê şabûna miletê Te şa bim
û pê warê Te bifir'im.

6 Me kal û bavêd xweva gune kirin,
bêolîtî qedandin, nep'akî kirin.
7 Kal û bavêd me Misirêda k'eremetêd Te fe'm nekirin,
h'uba Teye mezin bîr neanîn,
lê serî hildan li ber be'rê, ber Be'ra Sor.
8 Lê Wî bona navê Xwe ew xilaz kirin,
wekî qewata Xweye mezin bide k'ifşê.
9 Be'ra Sor hilat ew miç'iqî,
k'ûrayêva ew derbaz kirin, çawa bestêva.
10 Ji destê p'eyk'etî xilaz kirin,
ew azad kirin ji destê neyar.

11 Avê neyarêd wan nixamtin
û t'u kes ji wan nema.
12 Hingê bawerîya xwe sozê Wî anîn
û eşqî navê Wî stiran.

13 Lê belê zûtirê kirêd Wî bîr kirin,
ew hîvîya şîretêd Wî neman.
14 Ber'îyêda gelekî temsistî kirin
û Xwedê cêr'ibandin li çol bestêda.
15 Xwestinêd wan Ewî da wan,
nexweşî jî şande ser wan.

16 Gava zomêda h'evsûdî kirin,
avîtine Mûsa û Harûn pîrozêd Xudan.
17 E'rd vebû Dat'an daqurtand
û civata Avîram nixamt.
18 Agir alav da civata wan,
alavê nep'ak şewitandin.

19 Golik çêkirin H'orêbêda,
ber sûretê r'okirî serê xwe danîn.
20 Xwedêyê r'ûmeta xwe
dilqê golikê gîhaxurr'a guhêr'în.
21 Wan bîr kirin xilazkir Xwedêyê xwe,
ku kirêd mezin Misirêda kirine,
22 usa jî k'eremet welatê Hamda,
tiştêd nebûyî li devê Be'ra Sor.
23 Hingê got ku Ew gerekê wan unda ke,
heger bijartîyê Wî Mûsa
nava wanda li ber Wî nesekinîya,
hêrsa Wî nedabûya danînê, ku qir'a wan neanîya.

24 Wana welatê havijî bêr'ûmet kirin,
bawarîya xwe sozê Wî neanîn.
25 Konada bîna xwe teng kirin,
guhdarîya dengê Xudan nekirin.

26 Hingê Ewî bi sond destê Xwe bilind kir,
ku ber'îyêda wan unda ke.
27 Zur'eta wan nav mileta bela ke,
welatada t'ûr'-t'ûr'î ke.

28 Hingê wan xwe li Bae'l-P'ihor* girtin
û qurbanêd mirîyar'a dayî xwarin,
29 bi kirêd xwe Xudan hêrs xistin
û nexweşîya h'al gihîşte wan.
30 Hingê Pînhas k'ete xîretê
û nexweşîya h'al sekinî.
31 Ev yek wîr'a r'astî hate h'esabê,
qur'ne-qur'ne, h'eta-h'etayê.

32 Wan Xudan hêrs xistin li ber avêd Mêrîbanê,
r'ûyê wanda serê Mûsa berjêr bû.
33 Wana dilê wî êşandin
û wî bi devê xwe zêdezimanî kir.

34 Miletêd mayîn qir' nekirin,
çawa ku Xudan gotibû wan,
35 lê ew t'evî p'ûtp'arista bûn
û hînî kirêd wana bûn.
36 Xulamtî p'ûtêd wanar'a kirin
û ew bûne bela serê wan.
37 Kur' û qîzêd xwe kirine qurban cinar'a,
38 xûna bêsûc r'êtin,
xûna kur' û qîzêd xwe,
ku p'ûtêd Kenanar'a kirine qurban
û bi xûnê e'rd h'er'imandin.
39 Bi şixulêd xwe lewit'în
û bi kirêd xwe qavî kirin.

---

* 106:28 «P'ihor» ew ç'îyakî Mowabê bû, ku dik'ete alîyê r'ohilata Ûrdunê. Bae'l-P'ihor jî p'ûtê cime'ta Mowabê bû.

40 Awa hêrsa Xudan li cime'ta Wî r'abû
û ji warê Xwe Ew zivêr bû.
41 Ew dane destê mileta,
neyara h'ukumî ser wan kir.
42 Dijmina tengasî dane wan
û ew tewîyan bin destê wan.
43 Gelek cara Xudan ew xilaz kirin,
lê ew r'aberî Wî dibûn,
ji dest neheqîyêd xwe ew bêr'ûmet bûn.
44 Lê Ewî dîsa ser tengasîya wanda nihêr'î,
gava zarînîya wan Ewî bihîst.
45 Û bîr anî peymana Xweye t'evî wan,
anegorî h'uba Xweye mezin li wan veger'îya.
46 Xwedê kir ku hêsîrkirêd wan
dilovan bin hindava wan.

47 Me xilaz ke, Xudano, Xwedêyê me
û ji nav mileta me t'op ke,
wekî şikirîyê bidine navê Teyî pîroz
û bi r'ûmeta Te em bifir'in.

48 Şikir Xudan Xwedêyê Îsraêlr'a, h'eta-h'etayê!
Bira t'emamîya cime'tê bêje: «Amîn!»

Halêlûya!

## K'itêba Pênca (Zebûra 107-a h'eta 150-î)

### Pesindayîna qencîya Xwedê

**107** 1 R'azî bin ji Xudan, çimkî Ew qenc e,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
2 Bira aha bêjin azadbûyêd Xudan,
k'îjan azad kirin ji destê dijmin

3 û ew t’op kirin ji welata,
ji r’ohilat û r’oavayê
û ji bakur û başûrê.

4 Hinek ber’îyêda xalifîn,
ewê r’îya xike-xwelîda,
bajarekî mayînê wir nedîtin.
5 T’î û bir’çî bûn,
dil nava wanda xava diçû.
6 Hingê tengasîya xweda hewara xwe Xudan anîn
û Wî ew xilaz kirin ji xemêd giran.
7 R’îya r’astda Wî r’êberîya wan kir,
h’eta ku gihîştine bajarê mayînê.
8 Bira şikirîyê bidine Xudan bona h’uba Wî
û kirinêd Wîye h’ujmek’ar bona merivayê!
9 Çimkî Ew nefsa ç’ilabûyî av dike
û yê bir’çî qencîyêva xinê dike.

10 Hinek te’rîyê û bin sîya mirinêda r’ûniştibûn,
derd-kula û qeydava girêdayî bûn.
11 Çimkî ew li ber gotinêd Xwedê r’abûn
û şêwirêd Yê Jorin bêhurmet kirin.
12 Ewî jî pê h’alê giran dilê wan ta kirin,
ew k’etin, kesek t’unebû dest bavîta wan.
13 Hingê tengasîya xweda gazîya xwe Xudan anîn
û Wî ew azad kirin ji xemêd giran.
14 Evana ji te’rîstanîyê û sîya mirinê derxistin
û qeydêd wan şkênandin.
15 Bira şikirîyê bidine Xudan bona h’uba Wî
û kirinêd Wîye h’ujmek’ar bona merivayê!
16 Çimkî dergehêd sifir hûrdexweşî kirin
û stûnêd h’esinî şkênandin.

17 Hineke bêh’iş ji dest kirêd xweye xirab
û neheqîyêd xwe tengasîyê dibînin.

18 Me’dê wan ji h’emû xwarinê li hev dik’eve
û diçin h’eta li ber derê mirinê.
19 Tengasîya xweda gazîya xwe Xudan anîn
û Wî ew azad kirin ji xemêd giran.
20 Xebera Xwe şand ew qenc kirin
û ew xilaz kirin ji gor’istên.
21 Bira şikirîyê bidine Xudan bona h’uba Wî
û kirinêd Wîye h’ujmek’ar bona merivayê!
22 Bira dîyarîyêd r’azîdarîyê bidin
û kirinêd Wî bi eşq salix kin!

23 Hinekêd ku bi gemîya ser be’rêr’a diçin,
avêd mezinda şixul dikin,
24 wana kirinêd Xudan dîtin,
usa jî k’eremetêd Wîye bêbinîyêda.
25 Ewî e’mirî bê kir û firtone r’akir
û pêlêd wê bilind kirin.
26 H’eta e’zmên bilind bûn,
h’eta bêbinîyê berjêr çûn,
ji wê belê gemîvan h’elîyan-maşîyan.
27 Mîna serxweş li ser niga nesekinîn,
zanistîya wana neda wana t’u k’arîn.
28 Tengasîya xweda hewara xwe Xudan anîn
û Wî ew xilaz kirin ji xemêd giran.
29 Ewî firtone seqir’andin
û pêl dane sekinandin.
30 Hingê ew şabûn gava pêl sekinîn
û ew birine gemîwargeha wan xwestî.
31 Bira şikirîyê bidine Xudan bona h’uba Wî
û kirinêd Wîye h’ujmek’ar bona merivayê!
32 Bira Wî bilind kin civîna cime’tada
û pesinê Wî bidin k’oma r’ûspîyada.

### Boy xiraba

33 Ew ç’ema dike çol û best
û ç’e’vkanîya e’rdê ziha.

34 Welatê şên dike şor'ek'et,
bona xirabîya binelîyêd wir.

### Boy qenca

35 Ew çol û besta dike gola avê,
e'rdê ziha kanîya avê.
36 Bir'çîya li wir cîwar dike,
ew bajarê mayînê ava dikin.
37 E'rdê davêjin, tirîya datînin
û deremetê t'op dikin.
38 Xudan dua li wan dike,
gelekî li hev ew zêde dibin
û h'eywanêd wan Ew kêm nake.

### Boy xiraba

39 Lê yêd neyar ew kêm dibin, nimiz dibin,
ji dest tengasîyê, xirabîyê û k'ederê.
40 Ew bêr'ûmetîyê li ser mîrada dir'êjîne,
çol û besta, r'ê-dirbada dixalifîne.

### Boy qenca

41 Lê yê feqîr ji belengazîyê derdixe,
r'ik'inyata wan mîna kerê pêz zêde dike.
42 R'astê bibînin evê yekê û şa bin,
lê h'emû neheqê devê xwe bigirin.

43 K'î ye serwaxt ku van yeka bide ber h'işa
û h'uba Xudan ew fe'm bike.

### Gumana li ser Xwedê

**108** *Stiran û zebûra Dawid.*
1 Ez dilda guman im, Xwedêyo,
ezê bistirêm û miqamê lêdim r'ûmeta xweva.
2 H'işyar bin, hey çeng û çengê zîs,
ezê r'ojê h'işyar kim.

3 Ezê şikirîyê bidime Te, Xudan, nav miletada,
eşqî Te bistirêm nav cime'tada.
4 Çimkî h'uba Te ji e'zman bilindtir e
û aminîya Te jî h'eta e'wra ye.

5 Xwedêyo li ser e'zmên bilind be,
bira r'ûmeta Te t'emamîya dinê bigire.
6 Bi destê Xweyî r'astê me ser xe û bibihê,
wekî h'izkirîyêd Te azad bin.

7 Xwedê ji Cîyê Xweyî Pîroz xeber da:
«Ezê şa bim, Şexemê p'arevekim,
newala Sûkotê bipîvim.
8 Gîle'd ya Min e, Minaşe ya Min e,
Efrayîm zirih'ê serê Min e,
Cihûda jî qanûndarê Min e.
9 Mowab derdana Mine şûştinê ye,
sola Xwe Ezê bavêjime ser Edomê,
dilê Xwe Ezê şa kim li Filistînê».

10 K'î wê min bibe bajarê sûrkirî?
K'î wê r'êberîya min bike h'eta Edomê?
11 Tu nînî Xwedê, ku Te em ji ber Xwe avîtin?
Tu t'evî ordîyêd me dernak'evî, Xwedêyo!
12 Ji destê neyar me xilaz ke,
çimkî p'ûç' e alîk'arîya meriva.
13 Emê pê Xwedê mêrxasîyê bikin,
t'enê Ewê dijminêd me p'êpes ke.

## Duayê gazinkirinê

# 109

*Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid.*
1 Xwedêyê şikirdarîyê didim! Xwe ker' neke.
2 Çimkî devê nep'ak û mixeneta ser min vebûne,
bi zimanê derew xeyba min dikin.
3 Bi gotinêd jenandinê dora min digirin,
cîyê amî-t'am qir'ka min digirin.

4 Ji ber h’izkirina minva şikîyatê min dikin,
lê ez bona wan dua dikim.
5 Ji ber qencîyêva xirabîyê li min dikin,
ji ber h’izkirina minva ew dijenin.

6 Nep’akekî ser wîr’a Tu k’ifş ke,
bira şikîyatkir* li milê wîyî r’astê bisene.
7 Gava bê li ber dîwanê,
bira ew gunek’ar derê
û duayê wî jî gunekirin bê h’esabê.
8 Bira r’ojêd wî kin bin
û qulixê wî yekî din bistîne*.
9 Bira zar’êd wî sêwî bimînin
û jina wî jî jinebî.
10 De bira zar’êd wî dero-der bin û p’ars kin,
ji malêd wane xirabe berî wan din*.
11 Bira xweyê deyn t’emamîya hebûka wî jê bistîne
û yêd xerîb k’eda wî t’alan kin.
12 Bira dilê kesekî li wî neşewite
û gunê kesekî li sêwîyêd wî neyê.
13 Bira t’ûr’a wî bê bir’înê,
navê wî nisilê dinda bê hildanê.
14 Bira bêolîtîya kal-bavêd wî li ber Xudan bê bîranînê
û guneyê dîya wî neyê r’esîtkirinê.
15 Bira her t’im li ber ç’e’vê Xudan bin
û Ew bîranîna wan ji dinê bide hildanê.
16 Çimkî nekire bîra xwe ku r’e’mê bike,
lê ew pey merivê belengaz, k’esîb
û xweyê dilê k’eser k’et ku wî bikuje.

---

* 109:6 «Satan» xebereke îbranî ye, ku tê fe’mkirinê «şikîyatkir». Dîwanêd vê dinêda yan dîwana Xwedêda şikîyatkir hene.
* 109:8 K’arêd Şandîya 1:20.
* 109:10 Têk’st anegorî welger’andina Yûnanîye kevin e, lê bi îbranî xeber bi xeber aha ye: «Ji xirabêd xwe derk’evin, nan bixwazin».

17 Ewî nifir' h'iz kir, bira nifir' ser wîda bê,
dua-dirozge nexwest, bira ew jê dûr k'eve.
18 Nifir' mîna k'incekê li xwe kir,
de bira ew nifir' mîna avê her'e nav-dil
û mîna bizir bik'eve hestûyêd wî.
19 Bira bibe mîna k'inca wîye xwekirinê
û mîna benpişta wîye ku her t'im girê dide.

20 De bira ev be heqê şikîyatkirêd min alîyê Xudanda,
ku bona nefsa min xirab xeber didin!
21 Lê belê Tu, Xweyî, Xudan,
bona xatirê navê Xwe alîk'arîyê li min bike
li gora qencî û aminîya Xwe min xilaz ke.
22 Çimkî ez belengaz û feqîr im,
dilê xweda birîndar im.
23 Ez mîna sîya êvarê derbaz bûm çûm,
mîna kulîya hatime dawşandinê.
24 Ji dest r'ojîya ez qudûm k'etim
û qalibê min ji h'edemê xwe h'elîya maşîya.
25 Ez bûme pêk'enîyê şikîyatkirêd xwe,
min dibînin serê xwe dih'ejînin*.

26 Alî min bike, Xudan, Xwedêyê min,
min xilaz ke anegorî h'uba Xweye amin.
27 Bira bizanibin ku eva ji destê Te ye
û van yeka Tu, Xudan dikî.
28 Evana bira nifir'a bikin, lê Tê dua li min bikî,
gava ew h'icûmî li ser min bikin, bira ew şermî bin,
lê xulamê Te bira şa be.
29 Bira qarada bimînin şikîyatkirêd min
û r'obetîya wan mîna k'inca li ser wan be.

30 Ezê gelekî bi devê xwe şikirîyê bidime Xudan
û nava gelekada ezê pesinê Wî bidim.

---

* 109:25 Metta 27:39.

31 Çimkî Ew li milê k'esîbîyî r'astê disene,
wekî wî ji lomek'ara xilaz ke.

## Xudan û P'adşayê Wîyî bijartî

**110** *Zebûra Dawid.*
1 Xudan gote Xweyê min*:
«Li milê Minî r'astê r'ûnî,
h'eta neyarêd Te bikime binê p'îyêd Te»**.

2 Xudanê şiva qewata Te ji Sîyonê bişîne,
li nava neyarêd Xweda serwêrtîyê bike.
3 R'oja her'î şêr', cime'ta Teyê bi r'ezedilî bê
û xortêd Teyê jî mîna qir'avîya berbangê bûyî bin,
ewê bêne cem Te ser ç'îyayêd pîroz.

4 Xudan sond xwar û p'oşman nabe:
«Tu h'eta-h'etayê K'ahîn î, mîna Melk'î-Sadiq»*.

5 Xudan li milê Teyî r'astê ye,
wê r'oja ku hêrs k'eve Ewê p'adşa hûrdexweşî ke.
6 Ewê nava miletada h'akimtîyê bike,
dor-bera mirîyava t'ijî ke,
gelek welatada serîya bişkêne.
7 Ewê r'êva ji nixala vexwe,
bona vê yekê serê Xwe bilind ke*.

---

* 110:1 Bi îbranî xeber bi xeber aha ye: «Yahwê gote Adon-ê min». «Yahwê» navê Xwedêyî pîroz e û «Adon» tê fe'mkirinê «xweyî». Welger'andina yûnanîye kevinda, her du «Kûryos» in, ku tê fe'mkirinê «xweyî» yan «xudan».

** 110:1 Metta 22:44; Marqos 12:36; Lûqa 20:42-43; K'arêd Şandîya 2:34-35; Korint'î I 15:25; Efesî 1:20-22; Kolosî 3:1; Îbranî 1:13; 8:1; 10:12-13.

* 110:4 Îbranî 5:6; 6:20; 7:17, 21.

* 110:1-7 Bi fikira gelek zana, eva zebûra bona qewîn-qedîmkirina t'extê p'adşêd Îsraêlêye ji zur'eta Dawid dihate gotinê. Du gotinêd

## Pesindayîna kir û k'eremetêd Xudan

**111** 1 Halêlûya!

Ezê bi dil şikirîyê bidime Xudan,
nava civata r'asta û cime'têda.
2 Kirêd Xudan çiqasî mezin in,
h'izkirîyêd wan, wanda k'ûr dibin.
3 Kirêd Wî r'ewş û r'ûmet in,
r'astîya Wî dimîne h'eta-h'etayê.
4 Bi k'eremeta, Xwe dide e'yankirinê,
Xudan r'e'm û dilşewat e.
5 Xurek dide xofk'êşêd Xwe,
her t'im bîr tîne peymana Xwe.
6 Qewata kirêd Xwe nîşanî cime'ta Xwe kir
wekî cî-warêd mileta bide wan.
7 Kirêd destê Wî r'astî û heqî ne,
h'emû t'emîyêd Wî aminî ne.
8 Ew h'eta-h'etayê h'îmgirtî ne,
ser r'astîyê û h'elalîyê pêşda hatî ne.
9 Ewî cime'ta Xwer'a azadbûn şand,
peymana Xwe h'eta-h'etayê mak kir.
Pîroz û saw e navê Wî.
10 Serê zanebûnê xofa Xudan e,
yê t'emîyêd Wî diqedîne, her yek bîlan e.
Pesindayîna Wî her-t'im dimîne*.

---

Xudane bi devê p'êxember vêda hene, ya pêşin r'êza 1-da ye û ya duda r'êza 4-da ye, her du nava van «...» kevanada ne. Gava p'adşakî nû ji zur'eta Dawid ser t'extê xwe r'ûdinişt, hingê eva zebûra bona wî dihate gotinê. Îlahî ev zebûra bona Mesîh hatîye gotinê, çimkî Ew jî ji zur'eta Dawid dihate h'esabê (Lûqa 1:31-32; Metta 1:6, 17; 15:22; 21:9). Îsa Mesîh r'êza yekêye vê zebûrê hilda ser Xwe. Binihêr'e: Metta 22:44, Marqos 12:36, Lûqa 20:42, K'arêd Şandîyada 2:34.

* 111:1-10 Eva zebûreke «akrostîk» e, awa gotî anegorî elîfbeya h'erfêd îbranî çêkirî ye.

### Merivêd xwezilîye bextewar

**112** 1 Halêlûya!
Xwezî li wî bendeyî,
ku ji Xudan xof dike
û t'emîyêd Wî gelekî begem dike.
2 Zur'eta wîyê li ser e'rdê serxwe be,
duayê li bereka r'asta be.
3 Mala wîyê hebûkêda xinê be,
r'astîya wîyê h'eta-h'etayê bimîne.
4 Te'rîyêda r'onayî dertê ser r'asta,
ewana r'e'm, amin û dilşewat in.
5 Merivê qenc r'e'mê dike û deyn dide,
h'emû k'arê xwe bi heqîyê mîyaser dike.
6 Çimkî r'astê t'u car nalik'ume,
navê wîyê h'eta-h'etayê bimîne.
7 Ew ji deng-be'sê xirab natirse,
dilê wî şidîyayî ye, Xudanda guman e.
8 Dilda qewîn e, ew natirse,
yeke wê bela neyarêd xwe bibîne.
9 Ew bela dike û dide feqîr-belengaza,
r'astîya wîyê bimîne h'eta-h'etayê*,
strûyê wîyê bi r'ûmet bilind be.
10 Nep'akê vê yekê bibîne û hêrs k'eve,
dirana biç'ir'ikîne û bih'ele,
meremê nep'aka wê bit'er'ibe*.

### Xwedê qenc û piştovanê k'etîya ye

**113** 1 Halêlûya!
Pesinê Xudan bidin, gelî xulamêd Wî,
pesinê navê Xudan bidin.

---

* 112:9 Korint'î II 9:9.
* 112:1-10 Eva zebûreke «akrostîk» e, awa gotî anegorî elîfbeya h'erfêd îbranî çêkirî ye.

2 Şikirîyê bidine navê Xudan,
ji nihava h’eta-h’etayê.
3 Ji r’ohilatê h’eta r’oavayê,
hêjayî pesina ye navê Xudan.
4 Xudan ser h’emû miletar’a ye,
r’ûmeta Wî fêza e’zmana ye.

5 K’î mîna Xudan Xwedêyê me ye,
ku jor bilindayêda dimîne,
6 Xwe qûz dike, dîna Xwe dide e’rd û e’zmana?
7 Ew feqîr ji ser xwelîyê r’adike
û belengaz ji ser k’ulîk bilind dike,
8 wekî k’êleka e’silzada bide r’ûniştandinê,
t’evî e’silzadêd miletê Xwe,
9 k’ulfeta bêber malda didebirîne,
dike dayîka ewleda bi dilê şaye.

Halêlûya!

### Bîranîna derk’etina ji Misirê

**114** 1 Gava Îsraêl ji Misirê derk’et,
mala Aqûb ji nav cime’ta zimanê xerîb.
2 Cihûda bû pîrozgeha Wî,
Îsraêl jî h’ukumetîya wî.

3 Be’rê ev yek dît û r’evî,
Ûrdun şûnda veger’îya.
4 Ç’îya mîna berana banzdan,
gir jî mîna berxa r’icifîn.

5 Çi bû ter’a, hey be’rê, ku r’evîyî
û Ûrdunê ku tu şûnda veger’îyayî?
6 Çima ç’îyano we mîna berana banzda,
hûn gir jî mîna berxa r’icifîn?

7 E'rdo ji dîndara Xweyî bilerize,
ji dîndara Xwedêyê Aqûb,
8 ku Ew qeyê dike gola avê,
cîyê kevirî kanîya avê.

### Xwedêyê bêşirîkî bêheval

**115** 1 Ne ku me Xudan, ne ku me,
lê r'ûmetê bide navê Xwe,
bona h'ub û aminîya Xwe.

2 Çima p'ûtp'arist bêjin:
«K'anê Xwedêyê wan?»

3 Xwedêyê me li e'zmên e,
Ew çi dixwaze wê jî dike.
4 Lê p'ûtêd wan zêr' û zîv in,
kirêd destêd mêriv in.
5 Devê wan hene nak'êlimin,
ç'e'vêd wan hene nabînin,
6 guhê wan hene nabihên,
pozê wan hene bînê hilnadin.
7 Destêd wan hene nap'elînin,
nigêd wan hene ew nager'in
û ji gewrîya xwe deng dernaxin.
8 Yêd wan çêdikin wê bibine mîna wan
û usa jî h'emûyêd ku wanda guman in.

9 Gelî Îsraêlîya! Xudanda guman bin,
Ew e k'omekdar û mert'ala we.
10 Mala Harûn! Xudanda guman be,
Ew e k'omekdar û mert'ala we.
11 Gelî Xwedêxofa! Xudanda guman bin,
Ew e k'omekdar û mert'ala we.

12 Xudan me bîr tîne û me pîroz dike,
wê mala Îsraêl pîroz ke,
wê mala Harûn pîroz ke,
13 wê xwedêxofa pîroz ke,
biç'ûka jî t'evî mezina.

14 Bira Xudan we zêde ke,
we û ewledêd weva.
15 Dua li we be ji Xudan,
e'firandarê e'rd û e'zman.

16 E'zman e'zmanêd Xudan in,
lê e'rd Wî da merivayê.
17 Mirî pesinê Xudan nadin,
k'îjan ku li warê ker' û lal in.
18 Lê emê pesinê Xudan bidin,
ji nihava h'eta-h'etayê.

Halêlûya!

### Pesindayîna ji mirin azadbûnê

**116** 1 Ez Xudan h'iz dikim,
Ewî dengê zarînîya min bihîst.
2 Ewî guhê Xwe da ser min,
ezê t'emamîya r'ojêd xwe gazî Wî kim.
3 Xumama mirinê ser minda girt,
derd-kulêd gor'istên ez dîtim,
te'lî tengî ser minda hat.
4 Hingê min gazî navê Xudan kir:
«Xudano! E'mirê min xilaz ke».

5 Xudan xêrxwaz û amin e,
Xwedêyê me dilşewat e.
6 Xudan yêd sade xwey dike,
gava ez k'etim, ez xilaz kirim.

7 Nefsa min were ser r'ih'etîya xwe,
çimkî Xudan ter'a qencî kir.

8 Te nefsa min ji mirinê xilaz kir,
ç'e'vê min jî ji hêsira paqij kir,
nigê min jî lik'umandinê Te xwey kir.
9 Ezê biger'im li ber Xudan warê zêndîyada.
10 Gava ez h'alê giranda bûm,
min dîsa bawarîya xwe unda nekir*.
11 Min şaşîya xweda got:
«Her meriv derew e».

12 Ez çi bidime Xudan,
bona t'emamîya qencîya Wîye ser min?
13 K'asa azadîyê hildim bir'êjim*
û gazî navê Xudan kim.
14 Ad-qirarêd min ber Xudan kirî,
ezê li ber cime'ta Wî bînim sêrî.
15 Mirina amina ber ç'e'vê Xudan biha ye.
16 Xudano! Ez e'vdê Te me, ez e'vdê Te me
û kur'ê carîya Te me,
Te qeydêd min vekirin.
17 Ezê dîyarîya r'azîdarîyê Ter'a bidim
û gazî navê Xudan kim.
18 Ad-qirarêd min ber Xudan kirî,
ezê li ber cime'ta Wî bînim sêrî,
19 h'ewşêd Xana Xudanda,
nava teda, Orşelîmê!

Halêlûya!

* 116:10 Korint'î II 4:13.

* 116:13 Ew dîyarîya şeravê bona şikirdayîna navê Xudan ser gorîgehêda dihate r'êtinê.

**Pesindayîn**

**117** [1] Pesinê Xudan bidin, gelî mileta,
eşqî Wî bistirên gelî cime'ta*.
2 Çimkî h'uba Wî li ser me mezin e
û aminîya Xudan h'eta-h'etayê ye.
Pesinê Xudan bidin!

**Stirana şikirdarîyêye serk'etinê**

**118** [1] Şikirîyê bidine Xudan, Ew qenc e
û h'uba Wî h'eta-h'etayê ye!

2 De bira Îsraêl bêje:
«H'uba Wî h'eta-h'etayê ye».
3 De bira mala Harûn bêje:
«H'uba Wî h'eta-h'etayê ye».
4 De bira xudanxof bêjin:
«H'uba Wî h'eta-h'etayê ye».

5 Tengasîyêda min gazî Xudan kir,
Xudan cab da, ez derxistime fireyê.
6 Xudan t'evî min e, ez natirsim,
însanê çi li min bike?*
7 Xudan k'omekdarê min e,
ezê axirîya neyarêd xwe bibînim.
8 Ya p'ak e Xudanda guman bin,
ne ku xwe bispêrine benda.
9 Ya p'ak e Xudanda guman bin,
ne ku xwe bispêrine mîr û bega.

10 H'emû mileta ser minda girtin,
lê bi navê Xudan ez wan hûrdexweşî dikim.

---

* 117:1 R'omayî 15:11.
* 118:6 Îbranî 13:6.

11 Her alîyava dora min girtin,
lê bi navê Xudan ez wan hûrdexweşî dikim.
12 Mîna moza dora min girtin,
lê mîna agirê stirîya ew tefîyan,
bi navê Xudan ez wan hûrdexweşî dikim.
13 Ez qewîn de’f dam ku bik’evim,
lê Xudan alî min kir.
14 Xudan qewat û qudreta* min e,
Ew bona min xilazkir e.

15 Dengê şabûn û serk’etinê ji konêd r’asta tê:
«Destê Xudanî r’astê qewatê dike.
16 Destê Xudanî r’astê bilindkirî ye,
destê Xudanî r’astê qewatê dike».

17 Ez namirim, ezê bijîm,
kirinêd Xudan ezê salix kim.
18 Xudan gelekî serê min kir,
lê ez nedame destê mirinê.

19 Dergehêd r’astîyê* minr’a vekin,
ku bik’evime nav wan
û şikirîyê bidime Xudan.
20 Eva dergehê Xudan e,
r’astê wirr’a bik’evinê.

21 Şikir ji Ter’a, Te dengê min bihîst
û minr’a bûyî xilazkir.
22 Ew kevirê ku hosta t’exsîr kir,
ew bû serê e’nîşkê.

---

* 118:14 Xebera «qudret» bi îbranî usa jî tê fe’mkirinê: «zebûr» yan «stiran».

* 118:19 «Dergehêd r’astîyê» tê fe’mkirinê hin çawa «dergehêd serk’etinê», hin jî «dergehêd xwe r’astîyê girtinê», awa gotî «dergehêd P’aristgehê».

23 Ev yek ji alîyê Xudanda qewimî
û li ber ç’e’vê me h’eyr-h’ujmek’ar e!*
24 Eva r’oja Xudan xuliqand,
werin em vêda eşq û şa bin.
25 Hewar Xudan, me xilaz ke!
Hewar Xudan, mer’a li hev bîne.

26 Bimbarek e ewê ku bi navê Xudan tê!
Em ji Xana Xudan we bimbarek-pîroz dikin*.
27 Xudan e Xwedê, Wî em r’onayî kirin.
Pê bena qurbana cejinê girêdin,
h’eta stirûyê gorîgehê bibin.

28 Tu yî Xwedêyê min, ezê şikirîyê bidime Te,
Tu yî Xwedêyê min, ezê Te bilind kim.

29 Şikirîyê bidine Xudan, Ew qenc e
û h’uba Wî h’eta-h’etayê ye!

**Xwezî li h’izkirîyêd hînkirina Xudan**

***ALÊF***

**119** 1 Xwezî li yêd r’êdaye bêlek’e,
ku hînkirina Xudanda dijîn.
2 Xwezî li yêd t’emîyêd Wî xwey dikin
û bi t’emamîya dilê xwe li Wî diger’in.
3 Ewana neheqîyê nakin,
lê r’îyêd Wîda dimeşin.
4 Te e’mir kir ku qanûnêd Te
bi guhdarî bêne qedandin.
5 Xwezî r’îyêd min r’ast bûna,
min qanûnêd Te xweykirana.

---

* 118:22-23 Metta 21:42; Marqos 12:10-11; Lûqa 20:17; K’arêd Şandîya 4:11; Petrûs I 2:4, 7.
* 118:25-26 Metta 21:9; 23:39; Marqos 11:9; Lûqa 13:35; 19:38; Yûh’enna 12:13.

6 Ezê hingê t’u car şermî nebim,
gava ç’e’v bidim h’emû e’mirêd Te.
7 Bi dilê r’ast ezê pesinê Te bidim,
gava qirarêd Teye heq ez hîn bim.
8 Ezê xwey kim qanûnêd Te.
Tu lap dest ji min nek’işîne.

### Cahil çawa bêlek’e be

***BÊT’***

9 Cahil çawa dikare r’îya xwe paqij xwey ke?
Gava pê xebera Te miqatîyê li xwe bike.
10 Ez bi dil û can Te diger’im.
Nehêle ku ez ji e’mirêd Te bixalifim.
11 Sozê Te dilê xweda xwey dikim,
wekî li ber Te ez gune nekim.
12 Xudano! Tu xweyîpesin î,
Qanûnêd Xwe Tê min hîn kî.
13 Ez h’emû qirarêd devê Te
dikime dengî bi zarê xwe
14 Ez şa dibim r’îya t’emîyêd Teda,
çawa nava her xêr û xiznêda.
15 K’ûr difikirim ser qanûnêd Te,
dîna xwe didime r’ê-dirbêd Te.
16 Bi qanûnêd Te ez şa dibim,
xebera Te t’u car bîr nakim.

### K’eremetêd hînkirina Xwedê

***GÎMÊL***

17 Bike qencî xulamê Xwer’a,
ku ez bijîm xebera Ter’a.
18 Li min veke Tu van ç’e’va,
wan k’eremetêd hînkirina Xwer’a.
19 Ez r’êwî me li ser e’rdê,
e’mirêd Xwe neke pişt p’er’dê.
20 Ez h’elîyame û maşîyame,
her gav demana qirarêd Te me.

21 Tu k'ubarêd nifir'kirî hiltêyî,
yêd ku ji e'mirêd Te xalifîne.
22 Nav-nûçikêd wan ji ser min hilde,
çimkî ez xwey dikim wan t'emîyêd Te.
23 Serwêr r'ûdinîn miqabilî min dikin xeybe,
Lê qûlê Te ser qanûnêd Te k'ûr difikire.
24 T'emîyêd Te şabûnêd min in
ew se'vî-şîretk'arêd min in.

## Duayê guhdarîkirina qeyde-qanûnêd Xudan

***DALÊT'***

25 Jîyîna min bûye ax-xwelî
anegorî xebera Xwe Tê min sax kî.
26 R'îyêd xwe Teva kirine e'yan Te cab da,
Tu bîlan ke min wan qanûnêd Xweda.
27 Ber min veke Tu wan r'îya qanûnêd Xwe,
ezê k'ûr bim li ser wan k'eremetêd Te.
28 Ji k'eserê ez dih'elim-dimaşim,
gor gotina Xwe bike ku ez qewîn bim.
29 R'îya derewîyê ji min dûr xe
û hînkirina Xwe p'êşk'êşî min ke.
30 Min r'îya r'astîyê danî ber xwe
û qirarêd Te dane pêşîya xwe.
31 Ez bûme maşoq t'emîyêd Ter'a,
Xudan, min nede qarê şermêr'a.
32 Ezê bibezim r'îya e'mirêd Teda,
gava zêde kî min aqilda.

## Duayê bona naskirina t'emîyêd Xwedê

***HÊ***

33 R'îya qanûnêd Xwe min hîn ke, Xudan,
h'eta ez xweş bim ezê xwey kim wan.
34 Min serwaxt ke, hînkirina Te ez xwey kim
û bi t'emamîya dilê xwe wê biqedînim.
35 Min bike wê şiver'îya e'mirêd Xwe,
ku wanda deman û h'eyran im ez bi xwe.

36 Dilê min qayl ke t'emîyêd Xwer'a,
ne ku hebûkêva bêm girêdanê.
37 Ç'e'vê min xwey ke ji boş-betalîyê
û r'îya Xweda Tu min bide jîyanê.
38 Qedîm ke sozê Xwe bona qûlê Xwe,
bona wî e'vdê ku ji Te xof dike.
39 Ji wê qara jê ditirsim ser min hilde,
çimkî qenc in qeyd-qirarêd Te.
40 Ezî h'eyra qeyd-qanûnêd Te me,
r'uh' bide ber min bi r'astîya Xwe.

**Gumana ser xebera Xwedê**

***VAV***

41 Xudan, h'uba Te bira min bigire,
xilazkirina Te jî weke sozê Te.
42 Hingê caba p'êk'enîyêd xwe ezê bidim,
çimkî xebera Teda ez guman im.
43 Xebera r'astîyê ji devê min kêm neke,
çimkî nefsa min qirarêd Teda guman e.
44 Hînkirina Te ezê xwey kim
ji her-heyê û her t'im.
45 Firêqetîyêda ezê her'im,
çimkî qanûnêd Te ez diger'im.
46 Pêş p'adşêva t'emîyêd Te ezê bêjim,
t'u car ezê qet venek'işim.
47 E'mirêd Ter'a ezê şa bim,
k'îjana ku ez h'iz dikim.
48 Destê xwe dirêjî e'mirêd Teye h'izkirî dikim
û li ser qanûnêd Te k'ûr difikirim.

**Xebera Xudan kanîya guman û baristanîyê ye**

***ZAYN***

49 Bîr bîne sozê Te da qûlê xwe,
Te kir ku wê bikime gumana xwe.
50 Tengîyêda ew e bîna ber min,
çimkî sozê Teye saxîya min.

51 Gelekî dik'enin ser min k'ubar,
lê ji hînkirina Te ez naçim berwar.
52 Xudano, qirarêd Teye her-t'im
ez bîr tînim baristan dibim.
53 Boy nep'aka agir dide serê min,
ku dibînim hînkirina Te dihêlin.
54 Qanûnêd Te minr'a bûne stiranî,
Li wî warê minî firarî.
55 Şevê navê Te ez bîr tînim,
Xudano, hînkirina Te xwey dikim.
56 Ew p'eşk k'ete p'ara min,
çimkî qanûnêd Te xwey dikim.

### Maşoqê hînkirina Xudan

***H'ÊT'***

57 Milk'ê p'ara min, Xudan e,
sozê min xebera Te kirin e.
58 Bi dil dikim van r'eca ye,
bike r'e'mê gor soza ye.
59 Ez fikirîm ser r'îyêd xwe
t'emîyêd Teda kir gavêd xwe.
60 Dilezînim, derengî naxim,
ku e'mirêd Te biqedînim.
61 T'or'ê nep'aka dor min girtin,
lê hînkirina Te bîr nekir min.
62 Nîvê şevê ez r'adibim,
boy qirarêd Teye r'ast pesin didim.
63 Ez hogirê xofk'êşêd Te me,
ku xwey dikin qanûnêd Te.
64 T'ijî ye dinya h'uba Teva
Xudan minva veke qanûnêd Xwe.

### Qîmetê hînkirina Xudan

***TÊT'***

65 Te qencî kir li qûlê Xwe,
Xudan weke gotina Xwe.

66 Zanebûn, serwaxtîya qenc min hîn ke,
çimkî bawerîya min ser e’mirêd Te ye.
67 H’eta ser bela xwe ez venebûm dixalifîm,
lê niha xebera Te ez xwey dikim.
68 Tu qenc î û qencî ji Te dibare,
qanûnêd Xwe Tu min hîn ke.
69 K’ubar şer’a min dikin gilî,
lê ez şîretêd Te xwe dikim xweyî.
70 Mejûyê wan mîna don qer’imî ye,
lê hînkirina Te minr’a eşq û şayî ye.
71 Qenc bû ku ser bela xwe vebûm
û qanûnêd Te ez ser vebûm.
72 Minr’a hînkirina ji devê Te
ji h’ezar zêr’ û zîvî çêtir e.

### Heqîya qanûna Xudan

***YOD***

73 Destêd Te ez xuliqandim û çêkirim,
min serwaxt ke ku e’mirêd Te ez hîn bim.
74 Xofk’êşêd Teyê min bibînin û şa bin,
bona wê yekê ku sozê Teye gumana min.
75 Zanim Xudan, qirarêd Te bi r’astîyê ne,
weke aminîya Xwe ber bêvila min derxistine.
76 Bira aminîya Te bibe minr’a baristanî,
weke wî sozê qûlê Xwer’a Te dayî.
77 R’e’ma Te bira ser minda bê ez bijîm,
çimkî hînkirina Ter’a xweş bengizîm.
78 Bira k’ubarêd buxdana min dikin şermî bin,
lê qanûnêd Teda nin k’ûr fikirêd min.
79 Bira veger’in ser minda bên xofk’êşêd Te
û ew kesêd ku nas dikin wan t’emîyêd Te.
80 Dilê min bira qanûnêd Teda bêlek’e be,
ku nefsa min wê yekêda şermî nebe.

### Duayê t'îyê azadîyê

***K'AF***

81 Ez dih'elim ji dest h'eyra azadîya Te,
min guman danîye li ser wê xebera Te.
82 K'erbî xebera Te k'orda çûne ç'e'vê min
û dibêjim: «K'engê Tê bikî baristanîya min?»
83 Ez bûm mîna e'yarê nav dûda,
lê qanûnêd Te min ber'neda.
84 Qûlê Teyê çiqasî hîvîya Te be?
Dîwana peyk'etîya wê k'engê ji Te be?
85 K'ubara bona min ç'e'l k'olaye,
ku ne li gora hînkirina Te ye.
86 H'emû e'mirêd Te aminî ne,
hewar! Ew cîyê amî-t'am pey min k'etî ne!
87 Hindik mabû ez ser dinê nehiştama
lê min qeyde-qanûnêd Te yek ber'neda.
88 Weke h'uba Xwe min nûyejîyîn ke,
ezê jî xwey kim t'emîyêd devê Te.

### Aminîya qanûna Xudan

***LAMÊD***

89 Xudano, xebera Te h'eta-h'etayê ye,
ew e'zmênda qewîn-qedîm e.
90 Aminîya Te qur'ne-qur'ne dimîne,
Te dinya ava kir, ew qewîn sekinîye.
91 Weke qirara Te ew h'eta îro sekinîne,
çimkî ew h'emû jî xizmetk'arêd Te ne.
92 Heger hînkirina Te şabûna min nîbûya,
ezê zûva me'rimîya xweda unda bûma.
93 H'eta sax im ez bîr nakim qanûnêd Te,
çimkî bi wan Tu min didî jîyane.
94 Ez p'ara Te me, min xilaz ke,
çimkî diger'im ez qanûnêd Te.
95 Nep'ak hîvîyê ne min unda kin,
lê t'emîyêd Teda ez k'ûr dibim.

96 Min dît ku axirîya her tiştî heye,
lê belê e’mirê Te bêaxirî ye.

### H’izkirina hindava hînkirina Xudanda

*MÊM*

97 Hînkirina Te çiqasî ez h’iz dikim!
T’emamîya r’ojê ez ser wê difikirim.
98 E’mirêd Te min ji neyara serwaxttir dikin,
çimkî her t’im ew t’evî min in.
99 Ez ji h’emû dersdarêd xwe bîlantir bûme,
çimkî fikirêd min ser t’emîyêd Te ne.
100 Ji kalemêra aqiltir bûme,
çimkî xwey dikim qeyde-qanûnêd Te.
101 Ez nigêd xwe ji r’îya xirab dûr dixim,
wekî xebera Te ez biqedînim.
102 Ez ji qirarêd Te dûr nak’evim,
çimkî Tu yî dersdarê min.
103 Xebera Te çiqas şîrin e gewrîya minda,
ew ji hingiv zêdetir e devê minda.
104 Bi qanûnêd Te zanebûnê ez dest tînim,
lema ku ez her r’îya derew dijenim.

### Xebera Xudan r’onayî ye

*NÛN*

105 Xebera Te ç’ira gavêd min e
û r’onaya şiver’îyêd min e.
106 Min sond xwarîye, ezê bînim sêrî,
ku qirarêd Teye r’ast bînime cî.
107 Xudan min gelek tengasî k’işandin,
weke xebera Xwe r’uh’ bide ber min.
108 P’êşk’êşêd bi dil ji devê min qebûl ke
û qirarêd Xwe Tu li min hîn ke.
109 Ez her gav ber hêşîya mirinê me,
lê hînkirina Te min bîr nekirîye.
110 Nep’aka bona min t’elek danîne,
lê ez ji qeyde-qanûnêd Te nexalifîme.

111 T'emîyêd Te warê minî h'eta-h'etayê ye,
çimkî ewe dilê minda weke şayîyê ye.
112 Min qirar kir, qanûnêd Te xwey kim,
ji her-heyê h'eta xilazîyê.

## Xebera Xudanda bêxofî ye

*SAMÊX*

113 Yêd dudilî r'eş in ber ç'e'vê min
lê hînkirina Te ye h'uba dilê min.
114 Tu yî sit'ar, mert'ala min,
xebera Te ye gumana min.
115 Hey xirabno, ji min dûr k'evin,
ku e'mirêd Xwedêyê min bên xweykirin.
116 Gor sozê Xwe stûn be minr'a, ezê bijîm,
neke ku ez gumanêda şermî bim.
117 Piştovanê min be, ezê xweykirî bim
û her t'im qanûnêd Teda ezê agadar bim.
118 Tu yêd ji qanûnêd Te dixalifin davêjî,
çimkî h'ilek'arîya wanda heye boş-betalî.
119 Nep'akêd dinê bona Te h'emû mîna bîso ne,
lema t'emîyêd Te, ew bona min h'uba dila ne.
120 Ji sawa Te ez ser hevda dilerizim,
ji qirarêd Te ez ditirsim.

## Qedandina qanûna Xudan

*E'YN*

121 Min heqî û r'astî kirin,
min nede destê zordarêd min.
122 Sozê açixiyê bide qûlê Xwe,
ku yê k'ubar ew nikaribe zordar be.
123 Ç'e'vê min qer'imîn hîvîya azadîya Te me,
hîvîya xebera r'astîya Te me.
124 Qûlê xwer'a weke h'uba Xwe bike
û qanûnêd Xwe Tu min hîn ke.
125 Ez xulamê Te me, aqil bide min,
ku t'emîyêd Te minva bên nas kirin.

126 Îdî wextê kirina Xudan e,
çimkî hînkirina Te t'er'ibandine.
127 Lê belê ew h'izkirina e'mirêd Te,
minr'a ji zêr' û ji zêr'ê xalis çêtir e.
128 Lema ez r'ast xwe li h'emû qanûnêd Te digirim,
lê ji h'emû r'îyêd derew ez die'nirim*.

### Guhdarîkirina qanûna Xudan

***P'Ê***

129 T'emîyêd Te h'eyre h'ujmek'ar in,
lema ez xwe wanr'a dikim h'eyran.
130 E'yanbûna xebera Te r'onayî dike,
ew merivêd sade serwaxt dike.
131 Devê xwe vedikim k'eser tê min,
e'mirêd Te ne bîna ber min.
132 Dîna Xwe bide min, min were r'e'mê,
weke e'detê Xwe, boy maşoqêd navê Xwe.
133 Xeberêd Xweda Tu gavêd min bişidîne,
h'ukumê xirabîyê bira li ser min nemîne.
134 Min xilaz ke ji zordara,
ezê biqedînim qeyde-qanûna.
135 Sifetê Xwe gul de ser qûlê Xwe,
min hîn bike qeyd-qanûnêd Xwe.
136 Ç'emêd ava ji ç'e'vêd min dik'işin,
çimkî meriv hînkirina Te xwey nakin.

### Xudan û qanûna wî r'ast in

***TSADÊ***

137 Tu ser r'astîyê yî, Ya Xudan
û qirarêd Te r'aste-r'ast in.
138 T'emîyêd Teye Te t'emî kirine,
ew r'ast in û serê r'astîyê girtine.
139 Xîreta min min dih'elîne,
çimkî neyar gotina Te bîr nayîne.

---

* 119:128 Awa gotî «acizbûn, jêçûyîn, ji ber ç'e'va r'eş».

140 Sozê Te gelekî amin e
û xulamê Te wî h’iz dike.
141 Ez yekî nimizî bêqedir im,
lê qanûnêd Te ez bîr nakim.
142 Heqîya Te heqîya her-heyî ye
û hînkirina Te r’astî ye.
143 Derd û kul hatin serê min,
lê e’mirêd Te ne, şabûna min.
144 Heqîya t’emîyêd Te h’eta-h’etayê ye,
Bona ku ez bijîm, min serwaxt ke.

**Duayê hewarê**

***QOF***

145 Xudan, ez bi dil û can gazî dikim,
min bibihê ku qanûnêd Te biqedînim.
146 Min xilaz ke hewar dikim,
ezê t’emîyêd Te biqedînim.
147 Berbangê r’adibim dikim gazî,
min gumana xwe xebera Te anî.
148 Bedîlêd şevê ç’e’vê xwe vedikim
û li ser sozê Te k’ûr difikirim.
149 Min bibihê weke wê h’uba Xwe,
Xudano, weke e’detê Xwe min sax ke.
150 Yêd xwe neheqîyê girtine nêzîk dibin,
wan ji hînkirina Te xwe dûr girtin.
151 Lê Xudan Xwexa nêzîk e,
h’emû e’mirêd Wî r’astî ne.
152 Hê berêda ez t’emîyêd Te hîn bûme,
h’eta-h’etayê Te ewana qedîm kirine.

**Hewara k’omekdarîyê**

***R’ÊŞ***

153 H’alê minda binihêr’e, min xilaz ke,
çimkî bîr nakim ez hînkirina Te.
154 Pişta heqîya min bigire, min azad ke,
weke xebera Xwe Tu min sax ke.

155 Ji yê nep’ak xilazbûn dûr e,
çimkî qanûnêd Te ew nager’e.
156 Ya Xudan, r’e’ma dilê Te gelek e,
weke heqîya Xwe min sax xwey ke.
157 Gelek in neyar û p’eyk’etîyêd min,
lê t’emîyêd Te xwe dûr nexist min.
158 Zivêr dibim ku dibînim r’êk’etîya
wan nikaribû xebera Te cî banîya.
159 Binihêr’e çiqas ez h’iz dikim qanûnêd Te,
bike li gora wê h’uba Xwe,
min xwey ke.
160 Xeberêd Te t’emamîya xweva r’astî ne,
h’emû qirarêd Teye heq,
h’eta-h’etayî ne.

**Xwe dide hînkirina Xudan**

***ŞÎN***

161 Serwêr cîyê amî-t’am pey min k’etî ne,
lê dilê min xeberêd Teva xofî ye.
162 Sozê Ter’a ez gul didim,
çawa ser xiznê ez vebibim.
163 Dijenime derewîyê, jê zivêr im,
lê hînkirina Ter’a ez h’eyran im.
164 R’ojê h’eft cara pesinê Te didim,
bona qirarêd Te ku r’ast dibînim,
165 Ewêd xweyê hînkirina Te ne,
ji r’ê nak’evin, e’dilayêda ne.
166 Ez xilazkirina Teda guman im,
Xudano, e’mirêd Te ez diqedînim.
167 Ez t’emîyêd Te xwey dikim
û gelekî wan h’iz dikim.
168 Ez xwey dikim t’emî û qanûnêd Te,
çimkî h’emû r’îyêd min ber ç’e’vê Te ne.

### Duayê hewargazîyê

***T'AV***

169 Xudan, bira hêwarza min bê cem Te,
weke xebera Xwe Tu min serwaxt ke.
170 Bira r'ecayê min bê ber Te,
weke xebera Xwe min xilaz ke.
171 Ji devê min der tên şikirdarî,
çimkî qanûnêd Xwe Tu min hîn dikî.
172 Bira zimanê min xebera Te bike dengî,
çimkî h'emû e'mirêd Te ew in r'astî.
173 Bira destê Te li min piştovan be,
çimkî min bijartin qeyde-qanûnêd Te.
174 Xudano, ez h'eyra xilazkirina Te me,
şabûna min jî hînkirina Te ye.
175 Bira ez sax bim, pesinê Te bidim
bira qirarêd Te alîk'arê min bin.
176 Mîna peza undabûyî ez xalifîm,
qûlê Xwe biger'e, ez e'mirêd Te bîr nakim*.

### Duayê azadbûna ji derewîn û xeybkira

**120** *Stirana eşqî çûyîna h'ec.*
1 Te'lî-tengîya xweda,
min hewara xwe Xudan anî,
guhê Xwe Ewî ser min danî.
2 Xudano! Min xilaz ke,
ji yê derewîn û zarda qelp e.

3 Hey zarê vir'î-derew!
Wê çi bik'eve k'îsê te?
Wê çi bik'eve p'êşa te?
4 Tîrêd tûje mêrxasa,
pirîskêd k'ûra kuç'ika!

* 119:1-176 Eva zebûreke «akrostîk» e, awa gotî anegorî elîfbeya h'erfêd îbranî çêkirî ye.

5 Mayîna nava wanda haqasî xirab e,
tê bêjî ez Meşexêda dimînim,
yan jî konêd Qêdarêda dijîm*.
6 Gelekî dirêj nav wanda mame,
t'evî yêd ku neyarê e'dilayîyê ne.
7 Ez ku bona e'dilayîyê xeber didim,
lê ewana şer' dixwazin.

**Xudan xweykirîyê me ye**

**121** *Stirana eşqî çûyîna h'ec.*
1 Ez dîna xwe didime ç'îya.
Gelo k'omekê ji k'u bê minr'a?
2 K'omeka min ji Xudan e,
e'firandarê e'rd û e'zman e.

3 Ew nahêle ku nigê te bişimite,
Xweykirîyê te nahênije.
4 Xweykirîyê Îsraêlê
t'u car nahênije, r'anazê.

5 Xudan xweykirîyê te ye,
Xudan sîya ser te ye,
li milê teyî r'astê ye.
6 R'ojê te'vê te nexe,
ne jî hîvê şevê.
7 Xudanê ji her xirabîyê te xwey ke,
Ewê xwey ke e'mirê te.
8 Ç'e'vê Xudan wê ser k'etin-derk'etina te be,
ji îroda h'eta-h'etayê.

---

* 120:5 Meşex dik'ete nêzîkî Be'ra R'eş. Qêdar e'şîrek bû, ku nava qûmistanêda dima, ya ku nava Sûrîya û E'rebistanêda bû. Meşex û Qêdar ji Orşelîmê dûr bûn û binelîyêd wan dera mîna yêd beyanî dihatine h'esabê. Dibek cihû jî nava wanda hebûn. Belkî zebûrbêj bona wan cihûyêd ku ji Orşelîmê dûr diman stiraye.

### Duayê eşqî Orşelîmê

**122** *Stirana Dawide eşqî çûyîna h’ec.*
1 Ez şa bûm, gava minr’a gotin:
«Emê her’ine Xana Xwedê».
2 Nigêd me îdî dergehêd teda ne,
em gihîştin wan, hey Orşelîm!

3 Orşelîm bajarê çêkirî ye,
t’emamî hevva cîkirî ye,
4 Qebîl r’adibin wir, qebîlêd Xudan,
weke t’emîya bona Îsraêlê,
ku şikirîyê bidine navê Xudan*.
5 K’ursîyêd dîwanê wir danîne,
ew k’ursîyêd zur’eta Dawid in.

6 Bona Orşelîmê e’dilayê bixwazin:
«Bira r’îya wan r’ast be, yêd te h’iz dikin.
7 Bira e’dilayî be sûrêd teda
û açixî be qesirêd teda».
8 Bona xatirê bira û hevalêd xwe,
ez dibêjim: «Orşelîmê, e’dilayî li te».
9 Bona xatirê Xana Xudan, Xwedêyê me,
ez qencîyê ter’a dixwazim.

### Duayê bona r’e’mkirinê

**123** *Stirana eşqî çûyîna h’ec.*
1 Yê li e’zmên r’ûniştî, ç’e’vê min li Te ye!
2 Çawa ç’e’vê xulama destê xweyê wan e
û ç’e’vê carîya jî destê xanimêd wan e,
usa jî ç’e’vê meyê li Xudan, Xwedêyê me be,
h’eta Ew li me bê r’e’mê.

* 122:4 Binihêr’e: Şirovekirina Qanûnê 16:16-17.

3 Li me were r'e'mê, Xudano,
li me were r'e'mê.
Em t'êr bûne ji bêhurmetîyê,
4 em ji qerfê xwer'azîya
û bêhurmetîya k'ubar-babaxa t'êr bûne.

**Xwedê ye piştovanê cime'ta Xwe**

**124** *Stirana Dawide eşqî çûyîna h'ec.*
1 «Heger Xudan t'evî me nîbûya»,
de bira Îsraêl niha bêje:
2 «Heger Xudan t'evî me nîbûya,
gava meriva ser meda girt,
3 hingê wê saxe-sax em daqurtandana,
gava hêrsa wan li me r'abibû xwe dixwarin.
4 Ava wê em nava xweda mina kirina,
lêyîyê ser mer'a derbaz bûya,
5 avêd r'abûyî wê ser mer'a derbaz bûna».

6 Şikir ji Xudanr'a, ku em nedane
nêç'îra ber diranêd wan!
7 Mîna ç'ivîka em ji t'eleka
nêç'îrvana xilaz bûn,
t'elek şkestin em jê xilaz bûn.
8 K'omeka me ji navê Xudan e,
ku e'firandarê e'rd û e'zman e.

**Cime'ta Xwedêye bêxofîyêda**

**125** *Stirana eşqî çûyîna h'ec.*
1 Gumana k'îjana ser Xudan e,
ew mîna ç'îyayê Sîyonê ne,
ku ew ji cîyê xwe nah'eje
û h'eta-h'etayê dimîne.
2 Ç'îya çawa dora Orşelîmê ne,
usa jî Xudan dora cime'ta Xwe ye,
ji îroda h'eta-h'etayê.

3 Çimkî şivdara nep’aka
wê ser e’rdê r’astaye p’eşkavîtî nemîne,
nebe ku r’ast destêd xwe dirêjî neheqîyê kin.

4 Xudano, qencîyê bike li qenca,
xweyêd sitqê dilê r’asta.
5 Lê ewê r’îyêd xweye xarda xalifîne,
Xudanê r’îyêd wanda jî wan bişîne,
t’evî ewêd ku xwe neheqîyê girtine.

Bira xêr û xweşî li ser Îsraêlê be!

## Azabûna ji hêsîrtîyê

# 126

*Stirana eşqî çûyîna h’ec.*
1 Gava Xudan em hêsîr veger’andine Sîyonê*,
ew mer’a bû mîna xewnekê.
2 Hingê k’en li ber devê me k’et
û zimanê me jî r’eqisîn.
Nava miletada hingê hate gotin:
«Xudan bona wan tiştêd mezin kirin!»
3 Xudan bona me tiştêd mezin kirin
û em gelekî eşq û şa bûn.

4 Xudano, me dîsa bextewar ke,
mîna sêlafêd Negevê*.

5 Yêd ku pê hêsira dir’eşînin,
pê eşq û şabûnê wê bidirûn.
6 Yêd pê girî tûrikê t’oxim dir’eşînin,
wê bi stirana eşq gur’zêd xwe bînin.

---

* 126:1 Aha jî tê fe’mkirinê: «Gava Xudan dîsa Sîyon bextewar kir».
* 126:4 Negevê tê fe’mkirinê: «Başûr». Ew dereke bêav e û dik’eve başûra Cihûda. Û nişkêva ji baranê gelîyêd wan t’ijî dibin û gul didin.

### Her dayîna qenc ji Xwedê ye

**127** *Stirana Silêmane eşqî çûyîna h’ec.*
1 Heger Xudan malê çêneke,
badîhewa avakir dixebitin.
Heger Xudan bajêr xwey neke,
badîhewa nobedar bêxew dimîne.
2 Badîhewa hûn zû ji xewê r’adibin
û dereng hûn p’al didin, r’adizên,
nanê xwe jî k’esirî dixwin.
Xewêda jî Xudan dide delalêd Xwe*.

3 Ewled p’êşk’êşêd Xudan in,
berê zika dayîna Wî ye.
4 Çawa tîr destê mêrê mêrxasda,
usa jî zar’ cahiltîya bavêda.
5 Xwezî li wî merivî,
ku tîrdanga wî wan yekava t’ijî ye.
Gava li ber dergê dîwanê*,
t’evî dijmin xeber de,
hingê ewê şermî nebe.

### Dayîna Xwedêye bona Xwedêxofa

**128** *Stirana eşqî çûyîna h’ec.*
1 Xwezî li wan h’emûyêd
ku ji Xudan xof dikin
û r’îya Wîda dimeşin.

2 Belê tê xebata destê xwe bixwî,
tê xwezilî bî û xêr-xweşîyêda bî!

---

* 127:2 Welger’andina Yûnanîye kevinda aha ye: «Xudan xewê dide delalêd Xwe».
* 127:5 Bi îbranî xeber bi xeber «dergeh» e. Li ber dergehê bajêr herema dîwanê bû. Binihêr’e: R’ût’ 4:1-2; Eyûb 29:7-17.

3 K'ulfeta teyê nav mala teda,
mîna k'ola tirîyê xweyîber be,
ewledêd teyê jî dora sifira te,
mîna ajer'ûyêd dara zeyt'ûnê bin.
4 Awa ser wî merivîda wê aha bibare,
k'îjan ku ji Xudan xof dike.

5 De bira Xudan ji Sîyonê dua li te bike
û t'emamîya e'mirê jîyana xweda,
xêr-berek'etîya Orşelîmê bibînî.
6 De bira tu zar'êd zar'êd xwe bibînî.

Bira xêr û xweşî li ser Îsraêlê be!

### Gazinê cime'ta Îsraêlê hindava neyarêd wêda

## 129

*Stirana eşqî çûyîna h'ec.*
1 «Ji cahiltîya minda,
gelek tengasî dane min»,
de bira Îsraêl niha bêje:
2 «Ji cahiltîya minda,
gelek tengasî dane min,
lê zora min nebirine.
3 Cotk'ara ser pişta min cot dikirin
û xetêd xwe dirêj dikirin.
4 Xudan li ser r'astîyê ye,
Ewî kapêd nep'aka qetandin».

5 H'emûyêd ku dijenine Sîyonê,
wê şermî bin paşda bir'evin.
6 Bira ew bibine mîna gîhayê ser xênî,
ku hê negihîştî h'işk dibe,
7 ew ne destê yê didirû t'ijî dike,
ne jî ber mila yê gur'z dike dadigire.
8 Û yê ku derbaz dibin wê nebêjin:
«Bira duayê Xudan ser we be
û em bi navê Xudan dua li we dikin».

**Duayê hewargazîyê**

**130** *Stirana eşqî çûyîna h’ec.*
1 Ji k’ûrayê ez hewara xwe Te datînim, Xudano.
2 Xudan, dengê min bibihê!
Bira guhê Te ser dengê hêwarza min be.

3 Xudan, heger dîna Xwe bidî guneyêd me,
k’î wê bikaribe ber Te bisene, Xweyo?
4 Çimkî baxşandin destê Te ye,
wekî însan ji Te xof bike.

5 Ez hîvîya Xudan im,
nefsa min hîvîyê ye,
gumana min ser sozê Wî ye.
6 Nefsa min h’eyra Xweyî ye,
ji wan nobedara ze’ftir,
yêd ku h’eyra sibehê ne,
h’eyra sibehê ne.

7 Îsraêl, gumana xwe bide ser Xudan,
çimkî h’uba Xudan p’ir’ mezin e,
her xilazbûn ji destê Wî ye.
8 Ewê Xwexa Îsraêlê
ji her neheqîyêd wan xilaz ke.

**Duayê gumana yê şkestî**

**131** *Stirana Dawide eşqî çûyîna h’ec.*
1 Xudan! Dilê minda babaxî t’une,
ç’e’vê min ne li bilindbûnê ye,
Ez nigêd xwe gire-girar’a navêjim,
xwe tiştêd ji xwe mestir dûr digirim.
2 Nefsa xwe seqir’andîye û ker’ kirîye,
mîna zar’a h’emêza dêda şîrevekirî ye
nefsa min mîna zar’a şîrevekirî ye.

3 Îsraêl, de gumana xwe bide ser Xudan
ji nihada h'eta-h'etayê.

### Ad û qirarêd nava Xudan û Dawidda

**132** *Stirana eşqî çûyîna h'ec.*
1 Xudan, Tu Dawid bîr bîne
t'evî h'emû cefayêd wî,
2 çawa wî Xudanr'a sond xwar
û Zorê Aqûbr'a ad-qirar kir.
3 «Ezê nig nevêjime şêmîka xwe*,
nak'evime nava cî-nivînê xwe,
4 xewê nekime ç'e'vê xwe,
neynim ser hev bijangêd xwe,
5 h'eta nebînim cîkî Xudanr'a,
cî-warekî Zorê Aqûbr'a».

6 Me bihîst bona Sindoqê Efrat'êda*
û me ew dît nava deşta Yaharêda.
7 «Werin em bik'evin cî-warê Wî
û serê xwe daynin li ber nigêd Wî».

8 R'abe, Xudan, warê r'ih'etîya Xwe,
Tu û Sindoqa Zorayîya Xwe.
9 K'ahînêd Te bira r'astîyê xwe kin
û aminêd Te bira eşq û şa bin.

10 Bide xatirê Dawidê xulamê Xwe,
berê Xwe neguhêze ji k'ifşkirîyê Xwe.
11 Xudan r'astî Dawidr'a sond xwar,
Ewê sondê Xwe înk'ar neke:

---

* 132:3 Bi îbranî xeber bi xeber aha ye: «Ezê nek'evime kon, mala xwe».

* 132:6 Bi gotina hinek zana «Efrat'» «Bêt'leh'm» e yan «Bêt'-Êl» e. Aha jî tê fe'mkirinê: «Bona Sindoqê me li Efrat'ê bihîst».

«Ezê yekî derxim ji bedena te,
bidime r'ûniştin ser k'ursîya te*.
12 Heger peyman û gotinêd Min
ewledêd te biqedînin,
k'îjana Ezê wana hîn kim,
hingê ewledêd wan jî ser k'ursîya te
h'eta-h'etayê wê r'ûnên».

13 Çimkî Xudan Sîyon bijart,
xwest ku Xwer'a bike cî-war.
14 «Ev e warê r'ih'etîya Mine h'eta-h'etê.
Ezê vir bim, çimkî eva Min begem kir.
15 Xurekêd wê Ezê serda bir'êjim,
k'esîbêd wê Ezê pê nên t'êr kim.
16 Ezê k'ahîna xilazbûnêva wergirim
û aminêd wê Ezê eşq û şa kim,
17 Dawidr'a wir strûkî bidime derxistinê
û ç'irê saz kim bona k'ifşkirîyê Xwe.
18 Ezê şermê li dijminêd wî wergirim,
lê t'acê li serê wî wê gul de û biç'irûse*».

### Eşqî t'ifaqîya biratîyê

**133** *Stirana Dawide eşqî çûyîna h'ec.*
1 Çawa qenc e, çawa xweş e,
ku bira hevr'a yektîyêda ne!
2 Ew mîna wî r'ûnê xalis e,
ku ji sêrî dir'ije ser r'ûdanê,
belê li ser r'ûdana Harûnda,
ku jorda h'eta bestûya wî dişiqite.
3 Ew mîna qir'avîya ç'îyayê Hermonê ye,
ku li ser ç'îyayêd Sîyonê datîne.

---

* 132:11 K'arêd Şandîya 2:30.
* 132:18 Têk'sta îbranîda xebera «yatsîts» tê fe'mkirin hin «wê gul de» hin jî «biç'irûse».

Çimkî li wir Xudan xêr û xweşî
û jîyana h’eta-h’etayê soz daye.

**Pesindayîna şev P’aristgehêda**

**134** *Stirana eşqî çûyîna h’ec.*
1 Hey gelî xulamêd Xudan!
Şikirîyê bidine Xudan,
ku Xana Xudanda şev disekinin.
2 Destêd xwe berbir’î Pîrozgehê kin
û pesinê Xudan hûn bidin.

3 Bira Xudan ji Sîyonê dua te bike,
Ewî ku e’rd û e’zman e’firandine.

**Stirana pesindayînê**

**135** 1 Halêlûya!
Pesinê navê Xudan bidin,
pesinê bidinê, gelî xulamêd Xudan,
2 yêd ku Xana Xudanda disekinin,
h’ewşêd Xana Xwedêyê meda nin.
3 Pesinê Xudan bidin,
çimkî Xudan qenc e,
eşqî navê Wî bistirên,
çimkî ev yek xweş e.
4 Xudan Xwer’a Aqûb bijart,
Îsraêl çawa milk’ê Xwe.

5 Ez zanim ku Xudan mezin e,
Xweyê me ser h’emû xwedêyar’a ye.
6 Xudan ça dixwaze usa dike,
e’rd û e’zmênda, nava be’ra,
usa jî h’emû k’ûrayîyada.
7 Ji her çar qulba, e’wra derdixe,
bona baranê birûskê çêdike,
ji e’mbarêd Xwe bayê r’adike.

8 Ewî nixurîyêd Misirê kuştin,
ji meriva girtî, h’eta h’eywên.
9 Nîşan û k’eremetêd e’cêb
anîn serê te, hey Misirê!
serê Firewin û xulamêd wî.
10 Ewî gelek mileta xist
û p’adşêd zor qir’kirin:
11 Sîxon p’adşê emorîya,
Og p’adşê Başanê
û h’emû p’adşêd Kenanê.
12 E’rdê wana wartî da,
warê cime’ta Xwe Îsraêlê.

13 Xudano! Navê Teyê her t’im hebe,
Xudan, qur’ne-qur’ne Tê bêyî bîranînê.
14 Çimkî Xudanê heqîyê cime’ta Xwe bike
û ç’e’vê r’e’mê xulamêd Xwe binihêr’e.

15 P’ûtêd mileta ji zêr’ û zîv in,
çêbûyêd pê destê însên in.
16 Devê wan hene, xeber nadin,
ç’e’vê wan hene, ew nabînin.
17 Guhê wan hene, ew nabihên
û bîn t’une ber bêvila wan.
18 Yêd wana çêdikin
û wanda guman in,
ewê jî bibine mîna wan.

19 Mala Îsraêl! Pesinê Xudan bidin.
Mala Harûn! Pesinê Xudan bidin.
20 Mala Lêwî! Pesinê Xudan bidin.
Yêd ji Xudan ditirsin! Pesinê Xudan bidin
21 Bira ji Sîyonê Xudan bimbarek be,
Yê ku Orşelîmêda dimîne!

Halêlûya!

## Pesindayîna k'eremetêd Xwedê

**136** 1 Şikirîyê bidine Xudan,
çimkî Ew qenc e
û h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
2 Şikirîyê bidine Xwedêyê xwedêya,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
3 Şikirîyê bidine Xudanê xudana,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.

4 Yê ku t'enê k'eremetêd mezin dike,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
5 Yê ku e'zman bi serwaxtîyê e'firand,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
6 Yê ku h'îmê e'rdê ser ava avît,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
7 Yê ku şewqdarêd mezin e'firandin,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
8 Te'v, ku serwêrîyê r'ojê bike,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
9 Hîv û steyrk, ku serwêrîyê şevê bikin,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.

10 Yê ku Misirî, nixurîyê wanva xist,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
11 Yê Îsraêl ji nava wan derxist,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
12 Bi destê zor û zenda dirêjkirî,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
13 Yê Be'ra Sor kire du p'ara,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
14 Yê Îsraêl nav wêr'a derbaz kir,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
15 Yê Firewin, ordîya wîva avîte Be'ra Sor,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.

16 Yê Cime'ta Xwe ber'îyêva bir,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
17 Yê ku p'adşêd mezin xistin,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
18 Û Yê p'adşêd xweyîr'ûmet kuştin,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
19 Sîxon p'adşê emorîya,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
20 Og p'adşê başanîya,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
21 Yê e'rdê wan wartî da,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
22 Yê wartî da xulamê Xwe Îsraêl,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.

23 Yê belengazîya meda me bîr tîne,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
24 Û em ji dijmina xilaz kirin,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.
25 Yê h'emû r'uh'berî nan dike,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.

26 Şikirîyê bidine Xwedêyê e'zmên,
çimkî h'uba Wî h'eta-h'etayê ye.

## Lûrîna hêsîrtîya Babîlonêda

**137** 1 Li ber ç'emêd Babîlonê em r'ûdiniştin,
me Sîyon dikire bîra xwe û digirîyan.
2 Me sazêd* xwe bîyêd wêva darda dikirin.
3 Û yêd wire ku em hêsîr biribûn,
de'wa stirana ji me dikirin,
yêd em dizêrandin jî şayî dixwestin,
digotin: «Mer'a k'ulamêd Sîyonê bistirên».

* 137:2 Bi îbranî xeber bi xeber «çeng» e.

4 Em çawa bistirên k'ulama Xudan,
welatê xerîbda?
5 Heger ez te bîr bikim, Orşelîmê,
bira destê minî r'astê bik'işe,
6 zimanê min demaxê minva biqemite
ku ez ne saz xim, ne jî bistirêm,
heger ez te bîr bikim Orşelîmê
û te ser şabûna xweye mezinr'a negirim.

7 Bîr bîne, Xudan, kirêd edomîya*,
ewê r'oja ku Orşelîm k'et, çi digotin:
«Wêran kin, wêran kin h'etanî r'ik'ina».

8 Tu Babîlona k'aw-k'ubara wêrankir!
Xwezî li wî, yê ku usa serê te bike,
çawa ku te li serê me kirîye.
9 Xwezî li wî ku zar'êd te hilde zinara xe.

**Duayê r'azîdarîyê**

**138** *Zebûra Dawid.*
1 Xudan, ez dil û can şikirîyê didime Te,
li ber xwedêya distirêm eşqî navê Te.
2 Ta dibim ber P'aristgeha Teye pîroz
û ez şikirîyê didime navê Te,
bona wê h'ub û aminîya Te,
ku Te nav û xebera Xwe
ser her tiştîr'a girtîye.
3 R'oja ku min gazî Te kir,
hingê bihîst Te dengê min,
qewat kirim, qudûm da min.

* **137:7** Edom pismam û cînarê Îsraêlê bû û ji r'ik'inyata Esawê Aqûbê Îshaqê Îbrahîm bû. Gava Babîlonê h'icûmî ser Orşelîmê kir, Edom alîk'arî da Babîlonê. Binihêr'e: Hezekîyêl 25:12-14, 35:5-9; Obadîya 1:10-14.

4 Xudan, h’emû p’adşayêd dinyayê
wê şikirîyê bidine Te,
çimkî bihîstin xeberêd devê Te,
5 Xudan wê bistirên eşqî r’îyêd Te,
çimkî mezin e Xudan r’ûmeta Te.
6 R’ast e Xudan bilind e,
lê yêd nimize belengaz dibîne,
k’ubara jî dûrva nas dike.

7 Heger te’lî-tengîyar’a ez derbaz bim,
Tê ji ber hêrsa dijmin min xwey kî
û Tê destê Xwe dirêjî min kî,
destê Teyî r’astê min xilaz ke.
8 Xudanê bona min pirsa safî ke,
Xudan, h’uba Te h’eta-h’etayê ye!
Dest ji kirêd destê Xwe neke.

**Zanebûn û xemk’êşîya Xwedêye her der**

**139** *Serwêrê sazbendar’a. Zebûra Dawid.*
1 Xudan! Te ez e’nene kirim û nas kirim.
2 Tu zanî r’abûn û r’ûniştina min,
dûrva Teva e’yan e fikirêd min.
3 Tu dibînî ger’ û p’aldana min
û Teva e’yan e h’emû r’îyêd min.
4 Hela hê xeber ne ser zarê min e,
Xudan, fikir îdî Teva e’yan e.
5 Tu pêş û pişva xwey dikî min,
destê Te sî ye li ser serê min.
6 Ev zanebûn ji h’işê min der e,
nikarim bigihîjimê, gelekî k’ûr e.

7 Ezê ji R’uh’ê Te k’uda her’im,
yan ji ber Te k’uda bir’evim?
8 Heger r’abime e’zmên, Tu li wir î,
berjêr her’ime dîyarê mirîya, dîsa wir î.

9 Heger p’encê r’oyê baskê min bin,
bifir’ime xilazîya be’rê, wir bimînim,
10 wir jî destê Teyê r’êberîya min bike,
destê Teyî r’astê wê min xwey ke.
11 Heger bêjim: «Te’rîstanê min veşêre,
r’onayîya dora min jî şev be»,
12 dîsa şev bona Te ne te’rî ye,
şev mîna r’ojê r’onayî ye,
bona Te şev û r’oj weke hev e.

13 Navdilê min Te çêkirine,
zikê dîya minda cebirandime.
14 Pesin û şikirîyê didime Te,
ku ez e’cêbmayî çêkirî me.
Ev kirinêd Te h’ujmek’ar in,
minva ev yek t’am zelal in.
15 Hestûyêd min ji Te veşartî neman,
gava cîyê veşartî hatime xuliqandin
û bet’inêda hatime cebirandin.
16 Te ez dîtim hê ne hatibûm meyandin.
H’emû r’ojêd k’ifşkirîye bona min,
k’itêba Teda hatibûne nivîsandin,
berî wan r’ojêd ku ewe hê t’unebûn.
17 Xwedêyo, fikirêd Te serê minda r’ûnanîn
û çiqasî mezin e r’eqema wan!
18 Heger ez bikim bijmêrim wan,
wê ji qûmê ze’ftir be h’esabê wan.
Ez ku jimarê ser hevda bînim,
ezê t’ev Te dîsa h’ucetêda bim*.

19 Xwezî Te qir’a nep’aka banîya, Xwedêyo!
Ji min dûr k’evin, hey merivêd xûnxurno!

---

* 139:18 Bi îbranî xeber bi xeber aha ye: «Ez ku h’işyar dibim, ez hela hê t’ev Te me».

20 Ew h'ilek'arî hindava Teda xeber didin,
neyarêd Te cîyê badîhewa navê Te didin.
21 Xudan, ez ça nejenime yêd dijenine Te?
Ça zivêr nebim, ji r'aberêd himberî Te?
22 Ez wan ber ç'e'vê xwe lap davêjim,
ez wan xwer'a dijmin h'esab dikim.

23 Min e'nene ke, Xudano, dilê min zanibe,
min bicêr'ibîne û fikirêd min bizanibe.
24 Dîna xwe bidê, xa ez ne r'îya xirabda me,
r'îya h'eta-h'etayêda r'êberîya min bike.

## Duayê ji dijmin azadbûnê

**140** *Serwêrê sazbendar'a. Zebûra Dawid.*
1 Ya Xudan, ji merivê xirab min xilaz ke
û ji yê zulmdar Tu min xwey ke.
2 Ew dilê xweda xirabîyê dişêwirin
û her r'oj şer'a t'evr'adikin.
3 Mîna me'ra zimanê xwe tûj dikin,
je'ra me'rê teyar bin lêvêd xweda xwey dikin*. (Sela)

4 Ya Xudan, h'evza min ji nep'aka bike
û ji yê zulmdar Tu min xwey ke,
ewê ku şêwir dikin, nig bavêjine ber min.
5 K'ubara bona min qeyd û şirît veşartin,
t'or' r'axistine ser r'ê, t'ele danîn bona min. (Sela)

6 Min gote Xudan: «Tu î Xwedê min»,
ya Xudan, dengê hêwarza min bibihê!
7 Xudan Xweyo, qewata azadîya min!
Sîya serê min î, r'oja şêr'da.
8 Ya Xudan, xwestinêd nep'aka neynî sêrî,
fikirêd wane xirab wanr'a li hev neynî,
ku ew nekin k'ubarî. (Sela)

---

* 140:3 R'omayî 3:13.

9 Bira neyarêd dora min ser nek'evin,
gef-gur'îya wan bê serê wan.
10 Bira şelê agir ser wanda bibare,
wan bavêje bîrêd k'ûr, ku ew îdî r'anebin.
11 Bira cîyê buxdanbêj dinyayêda t'une be,
bira xirabîya wî bibe t'or', wî unda ke.

12 Zanim Xudan berê Xwe dide belengaza,
dîwanêda k'esîbar'a heqîyê dike.
13 E'se bêsûcê şikirîyê bidine navê Te
û r'astê li ber ç'e'vê Te bidebirin.

### Duayê k'omekdarîyê

# 141

*Zebûra Dawid.*
1 Ya Xudan! Ez gazî Te dikim,
zû hewara min were,
guh bide dengê min, gava ez gazî Te dikim.
2 Bira duayê min mîna bixûrê
li ber Te bê qebûlkirinê,
destê xwe jî ku bilind dikim,
bibe mîna dîyarîya êvarê*.

3 Ya Xudan, nobedar bide li ber devê min
û dergehê devê min Tu xwey ke.
4 Nehêle dilê min pey xirabîyê k'eve,
wekî ez t'evî kirê neheqa nebim,
tiştêd xirab nekim,
xwarinêd wane xweş te'm nekim.

5 Bira yê r'ast min şîret ke, ew yek şîrinayî ye,
bira min hilê, ew yek r'ûnê xas e
û bira serê min t'exsîr neke,
lê duayêd min, miqabilî kirê merivêd xirab e.

* 141:2 Binihêr'e: Derk'etin 29:39-41; Zebûr 28:2; E'yantî 5:8.

6 Gava serwêrêd wan zinarada bik’evin,
hingê ewê gotinêd min fe’m bikin, ku xweş in.
7 Çawa e’rdê r’akirîyî, r’êz-r’êz kirî qelaştî,
hestûyêd wanê jî ber devê gor’ê bela-belayî bin.

8 Lê belê, Xudan Xweyo! Ç’e’vê min li Te ye,
Tu yî gumana min, min ji ber Xwe nevêje.
9 Tu min ji wan t’elêd bona min hazirkirî
û qeydêd wane ku neheqîyê dikin xwey ke.
10 Nep’akê xwexa bik’evine t’or’a xwe,
lê ezê derbaz bim her’im.

## Duayê hewargazîyê

# 142

*Maskîla Dawid, gava ew şkeftêda bû. Dua.*
1 Ez bi deng gazî Xudan dikim,
ez bi deng lava Xudan dikim.
2 Derd-kulêd xwe dir’êjime ber Wî,
tengasîyêd xwe ez Wîr’a dibêjim.
3 Gava r’uh’ê min minda p’ûç’ dibe,
şiver’îyêd min Teva e’yan in.

Ew r’îya ku ezê têda biçûma,
bi dizîva bona min t’ele danîn.
4 Ez dîna xwe didime alîyê r’astê,
kesek t’une guh bide min,
kesek minr’a nabe sit’ar,
kesek t’une bona min xem bike.

5 Min hewara xwe Te anî, Xudano
dibêjime Te, Tu yî sit’ara min
û p’ara mine welatê zêndîyada.
6 Dîna Xwe bide zarînîya min,
ku ez çiqasî t’engezar im.

Min ji p’eyk’etîya xilaz ke,
çimkî ewe ji min zortir in.

7 Tu min ji zindanê derxe,
ku şikirîyê bidim navê Te,
gava Tu qencîyê min bikî,
r'astê her alîyava dora min bigirin.

### Duayê ji dijmin azadbûnê

**143** *Zebûra Dawid.*
1 Ya Xudan, duayê min bibihê!
Guh bide hêwarza min,
bi heqî û aminîya Xwe caba min bide.
2 Qûlê Xwer'a nek'eve de'wê,
çimkî t'u bendeyê ber Te r'ast derneyê*.

3 Dijmin pey min k'et,
e'mirê min p'êpes kir,
ez avîtime te'rîstanîyê,
ez bûme mîna yê zûva mirî.
4 R'uh'ê min minda temirî,
dil nav minda r'icifî,

5 R'ojêd bihurî ez bîr tînim,
ser h'emû kirinêd Te difikirim,
ser kirêd destê Te ez k'ûr dibim.
6 Destê xwe dirêjî Te dikim,
çawa e'rdê ziha hîvîya avê ye,
nefsa min jî t'îyê Te ye. (Sela)

7 Caba min zû bide, Xudano,
r'uh'ê min tê serê pozê min,
r'ûyê Xwe ji min veneşêre,
ku nebime mîna yêd dik'evine gor'ê.
8 Serê sibê h'uba Xwe min bide bihîstinê,
çimkî min gumana xwe danîye li ser Te.

---

* 143:2 R'omayî 3:20; Galatî 2:16.

R’îya ku ezê têda her’im, nîşanî min ke,
çimkî nefsa xwe ber bi Te bilind dikim.

9 Xudano, min ji neyara xwey ke,
min e’mirê xwe spartîye Te.
10 Min hîn ke, ku e’mirê Te biqedînim,
çimkî Tu Xwedêyê min î,
bira R’uh’ê Teyî qenc r’êberê min be
min bibe e’rdê mêrg û çîman.

11 Bona xatirê navê Xwe,
e’mir bide min, Xudano,
bona xatirê heqîya Xwe,
min ji tengasîyê derxe.
12 Bi h’uba Xwe neyarêd min gever ke
unda ke wan yêd tengasîyê didine min,
çimkî ez im xulamê Te.

**Duayê r’azîdarîyêyî bona serk’etinê**

**144** *Zebûra Dawid.*
1 Şikir ji Xudanr’a, qeyayê min,
ku destê min hînî şêr’ dike,
t’ilîyêd min jî ç’ekr’a.
2 Xêrxwazê min û kela min,
sit’ara min û xilazkirê min,
mert’ala min, ku xwe dispêrime Wî,
Cime’t ku guh dide min, ew Tu dikî.

3 Xudano! Însan çî ye Tu dîna Xwe didêyî,
benî-adem ku Tu bona wî xem dikî?
4 Însan mîna hulm-gulmê ye,
r’ojêd wî mîna sîyê derbaz bûye.

5 Xudano! E’zmanêd Xwe bitewîne, peya be,
ç’îya k’eve, ku ew dû kin.

6 Bi birûskê birq bide, wan bela-belayî ke,
tîrêd Xwe bişîne, wan şaşo-p’aşo ke.
7 Jorda destê Xwe dirêj ke,
min azad ke û xilaz ke,
ji dest xerîba û gelek ava,
8 ji devê k’ê derew dertê,
destê ser dilê wan, yê derewîyê ye.

9 Ya Xwedê, ezê stiraneke nû Ter’a bistirêm,
ser sazê dehet’êlî, miqama Ter’a lê xim.
10 Yê azadîyê dide p’adşê
û qûlê xwe Dawid xilaz dike.
11 Ji şûrê xirab min azad ke,
ji destê xerîba xilaz ke,
ji devê k’îjana betalî dertê,
destê wanî r’astê, destê derewîyê ye.

12 Bira xortêd me, cahiltîya xweda
r’ind şîn bin mîna dara,
qîzêd me bibine mîna stûnêd e’nîşkê
ku qesirada têne neqişandinê.
13 Bira e’mbarêd me dagirtî bin,
bi her xurekîva t’ijî bin
û pezêd me mêrgêd meda bi h’ezara,
bê h’esab li hev zêde bin,
14 dewarêd me jî k’oke xurt bin.
Bira terk lê nek’evin, ber nevêjin,
qar’e-qar’ jî li k’ûçêd me nek’evin.

15 Xwezî li wî miletî, ku vî h’alîda ye.
Xwezî li wî miletî, ku Xudanê wan Xwedê ye.

### Stirana qudret û k’erema Xwedê

**145** *Pesindayîna Dawid.*
1 Ezê Te bilind kim, ya Xudan, P’adşa
û pesinê navê Te bidim h’eta-h’etayê.

2 Her gav ezê pesinê Te bidim,
p'ayê navê Te bidim h'eta-h'etayê.
3 Xudan mezin e, hêjayî gelek pesina ye,
mezinayîya Wî ne li ber h'işa ye.

4 Qur'ne-qur'ne wê pesinê kirêd Te bidin
û kirêd Teye mezin wê salix kin.
5 Ezê ser bedewetîya r'ûmeta mezinayîya Te
û kirinêd Teye h'eyre-h'ujmek'ar bifikirim.
6 Wê ser kirinêd Teye sawe-xof xeber din
û ezê mezinayîya Te salix kim.
7 Wê bîranîna k'erema Teye mezin bela kin
û eşqî r'astîya Te bistirên.

8 Dilşewat û r'e'm e Xudan,
xweyê sebir-sik'anê û h'ubêda xinêyo.
9 Xudan bona h'emûya qenc e,
r'e'ma Wî ser h'emû e'firînêd Wî ye.

10 Ya Xudan, h'emû kirinêd Teyê pesinê Te bidin
û h'emû aminêd Teyê jî şikirîyê.
11 Wê r'ûmeta P'adşatîya Te e'yan kin
û qudretêd Te wê salix kin,
12 wekî qudreta Te ewledêd merivayêva e'yan kin,
usa jî mezinayîya r'ûmeta P'adşatîya Te.
13 P'adşatîya Te p'adşatîke h'eta-h'etayê ye
û serwêrtîya Te qur'ne-qur'ne ye.

14 Xudan dest davêje h'emû k'etîya
û yê tewîyayî dide sekinandinê.
15 Ç'e'vê gişka li destê Te ye
û Tu we'deda xurekê wan didî.
16 Tu destê Xwe vedikî,
h'emû bînberî gora dilê wan t'êr dikî.

17 Xudan r'ast e, nava h'emû r'ê-dirbêd Xweda
û amin e, nava h'emû şixulêd Xweda.
18 Xudan nêzîkî wan h'emûya ye,
k'îjan ku gazî Wî dikin,
wan h'emûya ku dilê r'ast gazî dikin.
19 Ew mirazê wan dike,
k'îjan ku ji Wî ditirsin,
zarînîya wan dibihê û wan xilaz dike.
20 Xudan h'emû h'izkirîyêd Xwe xwey dike,
lê h'emû nep'aka wê unda ke.

21 Devê min eşqî pesinê Xudan wê vebe
û her e'firînê h'eta-h'etayê
pesinê navê Wîyî pîroz bide*.

### Stirana eşqî gumana ser Xwedê

# 146

1 Halêlûya!

Nefsa min pesinê Xudan bide.
2 Pesinê Xudan ezê bidim, h'eta ku dijîm,
eşqî Xwedê xwe ezê bistirêm,
h'eta ku heme.

3 Gumana xwe nedine li ser mîra,
li ser bendê ku nikare xilaz ke.
4 R'uh'ê wî gava ji wî dertê,
diçe dibe dîsa xwelî,
ewê r'ojê şêwirêd wî dit'er'ibin.

5 Xwezî li wî, ku piştovanê wî Xwedêyê Aqûb e,
gumana wî li ser Xudan,
Xwedê wî ye.

---

* 145:21 Eva zebûreke «akrostîk» e, awa gotî anegorî elîfbeya h'erfêd îbranî çêkirî ye.

6 Ewî xuliqand e’rd û e’zman,
be’r û h’emûyêd nava wanda,
aminîya xwe h’eta-h’etayê xwey dike*.
7 Hêsîr-belengazar’a heqîyê dike,
yêd bir’çî jî nan-av dike.

Xudan girtîya azad dike,
8 Xudan ç’e’vê kora vedike,
Xudan k’etîya r’adike,
Xudan r’asta h’iz dike.
9 Xudan xerîba xwey dike,
alîk’arîya sêwî û jinebîya dike,
lê r’îya nep’aka ç’ep dike.

10 Xudanê p’adşatîyê bike h’eta-h’etayê,
Xwedêyê te, hey Sîyon, qur’ne-qur’ne wê bike.

Halêlûya!

### Stirana eşqî mezinayîya Xwedê

# 147

1 Halêlûya!

Qenc e eşqî Xudan bistirên,
çimkî xweş û hêja ye pesindayîn.
2 Xudan Orşelîmê ava dike,
sirgûnbûyêd Îsraêlê hev dide.
3 Dilşkestîya qenc dike
û birînêd wan dip’êç’e.

4 Ew h’esabê steyrka k’ifş dike,
bi her navekî wan gazî dike.
5 Xudanê me mezin e,
xweyê qudreta p’ir’ e,
zanebûna Wî bê sînor e.

---

* 146:6 K’arêd Şandîya 4:24; 14:15.

6 Xudan dest davêje belengaza,
lê nep'aka dever'ûya tîne dike xalî.

7 Bi şikirdarîyê Xudanr'a bistirên,
ser çeng Xudanr'a miqamê lê xin.
8 Ew e'zmên pê e'wra dinixême,
baranê bona e'rdê hazir dike,
serê ç'îya gîhê dide şînkirinê.
9 Ew xurekê h'eywên dide wan,
usa jî yê cûcûkêd qar'qar'ê,
gava ew dikine qir'e-qir'.

10 Xudan begem nake qewata hespê
ne jî r'eva çokêd însên,
11 lê Ew xofk'êşêd Xwe begem dike,
wanêd h'uba Wîda ku guman in.

12 Hey Orşelîm, pesinê Xudan bide!
Şikirîyê bide Xwedê xwe, hey Sîyonê!
13 Çimkî Ew zer'zêd dergehêd te dişidîne
û nava teda dua zar'êd te dike.
14 Ew e'dilayê dide sînorêd te
û genimêd jibareva te t'êr dike.

15 Ew e'mirê Xwe dişîne ser dinê
û xebera Wî zû bela dibe.
16 Ew mîna hirîyê berfê dibarîne,
qişê mîna t'ozê dir'eşîne.
17 Ew şelê bûzê dike teyrok dibarîne,
k'î dikare li ber serma Wî teyax ke.
18 Ew xebera Xwe dişîne wan dih'elîne
û bayê Xwe r'adike, av diher'ike.

19 Ew xebera Xwe Aqûbr'a dibêje,
qanûn û qirarêd Xwe jî Îsraêlr'a.

20 Bona t’u miletî Xudan aha nekir,
wan qirarêd Wî nas nekirin.

Halêlûya!

**Şikirîyê bidine Xudan, hey e’rşê e’zmên, e’rd û be’r**

# 148

1 Halêlûya!

Şikirîyê bidine Xudan, ji e’zmên,
şikirîyê bidine Wî, jor ji bilindayê.
2 Şikirîyê bidine Wî, h’emû milyak’etêd Wî,
şikirîyê bidine Wî, h’emû ordîyêd Wî.

3 Şikirîyê bidine Wî, hîv û r’o,
şikirîyê bidine Wî, h’emû steyrkêd birqok.
4 Şikirîyê bidine Wî, e’zmanê e’zmana
û usa jî avêd fêza e’zmanada.

5 Bira evana şikirîyê bidine navê Xudan,
çimkî Ewî e’mir kir û ew e’firîn.
6 Evana h’eta-h’etayê dane t’estîq kirin,
qeyde-qanûn danîn, ku nayê t’er’ibandin.

7 Şikirîyê bidine Xudan ji e’rdê,
h’emû zîyayêd be’rê û k’ûrayî,
8 agir û teyrok, berf û dûman,
bayê bobelîsk, ku gotina Wî dike,
9 ç’îya û h’emû t’ap û gir,
darêd xweyîber û h’emû erz,
10 de’ve û h’emû h’eywan,
şûlikî û h’emû teyrede,
11 p’adşayêd dinyayê û h’emû milet,
serwêr û h’emû r’êberêd dinê,
12 xort û qîz, ahil û cahil.

13 Bira h’emû şikirîyê bidine navê Xudan,
çimkî her t’enê navê Wî bilind e,
r’ûmeta Wî ji e’rd û e’zmên bilindtir e.
14 Ewî strûyê cime’ta Xwe bilind kir,
r’ûmeta h’emû aminêd Xwe,
lawêd Îsraêl û cime’ta Xweye delalî.

Halêlûya!

### Stiraneke nûye pesindayînê

**149** 1 Halêlûya!

Stiraneke nû Xudanr’a bistirên,
şikirîyê bidine Wî, civîna aminêd Wîda.
2 Îsraêl bira şa be pê E’firandarê xwe,
ewledêd Sîyonê bira geş bin pê P’adşê xwe.
3 Bira pê r’eqasê şikirîyê bidine navê Wî,
bi defê û çengê zîs miqama Wîr’a lê xin.
4 Çimkî Xudan cime’ta Xwe begem dike,
milûka bi serk’etinê dixemilîne.
5 Bira amin r’ûmetêda eşq û şa bin,
nava nivînêd xweda beşerxweş bin.
6 Pesindayîna Xwedê ji devê wan kêm nebe
û şûrê dudevî ji destê wan nek’eve,
7 wekî h’eyfê ji mileta hildin
û bela mixulqeta bidin.
8 P’adşêd wan bi zincîra girêdin
û e’silzadêd wan bi qeydêd h’esinî,
9 wekî qirara dîwanê bê serê wan.
Eva r’ûmeta h’emû aminêd Wîr’a be.

Halêlûya!

## Şikirîyê bidine Xwedê

**150** 1 Halêlûya!

Şikirîyê bidine Xwedê, Pîrozgeha Wîda,
şikirîyê bidine Wî, e’zmanê Wîyî qewatda.
2 Şikirîyê bidine Wî, bona kirêd Wîye zor,
şikirîyê bidine Wî, bona r’ûmeta Wîye mezin.

3 Şikirîyê bidine Wî, bi dengê bor’îyê,
şikirîyê bidine Wî, bi çeng û çengê zîs.
4 Şikirîyê bidine Wî, bi def û r’eqasê,
şikirîyê bidine Wî, bi saz û bilûrê.
5 Şikirîyê bidine Wî, bi şingînîya bolma,
şikirîyê bidine Wî, bi zingînîya zengila.
6 Her bînber bira şikirîyê bide Xudan!

Halêlûya!

# Mesele

### Pêşgotina K'itêba Mesela

Nava «Mesela da»gelek gotinêd bîlantîyê hene û ew şîret bona merivayê gelekî k'ar in.

Zaneyêd ji miletê Îsraêlê, zûva destpêkirin gotin û meselêd vê k'itêbê berev kirin. Xudanê p'ir'anîya van gotinêd bîlane vê k'itêbêda, Silêman tê h'esabê, awa gotî kur'ê Dawid p'adşa. Silêman jî p'adşê Îsraêlê bûye, nêzîkî h'ezar sal berî bûyîna Îsa Mesîh. Ew bibû bîlanekî bi nav û deng. Eva k'itêba t'imê navê Silêmanva girêdayî bûye.

K'itêba Pîroz dibêje ku çawa Xwedê Silêmanr'a soz da, ew çi bixwaze wê bidê (Binihêr'e: P'adşa III 3:5-15). Silêman jî ji Xwedê serwaxtîyê bona xwe dixwaze, wekî ew r'ast h'akimtîyê miletê Wî bike û qencî û xirabîyê ji hev derxe. Xwedê li Silêman vediger'îne: «Te ku ev tişt xwest û bona xwe e'mirê dirêj, hebûk, usa jî mirina neyarêd xwe nexwest, lê xwer'a serwaxtî xwest ku ser heqî-neheqîyêda binihêr'î, va Ezê weke xwestina te bikim. Ezê h'işê serwaxtîyê û fe'mkirinê bidime te, usa ku ne berî te mîna te hebûne, ne jî pey ter'a wê hebin». Silêman p'êxember ew serwaxtî ji Xwedê stand û ew ji h'emû merivêd hatîye ser dinê serwaxttir bû.

Pêştirî gotinêd Silêman p'adşa, çend gotin û meselêd vê k'itêbê ji alîyê nivîsk'arêd mayînva jî hatine berevkirinê, mesele: hin ji p'irt'ûka berevoka Agûr, hin jî ji p'irt'ûka berevoka Lemûêl p'adşa (binihêr'e: 30:1 û 31:1).

## Meremê serwaxtîyê

1 1 Ev in meselêd Silêman p’adşê Îsraêlêyî kur’ê Dawid.

2 Bona ku serwaxtîyê û şîreta bizanibin,
gotinêd bîlana fe’m bikin,
3 şîretêd serwaxtîyê,
r’astîyê, qirarê û heqîyê qebûl kin,
4 ku firasetê bidine dilsaxa,
zanebûnê û aqil bidine cahila,
5 wekî yê serwaxt bibihê hê zanebûna xwe zêde ke
û yê bîlan hê r’ê-dirba ji hev derxe,
6 ku mesela û me’na têderxistinoka,
k’êlimêd zaneya û fikirêd wan fe’m bike.

## Serê serwaxtîyê

7 Serê serwaxtîyê xofa Xudan e,
t’enê yê bêh’iş qedirê bîlanîyê û şîretê nizane.

## Şîreta bona cahila

8 Lawê min, şîreta bavê xwe qebûl ke
û hînkirina dîya xwe p’êpes neke.
9 Çimkî ewê çawa k’ofîya r’ewş-k’eremê li serê te bin
û morî-mircan stûyê teda.
10 Lawê min! Gava yêd gunek’ar bixwazin te ji r’ê derxin,
tu guh nede wan.
11 Heger bêjin: «T’evî me were em bona kuştinê te’lde
çêkin,
cîyê bêsebeb xwe li merivê bêsûc bitelînin,
12 mîna dîyarê mirîya em saxe-sax wan h’ûfî xwe kin,
mîna gor’istên ku çawa mirîya dadiqurtîne.
13 Her cûr’e xêr-xizne em xwer’a bibin
û malê xwe bi t’alênva t’ijî kin,
14 were tu jî p’eşka xwe bavêje nava me,
k’îsikê me h’emûya bibe yek».

15 Lawê min! T’evî wan wê r’êyêda neçe,
nigêd xwe ji şiver’îyêd wan paşda bigire.
16 Çimkî nigêd wan ber bi xirabîyê dibezin
û xûnr’êtinêr’a dilezînin.
17 Lê belê badîhewa t’or’ tê avîtinê
li ber ç’e’vê teyreda,
18 lê evana dibine bayîsê xûna xwe,
bona kuştina xwe xwe ditelînin.
19 Ev e r’îya wan merivêd ku ç’e’vê wan hebûka xelqê ye,
ev yek dibe r’uh’istînê wan.

**Dengê serwaxtîyê**

20 Serwaxtî k’ûçada dike gazî,
meydanada dengê xwe bilind dike.
21 Ew cîyê qalme-qalma civata mixulqetada dike dengî,
li ber dergehê bajêr gotina xwe dibêje:
22 «Gelî bêh’işa, h’eta k’engê hûnê bêh’işîyê h’iz bikin?
H’eta k’engê qerfê li qerfkira xweş bê?
Û axmaxê bijenine zanistîyê?
23 Berê xwe bidine şîretêd min,
ezê r’uh’ê xwe li ser weda bir’êjim,
gotinêd xwe li we bidime fe’mkirinê.
24 Ez gazî we dikim hûn nabihên,
destê xwe dirêjî we dikim kesekî guhdar t’une,
25 lê şîretêd min davêjine pişt guhê xwe
û hilatina min qebûl nakin.
26 Ezê jî li ser k’etina we bik’enim,
dilê xwe li we şa kim, gava tirs-xof li ser weda bê,
27 çaxê zarîn û tengasî bê serê we,
gava tirs-xof mîna te’vîya teyrokê we bînfişkî ke
û çawa firtone li ser weda bigire.
28 Hingê wê gazî min kin lê ezê cabê nedim,
ewê demana minda bin, lê min nebînin.
29 Çimkî vana jenande zanistîyê
û xofa Xudan xwer’a nebijartin,

30 şîretêd min qebûl nekirin,
qerfê xwe h’emû hilatinêd min kirin.
31 Lema jî ew gerekê berê e’melêd xwe bixwin
û pê şêwirêd xwe t’êr bibin.
32 Çimkî ji r’êk’etina bêh’işa wan dikuje
û bêxemîya axmaxa wan unda dike.
33 Lê yê guh dide min wê sax-silamet bijî
û ji sawa xirabîyê t’evhev nebe».

## Xelata yê serwaxtîyê diger’e

2 1 Lawê min! Heger tu gotinêd min qebûl kî
û t’emîyêd min cem xwe xwey kî,
2 usa ku guh bidî serwaxtîyê
û dilê xwe li ber bîlantîyê vekî,
3 heger gazî aqil kî
û deng bidî bîlantîyê
4 û tu wê biger’î çawa zîv
û peyk’evî bibînî mîna xiznê,
5 tê hingê xofa Xudan fe’m bikî
û xwedênaskirinê bizanibî.
6 Çimkî Xudan e yê serwaxtîyê dide,
zanistî, bîlantî jî ji devê Wî dertên.
7 Ew bona r’asta açixîyê xwey dike,
Ew mert’al e bona yêd r’êda bêlek’e ne.
8 Ew miqatîyê r’îyêd r’astîyê dike
û şiver’îya aminêd Xwe xwey dike.

## R’astînaskirin

9 Hingê tê r’astîyê, qirarê, heqîyê, fe’m bikî
û serda jî her şiver’îyêd qenc.
10 Gava serwaxtî bik’eve dilê te
û zanebûn li r’uh’ê te xweş bê,
11 hingê firasetê te xwey ke
û aqilê miqatîyê li te bike,
12 wekî te ji r’îya xirab
û wan merivêd mixenete derewîn xilaz ke,

13 k’îjan ku ji r’îya r’ast derk’etine,
ku r’îyêd te’rîstanîyêda her’in,
14 k’îjan ku xirabîyêd xwer’a şa dibin
û neheqîyêd xwer’a dir’eqisin,
15 r’îyêd k’îjana xaro-maro ne
û şiver’îyêd xweda dixalifin.
16 Wekî te ji k’ulfeta xerîb xilaz ke,
ji k’ulfeta ner’êdaye xweyê zarê h’ilek’ar,
17 ji ya ku destê xwe ji h’elalê cahiltîya xwe kirîye
û peymana ber Xwedêyê xwe bîr kirîye.
18 Mala wê berbi mirinê dibe
û şiver’îyêd wê jî alîyê mirîyada.
19 Ewêd ku xwe li wê digirin, t’u car venager’in
û îdî nikarin bêne li ser r’îya jîyînê.

## Xelat û ceza

20 Bona vê yekê tu r’îya qencada her’e
û xwe li şiver’îyêd r’asta bigire,
21 çimkî r’astê bijîn li ser e’rdê
û k’amilê li ser wê bimînin,
22 lê nep’akê ji ser r’ûyê e’rdê unda bin her’in
û k’oka bêamina wê bê hatinê.

## K’ara ji guhdarîyê û serwaxtîyê

3 1 Lawê min! Dersa min bîr neke
û dilê te bira t’emîyêd min xwey ke,
2 çimkî ewê r’ojêd dirêj, e’mirê dirêj
û xêr-xweşîyê bidine te.
3 Bira dilşewatî û r’astî ji te dûr nek’evin,
van stûyê xweva girêde, li ser t’extê dilê xwe binivîse.
4 Hingê tê li Xwedê û meriva
xweş bêyî û r’ûspî bî.
5 Bi t’emamîya dilê xwe xwe bispêre Xudan,
gumana xwe nede li ser h’işê xwe.
6 H’emû r’îyêd xweda tu Xwedê nas ke
û Ewê h’emû şiver’îyêd te r’ast-dûz ke.

7 Tu li ber ç'e'vê xwe xwe serwaxt nebîne,
ji Xudan xof ke û ji xirabîyê dûr be.
8 Ev yekê dermanê nefsa te be
û sih'et-qewata hestûyêd te be.
9 Hebûka xweva qedirê Xudan bigire
bi h'emû berê deremetêd pêşinva,
10 hingê e'mbarêd teyê lêvar'a t'ijî bin
û ji h'ewzêd te jî meya nû bik'işe.
11 Lawê min, şîreta Xudan pişt guhê xweva nevêje
û ne jî gava Ew li te hiltê, li ber xwe k'eve,
12 çimkî Xudan h'izkirîyê Xwe şîret dike,
çawa bavek ku kur'ê xwe h'iz dike.

## Serwaxtî ji xiznê çêtir e

13 Xwezî li wî merivî ku serwaxtîyê dibîne
û li wî merivî ku bîlantîyê distîne!
14 Çimkî k'ara wê ji k'ara zîv zêdetir e
û qazinca wê ji zêr'ê xas.
15 Ew ji kevirêd qîmet girantir e,
her tiştê ku dilê te dik'işînê weke wê nabin.
16 Destê wêyî r'astêda r'ojêd dirêj in
û destê ç'epêda jî dewlet û r'ûmet.
17 R'îyêd wê r'îyêd xweşîyê ne
û h'emû şiver'îyêd wê yêd e'dilayê ne.
18 Ew bona yêd ku wê dest tînin dara jîyînê ye,
yêd ku wê qewîn digirin bextewar dibin!
19 Xudan pê serwaxtîyê h'îmê dinyayê danî,
pê bîlantîyê e'zman qewîn-qedîm kir.
20 Pê zanebûna Wî bêbinî derevebûne
û e'wr qir'avîyê diniqitînin.

## R'îya yê serwaxt

21 Lawê min! Evana bira ji ber ç'e'vê te neçin,
aqil û firasetê qewîn bigire,
22 evê bibine e'mirê nefsa te
û xişirê stukura te.

23 Hingê tê r’îya xweda bêxof her’î
û nigê teyê nelik’ume.
24 Gava p’aldî, tê netirsî
û gava xewr’a her’î, xewa teyê şîrin be.
25 Tê ji xofa nişkêva netirsî,
ne jî ji fizirdûmana nep’aka, gava li ser teda bê.
26 Çimkî Xudanê gumana te be,
Ewê nigê te xwey ke, ku nek’eve t’elekê.

## K’omekdarî

27 Gava ji destê te tê, ku alîk’arîya desttenga bikî,
xwe ji vê yekê nede paş.
28 Nebêje hevalê xwe:
«Her’e careke din were, ezê sibê bidime te»,
wekî cem te heye.
29 Hindava hevalê xweda t’ivdîra xirab neke,
çimkî ew bi guman li cem te dimîne.
30 Cîyê badîhewa qir’ika mêriv negire,
wekî wan xirabî li te nekirîye.
31 H’evsûdîya merivê zordar neke,
t’u car xwe li r’êke wan negire.
32 Çimkî merivê qelp, li ber ç’e’vê Xudan zivêr e,
lê belê Ew hevalê sitqê dilê r’ast e.
33 Nifir’a Xudan li ser mala nep’aka ye,
lê Ew dua oda r’asta dike.
34 Ew pêk’enîya dik’ene,
lê k’eremê dide şkestîya.
35 Serwaxtê r’ûmetê war bin,
lê axmaxê bêr’ûmetîyê.

## Şîreta bavêye bona serwaxtîyê

4 1 Ewledno! Guh bidine şîretêd bavê
û dîna xwe bidinê, wekî aqil hûn hîn bin.
2 Çimkî ezê dersêd qenc bidime we,
pişta xwe nedine hûn hînkirina min.

3 Çaxê ku ez kur'ê bavê xwe bûm,
delalîyê dîya xweyî tayê t'enê bûm,
4 ewî ez hîn dikirim û digot:
«Bira dilê te pey gotinêd min be,
t'emîyêd min xwey ke û tê bijîyî.
5 Serwaxtîyê bistîne, aqil bistîne,
vê yekê bîr neke û ji gotinêd devê min daneger'e.
6 Serwaxtîyê ber'nede û ewê te xwey ke,
tu wê h'iz bike, ewê piştovanê te be.
7 Serî serwaxtî ye, serwaxtîyê bistîne
û bira aqil li ber dilê teda ji h'emû hebûka te şîrintir be.
8 Tu qîmetê wê bizanibe, ewê te bilind ke,
heger tu wê h'emêz kî, ewê qedirê te bigire.
9 Ewê k'ofîya r'ewş-k'eremê bide serê te,
pê t'acê bedewî r'ûspîtîyê te xelat ke».

**R'îya serwaxta û xiraba**

10 Bibihê, lawê min, gotinêd min bike serê
xwe û salêd e'mirê teyê dirêj bin.
11 Ez r'îya serwaxtîyê nîşanî te dikim,
şiver'îyêd r'astîyêda ezê te bibim.
12 Gava tu r'ê her'î, tiştê nek'eve ber nigê te
û gava tu bir'evî tê neşimitî nek'evî.
13 Şîretê min qewîn bigire
û destê xwe ji wê neke,
tu wê xwey ke, çimkî ew e e'mirê te.
14 Nede ser r'îya nep'aka
û r'îya xirabada neger'e,
15 h'evza xwe ji wê bike,
wê r'êyêda neçe, jê dûr k'eve wêda her'e.
16 Çimkî evana h'eta xirabîyê nekin,
ew nikarin r'azên, xew ç'e'vê wan nak'eve
h'eta ku yekî neşimitînin nevêjin.
17 Evana nanê xirabîyê dixwin
û şerava zordarîyê vedixwin.

18 Lê belê r'îya r'asta mîna r'onayîya
berbangê ye, ku hêdî-hêdî dertê,
h'eta ku t'emamîya r'ojê r'onayî dibe.
19 R'îya neheqa çawa şever'eşêda
ku ew nizanin wê çi p'elî k'evin.

20 Lawê min! Dîna xwe bide xeberêd min
û guhê xwe bide ser gotinêd min,
21 bira evana ji ber ç'e'vê te neçin,
dilê xweda tu van xwey ke.
22 Çimkî evana e'mir in bona ewê ku dibîne
û derman in bona h'emû nefsa wî.
23 Ji her tiştî zêdetir miqatî dilê xwe be,
çimkî kanîya e'mir ji wî dertê.
24 Devê derewîn ji xwe dûr xe,
zarê h'ilek'ar dûrî te be.
25 Bira ç'e'vêd te r'aste-r'ast binihêr'in
û dîna bijangêd te li pêşîya te bin.
26 Şiver'îya gavêd xwe e'nene ke
û h'emû r'îyêd te şidîyayî bin.
27 R'ast û ç'ep nexalife,
ji xirabîyê nigê xwe dûr xe.

### Şîreta ku ji zinêk'arîyê dûr bin

**5** 1 Lawê min! Dîna xwe bide serwaxtîya min
û guhê xwe bide ser bîlantîya min,
2 wekî firaseta te hebe
û lêvêd te zanebûnê xwey kin.
3 Çimkî ji lêvêd jina xerîb,
çawa hingivê hêlûnê jê biniqite
û devê wê jî ji r'ûn nermtir e,
4 lê axirî te'l e mîna zirîç'kê
û bir'aye mîna şûrê dudevî.
5 Nigêd wê berbi mirinê dibin
û gavêd wê digihînine dîyarê mirîya.

6 R'îya jîyînêda ew t'u car naçe,
r'ê-dirbê wê sibe-êvarê ew ne yek in,
tu xwexa nizanî ew k'uda diçe*.
7 De niha lawno, guh bidine min,
ji gotinêd devê min dûr nek'evin.
8 Ji wê k'ulfetê xwe dûr xwey kin
û nêzîkî derê mala wê nebin,
9 wekî qewata xwe nedî hineke din
û salêd xwe nedî yekî zulmk'ar.
10 Nebe ku hineke din pê qewate te t'êr bin
û k'eda te bik'eve mala xelqê
11 û tu axirîyê axe-ax nekî,
gava goştê canê te bih'ele-bimaşe,
12 hingê bêjî: «Min çima şîret qebûl nekir
û dilê min hilatin bêhurmet kir,
13 min dengê şîretk'arêd xwe nebihîstin
û guhêd xwe nedane li ser dersdarêd xwe?
14 Hindik mabû ez li ber ç'e'vê k'omê û cime'tê
bik'etama nava her xirabîyê».

**H'alê zewacê**

15 Tu ava ji h'ewzê xwe vexwe
û ya ku ji bîra te derdik'eve.
16 Bira kanîyêd te k'ûçêda bela nebin,
nixalêd avê meydanada neher'ikin.
17 Bira ew t'enê yêd te bin,
ne ku yêd te û xerîba bin.
18 Kanîya te bira bimbarek be
û pê jina xortanîya xwe şa be,
19 bira ew xezala h'izkirî be
û ew kara h'ewask'ar be,
sîng-berê wê her gav te t'êr kin
û her t'im maşoqê h'izkirina wê be.

---

* [5:6] Aha jî tê fe'mkirinê: «Ew xwexa jî nizane k'uda diçe».

20 Çima lawê min, bibî maşoqê jina zinêk'ar
û sîng-berê jina xerîb tu h'emêz kî?
21 Çimkî r'ê-dirbêd mêriv li ber ç'e'vê Xudan in
û Xudan haş ji h'emû gavêd wan heye.
22 Xirabê pê e'melêd xweye xirab bê girtinê
û pê werisê gunêd xwe bê girêdanê.
23 Ewê ji dest şîretqebûlnekirinê bimire
û ji dest gele axmaxtîya xwe wê unda be.

## Haşxwehebûn

6 1 Lawo! Gava te ji ber hevalê xweva wek'îltî kir
û ji ber yekîva deyn hilda stûyê xwe,
2 tu pê gotina devê xwe k'etî t'elê,
te pê gotinêd devê xwe xwe da girtinê.
3 Aha bike ku xilaz bî, lawê min,
çimkî tu k'etî destê hevalê xwe,
her'e xwe bavêje nigê hevalê xwe
û lavaya tu jê bike.
4 Bira xew nek'eve ç'e'vê te
û bijangêd te neçine li ser hev.
5 Xwe xilaz ke çawa xezal ji t'elê,
çawa teyrede ji destê nêç'îrvan.

## Bêxîretî

6 Bêxîreto! Her'e cem mûrîya,
dîna xwe bide r'ê-dirbêd wan û serwaxt be.
7 Ne axê wan heye, ne zapidê wan
ne jî serwêr,
8 lê belê xurekê xwe ew havînê didin ser hev,
xwarina xwe jî wextê nandirûnê t'op dikin.
9 Bêxîreto, h'eta k'engê tê p'aldî?
Tê ji xewa xwe k'engê h'işyar bî?
10 H'eta hinekî r'azêyî, hinekî bip'onijî,
hinekî destêd xwe bidî li ser hev p'aldî,
11 hingê k'esîbîya teyê mîna r'êwîkî diz li ser teda bigire,
desttengîya teyê jî mîna qaçaxekî.

## Merivê nep'ak

12 Merivê bêkêr, merivê nep'ak
bi devê derewîn diger'e,
13 ew ç'e'vê xwe diqurç'imîne,
bi nigêd xwe xeber dide
û bi t'ilîya tişta hîn dike,
14 mixenetî dilada heye,
ew t'imê li ser nêta xirabîyê ye
û ew xelqê berî hev dide.
15 Bona vê yekê xezebê nişkêva ser wîda bê,
derbekêr'a wê bişkê û dû-dermanê lê nebe.

## Tiştêd Xwedê jê aciz e

16 Vane şeş tiştêd ku Xudan dijene wan,
hela h'eft in ku li ber Wî h'eram in:
17 Ç'e'vêd k'ubar, zimanê derewîn,
destêd ku xûna bêsûc dir'êjin,
18 dilê ku t'ivdîra xirab dertîne,
nigêd ku bona xirabîyê zû dir'eve,
19 şe'dê derew, ku derewa dike
û bira berî hev dide.

## H'evza xwe ji zinêk'arîyê kirin

20 Lawê min! T'emîya bavê xwe xwey ke
û hînkirina dîya xwe pişt guhê xweva nevêje.
21 Evana her t'im bira ser dilê te girêdayî bin,
li stukura te walandî bin.
22 Gava tu her'î, ewê r'êberîya te bikin.
Gava tu r'azêyî, ewê te xwey kin.
Gava h'işyar bî, ewê t'evî te xeber din.
23 Çimkî t'emî ç'ira ye û hînkirin r'onayî,
hilatinêd şîretê r'îya jîyînê ye.
24 Evê te ji jina xirab xwey ke,
ji zimanê jina xerîbe zarxweş.

25 Dilê xweda nebe maşoqê bedewîya wê,
bira te neçelqîne pê birî-bijanga.
26 Çimkî r'ûyê jina qavda, merî dibe h'ewcê parî nanê t'isî
û jina ç'e'vder, nêç'îrvanê nefsa maqûla ye.
27 Dibe ku yek agir têke p'aşila xwe
û k'incêd wî neşewitin?
28 Dibe ku yek li ser k'ûra êgir biger'e
û nigê wî neşewitin?
29 Ev jî aha ya, yê ku nêzîkî jina xelqê dibe,
heger dest bavêje wê, ew bê bela namîne.
30 Lome dizê bir'çî nayê kirinê,
gava dizî zikê xwe t'êr kir,
31 lê belê gava bê girtinê, gerekê h'eft car lê veger'îne,
wê h'emû hebûka mala xwe bide.
32 Lê yê ku zinêk'arîyê dike, h'işê wî t'une,
ewê aha dike nefsa xwe unda dike.
33 Ewê lêdayî û bêr'ûmet be,
ji r'ûr'eşîyê xilaz nebe.
34 Çimkî k'umr'eşî qalp'axê serê mêr r'adike
û r'oja h'eyfhildanê hewa pê dik'eve,
35 ji ber vê yekêva t'u tişt ber ç'e'va nayê,
çiqas tişt jî ji berva bidî, yeke dîsa wê ya xwe bike.

7 1 Lawê min! Gotinêd min xwey ke
û t'emîyêd min çawa xizne veşêre.
2 T'emîyêd min xwey ke ku e'mir kî
û her gotineke min mîna r'onaya ç'e'vê xwe.
3 T'ilîyêd xweva wan girêde,
li ser t'extê dilê xwe binivîse.
4 Serwaxtîyêr'a bêje: «Tu xûşka min î!»
û bîlantîyê nav ke: «Pismamê min»,
5 ku te xwey kin ji jina xerîb,
ji jina xelqêye zarxweş.

## Jina ç’e’vder

6 Carekê min mala xweda
p’encerêr’a dîna xwe dayê,
7 va ye nava cahilêd saxikê dilê xweda,
ç’e’vê min xortekî bêfe’m k’et,
8 ku k’ûçêda nêzîkî e’nîşkê
xwe li r’îya mala wê girt,
9 êvar bû, r’o çûbû ava,
şev bû, te’rî k’etibû e’rdê
10 û va jineke k’incê qava lê,
bi dilê qancixî derk’ete pêşîya wî,
11 ew yeke şer’ûde bed bû
nigê wê mala wêda nediman.
12 Te hew didît derva bû, hew meydanada
û her qulç’ekîda xwe diteland.
13 Ewê ew xort girt r’amûsa
û bê şerma r’û gote wî:
14 «Min dîyarîya heleqetîyê daye,
sozê xwe îro anîye sêrî,
15 lema ez derk’etime pêşîya te,
ku r’ûyê te bibînim, va min tu dîtî.
16 Min cî-nivîna xwe pê sipîç’ala
misirêye r’eng-r’engî xemilandîye.
17 Min nivîna xwe zimir, ûd
û darçîn kirîye.
18 Were emê xwer’a bik’evine k’êf-h’eneka h’eta sibê,
bi şabûnê t’ev derbaz kin.
19 Çimkî mêrê min ne li male,
r’êke dûrda ewa çûye,
20 k’îsikê p’era xwer’a birîye,
xilazîya mehê ewê bê malê».

21 Pê zarxweşîya xwe ew kire maşoqê xwe
û zarê xweyî xweş, ser xwe bengî kir.

22 Hingê ewî zû da pey wê çû,
çawa ga ku diçe qesabxanê
û mîna h’eywaneke kapstûkirî,
23 h’eta ku tîr cegera wî bigire,
çawa ku ç’ivîk xwe t’elêr’a digihîne
û nizane ku ew r’uh’istînê wê ye.
24 De niha gelî ewleda, dengê min bibihên
û guh bidine gotinêd devê min.
25 Bira dilê te berbi r’îya wê nezivir’e
û şiver’îyêd wêda nexalife.
26 Çimkî gelek bi destê wê birîndar bûne
û geleke mêrxas bi destê wê hatine kuştinê.
27 Mala wê r’îya dîyarê mirîyada ye,
ya ku dibe jêr cî-warê mirîya.

**Dengê serwaxtîyê û bîlantîyê**

8 1 Serwaxtî gazî dike
û bîlantî dike dengî!
2 Ew li hêlanêd jorin devê r’îya
û nava şiver’îyada disekine.
3 Ew li ber dergehê ku dik’evine bajêr,
li ber derîyê k’îjanîr’a derbaz dibin dike gazî:
4 «Ez gazî we dikim gelî meriva
û deng didime ewledêd însên!
5 Gelî bêh’işa, serwaxtîyê hîn bin,
gelî axmaxa h’iş bikine serê xwe.
6 Bibihên, çimkî ezê tiştêd maqûlî bêjim
û devê xwe vekim bona tiştêd r’ast.
7 Devê minê r’astîyê bêje,
çimkî nep’akî, zarê minr’a h’eramî ye.
8 H’emû gotinêd devê min bi r’astîyê ne,
nava wanda tiştêd qelp û xar t’unene.
9 Evana h’emû fe’mdarîne bona yê aqil
û evana r’ast in bona yêd zanistî standine.
10 Dersê min hildin, ne ku zîv,
zanistîyê, ne ku zêr’ê xas.

11 Çimkî serwaxtî ji lal û dur'a çêtir e
û her tiştêd dilê mêrivda biha, weke wê nabe.

12 Ez, serwaxtî, firasetêda dimînim,
fe'mîna zanebûnê e'yan dikim.
13 Xofa Xwedê xirabî jenandin e,
k'ubarî, babaxî û r'îya xirab
usa jî zarê mixenet ber ç'e'vê min r'eş in.
14 Şêwir şêwira min e, firaset firaseta min e,
ez im bîlantî, qewat qewata min e.
15 Pê min p'adşa p'adşatîyê dikin,
mîr qirarêd r'astîyê didin.
16 Pê min serwêr serwêrîyê dikin,
usa jî e'silzade û h'emû h'akimêd r'ast.
17 Ez h'izkirîyê xwe h'iz dikim,
yêd bi dil min diger'in min dibînin.
18 Dewlet û r'ûmet cem min in,
xizna nep'ûç' û çerxa r'ast.
19 Berê min ji zêr' çêtir e, ji zêr'ê zer jî,
feyda min jî ji zîvê jibare.
20 Ez r'îya r'astîyêda diger'im
û nava şiver'îyêd heqîyêda,
21 wekî hebûkê bidime h'izkirîyêd xwe
û xizindangêd wan ez dagirim.

## Berî hebûna serwaxtîyê

22 Dema destpêkirina şixulê Xudan, ez cem Wî bûm,
hê berî kirinêd Wîye pêş.
23 Ez hê berî her-heyê hatime qedîmkirinê,
serê sêrîda, berî pêşdahatina dinyayê.
24 Ez berî bêbinîya bûme,
hê berî kanîyêd avêd gur'.
25 Hê ç'îya-banî cî-war nebûyî,
berî gira ez bûme.
26 Gava Ewî hê ne e'rd, ne deşt e'firandibû
û ne jî hê axa dinyayê,

27 gava Ewî e’zman çê dikirin ez li wir bûm.
Gava li ser r’ûyê ava bêbinî gilover’î k’işand,
28 gava Ewî e’zmanada e’wr didane sekinandinê,
kanîyêd bêbinîya qayîm-qedîm dikirin,
29 gava sînorê be’rê danî
ku av fermana Wî dernek’eve,
gava h’îmê dinê davît,
30 hingê ez li cem Wî çîredest bûm.
Ez şabûna Wîye her r’oj bûm,
her t’im li ber Wî şa dibûm,
31 ez bi her tiştêd dinya Wîda şa dibûm
û eşqa min ewledêd însên bû.

### Dengê serwaxtîyê

32 Û niha, gelî zar’a, guhdarîya min bikin.
Xwezî li wan, yêd ku r’ê-dirbêd min xwey dikin!
33 Guh bidine şîreta hûnê serwaxt bin,
pişt guhê xweva wan nevêjin.
34 Xwezî li wî merivî ku min dibihê,
her r’oj ç’e’vê wî li ser dergehê min e
û dîna wî li derîyêd min e.
35 Çimkî k’ê ez dîtime, jîyîn dîtîye
û ji Xudan wê k’eremê bistîne,
36 lê yê ku min ji destê xwe bike,
ew zirarê dide nefsa xwe
û h’emûyêd ku dijenine min,
ew mirinê h’iz dikin».

### Gazîya serwaxtîyê

9 1 Serwaxtîyê mala xwe ava kir,
h’eft stûn dane sekinandinê,
2 h’eywana xwe serjêkir, şerava xwe
lihev danî û sifira xwe hazir kir,
3 carîyêd xwe şandin,
ji bilindcîyêd bajêr ku bikin gazî:

4 «K'î bêh'iş e, bira bê vira!
Û bêjine kêmaqila:
5 ‹Werin bixwin nanê min
û hûn vexwin şerava mine lihevdayî.
6 Dest ji bêh'işîyê bik'işînin, ku hûn bijîn
û xwe li r'îya bîlantîyê bigirin›».

## Şîreta serwaxtîyê

7 Ewê ku pêk'enî şîret dike,
ew bêhurmetîyê ser xweda tîne
û yê nep'ak hiltê, ew lek'a wî li xwe dixe.
8 Pêk'enî şîret neke, ku nebe neyarê te,
lê yê serwaxt şîret ke, ewê te h'iz bike.
9 Yê serwaxt şîret ke û ewê hê serwaxt be,
merivê r'ast hîn ke, zanebûna wîyê hê zêde be.
10 Serê serwaxtîyê xofa Xudan e,
Yê Herî Pîroz naskirin bîlantî ye.
11 Çimkî pê min r'ojêd teyê gelek bin
û salêd e'mirê teyê zêde bibin.
12 Heger tu serwaxt î, ew k'ara te ye
û heger pêk'enî yî, tê zîyanê t'enê bik'işînî.

## Gazîya axmaxtîyê

13 Axmaxtî jineke qalme-qalm e,
bêh'iş û bêfe'm e.
14 Ewa yan li ber derê mala xwe r'ûdinî,
yan jî ser t'extê bilindcîyêd bajêr,
15 gazî yêd r'êda dike,
k'îjan ku r'îya xweda r'ast diçin:
16 «K'î bêh'iş e, bira bê vira!»
Ewa dibêje kêmaqila:
17 «Ava dizîyê şîrin e,
nanê dizîva tê xwarinê te'm e».
18 Lê ewê guh dide wê nizane ku li wir mirî ne,
mêvanêd wê gelîyê dîyarê mirîyada ne.

## K’oma meselêd Silêmane e’wlin

**10** 1 Meselêd Silêman:

Kur’ê serwaxt bavê xwe şa dike,
lê kur’ê axmax k’edera dîya xwe ye.
2 K’ara xiznêd nep’akîyê t’une,
lê r’astî ji mirinê xilaz dike.
3 Xudan nahêle ku yê r’ast bir’çî bimîne,
lê h’ûfe-h’ûfa nep’aka ç’e’vê wanda dihêle.
4 Destê xwer’anedîtîya mêriv belengaz dike,
lê destê yê xîret dewletî dike.
5 Ewê ku havînê dide li ser hev, kur’ê bîlan e,
kur’ê ku dema nandirûnê r’adizê, ew qara bavê ye.
6 Dua ser serê r’asta heye,
lê devê neheqada zordarî veşartî ye.
7 Dua ser bîranîna navê r’asta ye,
lê navê nep’aka dir’ize diçe.
8 Yê xweyê dilê serwaxt, ew t’emîya qebûl dike,
lê yê xweyê zarê axmax wê sersêrî bê.
9 Yê ku r’îya xweda bêlek’e ye, ew bêxof diçe,
lê yê ku r’îya xwe dit’er’ibîne, ew nedîtî namîne.
10 Yê ku bi ç’e’va dike, dibe sebebê xirabîyê
û yê zimanê xwe nikare, wê sersêrî bê.
11 Devê yê r’ast kanîya jîyînê ye,
lê devê neheqada zordarî veşartî ye.
12 K’în-box şêr’ t’evr’adike,
lê h’izkirin her xirabîyê dinixême.
13 Serwaxtî li ser zarê bîlana ye,
lê şivdar bona pişta bêh’işa ye.
14 Yêd serwaxt zanebûnê t’op dikin,
lê devê bêh’iş nêzîkî qeda-bela ye.
15 Hebûka dewletîya bona wan, çawa bajarekî zor e,
lê p’erîşanîya feqîra belengazîya wan e.
16 K’eda r’asta jîyîn e,
qazinckirina nep’aka gune.

17 Şîretxweykirî nava r'îya jîyînêda ye,
lê yê hilatinê qebûl nake dixalife.
18 K'î k'înê vedişêre ew derewî ne
û k'î xeybê dike ew bêh'iş e.
19 Ze'fxeberdanêda gune hene,
lê yê zimanê xwe dikare ew aqil e.
20 Zimanê merivê r'ast zîvê bijartî ye,
lê dilê nep'aka ne t'u tişt e.
21 Devê r'asta geleka t'êr dikin,
lê axmax ji dest bêh'işîyê dimirin.
22 Duayê Xudan hebûkê dide
û k'ederê serda zêde nake.
23 Xirabîkirin bona axmaxa seyreng e,
serwaxtî jî li mêrê bîlan xweş e.
24 Nep'ak ji çi ditirse tê serê wî,
lê xwestina yêd r'ast têne sêrî.
25 Bobelîsk r'adibe nep'ak unda dibe,
lê yê r'ast ser h'îmê h'eta-h'etayê ye.
26 Çawa sirke bona dirana û dû jî bona ç'e'va,
usa jî xwer'anedîtî, bona yê ku wî dişîne.
27 Xofa Xudan e'mirê meriv dirêj dike,
lê salêd nep'aka wê kêm bin.
28 Gumana r'asta şabûn e,
lê mirazê nep'aka wê ç'e'vê wanda bimîne.
29 R'îya Xudan sûra dor bêlek'a ye,
lê bona neheqa wêrankirin e.
30 R'astê t'u car nelik'ume,
lê nep'akê li ser dinê nemînin.
31 Devê yê r'ast serwaxtîyê dertîne,
lê zimanê mixenet wê bê bir'înê.
32 Zarêd r'asta tiştêd me'rîfet zanin,
lê devê nep'aka mixenetîyê.

**11** 1 Mêzîna qelp li ber Xudan h'eramî ye,
lê mêzîna r'ast li Wî xweş tê.

2 Gava k'ubarî tê, bêhurmetî jî tê,
lê serwaxtî t'evî şkestîya ye.
3 H'elalîya r'asta wê r'êberîya wan bike,
lê h'ilek'arîya fêlbaza wê k'oka wan bîne.
4 R'oja xezebê hebûk k'arê nade,
lê r'astî ji mirinê xilaz dike.
5 R'astîya k'amila r'îya wan r'ast dike,
lê neheq pê neheqîyêd xwe dik'evin.
6 R'astîya r'asta wê wan xilaz ke,
lê xayîn pê xayîntîya xwe tê girtinê.
7 Gava merivê nep'ak dimire, gumana wan jî unda dibe
û meremê neheqa nayê sêrî.
8 Yê r'ast wê ji tengasîyê xilaz be
û dewsa wî yê neheq dik'evê.
9 Merivê bêxwedê pê devê xwe heval-hogira unda dike,
lê yêd r'ast bi zanistîyê xilaz dibin.
10 Li ser açixîya r'asta bajar şa dibe
û ser k'etina xiraba dengê şayê tê.
11 Bi duayê r'asta bajar gul dide,
lê bi devê nep'aka xirab dibe.
12 Kêmaqil cînarê xwe bêhurmet dike,
lê merivê aqil xwe ker' dike.
13 Gilîger'o sur'ê e'yan dike,
lê şîrh'elal wê yekê vedişêre.
14 Ji bêse'vîtîyê cime't unda dibe,
lê bi k'oma şêwirkira xilaz dibe.
15 Yê dibe wek'îlê deyndarîya yekî nenas,
ew xirabîyê li xwe dike,
lê yê ku xwe ji wek'îltîya deyndarîyê dûr digire,
ew bêxof e.
16 Jina e'sil qedir distîne,
lê merivê zordar t'enê hebûkê.
17 Merivê r'e'm qencîyê li xwe dike,
lê merivê bêr'e'm xirabîyê li xwe dike.
18 Merivê nep'ak kirê p'ûç' dike,
lê yê r'astîyê dir'eşîne xweyê maşê xwe ye.

19 Çawa yê r'astîyêda mayî diçe berbi jîyînê,
usa jî yê xwe li xirabîyê girtî berbi mirinê.
20 Xweyê dilê xirab li ber Xudan h'eram in,
lê yê ku r'îya bêqusûrda diçin şîrinê Wî ne.
21 T'u car neheq bê bela namîne
lê zur'eta r'asta wê xilaz be.
22 K'ulfeta bedewe bêfe'm,
çawa xelaqa zêr'în finca berazda.
23 Xwestina r'asta t'enê qencî ye,
lê meremê nep'aka xezebe.
24 Hinek bi mer'danîyê zêde dikin,
hinek jî bi timayê kêm dikin.
25 Nandarê sih'et û qewat be,
avdarr'a jî avê bê dayînê.
26 K'î genim vedişêre nifir'a xelqê ser e,
lê yê ku difiroşe dua li ser e.
27 Yê demana qencîyêda ye xatir distîne,
lê yê xirabîyê diger'e ew jî tê serê wî.
28 Yê gumana xwe danîye li ser hebûka xwe wê bik'eve,
lê r'astê mîna ç'iqilê şîn guldin.
29 Yê zirarê dide mala xwe, bayê bibe milk'ê wî
û yê axmax dibe xulamê yê serwaxt.
30 Berê r'asta dara jîyînê ye
û yê serwaxt delalîyê xelqê ye.
31 Heger ser dinê r'ast heqê xwe distînin,
nep'ak û xirabê hê bistînin.

12 1 Yê şîreta h'iz dike, ew zanistîyê h'iz dike,
lê yê hilatinê h'iz nake, ew bêh'iş e.
2 Merivê qenc Xudan xêrxwazê wî ye,
lê merivê mixenet Ew dîwana wî dike.
3 Meriv bi nep'akîyê bingeh nagire,
lê r'awêd r'asta t'u car nah'ejin.
4 Jina e'sil t'acê mêrê xwe ye,
lê ya xweyîqar mîna kurmê hestûyê wî ye.

5 Fikirêd r’asta heq-h’elal in,
lê şêwirêd nep’aka mixenetî ne.
6 Gotinêd nep’aka t’elekêd xûnr’êtinê ne,
lê devê r’asta mêriv xilaz dike.
7 Nep’ak dever’û dibin û unda dibin,
lê malêd r’asta qewîn dimînin.
8 Meriv weke fe’mê xwe xweyîqedir e,
lê yê xweyê dilê xirab bêr’ûmet dibe.
9 Qenc e berbihêr bî û xweyîyê xulamekî,
ne ku p’aydar û merivê h’ewcê nan.
10 Dilê yê r’ast ser h’eywanê wî dişewite,
lê yêd nep’ak bêîsaf in.
11 Yê e’rdê xwe bêcer dike, wê nanê xwe t’êr bixwe,
lê yê dide pey tiştê p’ûç’, ewa yekî bêh’iş e.
12 Ç’e’vê nep’aka li t’alanê xiraba ye,
lê r’awê r’asta şidîyayî ne.
13 Yê xirab bi devê xwe dik’eve êgir,
lê r’astê ji tengasîyê derk’eve.
14 Meriv bi berê devê xwe xêr-xiznêva t’êr dibe
û weke kirêd desta ew p’ara xwe distîne.
15 R’îya axmax li ber ç’e’va r’ast e,
lê yê serwaxt guh dide şîreta.
16 Axmax pêr’a-pêr’a hêrsa xwe dide k’ifşê,
lê yê aqil şaşîyê vedişêre.
17 Yê heq xeber dide, r’astîyê e’lam dike,
lê şe’dê derew, xapandinê.
18 Hinek bi xebera mîna şûr mêriv birîndar dikin,
lê zimanê serwaxta dermanê dila ye.
19 Devê r’astgotî ser ya xwe dimîne,
lê zimanê derewîn dem-demî ye.
20 Dilê fikirxirabada mixenetî ne,
lê yê ser e’dilayê difikirin wê şa bin.
21 T’u xirabî wê neyê serê r’asta,
lê nep’akê ji qede-bela ç’e’v venekin.
22 Ji zarê derew Xudan zivêr e,
lê yê p’ergale amin Wî xweş tên.

23 Merivê aqil zanebûna xwe vedişêre,
lê dilê axmaxa, axmaxtîya wî e’yan dike.
24 Destê merivê xîret serwêrîyê dike,
lê xwer’anedîtî borcdar e.
25 Kul-derd dilê mêriv wî dih’elîne,
lê gotineke qenc wî şa dike.
26 Merivê r’ast r’ê nîşanî hevalê xwe dike,
lê r’îya nep’aka wan dixalifîne.
27 Xwer’anedîtî nêç’îra xwe nak’elîne,
lê merivê xîret xweyîhebûk e.
28 Şiver’îya r’astîyêda jîyîn heye
û r’îya wêda mirin t’une.

13 1 Kur’ê serwaxt guh dide dersê bavê xwe,
lê yê pêk’enî guh nade hilatinê.
2 Meriv bi berê devê xwe xweşîyê dixwe,
lê nefsa neamina zordarîyê dixwaze.
3 Yê devê xwe dikare, ew xwe xwey dike,
lê yê devê xwe gelekî vedike, wê unda be.
4 Nefsa xwer’anedîtî dixwaze, lê tiştekî wî t’une,
lê nefsa merivê xîret t’êr-t’ijî dibe.
5 Merivê r’ast ji gotina derew zivêr dibe,
lê nep’ak xwe dike r’obet, şermî dibe.
6 R’astî r’asta xwey dike,
lê nep’akî gunek’ar sersêrî tîne.
7 Hene merî xwe k’ifş dikin ku dewletî ne, lê bê tişt in,
merî jî hene ew k’ifş dikin ku k’esîb in,
lê gelekî dewletî ne.
8 Meriv ji ber nefsa xweva hebûka xwe dide,
lê xema yê belengaz nîne.
9 Ç’ira merivêd r’ast wê şewq bide,
lê ç’ira yê nep’aka wê vêse.
10 Ji k’ubarîyê t’enê şer’-de’w dertên,
lê serwaxtî cem şîrethildaya ye.
11 Hebûka h’eramîyê hatî, h’eramîyê jî diçe,
lê bi xûdana h’elal k’edkirî wê zêde be.

12 Gumana ku derengî dibe, dil dêşîne,
lê gihîştina merem, mîna dara jîyînê ye.
13 Yê xeberê bêhurmet dike, ew zîyanê ser xweda tîne,
lê yê ji t'emîyê ditirse, wê maşê xwe bistîne.
14 Hînkirina yê serwaxt kanîya jîyînê ye,
ku mêriv ji t'or'a mirinê dûr bigire.
15 Fe'mê qenc me'rîfetîyê tîne,
lê r'îya yêd bêamin ze'met
16 Her kesê aqil bi zanistîyê dike,
lê yê axmax, axmaxtîyê dide k'ifşê.
17 Qasidê xirab xeta-bela ye,
lê yê amin derman e.
18 Yê şîreta qebûl neke belengazî û qarê bên serê wî,
lê yê guh dide hilatinê, qedirê wîyê bilind be.
19 Xwestina mêriv ku tê sêrî dil şa dibe,
lê yê axmax xwe ji xirabîyê paşdagirtinê zivêr e.
20 Hevalê serwaxta serwaxt dertê,
hevalê axmaxa xirab dertê.
21 Xirabî tê serê gunek'ara,
lê qencîyê r'astar'a bê dayînê.
22 Merivê qenc milk' dihêle nevîyêd xwer'a,
lê hebûka gunek'ara bona r'asta tê t'opkirinê.
23 E'rdê belengazada gelek r'isq heye,
lê ji dest neheqîyê dest wan diçe.
24 Yê şiva şîretê nade xebatê, ew zar'a xwe h'iz nake,
lê yê h'iz dike, ew zar'otîyêda bi t'erbet şîret dike.
25 Yê r'ast dixwe ç'e'vê wî xwarinêda namîne,
lê zikê yê nep'ak nizane t'êrbûn çî ye.

# 14

1 K'ulfeta serwaxt mala xwe ava dike,
lê ya axmax pê destê xwe hildişîne.
2 Yê r'îya r'astda diçe ew ji Xudan ditirse,
lê k'î r'îya xaro-maroda diçe, ew Wî bêhurmet dike.
3 Devê axmax şiva ser pişta wî ye,
lê devê serwaxta xwe zeft dikin.

4 K'îderê ga t'une, afir' vala ye,
lê piştî ga gelek deremet tê ser hev.
5 Şe'dê amin derewa nake,
lê şe'dê derew, derew ji dêv diwarin.
6 Pêk'enî serwaxtîyê diger'e, lê nabîne,
lê bona bîlana zanistî r'ih'et e.
7 Ji merivê axmax dûr k'eve,
tu zanebûnê devê wîda nabînî.
8 Serwaxtîya merivê aqil ev e, ku r'îya xwe zane,
lê axmaxtîya axmax xalifandine.
9 Axmax ser gunekirinê dik'enin,
lê nava r'astada berbihêrî heye.
10 Her dil derd û kulêd xwe zane
û kesek t'evî şabûna wî nabe.
11 Malêd nep'aka wê wêran bin,
lê h'olikêd r'asta wê gul din.
12 R'ê heye ku mêrivr'a r'ast xuya dike,
lê xilazîya wê r'îya mirinê ye.
13 Car-cara devî k'en e, dilî kul e,
car-cara jî axirîya şabûnê şîn û girî ye.
14 Merivê dilxirab ji berêd r'îya xwe t'êr dibe,
lê merivê qenc ji berê kirêd xwe.
15 Merivê saxikê dilê xwe her gotinê bawer dike,
lê yê aqil dîna xwe dide gavêd xwe.
16 Yê serwaxt ditirse û ji xirabîyê dûr dik'eve,
lê yê axmax diqilqile û cule't dibe.
17 Yê zû hêrs dik'eve bêh'işîyê dike,
lê merivê serwaxt sebir dike.
18 Yê bêh'iş wê axmaxtîyê qazinc kin,
lê yê aqil zanistîyêva tên k'ofîkirin.
19 Xirabê li ber qenca dever'ûya bên,
nep'akê jî li ber derê r'asta.
20 K'esîb h'eta li ber ç'e'vê hevalê xwe jî r'eş e,
lê dostêd dewletî gelek in.
21 K'î qedirê yekî nagire, ew gune dike,
lê yê dest davêje k'esîb, xwezilî ye.

22 Gelo yêd xirab difikirin naxalifin?
Lê yêd qenc difikirin, qencî û r’astîyê dibînin.
23 Her şixulîda k’ar heye,
lê p’ûç’xeberdan dibe t’unebûnê.
24 Hebûka serwaxta t’acê wan e,
lê k’ofîya axmaxa axmaxtîya wan e.
25 Şe’dê amin mêriv xilaz dike,
lê yê qelp mixenetîyê dide der.
26 Xofa Xudan gumaneke qewîn e
û bona zar’êd xofk’êş hêwargeh e.
27 Xofa Xudan kanîya jîyînê ye,
ku mêriv ji t’or’a mirinê dûr bigire.
28 Mixulqeta ze’f qedirê p’adşê ye,
lê mixulqeta kêm k’etina mîr-bega ye.
29 Merivê xweyîsebir, yekî gelekî bîlan e,
lê yê zû quloz dibe, bêh’işîya xwe dide k’ifşê.
30 Dilê r’ih’et jîyîna bedenê ye,
lê h’evsûdî kurmê hestûya ye.
31 Ewê ku k’esîb dêşîne, ew qedirê Xuliqdarê wî dik’eve,
lê yê alîyê desttenga dike, ew qedirê Xwedê digire.
32 Ji dest xirabîya xwe nep’ak dever’ûya tê,
lê h’eta ber mirinê jî gumana yê r’ast heye.
33 Dilê merivê aqilda serwaxtî dimîne,
axmax jî zanin ew yek çîye.
34 R’astî milet bilind dike,
lê gune milet r’ûr’eş dike.
35 P’adşa li xulamê aqil xweş e,
lê hêrsa wî li ser yê ku r’ûr’eşîyê tîne.

# 15

1 Caba nerm hêrsê datîne,
lê gotina h’işk hêrsê r’adike.
2 Zimanê yê serwaxt zanistîyê xweş dike,
lê ji devê axmax axmaxtî dir’ije.
3 Ç’e’vê Xudan li her dera ye,
Ew qenc û xiraba dibîne.

4 Zarê şîrin dara jîyînê ye,
lê yê xalifî êşa dila ye.
5 Axmax dersa bavê xwe bêhurmet dike,
lê yê guh dide hilatinê, firaseta wî zêde dibe.
6 Malêd r'astada xizna mezin heye,
lê k'eda nep'akada kul û derd.
7 Devê serwaxta zanistîyê bela dikin,
lê dilê axmaxa usa nake.
8 Xudan ji qurbana nep'aka zivêr e,
lê duayê r'asta li ber dilê Wîda şîrin e.
9 Xudan ji r'îya nep'aka zivêr e,
lê yêd li pey r'astîyê diçin h'iz dike.
10 Yê ji r'ê dik'eve bê bela namîne
û yê hilatinê h'iz nake wê nemîne.
11 Dîyarê mirîya û gelîyê hey-wayê li ber Xudan in,
îdî k'u ma dilê ewledêd mêriv.
12 Yê ji xwe r'azî şîretk'arê xwe h'iz nake
û naçe cem serwaxta.
13 Dilê şa beşera xweş e,
lê dilê kul h'inavzer e.
14 Dilê bîlana zanistîyê diger'e,
lê devê axmax axmaxtîyêva t'ijî ye.
15 Xweyê dilê kul her r'oj şînêda ye,
lê xweyê dilê şa her t'im şayêda ye.
16 Qenc e hindik bi xofa Xudan,
ne ku xizna gelek bi şer' û de'w.
17 Qenc e xwarina p'incar'ê bi h'izkirinê,
ne ku gayê dermalîkirî bi k'în-box.
18 Merivê hêrs şêr' t'evr'adike,
lê yê berbihêr qalme-qalmê diseqir'îne.
19 R'îya xwer'anedîtî mîna çîta stirî ye,
lê şiver'îya r'asta r'ast-dûz e.
20 Kur'ê serwaxt bavê xwe şa dike,
lê merivê axmax qedirê dê nizane.
21 Axmaxtî bona kêmaqil şabûn e,
lê yê aqil dide li ser r'îya r'ast.

22 Bê şîret merem û t’ivdîr betal dibin,
lê bi saya gelek şîretk’ara ew têne sêrî.
23 Meriv pê cabdayîna xweye r’ast şa dibe,
çiqas xweşe her xeber wextê xweda!
24 R’îya jîyînê merivê aqil berbi jor dibe,
ku wan dûr xe ji dîyarê mirîyaye jêrin.
25 Xudan malêd k’ubara dever’û dike,
lê sînorê jinebîya dişidîne.
26 Xudan ji fikirê yê xirab zivêr e,
lê xeberêd yê bêxêlif li Wî xweş tên.
27 Ç’e’vbir’çîtî şer’-de’w dike mala xwe,
lê yê r’uşeta h’iz nake wê bijî.
28 Dilê yê r’ast li ser cabdayînê difikire,
lê ji devê nep’aka xirabî dir’ije.
29 Xudan ji nep’aka dûr e,
lê duayê r’asta dibihê.
30 R’onaîya ç’e’va dil şa dike,
mizgînîya xêr jî hestûya dişidîne.
31 Yê ku guh dide hilatina jîyînê,
xwexa jî wê nav serwaxta bê jîyînê.
32 Yê şîreta qebûl nake, ew xenîmê xwe ye,
lê k’î hilatinê qebûl dike, aqil t’op dike.
33 Xofa Xudan serwaxtîyê hîn dike,
bi milûktîyê berbi r’ûmetê dibe.

16 1 T’ivdîrêd dilê mêrivda yê wî ne,
lê cabdarîya zimên ji Xudan e.
2 H’emû r’îyê mêriv li ber ç’e’vê wî paqij in,
lê Xudan r’uh’a dide li ser mêzînê.
3 Şixulê xwe bide destê Xudan
û tê bigihîjî nêt-meremê xwe.
4 Her tişt Xudan bi merem kirîye,
nep’ak jî bona r’oja oxirmê giran.
5 Xudan ji h’emû k’ubar-babaxa zivêr e
û ew t’u car bê bela namînin.

6 Bi dilşewatîyê û aminîyê gune têne k’ewandinê
û xofa Xudan mêriv ji xirabîyê dûr dixe.
7 Gava Xudan r’îya yekî begem dike,
h’eta dijminê wî jî t’evî wî li hev tîne.
8 Qence hindik bi r’astîyê,
ne ku malê p’ir’ bi neheqîyê.
9 Dilê mêriv r’îya dide li ber xwe,
lê Xudan gavê wî r’ast dike.
10 H’ukumê Xwedê li ser devê p’adşê ye
û devê wî dîwanêda şaş nabe.
11 T’erezî û mêzîn r’ast yê Xudan in,
kevirêd mêzînêye t’orpeda kirêd Wî ne.
12 P’adşa ji xirabîkirinê zivêr in,
çimkî t’extêd wan bi r’astîyêva qedîm in.
13 P’adşa li yê zarê bêxêlif xweş in,
ewana yê r’ast xeber dide h’iz dikin.
14 Hêrsa p’adşê mîna r’uh’istîn e,
lê merivê serwaxt wê diseqir’îne.
15 R’onaya r’ûyê p’adşê jîyîn e
û xêrxwezîya wî mîna e’wrê baranêyî biharê.
16 Serwaxtî standin ji zêr’ hêjatir e
û bîlantî destanîn ji zîv çêtir e.
17 R’îya r’astaye sereke ji xirabîyê dûrk’etin e,
k’î miqatî r’îya xwe dibe, ew e’mirê xwe xwey dike.
18 Berî wêranbûnê k’ubarî tê
û berî k’etinê r’uh’ê babaxîyê.
19 Hê qenc e t’evî belengaza şkestî bin,
ne ku t’evî k’ubara t’alan p’arevekin.
20 K’î şixulê xwe bi serwaxtîyê dike k’arê dik’eve
û yê ku xwe dispêre Xudan xwezilî ye.
21 Merivê dilda serwaxt aqil h’esab dibe
û yê zarê şîrin zanistîyê zêde dike.
22 H’iş, bona xweyîh’işa kanîya jîyînê ye,
lê bona bêh’işa şîret axmaxtî ye.
23 Merivê dilda serwaxt serwaxtîyê dide zimên
û zanebûnê li zarê wî zêde dike.

24 Xweşxeberdan mîna hingivê t’or’hêlûnê ye,
li r’uh’ xweşe û li hestûya derman e.
25 R’ê heye ku mêrivr’a r’ast xuya dike,
lê xilazîya wê r’îya mirinê ye.
26 Merivêd xebatk’ar bona xwe dixebite,
çimkî devê wî p’êyî ser wî dike.
27 Merivê neheq xirabîyê diger’e
û zarê wî alava agir e.
28 Merivê mixenet şêr’ t’evr’adike
û buxdanbêj pismama ji hev dûr dixe.
29 Merivê zorbe hevalê xwe dixapîne
û dibe dike r’îya xirabîyê.
30 Yê ku ç’e’vê xwe digire bona fikira xirab
û lêva xwe digeze, xirabîyê dike.
31 R’û-gulîyê sipî k’ofîya r’ûmetê ye,
ku ew nava r’îya r’astîyêda ye.
32 Merivê xweyîsebir ji mêrxas çêtir e
û yê xwegirtî ji yê bajar-hildayî.
33 P’eşkavîtin ji t’ext û bext e,
lê her qirarê Xudan dide.

**17** 1 Qenc e pe’rî nanê h’işk bi e’dilayê,
ne ku maleke t’êre-t’ijî bi şer’-de’w.
2 Xulamê aqil h’ukumî li ser kur’ê r’obet dike
û nava biratîyêda p’ara xwe milk’ distîne.
3 Çawa fir’ne zîv dicêr’ibîne û k’ûre jî zêr’,
lê Xudan dila dicêr’ibîne.
4 Merivê xirab guh dide zarê neheq
û derewîn guh dide zimanê zîyank’ar.
5 Yê ku li k’esîb dik’ene, ew qedirê Xuliqdarê wî dik’eve
û yê ku dilê xwe li çerxa ç’ep şa dike,
ew bê bela namîne.
6 Nevî k’ofîya r’ûspîya ne,
bav r’ûspîtîya zar’a ne.
7 Çawa xebera çê li merivê bêarî-ser’a nak’eve,
usa jî zarê derew li e’silzada nak’eve.

8 R’uşet ç’e’vê dayîda çawa kevirê qîmet e,
ku berê xwe bide çi wê jêr’a li hev bê.
9 Yê xirabîyê dinixême hevalk’ar e,
lê yê dike dengî hevalder e.
10 Hilatinek hê li fe’mdar,
ne ku sed k’ulm li axmax.
11 Merivê xirab ku t’enê serî hildide,
qasidê bêîsaf wê pêşîyêda bê şandinê.
12 Qenc e meriv h’ir’ç’ekî ç’êjikê xwe undakirî biqeside,
ne ku di dema axmaxtîyêda axmaxekî.
13 K’î ji ber qencîyêva xirabîyê bike,
xirabîyê ji mala wî dûr nek’eve.
14 Destpêbûna şêr’ mîna avber’danê ye,
hê şer’ ku giran nebûye jê dûr k’eve.
15 Yê nep’ak r’ast derdixe û yê r’ast gunek’ar derdixe,
her du jî li ber Xudan h’eram in.
16 Qîmetê serwaxtîyê ku destê axmaxda ye kêrî çi tê?
Ku fe’m nake bik’ir’e.
17 Heval her gav h’iz dike,
bira bûye bona r’oja oxirmê giran.
18 Merivê kêmaqil deynê xelqê hildide stûyê xwe
û bona pismamê xwe dibe wek’îl.
19 Yê şer’ h’iz dike ew xirabîyê h’iz dike
û yê dergehê xwe bilind dike,
ew wêranbûna xwe diger’e.
20 Merivê dilê xirab, xêrê nabîne
û yê zarê mixenet bela jêr’a tê.
21 Yê axmax pey xwe dixe, mereza wî ye
û bavê yê bêar axîn-axînîya wî ye.
22 Dilê şa mîna dermanê kêrhatî ye,
lê dilê xem û xeyal h’işkbûna hestûya ye.
23 Yê nep’ak p’aşila xweda r’uşetê tîne,
wekî r’îya r’astîyê bit’er’ibîne.
24 Serwaxtî li ber ç’e’vê fe’mdara ye,
lê ç’e’vêd axmaxa virda-wêda dinihêr’in.

25 Kur’ê axmax k’esera bavê ye
û kula dilê ya pey xwe xistî ye.
26 Ne qence yê r’ast bidine cezayê
û e’silzada xin bona heqîya wan.
27 Yê zimanê xwe dikare zane ye
û yê berbihêr bîlan e.
28 Axmax jî gava ku deng nake, serwaxt k’ifş dibe
û yê devê xwe venake, bîlan xuya dibe.

**18** 1 Yê ji xwe r’azî xwestina dilê xwe diger’e
û miqabilî her şêwir û qirarê ye.
2 Axmax bîlantîyê h’iz nake,
lê t’enê dike ku ya xwe bêje.
3 Gava nep’akek tê, bêqedirî jî tê,
t’evî bêr’ûmetîyê bêhurmetî tê.
4 Gotinêd devê mêriv avêd k’ûr in,
ji kanîya serwaxtîyê ç’em dik’işin.
5 Ev ne r’ast e ku pişta nep’ak bigirin,
dîwanêda yê r’ast ner’ast derxin.
6 Devê yê axmax şêr’ t’evr’adike
û gotina wî gazî lêdanê dike.
7 Devê axmax bela serê wî ye
û zarê wî t’ela nefsa wî ye.
8 Gotinêd buxdanbêj mîna te’me-tîska ne
û ew h’eta k’ûraîya navdil diçin.
9 Ewê ku şixulê xweda sist e,
ew birê merivê zîyank’ar e.
10 Navê Xudan bilindcîke qayîm e,
r’astê ku xwe li wir digire, lê sit’ar dibe.
11 Hebûka dewletî bona wî, çawa bajarekî zor e
û bi dîtina wî mîna sûreke bilind e.
12 Berî k’etinê dilê mêriv k’ubar dibe,
lê xwe nimizkirinê r’ûspî dibe.
13 Yê hê nebihîstî cabê dide,
ew bêh’iş û qara wî ye.

14 R'uh'ê mêriv li nexweşîya sebir dike,
lê r'uh'ê birîndar k'î dikare teyax ke?
15 Dilê yê aqil zanistîyê dest tîne
û guhê yê serwaxt zanistîyê diger'e.
16 Xelata mêriv r'ê li ber wî vedike,
h'eta li ber giregira jî wî dibe.
17 Yê pêşîyê gotina xwe dibêje, ku ew r'ast derê,
lê gava de'wkirê wî bê, wê bê e'nenekirinê.
18 P'eşk-avîtin şer'-de'wa dide sekinandinê
û yêd zor li hev dide r'ûniştandinê.
19 Birakî xeyîdî mîna bajarekî sûrkirî ye
û şer'-de'w mîna zer'za qesirê ye.
20 Zikê meriv ji berê devê wî t'ijî dibe
û ji deremeta zarê wî t'êr dibe.
21 Mirin û jîyîn destê zimên in,
yê ku jê h'iz dikin ji berêd wî dixwin.
22 K'î jinê dibîne, xêr û xiznê dibîne
û ji Xudan r'e'm-k'eremê distîne.
23 K'esîb bi lava-dîleka dipirse,
lê dewletî h'işk cabê dide.
24 Merivê xweyê gelek heval, bela serê wî ye,
lê heval jî hene ji birakî çêtir in.

**19** 1 Qenc e belengazê ku r'îya xweye aminda diçe,
ne ku yekî devxalifîyî axmax.
2 Merivê bê zanebûn xêr t'une,
yê lez dik'eve r'îya xwe unda dike.
3 Axmaxtîya mêriv r'îya wî şaşo-p'aşo dike
û dilê wî hindava Xudanda bînteng dibe.
4 Hebûk gelek dosta zêde dike,
lê yê k'esîb ji pismamtîya xwe diqete.
5 Şe'dê derew wê bê bela nemîne
û yê derewîn wê nefilite.
6 Gelek xwe li merivê mer'd digirin
û h'emû dibine pismamê merivê ku p'êşk'êş didin.

7 Biratîya k'esîb h'emû jê diçin,
îdî k'u ma pismamê wî jê dûr nek'evin!
Û ew li wan dike gazî,
lê k'a ewe k'u ne?
8 Yê serwaxtîyê destîne, ew nefsa xwe h'iz dike,
yê bîlantîyê xwey dike, ew xêr û xweşîyê dibîne.
9 Şe'dê derew wê bê bela nemîne
û derewînê r'ûbarî dinê nemîne.
10 Çawa xêr û xweşî li axmax nake,
usa jî xulam, serwêrîyê li axa nake.
11 Fe'mê qenc mêriv ji hêrsê paşda dêxe
û r'ûspîtîya wî qusûr-nenihêr'andin e.
12 Hêrsa p'adşê mîna mir'înîya şêra ye,
lê xêrxwezîya wî mîna qir'avîya ser şînayê ye.
13 Kur'ê axmax bela serê bavê ye,
şer'ê jinê jî mîna barana hûre-hûr.
14 Mal û hebûk ji bava ne,
lê jina e'sil ji Xudan e.
15 Xwer'anedîtin xewa k'ûr tîne
û yê bêxîret bir'çî dimîne.
16 Yê t'emîyê xwey dike, ew xwe xwey dike,
lê yê guh nade r'îya xwe, ew mirina xwe dike.
17 Yê ku alîk'arîya k'esîb dike, ew deyn dide Xudan
û Xudanê ji ber dayîna wîva, wî xelat ke.
18 H'eta guman heye, kur'ê xwe şîret ke,
lê ne ku h'eta kuştina wî.
19 Yê gelekî hêrs, gerekê bê cezakirinê,
heger tu bidî xatir, tê dîsa biwek'ilînî.
20 Şîretê hilde û hînkirinê bibe yar e,
wekî axirîyê te bike dersdar e.
21 Dilê mêrivda gelek merem hene,
lê t'enê xwestina Xudan tê sêrî.
22 Qenc e meriv h'eyra qencîkirinêda be,
merivê k'esîb ji yê derewîn çêtir e.
23 Xofa Xudan jîyîn e, merivî pê r'ih'et e,
t'u xirabî lê naqesid e.

24 Xwer’anedîtî destê xwe dike t’asa xwe,
lê nikare bibe devê xwe.
25 Pêk’enî xe, ku yê saxikê dilê xwe, h’iş t’opî serê xwe ke
û yê aqil hilê, serwaxtîyê wê qazinc ke.
26 Yê ku bi k’ulmê diçe bavê xwe û berî dê dide,
ew kur’ê r’ûr’eşîyê û qara ye.
27 Lawê min, heger tu xwe ji şîretê dûr digirî,
belê, tu xwe ji gotinêd zanistîyê dûr digirî.
28 Şe’dê derew ser r’astîyê dik’ene
û devê nep’aka neheqîyê dadiqurtîne.
29 Bona pêk’enîya ceza hazir e
û bona pişta axmaxa jî lêdan.

**20** 1 Şerav k’entî ye û avce şer’tî ye,
yê xwe dide van, ne serwaxtî ye.
2 Sawa p’adşê mîna mir’înîya şêr e,
yê wî dike hêrsê ye, ew xwe dike neheqîyê ye.
3 H’evza xwe şer’kirinê, qedirê merîya ye,
lê her bêh’iş ser şêr’ bengî ye.
4 Xwer’anedîtî we’deda e’rdê r’anake,
nandirûnêda wê lê biger’e, lê p’eyda neke.
5 Meremê dilê mêriv avêd k’ûr in,
lê merivêd bîlan wan hildiç’inin.
6 Gelek merî qencîyêd xwe dikin dengîne,
lê merivêd amin k’î dikare bibîne?
7 Yê bi heqîyê r’îya r’astda çûyî,
peyr’a wê bextewar bin zar’êd wîye bûyî.
8 P’adşayê li ser t’extê dîwanê,
bi ç’e’va her xirabîyê dide hildanê.
9 K’î dikare bêje: «Min dilê xwe paqij kir
û guneyêd xwe jî ji xwe dûr xist»?
10 Du kevirêd mêzînêye ne weke hev,
du pîvanê ne weke hev,
h’eramîne li ber Xudan her du weke hev.
11 H’eta qencî yan xirabîya xeysetê zar’ê jî
bi kirêd wî k’ifş dibin.

12 Guhê ku dibihê û ç’e’vê dibîne,
her du jî Xudan çêkirine.
13 Xewê h’iz neke, ku k’esîb nebî,
ç’e’vê xwe veke, ku bi nan t’êr bî.
14 Yê dik’ir’e dibêje: «Ne r’ind bû! Ne r’ind bû!»
lê gava diçe, hingê p’aydar bû.
15 Zêr’ û cewar gelek hene,
lê zarê bîlan hê xişirê biha ye.
16 Yê bû wek’îlê xerîbekî, qap’ûtê wî hilde,
yê bû wek’îlê nenasekî, k’efîl ji wî hilde.
17 Nanê derewîyê mêriv xweş tê,
lê paşê mîna parî gewrîyêda dimîne
18 Merem bi şêwirê tê e’seyîkirinê,
bi r’êdîtinê şer’ bide kirinê.
19 Yê gilîger’o sur’ê bela dike,
h’evza xwe ji yê devbela bike.
20 Yê nifir’k’arê dê û bava be,
k’ûrayîya şevêda ç’ira wîyê vêse.
21 Ew milk’ê ku pêşda bi lezo-bez hatîye destxistin,
wê axirîyêda duayê lê wê neyê kirin.
22 Nebêje: «Ji ber xirabîyêva ezê xirabîyê bikim»
sebira Xudan bike û ewê te xilaz ke.
23 Li ber Xudan du kevirêd mêzînêye
ne weke hev h’eramî ne
û mêzîna qelp neheqî ye.
24 Gavê meriv ji Xudanda têne avîtinê,
îdî r’îya xwe çawa dikare ew fe’m bike?
25 Berî sozdayîna dîyarîya xwe, tu r’ind bide aqilê xwe,
ku p’oşman nebî û bik’evî t’ela xwe.
26 P’adşê serwaxt bi kam nep’aka dide lêdanê
û çawa melh’eb wan ji bêderê dide hildanê.
27 Îsafa mêriv ç’ira Xudan e,
k’ûrayîya dila e’nene dike.
28 Dilşewatî û r’astî xweykirîyê p’adşê ne,
ew jî bi dilşewatîyê t’extê xwe dişidîne.

29 R’ewşa cahila qewata wanda ye,
r’ûmeta mezina r’û-gulîyê sipî ye.
30 Derbêd birînê xirabîyê dûr dixe, lêdan jî nav-dil paqij dike.

21 1 Dilê p’adşê destê Xudanda mîna cewêd ava ne,
k’îyalîda ku dixwaze, Wî alîyîda dadiger’îne.
2 R’îya her merivî li ber ç’e’vê wî r’ast k’ifş dibe,
lê Xudan dila dide li ser mêzînê.
3 Ç’e’vê Xudanda r’astî û heqî kirin,
ji qurbandayînê çêtir in.
4 Ç’e’vê k’ubar, dilê babax
awa gotî ç’ira r’îya nep’aka, gune ye.
5 T’ivdîra merivê xîret e’se k’arê tîne,
lê her kesê lez k’etî e’se zirarê tîne.
6 Bi zimanê derew xizna qazinckirî,
mîna hulm-gulma ku derbaz dibe, dike t’ela mirinê.
7 Zordarîya nep’aka wan r’adiqetîne,
çimkî ew naxwazin pey r’astîyê bin.
8 R’îya merivê neheq xaro-maro ye,
lê yê bêsûc r’ast diçe.
9 Qenc e qulç’ekîda li ser xênî bijîn,
ne ku t’evî jina şer’ûd xanekêda.
10 Nefsa merivê xirab xirabîyê dixwaze,
hevalê wî jî ç’e’vê wîda xêrê nabîne.
11 Gava pêk’enî tê cezakirinê, dilsax serwaxt dibe
û gava yê serwaxt tê şîretkirinê, ew zanistîyê distîne.
12 Yê ser r’astîyê dîna xwe dide mala nep’ak
û nep’ak ji dest xirabîyê ser-sêrî tê.
13 K’î t’ilîya dike guhê xwe ku dengê k’esîb nebihê,
ewê jî têke gazî û dengê wî neyê bihîstinê.
14 P’êşk’êşa dizîva hêrsê datîne,
xelata p’aşilêda, xezebê diseqir’îne.
15 Heqîkirin şabûna r’asta ye,
lê bona yê neheq ew yek merez e.
16 Merivê ku ji r’îya bîlantîyê dadiger’e,
ew dik’eve nava civata xeyala.

17 Yê k'êfê h'iz dike, ewê k'esîbîyê bibîne,
ewê şeravê û bez h'iz dike, wê dewletê nabîne.
18 Bona yê r'ast, nep'ak berva tê dayîn,
bona heqa jî, yê bêamin tê dayînê.
19 Qenc e merî çol-bestada bijî,
ne ku t'evî jina şer'ûd û bed.
20 Mala serwaxtda t'ijî r'ûn û xizne ye,
lê yê bêh'iş hebûka xwe qurta xweda dike.
21 Yê nêta wî li ser r'astîyê û r'e'mê ye,
ewê e'mir, r'astîyê û r'ûmetê bibîne.
22 Yê serwaxt hildik'işe bajarê mêrxasa,
kela wane ku ew têda guman in, hildişîne.
23 Yê devê xwe û zimanê xwe dikare,
ew xwe ji qede-bela xwey dike.
24 Merivê xwer'azîyî, ku kirêd wî bi k'ubarîyê û babaxîyê ne,
navê wî: «Pêk'enî» ye.
25 Temê bêxîret wî dikuje,
çimkî destê wî xebatê naxwaze,
26 her r'oj ç'e'vê wî desta ye,
lê yê r'ast dide û ber nak'eve.
27 Xudan ji qurbana nep'ak zivêr e,
îlahî gava bi nêta xirab dide.
28 Şe'dê derew wê unda be,
lê yê guha bihîstî şe'detîya wî dimîne.
29 Merivê nep'ak r'ûyê xwe dişidîne,
lê yê r'ast r'îya xwe qedîm dike.
30 T'u serwaxtî, bîlantî û şêwir t'une
ku himberî Xudan bisekine.
31 Hesp bona şêr' tê hazirkirinê,
lê serk'etin bi destê Xudan e.

**22** 1 Navê qenc ji hebûka p'ir' qenctir e,
qedir ji zêr' û zîv çêtir e.
2 K'esîb û dewletî r'astî hev tên,
ew her du jî Xudan xuliqandine.

3 Yê aqil xirabîyê ku dibîne h’evza xwe dike,
lê yê dilsax pêşda diçin û zirarê dibîne.
4 Berê milûktîyê û xofa Xudan
hebûk, qedir û jîyîn in.
5 R’îya merivê ner’astda stirî û t’ele ne,
yê nefsa xwe xwey dike, ew ji wan dûr e.
6 Zar’otîyêda r’îya r’ast hîn bike,
gava ew kal be, îdî ewê ji wê nek’eve.
7 Dewletî k’esîba bindest dike,
deyndar dibe xulamê deyndayî.
8 Yê xirabîyê dir’eşîne, wê tengasîyê bidirû
û şiva hêrsa wî wê bişkê.
9 Duayê li mer’d bê kirinê,
çimkî ew nanê xwe belayî k’esîba dike.
10 Berî pêk’enî de, şer’ê dûr k’eve,
qalme-qalm û bêhurmetkirinê biseqir’in.
11 Yê dilê paqij h’iz dike, gul-nûr ji dêv dibare
û p’adşa li wî pismam e.
12 Ç’e’vê Xudan zanistîyê xwey dikin,
lê gotinêd yê qelpî-mixenet wêran dike.
13 Xwer’anedîtî dibêje: «Şêr derva heye!
K’ûçada ezê bême kuştinê».
14 Devê ç’e’vdera ç’e’la k’ûr e,
yê hêrsa Xudan ser, wirda dik’eve.
15 Axmaxtî dilê zar’êva girêdayî ye,
lê şiva şîretê wê yekê ji wî dûr dixe.
16 Yê ku k’esîb dêşîne, ku ew xwexa dewletî be,
yan jî yê dide dewletî, ew her duyê jî bik’evine t’unebûnê.

**K’oma gotinêd serwaxta**

17 Guh bide û gotinêd serwaxta bibihê
û dilê xwe bide zanistîya min.
18 Heger tu van dilê xweda xwey kî, evê te şa kin
û li ser zarê te bimînin.
19 Awa ev yek, min îro tu dayî h’esandinê,
wekî gumana te li ser Xudan be.

20 Gelo min bona te sî şêwir û şîret ne nivîsîne?
21 Wekî fe’mîna gotinêd r’aste amin te hîn kim,
ku caba yêd ji te dipirsin tu r’ast bidî.

22 K’esîb t’alan neke, ku ew belengaz e
û zorê li yê bêç’areyî li ber dîwanê neke,
23 çimkî Xudan piştovanê wan e,
Ewê jî e’mirê yê ku ew şêlandine bişêlîne.

24 T’evî merivê hêrs hevaltîyê neke,
û t’evî merivê zû quloz dibe r’ê neçe,
25 nebe ku tu r’ê-dirbêd wî hîn bî
û nefsa te bik’eve t’elê.

26 Ji ber deynva nebe wek’îl
mîna ewê ku dest dide,
27 gava t’unebe tu berva bidî,
çima nivîna bin te bibin?

28 Nîşana sînorê kal-bavêd te danîne,
ji cî neh’ejîne.

29 Te ew merivê şixulk’arê xwe dîtîye?
Ew li ber p’adşa disekine,
ne ku li ber merivê bêkêr disene.

# 23

1 Gava tu t’evî axakî r’ûnîyî nan bixwî,
r’ind dîna xwe bide pêşîya xwe.
2 Heger tu xweyê zapa mezin î
k’êrê bide li ser qir’ika xwe.
3 Bira temê te nek’işîne te’me-tîskêd wî,
çimkî ew xurekêd xapanok in.

4 Nek’eve demana dewletîbûnê,
ji wê fikira xwe paşda bisekine.

5 Ç'e'vê teyê li ser wî tiştê p'ûç' be,
lê ewê xwer'a baska çêke
û mîna teyra bifir'e e'zmên.

6 Nanê merivê nemer'd nexwe
û temê te nek'işîne xwarina wî,
7 çimkî ç'e'vê wîyê xwarina te be,
wê ter'a bêje: «Bixwe-vexwe»,
lê dilê wî ne t'evî te ye.
8 Ew parîyê ku te xwaribe tê ver'eşî
û gotinêd xweye xweş tê unda kî.

9 Guhê axmaxda tiştekî nebêje,
çimkî ewê zanistîya gotina te bêhurmet ke.

10 Sînorê kevin cîguhastî neke
û nek'eve e'rdê jinebîya,
11 çimkî pismamê wanî nêzîk zor e,
ewê îşê wan t'evî te safî ke.

12 Dilê te li ser şîreta be,
guhê te jî li ser gotinêd serwaxt be.

13 Şîretkirinêda bêxatirîya zar'a bike,
pê şivê jî heger bik'utî, ew namire.
14 Lê heger tu pê şivê jî wî dik'utî,
nefsa wî tu ji dîyarê mirîya xilaz dikî.

15 Kur'ê min! Heger dilê te serwaxt e,
dilê min jî şa dibe.
16 Gava ji devê te gotinêd r'ast derên,
ezê jî li nava xweda şa bibim.

17 Bira dilê te h'evsûdîya gunek'ar neke,
lê her r'oj xofa Xudanda be.

18 Çimkî e’seyî axirî heye
û gumana teyê unda nebe.
19 Bibihê, kur’ê min û serwaxt be,
dilê xwe ber bi r’îya r’astda ke.
20 Neçe nava vexwarîya,
ne jî nava p’ir’xurêd goşt.
21 Çimkî yê vexwarî û p’ir’xurî belengaz dibin
û k’incêd p’onijîya dip’izinin.

22 Gur’a bavê xwe bike, ku tu jê k’etîyî
û dîya xwe bêhurmet neke, gava pîr bibe.
23 Heqîyê bik’ir’e,
serwaxtîyê, şîreta, bîlantîyê jî nefiroşe.
24 Bavê yê r’ast eşq û şa ye,
yê serwaxt pey xwe dixe pê wî şa dibin.
25 Bira dê bavê te pê te eşq bin,
bira şa be ya ku tu jê k’etî.

26 Dilê xwe bide min, kur’ê min!
û ç’e’vê te bira ser r’îya min bin.
27 Çimkî ya qav ç’e’la k’ûr e,
jina ç’e’vder bîra teng e.
28 Ewa mîna qaçaxekî xwe ditelîne,
nava merivada bêamina zêde dike.

29 Axîn ya k’ê ye? Waxîn ya k’ê ye?
Şer’-de’w yê k’ê ne? Xem û xiyal yê k’ê ne?
Birînêd bêsebeb yê k’ê ne?
Ç’e’vêd sorbûyî yê k’ê ne?
30 Ew yê li ber şeravê ne,
yêd ku şerava t’evhevkirî diger’in.
31 R’engê şeravêyî sor nenihêr’e,
çawa ew k’asêda bi ç’e’va dike
û r’îya xweda xweş-xweş diçe!
32 Ew mîna me’ra paşê digeze
û mîna tîreme’r ew lê dide.

33 Hingê qeret'ûyê bêne li ber ç'e'vêd te
û dilê te jî wê tiştêd bêt'ewşe bêje.
34 Tê bibî mîna yekî be'rêda p'aldayî
û çawa yekî li ser serê bap'êşa gemîyê r'azayî.
35 Tê bêjî: «Min xistine, ez ne êşîyame,
ez dame li ber de'fa, min xwe dernexistîye.
Ez k'engê ser h'işê xweda bim,
wekî dîsa wê yekê bikim?»

24 1 H'evsûdîyê li merivêd xirab neke
û dilê te bira t'evî wan nîbe,
2 çimkî dilê wan li ser zordarîyê difikire
û devê wan li ser xirabîyê xeber dide.

3 Bi serwaxtîyê mal tê çêkirinê
û bîlantîyê tê qedîmkirinê,
4 pê zanistîyê hindur' bi her tiştêd biha
û xişirêd h'ewask'arva tê t'ijîkirinê.

5 Merivê aqil zor dibe
û merivê zane zexim dibe,
6 çimkî şer'ê xwe ku dikî, didî ber h'esaba
û serk'etin bi gelek şîretk'ara tê.

7 Serwaxtî bona axmax gelekî bilind e,
dergeh-dîwanêda ew nikare devê xwe veke.
8 Ewê difikire xirabîyê bike,
wîr'a dibêjin: «Yê mixenet».
9 Fikira axmaxtîyê gune ye
û pêk'enî li ber ç'e'vê meriv zivêr e.

10 Heger tu tengasîyêda dilsist bî,
ku usa ye tu ne xurt î.

11 Yêd mirinêr'a têne birinê xilaz ke
û xwe ji yêd kuştinêr'a dayî nede paş.

12 Heger bêjî: «Belê me ev yek nizanibû»,
awa yê dila zane, ew haş pê heye,
yê ku ser teda dinihêr’e wê yekê zane
û wê her kesî weke e’melêd wan bide.

13 Lawê min, hingiv bixwe çimkî xweş e
û hingivê hêlûnê ku şîrine bona demaxê te,
14 usa jî serwaxtî naskirinê li nefsa te şîrin be,
heger tu wê bibînî axirîya teyê xêr be,
bê guman nabî.

15 Hey nep’ako! Xwe li mala r’astada netelîne
û hêwargeha wî wêran neke,
16 çimkî, heger yê r’ast h’eft cara bik’eve, wê dîsa r’abe,
lê nep’akê xirabîyêda sersêrî bên.

17 Gava dijminê te bik’eve şa nebe
û gava nigê wî bilik’ume, dilê xwe wî şa neke,
18 nebe ku Xudan vê yekê bibîne Wî xweş neyê
û Ew hêrsa Xwe li neyar dayne.

19 Dilê xwe hindava xirabada t’ijî neke
û h’evsûdîyê nep’aka neke,
20 çimkî xêra axirîya yê xirab t’une,
ç’ira yê nep’ak wê vêse.

21 Lawê min! Ji Xudan û p’adşê bitirse
û t’evî yêd serhildayî miqabilî wan nebe,
22 çimkî belayê nişkêva bê serê wan
û k’î zane ji Xudan û p’adşê wê çi bibe li wan.

## Gotinêd serwaxte kêrhatî

23 Ev jî gotinêd serwaxta ne:
Dîwanêda firqîkirin ne baş e.
24 Ewê ku yê nep’akr’a bêje: «Tu r’ast î»,
êl-e’şîrê nifir’a wî bikin û miletê ewî bêhurmet kin,

25 lê yêd kirê wan bide r’ûyê wan, wê bextewar bin
û xêr û xweşîyê li ser wanda bibare.
26 Caba r’ast,
çawa lêv r’amûsan.
27 T’ivdarekê şixulê der bike
û e’rdê xwe li ser hevda bîne,
paşê mala xwe çê ke.
28 Bê sebeb nebe şe’dê himberî hevalê xwe
û bi devê xwe nexapîne,
29 nebêje: «Evî çi serê min kir,
ezê jî usa serê wî bikim,
weke kirêd wî ezê lê veger’înim».

30 Ez li ber e’rdê xwer’anedîtî
û r’ezê tirîyê kêmaqilr’a derbaz bûm,
31 va ye h’emû stirî derk’etibûn
û r’ûyê wan gez-gezekêva girtî bûn, sûrêd kevirî jî
hilşîyayî bûn.
32 Gava ez ç’e’v pêk’etim, min da h’işê xwe
û min dîna xwe dayê, xwer’a kire dersa xwe:
33 H’eta hinekî r’azêyî, hinekî bip’onijî,
hinekî destêd xwe bidî li ser hev p’aldî,
34 hingê k’esîbîya teyê mîna r’êwîkî diz li ser teda bigire,
desttengîya teyê jî mîna qaçaxekî.

## K’oma meselêd Silêmane duda

**25** 1 Ev in ew meselêd Silêman, k’îjan ku merivêd Hizqîya
p’adşê Cihûdayê ji ber hildane:

2 Kirêd Xwedêye veşartî r’ûmeta wî ye,
lê r’ûmeta p’adşê kir e’yankirin e.
3 Çawa bilindaya e’zmên û k’ûraya e’rdê,
usa jî dilê p’adşê nayê e’nenekirinê.
4 T’orta zîv jê biqetîne,
ewê zîvkerr’a derdanekê derk’eve,

5 nep’ak jî ji p’adşê biqetîne,
t’extê wîyê bi r’astîyê qedîm be.
6 Li ber p’adşê p’ayê xwe nede,
li cîyê giregira nesekine,
7 qenc e ku ter’a bêjin: «K’erem ke vê jorê»,
ne ku li ber giregira te nimiz kin.
8 Bi dîtina ç’e’va,
zû nek’eve nava şer’ û de’wa,
wekî hevalê te, te nede şermê
û nizanibî axirîyê tê çi bikî.
9 Pirsêd xwe t’evî hevalê xwe safî ke,
lê sur’a xelqêr’a veneke,
10 wekî yê bibihê te bêhurmet neke
û ew navê xirab li ser te nemîne.
11 Gotineke cîda
mîna sêva zêr’în e li ser zîv qaşkirî.
12 Şîreta yê serwaxt, bona yê guhdar,
mîna guhar û xişirê zêr’în e.
13 Çawa sir’a berfê dema nandirûnê,
usa jî qasidê amin bona şandîyê xwe,
ew sik’anê dide nefsa xweyîyê xwe.
14 Yê p’êşk’êş soz dide û nake,
ew mîna bayê û e’wrê bê baran e.
15 Bi sebirê dilê mîr û bega nerm dibe
û zarê şîrin hestûya hûrdexweşî dike.
16 Gava te hingiv dît, weke me’dê xwe bixwe,
nebe ku tu jê t’êr bî û paşê ver’eşî.
17 Her gav neçe mala cînar, ku ew ji te t’êr nebe
û paşê ew ji te aciz be.
18 Yê şe’detîya derew himberî hevalê xwe dide,
ew mîna r’im, şûr û tîrê tûjkirî ye.
19 Gumana li ser merivê bê amin,
r’oja tengasîyêda mîna diranê şkestî û nigê kulek e.
20 Li ber merivê dilşkestî, stiran gotin,
mîna çawa yek r’oja sar k’incê xwe bêxe,
yan jî çawa xwê têkine li ser birînê.

21 Heger dijminê te bir’çî ye, nên bidê
û heger t’î ye, avê bidê,
22 çimkî tu bi vê yekê
pirîskê êgir ser serê wî t’op dikî
û Xudanê li te veger’îne.
23 Bayê bakurê baranê tîne,
zarê mixenet jî r’ûyê me’dekirî.
24 Qenc e qulç’ekîda li ser xênî bijîn,
ne ku t’evî jina şer’ûd xanekêda.
25 Mizgînîya ji welatekî dûr
mîna çawa ava sare bona zarê ç’ila.
26 Merivê r’ast ku li ber nep’ak nimiz dibe,
ew mîna kanîya xitimî û sêlava şêlû ye.
27 Çawa gelek hingiv-xwarin neqenc e,
usa jî yê li pey navê xwe k’etî ne nav e.
28 Merivê ku nefsa xwe nikare,
ew mîna bajarekî xirabeyî bêsûr e.

**26** 1 Çawa berf li havînê û baran li nandirûnê,
usa jî qediriaxmax nak’eve.
2 Çawa ku ç’ivîk divir’vir’e û dûvmeqesk difir’e,
usa jî nifir’a badîhewa nayê sêrî.
3 Qamçî bona hespa ye, qeyd bona k’era ye,
lê zoxal bona navmila axmaxa ye.
4 Li axmax li gora axmaxtîya wî veneger’îne,
ku nebe bibî yekî mîna wî.
5 Li axmax li gora axmaxtîya wî veger’îne,
wekî ew xwe dewsa zana daneyne.
6 Yê bi destê axmax xeberê dişîne,
ew nigê xwe dibir’e û zirarê dik’işîne.
7 Mesela devê axmaxa,
mîna lerizeka nigê seqeta.
8 Yê qedir axmaxr’a dike,
mîna çawa kevirek kewkanîyêda biwale.
9 Mesela devê axmaxa,
çawa ç’iqilê stirîyayî destê serxweşa.

10 K'irêkirê axmaxa û r'êwîya,
ew zirarê dida h'emûya.
11 Axmaxê ku axmaxtîya xwe diwek'ilîne,
ew mîna çawa se ku vediger'e
li ser ver'eşandina xwe.
12 Te ew merivê ku xwe aqil dibîne dîtîye?
Ji yê axmax hê guman heye, ne ku ji wî.
13 Xwer'anedîtî dibêje:
«Şêr li ser r'ê ye! Şêr li meydanê ye!»
14 Çawa derî li ser dergira xwe diçe-tê,
usa jî xwer'anedîtî li ser nivîna xwe.
15 Xwer'anedîtî destê xwe dike t'asa xwe,
lê jêr'a ze'met e ku ew bibe devê xwe.
16 Xwer'anedîtî hê xwe serwaxt dibîne
ne ku h'eft mêrêd ku cabêd aqil didin.
17 R'êwîyê ku t'evî şer'-de'wê xelqê dibe,
mîna çawa yek dest bavêje guhê sekî.
18 Dînî-harê ku pirîskê agir
û tîrê kuştinê davêje,
19 mîna wî ye, yê ku yekî dixapîne
û paşê dibêje: «Min h'enek kir».
20 Ser agir ku dar t'unebin, agirê vêse,
usa jî gava buxdanbêj t'unebin şer'ê bitemire.
21 Çawa k'omir bona pirîska û dar bona agir e,
usa jî yê şer'ûd bona şer'-t'evr'akirinê ye.
22 Gotinêd buxdanbêj mîna te'me-tîska ne
û ew h'eta k'ûraîya navdil diçin.
23 Lêvêd alavîye t'evî dilê xirab
mîna çawa derdana axîne pê t'orta zîv kiraskirî.
24 Neyar bi zarê xwe h'ilek'arîyê dike,
dilê xweda jî mixenetîyê xwey dike,
25 heger ew zarê xweş jî xeber de, bawer neke,
çimkî h'eft h'eramî dilada hene.
26 Ew k'îna xwe ku bi mixenetîyê veşêre,
yeke civatêda xirabîya wî wê derê.

27 Yê ç’e’lê dik’ole ew xwexa dik’evê
û yê kevir hol dike, ew li ser wîda tê.
28 Zimanê derew dijene derbdayê xwe
û devê h’ilek’ar mêriv ser-sêrî tîne.

# 27

1 Pê r’oja sibê nefir’e,
çimkî tu nizanî ew r’ojê çi bîne.
2 Bira xelq pesinê te bide, ne ku devê te,
yê xerîb, ne ku zarê te.
3 Kevir giran e û qûm jî bar e,
lê hêlanê axmaxa ji her duya girantir e.
4 Xezeb bêîsaf e û hêrs lêyî ye,
lê k’î dikare li ber k’umr’eşîyê bisekine.
5 Hilatina aşkela,
ji h’izkirina veşartî çêtir e.
6 Birînêd pêşewitîya amin in,
r’amûsanêd neyara p’ir’ in.
7 Zikê t’êr p’ê li hingivê hêlûnê dike,
lê bona zikê bir’çî her tiştê te’l şîrin e.
8 Merivê cî-warê xwe hiştî,
çawa ç’ivîka hêlûna xwe hiştî.
9 R’ûn û bixûr dil şa dikin,
şîrinaya hevaltîyê jî ji şîretêd qenc.
10 Dest ji hevalê xwe û hevalê bavê xwe nek’işîne,
r’ojê xweye oxirmê giranda neçe derê birê xwe,
cînarê nêzîk ji birakî dûr çêtir e.
11 Kur’ê min, serwaxt be û dilê min şa ke,
ku ez bikaribim caba qardarêd xwe bidim.
12 Yê aqil xirabîyê ku dibîne h’evza xwe dike,
lê yê dilsax pêşda diçin û zirarê dibîne.
13 Yê bû wek’îlê xerîbekî, qap’ûtê wî hilde,
yê bû wek’îlê jineke nenas, k’efîl ji wî hilde.
14 Yek ku her sibeha zû r’abe
û bi deng bilind dua yekî bike,
ev yekê ber ç’e’vê wî merivî nifir’ bê h’esabê.

15 R’oja ç’ilke-ç’ilka baranê
û jina bede-şer’ûd mîna hev in,
16 yê ku bixwaze wê bigire, ew çawa bixwaze bayê bigire,
yan jî çawa k’ulma xweye r’astêda r’ûn xwey ke.
17 Çawa h’esin bi h’esin tê tûjkirinê,
usa jî meriv h’esinê hevalê xwe ye.
18 Yê ku dara hêjîrê xwey dike, berê wê dixwe
û yê ku axayê xwe xwey dike, tê qedirkirinê.
19 Çawa avêda r’û li ber r’û ye,
usa jî dil mêriv, mêriv dide k’ifşê.
20 Çawa dîyarê mirîya û gelîyê hey-wayê t’êr nabin,
usa jî ç’e’vêd mêriv t’êr nabin.
21 Çawa fir’ne zîv dicêr’ibîne û k’ûre jî zêr’,
usa jî meriv bi pesindayînê tê cêr’ibandinê.
22 Heger axmax t’evî de’n bi mêrk’ut bik’utin,
yek e dîsa ew ji axmaxtîya xwe venager’e.
23 Li ser h’alê pezê xweda r’ind binihêr’e
û dîna xwe bide kerîyêd xwe,
24 çimkî dewlet her t’im namîne
û t’ac qur’ne-qur’ne namîne.
25 Şînayî tê dirûnê, ç’êra nû dertê,
gîhayê serê ç’îya lod dikin,
26 k’incêd te ji berxa tên
û nêrî jî bona heqê e’rdê ne.
27 Şîrê bizinê besî xwarina te, xwarina mala te
û îdara carîyêd te ye.

**28** 1 R’ev dik’eve nep’ak, bêyî ku yek pey k’eve,
lê yê r’ast mîna şêra minetê nak’işînin.
2 Gava welat serh’işk dibe, gelek serwêr jî zêde dibin,
lê bi saya merivekî aqil û zane dirêj dimîne.
3 Merivê me’rimî ku tengasîyê dide k’esîba,
mîna te’vîya baranêye ku zevîyê dişo dibe.
4 Yêd ku guh nadine qanûnê, pesinê nep’aka didin,
lê yêd ku qanûnê xwey dikin, himberî wan disenin.

5 Merivê xirab heqîyê fe’m nakin,
lê yê Xudan diger’in, t’am fe’m dikin.
6 Qenc e belengazê ku r’îya xweye aminda diçe,
ne ku dewletîkî xalifî.
7 Yê qanûnê xwey dike kur’ekî aqil e,
lê yê dibe hevalê p’ir’xure-p’ûç’,
bavê xwe dide şermê.
8 Yê ku hebûka xwe bi k’ar û selefa zêde dike,
ew bona yê ku dest davêje k’esîba t’op dike.
9 Ewê ku t’ilîya dike guhê xwe ku qanûnê nebihê,
duayê wî jî h’eta zivêr e.
10 Ewê ku yê r’ast berbi r’îya xirabîyê dibe,
ewê xwexa bik’eve ç’e’la xweye k’olayî.
Lê yê bêlek’e wê xêr-xweşîyê war bin.
11 Merivê dewletî li ber ç’e’vê xwe serwaxt k’ifş dibe,
lê k’esîbê aqil gilîya jê dik’işîne.
12 Gava r’ast eşq û şa dibin, r’ûmeta mezin e,
lê gava nep’ak h’ir’ dibin, meriv xwe vedişêrin.
13 Ewê ku neheqîya xwe vedişêre xêrê nabîne,
lê yê ku xwe mukur’ tê û dihêle, wê r’e’mê bibîne.
14 Merivê her gav xwedêxof, xwezilî ye,
lê yê dilê xwe dike kevir, çerxa wî ç’ep dibe.
15 Nep’akê ku serwêrîya miletê belengaz dike,
mîna şêrê mir’e-mir’e û h’ir’ç’ê bir’çî ye.
16 Serwêrê sersax gelekî tengasîyê dide,
lê yê hebûka h’eram h’iz nake, e’mirê xwe dirêj dike.
17 Merivê xûna însên ser stûyê wî, h’eta gor’ê dir’eve,
bira t’u kes wî negire.
18 Merivê r’êdayî bêlek’e, ewê her’e bêzede,
lê yê li r’îyêd xaro-marda zû dik’eve.
19 Yê e’rdê xwe bêcer dike, wê nanê xwe t’êr bixwe,
lê yê dide pey tiştê p’ûç’, dibe hêsîr-k’esîbek.
20 Ew meriv amin e, xweyê xêr û berek’et e,
lê yê dilezîne dewletî be, bê bela namîne.
21 Dur’ûtîkirin nebaş e,
lê meriv bona parî nan dikare xwe gunek’ar ke.

22 Merivê ç’e’vbir’çî dike ku dewletî be,
lê nizane ku belengazîyê serda bê.
23 Kirê mêriv bidine r’ûyê wî axirî hê xêr e,
ne ku bi zimên h’ilek’arîyê bikin.
24 Ewê ku dizîya dê û bavê xwe dike û dibêje:
«Eva ne gune ye», ew hevalê diz-qaçaxa ye.
25 Xweyê dilê tima şêr’ t’evr’a dike,
lê yê xwe dispêre Xudan gul dide.
26 Yê xweda guman e, ew axmax e,
lê yê serwaxtîyêda dijî wê azad be.
27 Alîk’arê belengaza ew nabîne te’lî-tengîya,
lê ewê ku pişt dide wî, ew nifir’a tîne li ser xwe.
28 Gava nep’ak h’ir’ dibin, xelq xwe vedişêre,
lê gava ew dik’evin, merivê r’ast zêde dibin.

# 29

1 Merivê li ber şîreta, gava serh’işk dimîne
derbekêr’a wê bişkê û dû-derman nebîne.
2 Gava yê r’ast zêde dibin, cime’t wanr’a şa dibe,
lê gava nep’ak dibe serwêr,
cime’t axîn zare-zar dike.
3 Merivê serwaxtîyê h’iz dike, ew bavê xwe şa dike,
lê yê pey qava diçe, ew hebûka xwe p’ûç’ dike.
4 P’adşayê li ser r’astîyê welat şên dike,
lê ç’e’vê yê li xerc e, welat xirab dike.
5 Yê h’ilek’arîyê li hevalê xwe dike,
ew t’or’ê davêje li ber nigê wî.
6 Gunek’arîya merivê xirabda t’ele heye,
lê yê r’ast eşqê û şayêda ye.
7 Merivê r’ast dik’eve h’alê destûra belengaza,
lê yê xirab h’işê wan nagihîje h’alê wan.
8 Merivêd pêk’enî bajêr t’evîhev dikin,
lê yê serwaxt qerebalixê diseqir’înin.
9 Gava serwaxt t’evî axmax bik’eve dergeh-dîwanê,
hêrs k’eve yan bik’ene, yeke p’anca wî danayne.
10 Merivêd qet’il davêjine k’amila,
lê yêd r’ast h’alê wî dipirsin.

11 Axmax h'emû hêrsa xwe dide der,
lê yê serwaxt xweda zeft dike.
12 Serwêrê ku guh dide gotinêd derew,
h'emû berdestîyêd wî xirab dertên.
13 Belengaz û zordar r'astî hev tên,
Xudane îşiqê dide ç'e'vê her duya.
14 P'adşayê ku bi r'astîyê li ser îşê belengazada dinihêr'e,
k'ursîya wîyê h'eta-h'etayê bimîne.
15 Şiva şîretê serwaxtîyê dide,
lê ewledê xweserêxwe hiştî r'ûr'eşîya dê ye.
16 Gava nep'ak zêde dibin, neheqî jî zêde dibe,
lê r'ast wê k'etina wan bibînin.
17 Dilê kur'ê xwe bêşîne, ewê r'ih'etîyê bide te
û wê bibe baristanîya r'uh'ê te.
18 Bê e'lametîya jorin, merî bêserî dibe,
lê yê qanûnê xwey dike, xwezilî ye.
19 Xulam bi gotina nayê şîretkirinê
wekî fe'm dike lê naqedîne.
20 Te ew merivê ku gotina xweda lez dik'eve dîtîye?
Ji yê axmax hê guman heye, ne ku ji wî.
21 Yê ku biç'ûktîyêda xulamê xwe nazik xwey ke,
axirîyêda ewê bibe mîrat'xurê wî.
22 Merivê hêrs şêr' t'evr'adike
û yê vegur'ipî gele gune dike.
23 K'ubarîya meriv wî nimiz dike,
lê yê milûk xweyîr'ûmet dibe.
24 Yê t'evî diz e, ew dijminê e'mirê xwe ye,
çimkî ew nifir'ê* dibihê, lê nake dengî.
25 Tirsa mêriv bona mêriv t'ele ye,
lê Xudan bona yê Wîda guman sit'ar e.
26 Gelek dikin ku r'ûyê wan r'ûyê serwêr k'eve,
lê heqîya mêriv ji Xudan e.
27 Yê r'ast ji yê ner'ast zivêr e,
nep'ak jî ji yê r'êda r'ast diçin zivêr e.

* 29:24 Qanûna K'ahîntîyê 5:1.

## Gotinêd Agûr

**30** [1] Ev in gotinêd dayî, k'îjan ku Agûrê kur'ê Yaqehê gote
Ît'îyêl û Ûk'al:

2 R'ast ez ji her merivî bêh'iştir im
û h'işê mêriv serê minda t'une,
3 ez serwaxtîyê hîn nebûm
û Yê Herî Pîroz ez nas nakim.
4 K'î r'abû e'zmên û ji wir hat?
K'ê k'ulma Xweda ba t'op kir?
K'ê pêşa Xweda av gol kirin?
K'ê h'emû qulbêd dinyayê danîn?
Navê Wî çî ye? Navê kur'ê Wî çî ye?
Gelo tu zanî?
5 H'emû gotinêd Xwedê paqij in,
bona yêd xwe spartine Wî, Ew mert'al e.
6 Tiştekî li ser gotinêd Wî zêde nekî,
ku Ew te hilê û tu derew derêyî.

7 Ez ji Te du tişta dixwazim,
na-na neke h'eta ku ez nemirime:
8 Boş-betalîyê û derewîyê ji min dûr xe,
ne min belengaz ke, ne jî dewletî ke,
pê nanê r'ojê Tu min t'êr ke.
9 Nebe ku ez t'êr bim, Te înk'ar kim
û bêjim: «Xudan k'î ye?»
Ne jî k'esîb bim dizîyê bikim
û navê Xwedê xwe bêhurmet kim.

10 Xeyba xulam li ber axayê wî neke,
ku ew nifir'a li te neke û bela neyê serê te.

11 Meriv hene ku nifir'a bavê xwe dikin
û dua dîya xwe nakin.

12 Meriv hene ku li ber ç’e’vê xwe paqij k’ifş dibin,
lê ji gemara xwe nehatine şûştinê.
13 Meriv hene ç’e’v li ser sêrî dir’eqisin
û birî-bijangêd wî bilind in.
14 Meriv hene diranêd wan mîna şûra ne,
çengîyêd wan jî mîna k’êra ne,
wekî k’esîba ji ser dinê daqurtînin
û belengaza jî ji nava meriva.

15 Du qîzêd t’êrnebûyê hene,
ku dibêjin: «Bide, bide!»
Sê tişt hene ku t’êr nabin
û çar tişt hene ku nabêjin: «Bes e!»
16 Dîyarê mirîya, jina bêber,
e’rdê ku t’êr avê venaxwe
û agir ku nabêje: «Bes e!»

17 Ewê ku qerfa bavê xwe dike
û guhdarîya dîya xwe nake,
qar’qar’êd newala û cûcûkêd teyra
wê ç’e’vêd wî derxin û daqurtînin.

18 Sê tişt hene ku ez tê hilnayêm
û çar tişt ku ez wan fe’m nakim:
19 R’îya teyraye hewêda,
r’îya me’raye qeyada,
r’îya gemîyaye nava be’rada
û r’îya mêraye berbi qîza.

20 R’îya jina ç’e’vder aha ye,
dixwe û devê xwe paqij dike û dibêje:
«Min t’u xirabî nekirîye».

21 Sê tişt hene ku dinya bin wanda dilerize
û çar tişt hene ku ew nikare wan bibe:

22 Xulamê ku dibe p'adşa,
axmaxê ku bi nên t'êr dibe,
23 k'ulfeta nexûnşîrin ku mêr dike
û carîya ku dibe mîrat'xurê xanima xwe.

24 Li r'ûyê e'rdê çar tiştê biç'ûk hene,
lê ew yê here serwaxt in:
25 Mûrî, ku ne e'firînekî qewat e,
lê xurekê xwe havînê dide li ser hev.
26 Qotik, ku bînbereke bêqewat e,
lê qulêd xwe ew qeyada çê dikin.
27 Kulî, ku p'adşê wan t'une,
lê k'om bi k'om bi hevr'a difir'in.
28 Me'regîskê lepikî, ku bi çeç'ikêd xwe dîwêrva dizeliqe,
lê ew qesirêd p'adşada dimînin.

29 Sê bînber in ku r'êvaçûyîna wan h'ewas in
û çar bînber in ku r'êvaçûyîna wan bedew in:
30 Şêr, ku e'gîtê h'eywana ye,
ew ji ber t'u tiştî nar'eve,
31 dîkê h'işir û nêrî,
usa jî p'adşê pêşîya cime'ta xwe.

32 Heger te ji dest k'ubarîyê bêfe'mî kir,
yan jî xirabî fikirî yî,
destê xwe bide li ser devê xwe.
33 Çimkî çawa dêw dik'ilên r'ûn derdik'eve
û pozda didinê xûn jê diçe,
usa jî hêlanêd hêrs, şer' çê dibe.

## Gotinêd Lemûêl p'adşa

31 1 Ev in gotinêd Lemûêl p'adşa, ew şîretêd ku dîya wî dabûne wî:

2 Çi bêjime te lawê min? Çi bêjime te kur'ê navdilê min?
Çi bêjime te kur'ê ad-qirarêd min?

3 Qewata xwe nede jina,
ne jî bide ewêd ku p'adşa jorda tînin.
4 Li p'adşa nak'eve Lemûêlo!
li p'adşa nak'eve, ku şeravê vexwe
û mîr-bega ku dixwazin avcê vexwin.
5 Nebe ku vexwin qanûnê bîr bikin
û heqê bêç'are bit'er'ibînin.
6 Avcê bidine yê li ber r'uh'
û şeravê bidine yê xwey derd-kul.
7 Bira ew vexwin t'unebûna xwe bîr bikin
û me'rimîya xwe îdî nekin bîra xwe.
8 Devê xwe veke bona yê bê zar-ziman
û bona piştgirtina yê bêk'omek.
9 Devê xwe veke û bi r'astîyê h'akimtîyê bike
û ser îşê feqîr û belengazda binihêr'e.

**K'ulfeta e'sile jêhatî**

10 Kî dikare k'ulfeta e'sil bibîne?
Qîmetê wê ji lal-dur' jortir e.
11 Dilê malxê wê wêda guman e
û ew t'u kêmasîyê nabîne.
12 T'emamîya e'mirê xweda
ewê qencîyê wîr'a bike, ne ku xirabîyê.
13 Hirî û k'itanê p'eyda dike,
bi dil û can bi destê xwe xebat dike.
14 Ew mîna gemîya t'ucaretê,
ku nanê wê ji cîyê dûr tê.
15 Ew hê şevda zû r'adibe, neferêd xwe nan-av dike
û şixul dide li ber carîya.
16 Dîna xwe dide e'rdekî û dik'ir'e,
bi k'eda destê xwe tirîya datîne.
17 Ew pişta xwe dişidîne,
zendada qewat dibe.
18 Ew k'ifş dike k'ir'în-firotan jêr'a qenc e
û şevê jî ç'ira wê vênasê.

19 Dest davêje ew t'eşîya xwe,
bi k'efa dêst dizivir'îne.
20 Dest davêje ew k'esîba
û dest dirêjî belengaz dike.
21 Bona nefera ew ji berfê natirse,
çimkî nefere du dest k'ince xwekirî ne.
22 Ew r'ûbera xwer'a çê dike,
k'incêd wê ji k'itanê xas û şîrk* e.
23 Malxê wê nav û deng e nav dergehada,
gava nava r'ûspîyêd welatda r'ûdinî.
24 Ew k'incêd k'itanî çê dike difiroşe
û pişteka dide bazirgana.
25 Qewat û xweyîr'ûmet in k'incêd wê
û axirîya wê, wê xêr-xweşî be.
26 Ew devê xwe bi serwaxtîyê vedike,
li ser zimanê wê hînkirina amin heye.
27 Ew miqatîyê mala xwe dike
û nanê xwer'anedîtîyê ew naxwe.
28 Zar'êd wê r'adibin xwezîya xwe wê tînin
û malxê wê jî pesinê wê dide:
29 «Gelek qîzêd e'sil hebûne,
lê tu bûyî li ser wanr'a».
30 Derew e delaltî û p'ûç' e bedewetî,
k'ulfeta ji Xudan ditirse ewe xwezîtî.
31 Ji berê destê wê bidine wê,
dergehada wê kirêd wê pesinê wê bidin*.

* 31:22 R'engê «şîrk» gelekî biha bû.

* 31:10-31 Ji r'êza 10-a h'eta xilazîyê hilbesteke «akrostîk» e, awa gotî anegorî elîfbeya h'erfêd îbranî çêkirî ye.